



K.T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

ROJEN BARNAS Ê TEMAYÊN SIYASÎ

DI HELBESTÊN WÎ DE

KENAN ÖRMEK

13711010

Şewirmend

Hnd. Pwd. ZÜLKÜF ERGÜN

Mêrdîn-2019

K.T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYAYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**ROJEN BARNAS Ê TEMAYÊN SIYASÎ
DI HELBESTÊN WÎ DE**

KENAN ÖRMEK

13711010

Şêwirmend

Hnd. Pwd. ZÜLKÜF ERGÜN

Mêrdîn-2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Rojen Barnas û Temayên Siyasî di Helbestên Wî de**” adlı yüksek lisans tezimin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

✓ **Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.**

Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

10.05.2019

Kenan ÖRMEK

KABUL VE ONAY

Kenan ÖRMEK tarafından hazırlanan “**Rojen Barnas û Temayên Siyasî di Helbestên Wî de**” adındaki çalışma, 10.05.2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Prof.Dr. Abdurrahman ADAK (Başkan)

Dr.Öğr. Üyesi Abdurrahim ÖZMEN (Üye)

Öğr. Gör. Zülküf Ergün (Üye)

PÊŞGOTIN

Rojen Barnas ji kovara *Tîrêjê* (1979) ve helbestan dinivîsîne û di nav “Nîfşê Tîrêjê” de tê nirxandin. Barnas yek ji wan helbestvanên Kurdî ye û wek helbestvanekî xweser di nav helbesta Kurdî de tê pejirandin ku ev xweserî bi kedeke mezin ava kiriye. Barnas di nav edebiyata Kurdî de bi helbesta xwe li cihekî girîng disekine û gelek guhertinên nû li helbesta Kurmancî bar kirine. Ji bilî helbestê, Barnas çîrok jî nivîsîne û berê xwe daye ceribandînan derbarê helbest, edebiyat, nivîskar, ziman, gramer, rastnivîs, kovar û siyasetê jî. Ji bilî van yek ji wan helbestvanên Kurdî ye ku ev demeke dirêj e dev ji helbestê bernedaye û helbestnivîsandina wî hê jî berdewam e. Barnas ji ber van girîngiyên xwe bûye mijara xebata me.

Mijara teza me “Rojen Barnas û Temayên Siyasî di Helbestên wî de” ye ku armanca me di vê xebatê de ew e ku em jiyana Rojen Barnas ji her awayî ve diyar bikin û helbestên wî ji aliyê naverokê ve ji hev veçirînin û temayên siyasî yên ku Rojen Barnas bêhtir giraniya xwe daye wan derxînin holê û van temayan di nav helbestên helbestvan de berçav bikin.

Me xebata xwe ji ber hin sedeman bi sînorek kiriye û xebata xwe me li gorî plansaziyekekê amade kiriye ku xebata me ji “pêşgotin, destpêk, du beş, encam û çavkani” yekê pêk tê. Li gorî vê plansaziye, me rê û rêbazên xwe diyar kirine.

Di destpêkê de çî nivîsên ku derbarê helbestvaniya Rojen Barnas de hene me ji wan sîd wergirtiye. Bi alîkariya van nivîsan û li gorî xwendinên ku me kirine me ramanên xwe diyar kirine û helbestvaniya “Rojen Barnas di Edebiyata Kurdî de” berçav kiriye. Di destpêkê de dîsa wek tabloyeke bi giştî “sedema hîlbijartina tezê, girîngiya tezê, sînorekî tezê û rêbaza tezê” ya xebata xwe me diyar kiriye.

Di beşa yekem de em li ser jiyana û berhemên Rojen Barnas sekinîne. Xebatên ku di destê me de hene têra me nekirin ku em jiyana wî ji her awayî ve berçav bikin. Ji ber vê jî heta ji me hat me xebatên di destê xwe de kûr kolan û gelek pirsên derbarê jiyana wî de ji Rojen Barnas bi xwe pirsîn. Lewre di vê beşê de me xwestiye ku em jiyana Rojen Barnas bi her awayî diyar bikin û agahiyên kêrêm yên derbarê

jiyana wî de tamam bikin. Bi vê yekê re jî me xwestiye ku em têkiliya jiyana û helbesta wî bi hev re girê bidin.

Di beşa duyem de jî em li ser temayên siyasî yên ku di helbestên wî de derketine pêş sekinîne ku ev beş, beşa sereke ye û armanca xebata me diyar dike. Di vê beşê de me temayên siyasî yên ku derdikevin pêş senifandine û li gorî binbeşan diyar kirine. Heta ji destê me hatiye me xwe bera hundurê helbestên Barnas daye û temayên helbestên wî li gorî jiyana wî û serdema ku helbestên xwe lê nivîsandine şîrove kirine. Di vê serdema modern de, ji ber ku gelek nirxandinên cuda cuda yên helbestê hene, helbet dê kêmasiyên me hebin. Eger bi vê xebatê re me helbesta Rojen Barnas di nava helbesta Kurmancî de hinekî diyar kiribe, em ê xwe bextewar hîs bikin.

Bi vê xebatê re me xwestiye ku em rola helbesta Barnas di nav helbesta Kurmancî de derxînin ber ronahiyê û agahiyên kêr yên derbarê jiyana helbestvan de tamam bikin û pê re jî ji aliyê temayên siyasî ve helbestên wî kifş bikin. Em hêvî dikin ku me bi vê xebatê re ev yek kiribe.

Berî her tiştî ji ber ku di diyarkirina mijara vê xebatê de û di pêvajoya vê xebatê de rê li ber min vekir û bi hemû bêhnfirehiya xwe kêmasiyên min bi zimanekî maqûl ji min re gotin, spasdarê şewirmendê xwe birêz Hnd. Pwd. Zülküf ERGÜN im. Spasdarê hevsera xwe Ajda me jî ku bi vê xebatê re gelek qehra min kişand û çî kesên ku keda wan di vê xebatê de heye, ji bo wan jî spasîyên xwe pêşkêş dikim. Ez vê xebata xwe diyarî keçika xwe *Rûken Roya* dikim ku bi hatina wê re jiyaneke nû li ber min vekir.

Kenan ÖRMEK

Mêrdîn-2019

KURTE

Rojen Barnas helbestvanekî Kurd e û di serdemeke nûjen de helbest nivîsandine. Barnas di destpêkê de bi Tirkî helbestan dinivîsîne lê ji ber ramanên xwe yên siyasî berê xwe dide Kurdî û bi kovara *Tîrêjê* re helbestên wî yên Kurdî diweşin. Herçiqasî ji bilî helbestê berê xwe dabe pexşanê jî, bi helbestê derdikeve pêş û wek helbestvanekî xweser di edebiyata Kurdî de deng vedide. *Li Bandeva Spêde, Heyv li Esmanê Diyarbekirê, Milkê Evînê û Yelda* pirtûkên wî yên helbestan e.

Rojen Barnas, di edebiyata Kurdî ya nûjen de ji aliyê temayên xwe ve helbestvanekî girîng e. Bi temayên ku li ser wan sekiniye re dengê zelal û rengê xweş li helbesta Kurdî bar kiriye. Herçiqasî berê xwe dabe gelek temayên curbicur jî tê dîtîn ku di hin temayan de bêhtir hûr bûye. Ji bo vê yekê me xwest em li ser helbestên wî bixebitin û temayên siyasî yên ku li ser wan kûr bûye berçav bikin.

Di xebata xwe de me jiyana Rojen Barnas bi her awayî berçav kiriye ku li gorî dîtina me çî bûyerên ku di jiyana wî de qewimîne bandor li temayên helbesta wî kirine. Bi vê yekê re me xwestiye ku em têkiliya jiyana û helbesta wî diyar bikin û di heman demê de sedemên ku berê helbestvan dane van temayên siyasî eşkere bikin. Ji ber vê jî di beşa duyem de me temayên siyasî yên ku di helbestên helbestvan de derketine pêş diyar kirine û ji helbestên wî mînak dane ku bi vî awayî me dahûrîna temayên siyasî yên helbestên Barnas berçav kirine. Bi vê re me xwestiye ku em cihê helbesta wî di nav helbesta Kurdî de diyar bikin. Em gîhane wê encamê ku Barnas di helbesta xwe de bêhtir li ser temaya netewetiyê û mijarên ku bi netewetiyê re girêdayîne sekiniye. Di encamê de jî em gîhan wê yekê ku Barnas helbesteke siyasî nivîsandiye.

Peyvên sereke: Rojen Barnas, *Tîrêj*, Temayên Siyasî, *Li Bandeva Spêde, Heyv li Esmanê Diyarbekirê, Milkê Evînê, Yelda*.

ÖZET

Önemli Kürt şairlerinden biri olan Rojen Barnas modern bir dönemde şiire başlamıştır. Başlangıçta Türkçe şiirler yazan şair, daha sonra siyasî düşüncelerinin olgunlaşmasıyla Kürtçe şiire yönelmiş ve *Tîrêj* (Işın) dergisiyle birlikte Kürtçe şiirleri yayınlanmıştır. Şiir dışında düz yazıda eser vermiş olsa da daha çok şiiriyle öne çıkmış ve özgün bir şair olarak ses getirmiştir. *Li Bandeva Spêde* (Şafakta), *Heyv li Esmanê Diyarbekirê* (Diyarbakır Semalarında Ay), *Milkê Evînê* (Aşk Yurdu) ve *Yelda* (Yelda) şiir kitaplarıdır.

Rojen Barnas modern Kürt edebiyatında ele aldığı temalar açısından önemli bir yer tutmuştur ve bu temalarla Kürt şiirine sade bir ses ve güzel bir renk katmıştır. Her ne kadar farklı temalar üzerinde durmuşsa da bazı temalarda daha ısrarcı davrandığı görülmüştür. Bizi bu çalışmaya iten sebeplerin başında şairin ele aldığı bu temalar gelmektedir. Bu çalışmayla şairin yoğunlaştığı siyasi temaları gözler önüne sermeye çalıştık.

Rojen Barnas'ın hayatında meydana gelen tüm olaylar, ele aldığı temalar üzerinde etkili olduğu için çalışmamızda yaşamını her yönüyle vermeye çalıştık. Bununla, hayatı ve şiiri arasındaki ilişkiyi belirttik ve aynı zamanda şairi bu siyasi temalara yönelten sebepleri ortaya serdik. Bundan dolayı da ikinci bölümde, Barnas'ın şiirlerinde öne çıkan siyasi temaları belirledik ve şiirlerinden örnekler vererek şiirlerinde öne çıkan siyasi temaları tahlil ettik. Bundaki amacımız Barnas'ın Kürt şiiri içindeki konumunu belirlemektir. Neticede; Barnas'ın, şiirlerinde ulusçuluk teması ve ulusçulukla ilgili konular üzerinde daha çok yoğunlaştığını gördük ve politik bir şiir yazdığı sonucuna vardık.

Anahtar sözcükler: Rojen Barnas, *Tîrêj* (Işın), Siyasi Temalar, *Li Bandeva Spêde* (Şafakta), *Heyv li Esmanê Diyarbekirê* (Diyarbakır Semalarında Ay), *Milkê Evînê* (Aşk Yurdu), *Yelda* (Yelda).

SUMMARY

Rojen Barnas is a Kurdish poet who has written his poems in a modern era. He used to write his poems in Turkish initially; however, due to his political views he then turns towards Kurdish and through the literary journal of *Tîrêj* (Light Beam), his poems started to be published. Even though besides the poems he wrote prose, he is best known for his poetry and acknowledged as a prominent poet. His poetry books can be listed as *Li Bandeva Spêde* (In the Early Dawn), *Heyv li Esmanê Diyarbekirê* (The Moon in the Sky of Diyarbekir), *Milkê Evînê* (The Kingdom of Love) and *Yelda* (The Longest Night).

In terms of the themes of his poetry, Rojen Barnas is one of the most important poets of contemporary Kurdish literature. With the themes that he has put emphasis on, he has brought a clear voice and an appealing colour to Kurdish poetry. Whereas he has made use of various kinds of themes, it can clearly be seen that he has concentrated more on some specific themes. That is why we preferred to study on his poems and indicate the political themes that he has made use of.

In this study we have viewed Rojen Barnas' life thoroughly and to us, every single incident happening in his life has influenced the themes of his poetry. Through this, we tried to reflect the relation between his life and poetry, and the reasons that made Barnas turn to these political themes at the same time. Thus, in the second part we indicate the political themes of his poetry and through the samples of his poems we analyzed these mentioned political themes. By doing that, we aimed to point out the place of his poetry within Kurdish poetry. We reached to the result that Barnas has laid more emphasis on the theme of nationality and the topics related to nationality. As a conclusion, we deduced that Barnas' is a political poetry.

Keywords: Rojen Barnas, *Tîrêj*, Political Themes, *Li Bandeva Spêde*, *Heyv li Esmanê Diyarbekirê*, *Milkê Evînê*, *Yelda*.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
SUMMARY	V
NAVEROK	VI
DESTPÊK	1
1. Rojen Barnas di Edebiyata Kurdî de.....	1
2. Sedema Hilbijartina Tezê.....	18
3. Armanç û Girîngiya Tezê.....	19
4. Sînorê Tezê.....	19
5. Rêbaza Tezê.....	20

BEŞA YEKEM

1. Jiyana û Berhemên Rojen Barnas.....	26
1.1. Jiyana Rojen Barnas.....	26
1.2. Berhemên Rojen Barnas.....	51
1.2.1. Helbest.....	52
1.2.1.1. Li Bandeva Spêde.....	52
1.2.1.2. Heyv Li Esmanê Diyarbekirê.....	57
1.2.1.3. Milkê Evînê.....	59
1.2.1.4. Yelda.....	62

1.2.1.5. Şi'r-1.....	63
1.2.1.6. Kadiz.....	63
1.2.2. Çîrok.....	65
1.2.2.1. Hingê.....	65
1.2.3. Bend û Gotar.....	68
1.2.3.1. Bi Kurmanciya Gewr.....	68
1.2.4. Lêkolîn.....	70
1.2.4.1. Farqîn (Sîlvan-Silîvan).....	70
BEŞA DUYEM	
1. Temayên Siyasî di Helbestên Rojen Barnas de.....	73
1.1. Netewetî.....	77
1.1.1. Bêriya Welat.....	81
1.1.2. Bindestiya Welat.....	89
1.1.3. Dîmenên Welat.....	97
1.1.4. Berxwedana Neteweyî.....	103
1.1.5. Nasnameya Neteweyî.....	115
1.1.6. Zimanê Neteweyî.....	126
1.2. Îdeolojiya Çepgir.....	133
ENCAM.....	148
ÇAVKANÎ.....	152



DESTPÊK

1. ROJEN BARNAS DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Berî her tiştî ji bo ku mirov bigihêje çêja zimanekî hewcedariya me bi helbesta wî zimanî heye. Bi vê çêjê re em civaka wî zimanî fêm dikin û xwe bera nav kok û rehên wê civakê didin. Lewre helbest hişmendiya neteweyî di civakekê de ava dike û civaka xwe ber bi armançekê ve dibe û di nava nifşên wê civakê de pirekê ava dike. T.S. Eliot jî helbestê wek hunera herî neteweyî bi nav dike û dibêje ku mirov dikare bi rêya helbestê neteweyekî wek neteweyên din bide fikirandin lê mirov nikare bihêle ku wek neteweyên din hîs bike.¹ Em di wê baweriyê ne de ku helbesta Rojen Barnas jî vê têkiliyê ava dike û vê yekê bi me dide hîskirin. Di vê xebatê de em ê di nava vê pêvajoya hîsî û pêvajoya helbesta Kurdî de cihê helbesta Barnas diyar bikin.

Serpêhatiya Rojen Barnas û helbesta wî di nava hevsengiyê de ne. Helbestvan çî jiyabe di helbesta xwe de bi cih kiriye. Lewre Barnas ji destpêka helbesta xwe û heta niha wek helbestvanekî, çî bûyerên ku bandor li wî û civaka Kurdan kirine tu carî çav û guhên xwe ji wan re negirtiye. Helbestvan bi gelek îmaj û metaforan pirsgirêkên civaka Kurdan di helbesta xwe de bi cih kirine. Êş û xemên ku hatine piştguhkirin û yên ku nehatine ferqkirin, bi dengê berz û carina jî bi dengê nizm di helbesta wî de bi coşeke mezin, vegotineke xurt û bi hêviyeke ku qet naweste derdikeve hemberî me. Ji destpêkê de helbesteke lîrîk û epîk ku her dem zindî maye, nivîsandiye.

Rojen Barnas bi kovara *Tîrêjê* re helbestên xwe diweşîne. Ji van helbestên ku di *Tîrêjê* de diweşin diyar dibe ku Barnas helbesteke serbixwe û nû dinivîsîne. Bêguman ev helbestên nû ji ber gelek sedemên civakî û siyasî derdikevin holê û helbesta wî helbesta serdemekê temsîl dike. Ji ber ku her metin bi dema xwe ve girêdayî ye, em dikarin bibêjin ku her metin têkiliyeke pir normal bi dem an jî bi serdema xwe re jî datîne. Lewre em dikarin gelek taybetmendiyên demê ji metnê derxin û bandora demê ya li ser metnê jî berçav bikin. Ev têkilî têkiliyeke xurt e.

¹ T.S.Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, Çeviri: Sevim Kantarcıoğlu, Birinci Baskı, Paradigma Yayıncılık, İstanbul, 2007, r. XIX.

Di vê çarçoveyê de gava em bala xwe didin helbestên Barnas û têkiliya wan ya bi demê re, em dibînin ku di navbera wan de têkiliyeke pir xurt xuya dike. Ji ber vê jî tê dîtîn ku helbestên wî bi dema xwe re pir girêdayî ne û bêyî demê nikarin bîn nirxandin.

Piştî kovara *Tîrêjê*, helbestên Rojen Barnas di kovara *Berbang, Çarçira, Çira, Hêvî, Nûdem û Nûbiharê* de jî derdikevin û helbestnivîsandina wî hê jî di kovara *Nûbiharê* de didome. Ango ev bû çil sal ku Barnas helbestan dinivîsîne. Di nav vî çil salî de helbestvan tenê çar pirtûkên helbestan diweşîne ku ev yek li gorî nêrîna me pir hindik e. Lê ji ber ku Barnas helbesta Kurmancî ber bi mijar, deng û şêweyê nû ve biriye em di wê baweriyê de ne ku helbesta wî bandoreke mezin hem li serdema xwe kiriye û hem jî li helbesta vê serdemê dike. Ji ber ku Barnas nivîsandina pir an jî hindik ya helbestan bi başbûna helbestvanekî ve girê nade, li gorî wî ya girîng ew e ku helbest ji aliyê hunerê ve xurt bin. Lewre li gorî wî eger helbestvanek pir helbestan binivîsîne ev nayê wê wateyê ku ew helbestvan, helbestvanekî hêja û serkeftî ye. Hêjabûna helbestavanekî bi hêjabûn, nûbûn û hunera helbestê ve girêdayî ye.² Îcar gava ku em bi vê nêrîna helbestvan li hejmara helbestên wî dinêrin, em dibînin ku herçiqasî hindik helbest nivîsandin bin jî, helbestên wî di xwe de hem nûbûnekê dihewînin û hem jî ji aliyê hunerê ve serkeftî ne. Ev aliyên helbesta wî jî Barnas di nav edebiyata Kurmancî de derdixîne pêş.

Gava ku em bala xwe didin vê pêvajoya dirêj tê dîtîn ku di destpêkê de helbestên Barnas di nav Kurdan de deng venadin. Weke ku me li jor jî diyar kir, helbet ev ne ji ber qelsbûna helbestên wî ye. Bi dîtina me ev hem ji ber mercan û hem jî ji ber prensîbên helbestvan pêk tê. Li gorî Barnas, sê cure helbestvan hene: Cureyek jê helbestan dinivîsînin û di civîn û civatan de helbestên xwe dixwînin an jî ji bo ku derkevin pêş, dikarin ji wî serê dinyayê bîn heta vî serê dinyayê. Hetta dikarin mal û milkê xwe bifiroşin da ku helbesta wan derkeve pêş. Cureyek jê jî li ser daxwaza hin kesên li derdora xwe helbestên xwe dixwînin û heval û hogirên wan helbestên wan belav dikin. Lê cureyek jî helbestan dinivîsînin, diweşînin û xwe bi paş ve vedikişînin, heta ku helbesta wan bê xwendin û deng vede li cihê xwe rûdinên.

² Rojen Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr**, Çapa Duyem, Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 64.

Barnas xwe di nav vê koma dawî de dibîne û diyar dîke ku tu carî ji bo helbestên xwe bixwîne tevî tu civîn û çalakiyan nebûye.³

Ji ber vê prensîba Barnas em dikarin bibêjin ku heta salên 90î jî, helbesta wî dernakeve pêş. An jî wî xwestiye ku wek helbestvanekî veşartî bimîne. Jixwe Barnas hem bi helbesta xwe û hem jî bi jiyana xwe her dem xwestiye ku di quncikekê de bimîne ku ev ji bo wî tercihek e. Lewre tu endîşeyeke wî ya ku derkeve pêş û di civatan de wesfê wî bê dayîn tune. Barnas jî di wê fikrê de ye ku Kurd ji xwendinê bêhtir ji bihîstin û temaşeyê hez dikin. Helbet bandora vê yekê heye ku ew bi xwe jî dengvedana helbesta xwe hinekî bi vê yekê ve girê dide: “Bi saya dengê Ciwan Haco û hunermendiya wî gelek kes bi çend helbestên min hisiyan, eger ne ji Ciwan Haco bûya ew ê haya kesî zûbizû ji min û helbestên min tunebûya.”⁴

Pirtûka ewilî ya Rojen Barnas *Li Bandeva Spêdeyê*, di sala 1979an de derdikeve. Piştî vê pirtûkê bi bîst û yek salan, di sala 2000î de Nîhat Çelîk bi Rojen Barnas re hevpeyvînekê li dar dixe. Barnas wek pîrensîbekê heta vê salê bi tu kesî re hevpeyvîn nekirine û tu carî li tu deverî xuya nebûye. Di vê hevpeyvînê de tê dîtin ku Çelîk jî ji ber hin pîrensîbên wî bi gilî û gazin e. Ji ber ku Barnas wî dixwe tengasiyekê ku ne dihêle ku dengê wî qeyd bike û ne jî destûrê dide ku wêneyên wî bikişîne. Di heman demê de ji ber ku Barnas ji pîrsên şexsî hez nake, Çelîk tu pîrsên şexsî jî jê nake.⁵ Em di wê baweriyê de ne ku vê rewşê bandor li dengvedana helbestvaniya Rojen Barnas kiriye.

Rojen Barnas, herçiqasî bi jiyana xwe wek helbestvanekî veşartî bimîne jî, piştî ku helbesta wî tê ferqkirin, em dibînin ku helbesta wî di nav helbesta Kurmancî de digihîje cihekî taybet û her ku diçe geş dibe. Bi piranî jî piştî ku kovara *Nûdemê* li Swêdê dest bi weşanê dîke Barnas bi helbestên xwe balê bikişîne jî, bi jiyana xwe her dem wek helbestvanekî nepen û veşartî dimîne. Lê şeweya wî ya serbest,

³ Fahriya Adsay, *Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS*, Kovara Zarema, Hejmar 7, Diyarbakır, 2016, r. 77.

⁴ Adsay, *Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS*, r. 74.

⁵ Nîhat Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, Kovara Jiyana Rewşen, Hejmar 43, İstanbul, 2000, r. 36.

hêmayên wî yên xurt, vegotina wî ya xwerû û çavkaniyên ku Barnas ji wan sûd wergirtiye, bandoreke mezin li helbestvanên nû yên Kurmancî dike.⁶

Abidin Parıltı jî diyar dike ku kêma helbestvan wek Barnas hene ku ala xwe di helbesta Kurmancî de bilind kirine. Bi taybetî piştî ku li Swêdê dijî, hêmayên wek bêriya welat, bêhna axê û kevîrên bajarên qedîm di helbesta wî de cih digirin. Hesta dûrbûnê di helbestên Barnas de tenê li ser bêrîkirina welat ava nabe. Bi nêrîneke romantîk evîne jî di nava vê dûrbûnê de bi cih dike. Di hin helbestên wî de jî erotîzmeke nepen û veşartî xuya dibe ku ev cure helbest bêhtir di nav jiyaneke veşartî de diqewimin. Parıltı jî helbestên Barnas hêja û balkêş dibîne û diyar dike ku Barnas wek helbestvanekî girîng li benda kifşkirin û fêmkirina xwe ye.⁷ Bandora dûrbûnê û bêrîkirina welat di helbestên Barnas de bi awayekî eşkere di tevahiya helbestên wî de xwe didin der lê “erotîzmeke nepen û veşartî” ji bilî çend helbestên ewilî di helbestên wî de ne berçav in. Ango em nikarin weke ku ev mijar di hemû helbestên wî de xuya dibe, lê binêrin û binirxînin.

Rojên Barnas herçiqasî wek helbestvanekî nepen tevbigere jî, helbesta wî helbesteke pir bi civaka xwe ve girêdayî ye. Helbesta wî li gorî psîkolojiya civaka wî tê guhertin ku ev rewş ji ber mercên serdemê tî guhertin. Bi vî awayî gava ku em bala xwe didin helbestên wî, di helbestên ewilî de her dem hêviyeke xurt ji dahatûyê heye lê piştî terka welat ya ji mecbûrî û şer û pevçûnên li welêt berê helbesta Barnas dikeve aliyekî din.

Ji ber ku di navbera çapên her pirtûkeke Barnas ya helbestan de gelek sal hene, em dikarin bibêjin ku her pirtûkek wî serdemekê temsîl dike. Helbestên pirtûka ewilî, ji helbestên wî yên berî salên 1980yî pêk tî ku di van helbestan de hêvî bi coşeke mezin derdikeve pêş. Ev rewşa bi hêvî di helbestên *Heyv li Esmanê Diyarbekirê* û *Milkê Evîne* de tê guhertin. Ji ber birakujiya ku di navbera hêz û rêxistinên Kurdan de belav dibin, helbesta Barnas jî vediguhere aliyekî din.

⁶Abidin Parıltı, **Gizemli Bir Şair**, 2009, <http://www.radikal.com.tr/kitap/gizemli-bir-sair-917158/>, nêrîna dawî: 12.03.2016.

⁷Parıltı, **Gizemli Bir Şair**.

Di destpêkê de li hemberî hemû bûyerên neyînî helbesta wî bi hêvî ye û ev hevî her ku bûyerên neyînî diqewimin xurtir dibe. Lê piştî ku Barnas terka welat dike û li Swêdê bi cih dibe rewş tê guhertin. Li biyanistanê jî heta demekê hêviya ku di helbestên wî de her dem deng vedide xurt e. Lê piştî demekê, ji ber mercên serdema siyasî û şerê di navbera rêxistinên Kurdan de, bandoreke mezin li psîkolojiya Barnas dike û bi vê re jî helbesta wî berê xwe dide rabirdû, lêpirsîn û hesaban. Hevî û coşa xurt her ku diçe di helbestên wî de qels dibe. Ev hêvî berê xwe dide gilî û gazinan. Bi vê guhertina hîssî û jiyana nû re hêma, ziman, vegotin û şewaza helbestên wî jî tên guhertin.

Rojen Barnas di wê baweriyê de ye ku “birakujiya Kurdan ya ku êdî di Kurdistanê de hilnayê” li kolanên Stockholmê jî belav bûye. Ji ber ku li biyanistanê jî her kesê ku berê di nav rêxistinên siyasî de cih girtine û mecbûr mane ku welat terk bikin, li vir jî hinek ji wan hevdu yan xayîn dibînin yan jî dost. Vê atmosfera neyînî bandoreke mezin li helbestên helbestvan jî kiriye. Lewre ne gengaz e ku mirov her dem bi coşê mezin tevbigere. Bi ser vê de jî dengê topên şerê Bakur hişê ku li kolanên Diyarbekirê ye ditengijîne. Ji ber van sedeman bi dîtina me jî ne gengaz e ku helbesta Barnas neyê guhertin û hêviya ku di pirtûka ewilî de beloq e, neçilmise.

Barnas li vî welatî wek penaberekî Kurd dijî ku ev bi serê xwe êşeke mezin e û ev êş xwe di gelek helbestan de diyar dike. Nîhat Çelîk jî diyar dike ku bi vê penaberiyê re coş û giyanê ku di helbestên wî yê ewilî de heye di helbestên wî yê dawî de xuya nake. Dûrketina ji welêt, ew giyanê Barnas yê bi coş û xurt ew ber bi helbesteke xewn û xeyalan ve biriye. Helbet ne mimkin e ku hest û ramanên ku li nava kuçe û kolanên welatekî ava bûne mirov li biyanistanê winda neke.⁸

Li gorî Eliot, dibe ku hin kes bi zimanên din jî helbestan bixwînin û ji vê xwendinê zewqekê mezin jî bistînin lê divê ku her millet li helbesta xwe xwedî derkeve.⁹ Bi vê nêrînê gava ku em li meseleyê dinêrin ji ber ku helbestvanên Kurd her dem bi zimanekî din berê xwe dane helbestê û bi vî zimanî helbest xwendine, di dîroka edebiyata Kurdî de bi awayekî rasterast an jî nerasterast di bin bandora

⁸ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 37.

⁹ Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, r. 185.

edebiyata gelên din de mane. Bi taybetî jî di bin bandora Tirkî, Erebi û Farisî de mane. Ev bandor ji helbestvanên klasîk bigire û heta helbestavanên hevçax jî xuya dibe. Gelek sedemên vê bandorê hene lê bandora herî mezin bandora siyasî ye. Lewre bi çî awayî dibe bila bibe bandoreke eşkere li ser helbestvanên Kurd bûye ku kêma helbestvanan xwe ji vê bandorê rizgar kirine. Hin helbestvanan ev bandor ji xwe re kirine sûdgirtinek û bi vî awayî berê xwe dane zimanê xwe. Tê dîtin ku Barnas jî ji edebiyata cîranan sûd girtiye û berê xwe daye edebiyata Kurdî.

Helbestvan çî jiyabe û çî tiştên ku ji mîrata helbesta beriya wî jê re mabe û kevneşopiya çanda gelê xwe; bi hîs, xeyal û cihana ramanên xwe re distrê û jiyane ji nû ve diafirîne. Gava ku em bala xwe didin jiyana û helbesta Barnas em vê yekê bi awayekî eşkere dibînin. Barnas gava ku dengê xwe yê resen bilind dike û welatê ji helbestê ava dike; poetîka, hêma, ziman û şeweyê, ev ji bo avakirina helbesteke xurt pir girîng in, piştguh nake. Berî her tiştî di helbestên wî de dengê helbestvanên berî xwe dide hîskirin û ji derfetên vegotina wan sûd werdigire. Vê bandor û derfetê reng û tehmeke din daye helbesta wî û rê li ber têkiliyêke jidil ya bi xwendevanên xwe re vekiriye.¹⁰

Di çarçoveya meseleya bandorê de cara ewilî Nîhat Çelîk diyar dike ku bandora Ahmet Arif li Rojen Barnas bûye û Çelîk tîne ziman ku ji hin helbestên Barnas bêhna helbestên Ahmet Arif tê. Lê Barnas bandora Ahmet Arif qebûl nake.

“Tesîr li ser min hebe, tesîra Fuzûlî, Nefî ya Recaîzade Ekrem, piçek Ehmed Haşîm; di wê demê de Mehmet Akîf Ersoy, aliyê wî yê gelperwerî dibe ku tesîr li min kiribe. Jixwe bê hemdî be jî, tesîr li meriv dibe. Tesîra Ehmed Arif li min nebûye. Di destpêkê de jî, tiştêkî wisa nîne. Lorca tesîrek hîştîye, Nerûda dîsa wisa, Aragon...”¹¹

Bêguman wek hemû kesên ku dest bi nivîsandinê dikin, bandora hin kesên din li wan dibin. Ev rewşeke normal tê dîtin. A girîng ew e ku nivîskar ji vê bandorê sûd bigire û vê yekê veguherîne û bi vê veguherînê re nivîsa xwe an jî dengê xwe ava bike. Di vê çarçoveyê de gava ku em bi gelemperî li helbestên Barnas dinêrin,

¹⁰ Berken Bereh, **Ağzımda Kimliğim Benim**, 2013, <https://www.evrensel.net/yazi/61963/agzimda-kimligim-benim>, nêrîna dawî: 10.02.2017.

¹¹ Çelîk, **Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas**, r. 40.

bandora ku Nihat Çelik behs dike rasterast xuya nake. Dibe ku Çelik têkiliyek di navbera helbesta Rojen Barnas ya bi navê “Destpêka Biharê ye Niha li Welatê Min”¹² û helbesta Ahmed Arif ya bi navê “Îçerde”¹³ (Di hundurê de) de dîtibe lê dema ku em bala xwe didin van her du helbestan, tê dîtin ku ji aliyê naverokê ve tu têkiliya wan bi hev re tune. Ji bilî vê yekê Barnas, bandora hin helbestvanên Kurmancî û yên biyanî qebûl bike jî, bi demê re Barnas xwe ji wan xelas dike û “helbesta xwe” ava dike. Lewre em dikarin bibêjin ku Barnas êdî helbesteke resen ku tu bandoreke rasterast tê de xuya nake dinivîsîne û em îro vê helbasta wî nikarin bi helbestvanekî an jî bi komekê ve girê bidin û bibêjin ku di bin siya filan helbestvanî de maye.

Abidin Pariltı jî di nivîsa xwe ya bi navê “Gizemli Bir Şair” (Helbestvanekî Nepen) de, derbarê helbestvaniya Rojen Barnas de diyar dike ku Barnas di helbestên xwe de şêweyê serbest bi kar bîne jî di bingeha helbest û hestên wî de bi piranî ji melodiyên newayên Kurdan yê kevna sûd werdigere. Ji aliyê din ve jî bandora helbesta klasîk li wî bûye û ji vê çavkaniyê sûd wergirtiye. Bi taybetî jî bandora helbesta tesewifê di helbestên helbestvan de pir xuya dibe.¹⁴ Em jî di heman baweriyê de ne ku helbesta Barnas, bi kevneşopiya helbesta gelêrî û dîwanî re têkildar re û hin nuans û ûnsûrên biçûk ji wan girtine. Lê berevajiyê nerîna Pariltı, bandora helbesta tesewifê di helbestên Barnas de xuya nake. Ji ber ku di nav helbestên wî de em li helbesteke ku bi vê nêrînê hatiye nivîsandin rast nehatine. Sûdwegirtina ji helbesta gelêrî û klasîk jî ne rasterast in û tu carî naşibe wan. Ji ber ku derdekî din ya helbesta Barnas heye ku ew jî estetîkeke nû ye. Ango helbestvan ji kevneşopiya klasîk sûd werdigere lêbelê ew vê kevneşopiyê ne wek ku hîn bûye bi kar tîne, ew bi nêrîneke nû tije dike û vê kevneşopiyê li cihaneke nû bar dike û helbesta xwe bi fikrên siyasî distrê. Barnas di helbestên xwe de vê helwestê bi gelemperî diparêze. Li gorî nêrîna me ev helwesta helbesta wî ye û ev alî di helbesta wî de pir derdikeve pêş.

¹² Rojen Barnas, **Kadiz**, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 24.

¹³ Ahmet Arif, **Hasretinden Prangalar Eskittim**, 41. Basım, Cem Yayınevi, İstanbul, 1999, r. 6.

¹⁴ Pariltı, **Gizemli Bir Şair**.

Barnas bi xwe jî bandora helbesta klasîk qebûl dike û diyar dike ku “zewqa lezeta şî'ra klasîk a Kurmancî” ji bavê xwe wergirtiye û helbestên wî yên bi Tirkî hin ji wan bi pîvana erûzê û hin jê jî bi pîvana kêteyî ne ku ev helbest ji forma berhemên edebiyata dîwanî û ya gelêrî ya Tirkî pêk tînin. Ango helbestvan ji kevneşopiyeye klasîk sûd girtiye. Lê piştî demekê tê dîtin ku Barnas van hemû pîvanan serobino dike û helbesteke ku kêr hatiye dîtin di edebiyata Kurdî de ava dike. Bi dîtina me ev yek sekneke nû ye û armanca helbesta wî jî berçav dike.

Barnas ji tecrubeyên helbestvanên cîranan sûd wergirtibe jî û ev bandor di hin helbestên wî yên ewilî de xuya bikin jî, bi demê re helbesta wî xurttir û qewîntir dike. Ev bandor, li gorî ku Bereh tîne ziman, têgihîştina Barnas ya helbestê jî berçav dike. Helbet Barnas vê yekê jî di helbestên xwe de rasterast bi cih nake. Ew li gorî xwe û bi dengê xwe yê resen vê yekê îspat dike. Ango helbesta Barnas hay ji kevneşopiya berî xwe heye û vê kevneşopiyê bi şêweyeyeke nû ji me re vedibêje û hemû serpêhatiyên welat û axekê tîne ziman.¹⁵

“Berî her tiştî ew, beriya ku binivîse, ava bike, vedibêje; dengbêjiya ku bûye kevnetoriyeye bêhempa ya vê xakê di helbesta wî de ji xwe re cihekî bêhempa terxan kiriye. Rojen Barnas, li ser vê gencîneya xwedîezmûn û hêçandina nûwaze bi rêbaz û amrazên nû çîrokekê ava dike. Ev çîroka ji xakekê dest pê dike û wek xekekê avê her fireh û bilind dibe, taliyê dinyayê radipêçe. Ev hewldan ne tenê jiyana welatekî, her wiha arîşe û pirsgirêkên mirovahiyê bi helbestê vedibêje û wan dike mijara guftûgoyan. Bêguman ev rapirsîn heyîn û hebûn, zeman û bêzemanî, tirs û metirsî, valahî, tenyayî, şer û pevçûn û hemû karesatên mirovahiyê bi hişzelaliya zanayekî raberî me dike û me bi wê perwerde dike.”¹⁶

Barnas hin helbestan tenê bi bêjeyekê an jî bi risteyekê ava dike. Her peyvekê li bin yeka din bi cih dike û ev jî dibe risteyeke bi serê xwe. Ev şêwe ji aliyê dîtbarî û rîtmî hundurîn ve hêzeke cuda dide helbesta Barnas.¹⁷ Bereh, avakirina helbesta wî li gorî rêbazekê dinirxîne û tîkiliya wî ya bi beriya xwe re wisa ji me re şîrove dike:

¹⁵ Bereh, **Ağzımda Kimliğim Benim**.

¹⁶ Berken Bereh, **Rojen Barnas**, Kovara Nûbihar, Jimar 133, Cild 19, Sal 23, İstanbul, 2015, r.5.

¹⁷ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

“Rojen Barnas, berî dest bi çêkirina helbesta xwe bike, bi gelek helbestvanên Kurd re bi rêya xwendin û dahûrina berhemên wan daye û standiye. Vê têkiliyê di teşe, vegotin, dirûv û hêma û ritma helbestê de xwe daye der. Vê têkiliyê, çêj û tehma wan helbestvanan jî daxilî helbesta xwe kiriye.”¹⁸

“Çûm Diyarbekir, Jîndarî, Dûrketin, Sira Araratê, Tekya Evînê, Rewşa Min, Bo Çi, Neyînî, Suht û Çû û hwd.” Bereh bi van mînakên diyar dîke ku, hem kanî û mînga helbestvaniya Barnas diyar dibe û hem jî ev helbest diyar dîkin ku Barnas “Ne bi çavpelînkê dest bi helbestkariya xwe kiriye.” Gava ku mirov bala xwe dide van helbestan diyar dibe ku Barnas, helbesta xwe “li ser kevneşopiya toreya helbesta Kurdî ava kiriye û bergeh û asoya helbesta Kurdî firehtir kiriye.” Barnas, “form û qalibên Kurdî bi awayekî zanistî ji nû ve bi kar anîne û derî û deliveyine nû ji bo vegotin û hûnandina helbesta Kurdî ava kirine.” Ji bo vê angaşê jî Bereh van mînakên dide: “Min Navê Xwe Kola Li Bircên Diyarbekir, Refa Qulinga, Ez Mendalekî Çar Salî Me Mamo.” Di heman demê de ev mînak diyar dîkin ku “Rojen Barnas bi gelek helbestvanên cihanê re jî daye û standiye.”¹⁹

Gelek helbestên Barnas di bin bandor û şewaza devkî û vegotina dengbêjiyê de jî mane. Bereh vê bandorê an jî vê têkiliyê wek rewşeke erênî dibîne û diyar dîke ku ev yek “asta vegotinê bilindtir û ji aliyê wateyê ve tîrtir” dîke ku Berken Bereh, Barnas di avakirina helbesta Bakur ya nû de wek “pireke xweşik” dibîne ku ev pir bi helbesta klasîk re çêkiriye. Barnas di helbesta xwe de ji gelek cureyên hunerê, wek wêne, muzîk, şano û sînemayê sûd wergirtiye.²⁰

Barnas di bin bandora helbesta Kurdî de mabe jî ev bandor di helbesta wî de wek teqlîdekê dernakeve pêş. Barnas ji çavkaniyên vê helbestê vexwariye û ji van çavkaniyan helbesta xwe ava kiriye. Bi alîkariya van çavkaniyan tê dîtin ku wî hem naverokeke nû û hem jî şeweyeke nû li helbesta Kurdî zêde dîke. Lewre Barnas rasterast di bin bandora kesî de nemaye. Em di wê baweriyê de ne ku bandora wî îro ro zêdetir e û cihê helbesta wî ya nûjen di helbesta Kurdî de hê jî xwe diparêze.

¹⁸ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

¹⁹ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

²⁰ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

Rojen Barnas helbestvanekî nûjen be jî pişta xwe daye kevneşopiyê. Helbestvan di çend helbestên xwe yên ewilî de û yên vê dawiyê de serî li pîvana kîteyî û serwayê xistibe jî bi piranî helbesteke ji her awayî de serbet û pêlikî nivîsandiye. Jixwe di nav nifşê xwe de ji aliyê şêweyê ve li cihekî resen disekine. Di vê helbesta resen de hevoksaziyeke nû derdikeve hemberî me û tê dîtîn ku di van hevokan de carcaran serwayê bi kar tîne ku ev serwa di helbesta wî de muzîkê ava dike. Ji ber vê jî ev yek di helbesta wî de ahengê ava dike. Herçiqasî di helbesta Barnas de wate li pêş be jî em di wê baweriyê de ne ku ev aheng bi qasî wateyê girîng e û bi naverokê re li hev dike.

Ji helbestên Rojen Barnas diyar dibe ku giyan, şiyar û viyana Kurdan gelekî baş dizane û vê zanebûnê di avakirina helbesta xwe de wek hosteyekî bi cih dike. Helbesta Barnas keresteyên xwe ji bender, çavdêrî û kelepûra civaka xwe girtine ku van keresteyan li moxila zanîna xwe dixê û çî tiştên ku bi kêrî helbesta wî tînin bi xewn û xeyalên xwe re distê û ji nû ve diafirîne. Pisporiya wî ya helbest û nasîna civakê di helbestên wî de pir tînin dîtîn.²¹

Îcar gava ku li gorî van fikr û ramanan em li helbesta wî dinêrin tê dîtîn ku Barnas helbesta xwe li gorî van ramanan ava dike û di helbesta xwe de bi vî awayî tevdiqere ku wî xwestiye bi helbesta xwe dengê civaka xwe ya feodal û êşa gelê xwe yê ku di bin kevneşopiyê giran de xwe gihandiyê sedsaleke modern, bigihîne dengê ku li hemû dinyayê deng vede û gelê xwe ji nav qalibên vê kevneşopiyê derxîne. Helbestvan vê yekê bi çavkaniyên civak û helbesta Kurdî dike. Ew tu carî xwe ji van çavkaniyan dûr naxe. Van çavkaniyan ji hev qut nake. Wan bi awayekî nû û bi şêweyê modern li hev siwar dike. Helbet kesayetîya xwe jî ji bîr nake ku Barnas ji bin vî barî bi rehetî derdikeve. Li gorî nêrîna me bingeha helbesta wî ya xurt ji vir derdikeve.

Ziman bikaranîna derbirîna deng û peyvane û rola ziman di ragihandinê de roleke mezin e. Îcar gava ku ev rol dikeve destê helbestvan ziman ber bi wateyê din ve diçe. Lewre peyvên ku di zimanê jiyana rojane de tînin bikaranîn helbestvan

²¹ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

van peyvan bi raman û xeyalên xwe re tevlihev dike û peywendiyê nû di navbera peyvan de ava dike û wateyêke din li wan bar dike. Ji ber vê jî helbestvan hewl dide ku wateyêke din di peyvê de bibîne ku ev yek jî teksteke helbestî derdixîne holê. Ev nêzîkahî heta astekê, balkêş û taybet e. Di vî warî de gava ku em bala xwe didin zimanê Rojen Barnas, tê dîtîn ku wî ji destpêkê de girîngiyêke mezin daye ziman. Di warê ziman de hewl daye ku ji helbestvanên serdema xwe zimanekî cudatir û balkêştir pêk bîne. Ji ber ku ew peyvan bi awayekî din bi kar tîne ku em beriya wî li bikaranîneke wisa rast nayên û ev jî dihêle ku zimanekî din derkeve holê.

Derbarê zimanê helbestên Rojen Barnas de nêrînên cuda hene. Nîhat Çelîk diyar dike ku Barnas di pirtûka xwe ya ewilî de “zimanekî zor” bi kar aniye û gelek peyvên çêkirî, yan jî yên ku zêde nayên naskirin di helbesta xwe de bi kar aniye.²² Eger mirov li gorî mercan û serdema van helbestan wan binirxîne, bi dîtina me “zimanekî zor” dernakeve holê. Lewre di vê serdemê de Kurd bi zimanê xwe perwerde nabin. Li gorî nêrîna me ev sedema herî mezin e ku Çelîk gihîştîye encama “zimanekî zor”. Yeka din jî gava ku mirov xwe berdide nava helbestên wî û bi nêrîneke din nêzî helbestên wî dibe, tê dîtîn ku zimanê Barnas li gorî serdema xwe zimanekî nû, jidil, herikbar û romantîk e. Barnas di avakirina zimên de bi zanistî tev digere û em dikarin bibêjin ku di warê zimên de hosteyekî ji xwe bawer e. Di avakirina hêmayan de dîsa bi zimanekî têr û tije tev digere û berê hêmayên wî her dem li asoya civaka wî ye. Li gorî nêrîna me “peyvên ku nayên naskirin” jî di warê zimên de berzbûna wî nîşanî me dike ku divê em ji bîr nekin ku peywira helbestvanekî çêkirina peyvan e jî.

Berken Bereh ji aliyê ziman ve li hemberî Çelîk derdikeve. Bereh, Rojen Barnas di warê ziman û hevoksaziyê de nûjen dibîne. Li gorî Bereh, serdema ku bi Cegerxwîn dest pê kiriye, Barnas ev serdem pejirandiye û bi pêş ve biriye. Bereh zimanê Barnas, wek zimanekî sade û rojane yê gel dibîne ku ev ziman nêzî zimanê dengbêjan e. Terkîb û qalibên helbesta wî bi îmajan tije ne. Hin peyv û hevok ji bo ku rîtmeke hundirîn pêk bînin carina têne dubarekirin.²³ Bereh vê rîtma helbesta Barnas bi vê yekê ve girê dide:

²² Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 37.

²³ Bereh, *Rojen Barnas*, r. 9.

“(…)Peyv bêhtir bi dengdêrê diqedin an jî bêjeyine wisa ne ku hejmara dengdêran ji ya dengdaran zêdetir e. Dîsa peyvên kirpandina wan zêde ne an di dawiya ristan de an jî li serî de hatine bicihkirin. Carina jî bi saya dengdarên (b, d, m, v, ş, r, q, x, t, z, l) ku kirpandina wan pir hêsan e, hevok û rist bi hev ve hatine girêdan.”²⁴

Li gorî nêrîna me Barnas vê yekê bi awayekî tekûz dike. Ji bilî vê, ew qîma xwe tenê bi zimanê rojane û peyvên ji rêzê nayîne. Barnas di heman demê de, her dem û her kêlî li dû peyv û şibandinên nû ye jî.

Berken Bereh, ji aliyê şêweyê ve jî helbesta Barnas helbesteke serkeftî dibîne. Bereh vê şêweya serkeftî, wek “têkiliyeke dilsoz û dostane” şîrove dike. Ev yek dîsa hem rîtma helbestê xurt dike hem jî di navbera xwendekar û helbestvan de têkiliyeke ava dike. Bereh ji bo vê rîtm û şêweya Barnas van şîroveyan dike:

“Bikaranîna xalbendiyê di helbestên Rojen Barnas de hevaltî û bandoreke xweş li ser ritmê kirine; aheng û awaz û newayeke xweş dane helbestan. Qafiye bi hosteyî di helbesta xwe de bi cih kiriye. Peyvên ku dema bi hev re bêne bicihkirin, qafiyeya dewlemend pêk tînin an li bin hev an jî bi forma (abab-aabb) bi kar aniye.”²⁵

Ziman, peyv û biwêjên helbesta Barnas ji nav axa xwe afirîne. Helbestên wî xwedî tehm, deng, reng û bêhnekê ne. Bêhn, reng û dengên ku derdikevin pêş; binefş, çiya, berbang, robar, çem, newal, aso, baran û hwd. in. Lê di helbesta wî de behr tune, li şûna behrê ba û bahoz cih digirin.²⁶

Barnas li ziman û aliyê zimên yê helbestî hêmayê bar dike û bi vî awayî jî helbesta beriya xwe vediqete. Ji bilî vê, helbestvan zimanê jiyana rojane yê gel û formên edebiyata devkî jî li helbestê bar dike û bi vegotîneke bi coş derfetê dide helbesta xwe. Tê dîtin ku Barnas di gelek helbestên xwe de bi peyvên dilîze. Carina peyvên qut dike, dişikîne, dirêj dike, bi hev dizeliqîne û cihên wan diguherîne.²⁷

²⁴ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 9.

²⁵ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 9.

²⁶ Bereh, **Ağzımda Kimliğim Benim**.

²⁷ Bereh, **Ağzımda Kimliğim Benim**.

Rojen Barnas di mijara ziman de hem pir hasas e, hem pir israrê dike û hem jî jidil e. Gava ku mirov bala xwe dide bikaranîna peyv û ravekên wî jî, tê dîtîn ku li gorî sentaksa Kurmancî wek hosteyekî ziman wan ava dike. Di hin ravekan de bi peyvên bilîze jî, tu carî ji sentaksa Kurmancî dûr nakeve. Helbestvan wek “mubtelayê ziman” tev digere û tu carî ji zimanê rojane jî dûr nakeve. Di tevahiyên helbestên wî de “wate” li pêş bisekine jî, gava ku mirov bala xwe dide pêyvên wî tê dîtîn ku her dem peyvên wek notayên muzîkê bi hev ve girê dide. Bi vê girêdanê re rîtmek û vegotîneke peyvên ya bi coş derdikeve meydana. Di hin helbestan de bikaranîna gotinên pêşiyên re helbesta xwe nêzî dengê stranbêj û dengbêjan dike. Em dikarin bibêjin ku bi vê yekê re Barnas, dengê nû li helbesta Kurmancî bar kiriye.

Di vegotina Barnas de rêkûpêkiyek û lihevhatinek bi zaneyî li ber çavan heye. Di avakirina helbestekê de peyvên li gorî vegotina mijara wê helbestê hildibijêre. Her peyv di cihê xwe de tê bikaranîn ku kompozîsyonek bi giştî derdikeve holê. Bi vê kompozîsyonê re dengê muzîkê tê guhê me ku muzîk yek ji wan unsûrên girîng e ku di vegotina Barnas de xuya dibe. Ji ber vê helbestvan ji hemû vegotinên hunerî yên Kurmancî, hem ji aliyê dengê peyvên û hem jî ji aliyê wateya peyvên sûd werdigire û di Kurmancî de rist û hevokên nû ava dike.

Barnas di hin helbestên pêlikî de vegotîneke din jî ava dike ku ev vegotin ji dubarekirina peyvên pêk tê. Peyvên ku ji aliyê dengê ve nêzî hev in di van helbestên pêlikî de bi cih kirine. Heta em dikarin bibêjin ku îskeletê van helbestan li ser asonans û alîterasyonan hatiye avakirin.

Vegotina Barnas sade û ji xwe bawer e. Di avakirina helbesta wî de ev sadebûn û jixwebawerbûn bi hev re derdikevin pêş. Helbestvan ji sadebûnê natirse beravajî vê heta ku jê tê helbestên hîn bêhtir sade dinivîsîne. Di helbestên wî yên dawî de ev rewş hîn xurttir dibe. Ev yek tesîrê li şêwaza wî jî dike. Ji ber vê, şêwazeke samîmî û rehet derdikeve pêşberî me.

Barnas ji aliyê şêwazê (uslûb) ve li gorî helbestvanên serdema xwe xwedî şêwazeke cuda ye. Hilbijartina peyvên, vegotina resen, deng û lihevhatina wateyê di helbesta wî de balê dikişînin. Helbesta Barnas ji aliyê naverokê ve dewlemend û ji

aliyê vegotin û şêwazê ve bi temamî nû û orjînal e. Bi şêwe û şêwazeke nû ji her helbestvanî vediqete ku ev taybetmendiya wî ya herî berbiçav e.

Ji aliyê şêweyê ve gava ku em bi giştî li helbesta Barnas dinêrin tê dîtîn ku wî hem ji şêweya klasîk û hem jî carcar ji helbesta dinyayê hin şêwe bi kar anîne. Lewre ji aliyekî ve pala xwe dide şêweya klasîk lê vê şêweyê rasterast di helbesta xwe de bi cih nake. Barnas li dû şêweyeke nû ye ku di encamê de jî bi ser dikeve.

Ji bilî şêweya serbest û çend helbestên ku bi pîvana kêteyî û bi serwayê hatine nivîsandin, di hemû pirtûkên wî de şêweyeke din jî derdikeve hemberî me. Ev şêwe helbest, ji çarînekê tenê pêk tên û di her pirtûka xwe de cih daye van çarînan. Em di wê fikrê de ne ku ev çarîn me ber bi çarînen Baba Tahirê Uryan ve dibin ku ev çarînen Barnas bi her awayî di formata çarînen wî de hatine nivîsandin. Lewre em dikarin bibêjin ku Rojen Barnas di helbesta xwe de gelek şêweyên curbicur yên helbestê bi kar anîne lê şêweya ku di helbestên wî de derdikeve pêş şêweya serbest e ku ev jî şêweyeke pêlikî ye û tê dîtîn ku di hemû pirtûkên xwe de ji vê şêweyê dûr nakeve. Em di wê baweriyê de ne ku ev şêwe bi xwe re rîtmek jî ava kiriye.

Ji bo mirov bikaribe helbestvanekî binase û binirxîne hewce ye ku mirov ewilî serdema ku helbestên xwe lê nivîsandine baş bizanibe û li gorî mercên wê serdemê berê xwe bide helbestên wî. Serdema ku Rojen Barnas helbest nivîsandine jî, ji bo têgihiştina me ya derbarê helbestên wî de rê li ber me vedike. Mirov bêyî ku vê serdemê binase nikare berê xwe bide helbestên helbestvan. Lewre têkiliya Barnas ya bi helbestê re, têkiliyeke bi jiyana re ye û ev, têkiliyeke xurt û kevn ya bi serdema xwe re ye. Dîroka helbesta Barnas di heman demê de dîroka dema nêz ya welêt e. Helbesta wî di serdemekê wisa de hatiye nivîsandin ku gelek pirsgerêkên siyasî, aborî û civakî di vê serdemê de qewimîne. Ev pirsgerêk di jiyana wî de jî xuya dikin. Piştî hin têkiliyên bi Kurdperweran re fikir û ramanên wî tîr guhertin û wek Kurdekî xwe ji hin tiştan berpirsyar dibîne. Ji ber vê jî xwestiyê ve berpirsariyê bi helbesta xwe bîne ziman.

Bandora mercan berê helbestvan dide ziman ku helbestvan encex bi alîkariya zimên dikare hebûna xwe diyar bike û dîsa bi alîkariya ziman dinyayê fêr bike. Ev

yek bi taybetî di helbesta Rojen Barnas de xwe dide der ku helbestvan di serdemeke zor û zehmet de biryar dide ku bi Kurdî helbestan binivîsîne. Ev biryar hem biryareke siyasî û hem jî biryareke takekesî ye. Îro roj gava ku em bala xwe didin vê serdemê tê dîtin ku ev biryar di vê serdemê de, biryareke mezin e û ev yek hişmendiya Barnas jî diyar dike.

Nîhat Çelîk helbesta Barnas li jêr pîvana sê serdeman dinirxîne ku em jî tevlî vê nirxandinê dibin. Çelîk ev her sê serdem li gorî van pîvanan ji hev veqetandine: “Helbestên ku di nava gel de û bi êş û kedereke giran hatine holê, yên ku di binê vê giraniyê de hewl dane xwe û yên ku li jêr bandora biyanîtiyê hatine nivîsandin.”²⁸

Nîhat Çelîk ji hin aliyan ve helbest û helbestvaniya Barnas berçav dike û bi gelemperî dibêje ku di helbestên wî yên ewilî de hêvî xurt e, serxwebûn û berxwedana hêmayan bandoreke mezin li mirov dikan. Dîrok û mîtolojî bi hev re hatiye strandin û lehengên dîrokî di helbestên wî de xuya dibin. Deng û tehma gund û kuçeyên welat li pêş e. Her çend armanca helbesta wî avakirina fikreke siyasî be jî, ji hin helbestên wî bêhna evîneke şexsî difûre. Lewre Barnas helbesta xwe di nava fikra siyasî de naxitimîne û tenê bi siyasetê naxemilîne. Helbestvan hest û hêza mirovî jî li helbestên xwe dineqîşîne û dizane ku ji helbestê re hem fikir û hem jî hest lazim e. Lewre Barnas di nava helbestvanên Kurdî de xwedî cihekî girîng e ku wî ev cih bi kedeke mezin û bi xebateke ciddî bi dest xistiye.²⁹

Hevpeyvîna Nîhat Çelîk û nivîsa kurt ya Abidin Pariltî, me ji hin taybetmendiyên Barnas û helbesta wî agahdar dikan. Lê li gorî nêrîna me ev çend agahiyên sereke ne û jixwe hevpeyvînek û nivîsek kurt nikare li ser helbesta helbestvanekî kûr bibe. Ji bilî van her du nivîsan cara ewilî Berken Bereh li ser helbestvaniya Rojen Barnas kûr dibe. Bereh derbarê helbestvaniya Barnas de du nivîsan dinivîsîne. Ev her du nivîs, gelek taybetmendiyên berfireh didin me.

Berken Bereh jî helbesta Barnas, wek helbesteke hesas dibîne ku her peyveke wî dibe kevirekî wê qesra ku bi zanistî, arezû, xem, kovan û hişekî zelal ku bi berxwedariyê hatiye avakirin, girê dide û diyar dike ku helbesta Barnas li ser sê

²⁸ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 37.

²⁹ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 37, 38.

hîmên xurt hatiye avakirin: Hîma ewilî evîna welat û berxwederî, ya din îdeolojî û hîma sêyemîn jî mirov û nasnameya heyîn û hebûna wî ye.³⁰

Bereh di heman nivîsê de, di binbeşa “Poetîka wî” de, Barnas wek helbestvanekî romantîk dibîne û diyar dike ku Barnas wek hemû romantîk û nûjenîxwazan bi helbesta xwe fikir, guman û îroniyê tevî helbesta Kurdî dike û pê re jî dixwaze ku wezna biqaîde bişikîne. Ji bilî vê asoya temayên helbestê û awaza helbestê guherandiye. Li helbestê erotîzm, kesayetî, xewn û xeyal bi vegotîneke cuda bar kirine.³¹

Berken Bereh di nivîsa xwe ya duyemîn de bi berfirehî derbarê helbestvaniya Rojen Barnas de tespîtên hêja dike. Em dikarin bibêjin ku Bereh, nivîsa xwe ya ewilî jî gelek hêlan ve di vê nivîsê de berfireh kiriye. Bereh ji helbestên Barnas gelek mînakên dide û van helbestan şîrove dike. Bereh bi van şîroveyan dest bi nivîsa xwe dike:

“Eger em bixwazin dakevin xaka helbestvanekî, wî û gerdûna wî şîrove bikin, helbet xebata wî ya dawî girîng e ji bo me. Lê, divê neyê jîbîrkin ku ger ew bi rastî helbestvan e hê di berhema ewil de dê reng û dengê xwe yê resen rabe me bike. Lew helbestvan ew kes e ku dixwaze jiyane ji nû ve saz bike. Ji bo wî helbest hêçandinek e ku jiyana bi hemî layên xwe tê de bi cih bûye û ji nû ve hatiye sazkirin.”³²

Bereh di dewama nivîsê de diyar dike ku Barnas ji berhema ewilî û heta ya dawî daye dû avakirina dinyayeke nû û her bi vegotîneke hunerî û bi hiş û bîreke saf û zelal cihê xwe û helwesta xwe wek hosteyekî avahiyan ava dike.³³

Çi bûyerên ku diqewimin û zerar dane jiyana Barnas û neteweya wî, helbestvan wan napejirîne û naecibîne, dixwaze wan ji nû ve bi helbesta xwe sererast bike. Helbest ne tenê rêya xwenasînê, her wiha avakirina jiyana xwe ye jî. “Ji Bandeva Spêdê, ta Yeldayê ev rastî heye, Rojen Barnas hêçandin û lixwemikurhatina jiyana xwe ji me re vedibêje û bi vê helwesta xwe dibe parçeyekî wê dinyaya

³⁰ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 5.

³¹ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

³² Bereh, **Rojen Barnas**, r.5.

³³ Bereh, **Rojen Barnas**, r.5.

jinûveavakirî...»³⁴ Ev fikra ku di helbesta wî de berçav dibe dîsa ji ber serdema ku helbestan dinivîsîne ava dibe.

Ji helbesta ewilî ve bêcihûwarbûn, di helbesta Barnas de xuya dibe. Bereh vê bêcihûwarbûnê bi giyanê helbesta wî ve girê dide ku giyanê helbesta wî li tu waran bi cih nabe. Ji helbesta ewilî de pêşbîniya ku wê jiyana wî her li xerîb û xurbetê bibihûre, xuya dibe.³⁵ Lewre helbesta Barnas her serê çend rûpelan me bi vê rastiya bêcihwarbûnê dihisîne. Ev jî rastiya welatekî û tenêtiya mirovên vê serdema modern raberî me dike. Ev rewş dîsa ji ber ku di vê serdemê de gelek Kurd, bê cih û war in derdikeve holê.

Di vê çarçoveyê de Rojen Barnas helbestên xwe ne bi awayeke propagandaya hişk û rasterast dinivîsîne. Ango her çiqasî helbesta wî di bin bandora atmosfereke tund de hatibe nivîsandin jî, dengê helbesta wî ne bilind e. Helbestên xwe bi dengê nerm dinivîsîne û bi vî dengî re tê dîtî ku tesîreke mezin li ser mirovan dihêle. Helbestên wî ragihandina daxwazên neteweyekê ne û van daxwazan bi vegotîneke kurt, xurt, kûr, zirav, bedew û ahengdar dide. Lewre em dikarin bibêjin ku helbesta Barnas, atmosfera serdemeke tund bi awayekî nerm ji me re berçav dike.

Piştî van fikir, raman û şîrovevên derbarê helbesta Barnas de, em dixwazin careke din jî dubare bikin ku helbesta Barnas helbesteke siyasî ye. Ev yek xwe di fikr û ramanên Barnas; yên derbarê ziman, helbest û edebiyatê de jî diyar dike. Lewre helbestvan li gorî vê hizra xwe ya siyasî nêzî helbestê bûye û helbest nivîsandine ku ev yek xwe di temayên helbestên wî de bêhtir berçav dikin.

Di çarçoveya van fikrên ku me li jor diyar kirin de, îcar gava ku em ji aliyê tema û mijaran ve bala xwe didin helbesta Barnas, tê dîtî ku di helbesta wî de gelek mijar û temayên curbicur derdikevin pêş. Ev yek jî ji ber serdema helbesta wî pêk tê. Ji ber ku di vê serdemê bêhtir atmosfereke siyasî derdikeve holê; neteweperwerî û mijarên ku bi neteweperweriyê ve girêdayîne di helbesta Barnas de pir derdikevin pêş. Em dikarin bibêjin ku hemû unsûrên neteweperweriyê di helbesta wî de cih girtine. Barnas di vê temayê de pir xebitiye û xwestiye ku wê ji her awayî de ji hev veçirîne. Di vegotina vê temayê de Barnas hem lîrik e û hem jî epîk tevgeriyaye. Ji

³⁴ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 7.

³⁵ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 7.

ber vê, helbesta wî ne helbesteke şexsî ye, bêhtir helbesteke siyasî ye. Lewre ne mijarên takekesî, yê civakî û siyasî derdikevin pêş ku di vê xebata xwe de em ê van temayên siyasî bi mînakên ku me ji helbestên wî girtine berçav bikin.

2. SEDEMA HILBIJARTINA TEZÊ

Em dikarin bibêjin ku edebiyata Kurdî li ser helbestê ava bûye û Kurdan di helbesta klasîk, gelêrî û modern de û di hemû dewr û dewranan de helbestvanên mezin ji edebiyata Kurdî derketine. Di serdema me de herçiqasî gilî û gazin ji helbestê hebin jî em di wê baweriyê de ne ku ev gilî û gazin di her serdemê de hebûn û dê hebin jî. Lê li hemberî van gilî û gazinan nivîsandina helbestê berdewam e û helbestvanên mezin derdikevin û di dahatûyê de jî dê derkevin.

Rojen Barnas jî di vê serdemê de wek helbestvanekî mezin tê zanîn. Bi taybetî ji ber ku ev demeke dirêj e ku helbestan dinivîsîne girîng e. Di nava “Nifşa Tîrêjê” de yek ji wan helbestvanê ku bi zimanekî pir sade nivîsandiye Rojen Barnas e. Jixwe di helbesta wî de girîngî li ser ziman e û ev girîngî ji ber nêrîna wî ya ji ziman tê. Loma di helbesta wî de binyada herî xurt jî ziman e. Ji bilî vê ji ber ku ji helbesta beriya xwe sûd girtiye û ew di helbesta xwe de bi awayekî nû bi cih kiriye jî balkêş e. Di heman demê de, Rojen Barnas bi berhemên xwe, mohra xwe li edebiyata nûjen ya Kurdî xistiye.

Heta niha derbarê jiyan û helbesta Rojen Barnas de çend gotar û lêkolînên kurt hatine nivîsandin ku bi dîtina me ev gotar û nivîs bi awayekî akademîk nehatine kirin û ji hin aliyan ve di mijara xwe de hûr nebûne. Hem ji ber vê û hem ji ber van girîngiyên ku me li jor diyar kirin û hem jî ji ber ku heta niha xebateke birêkûpêk û serbixwe ku ji aliyê akademiyeke ve derbarê jiyan û helbesta wî de nehatiye kirin, me hewce pê dîtiye ku em xebateke akademîk bikin. Bi van sedeman, me xwestiye ku em bi vê xebatê jiyan, berhem û dahûrîna naverokî ya helbestên wî bikin mijara xebata xwe.

Ji ber vê me hewce dîtiye ku em hemû berhemên wî bixwînin û binirxînin. Bi vê xwendin û nirxandinê re endişeya me ew e ku em jiyan û helbesta wî derxînin ber

roniyê. Ev jî di vê xebatê de pirsgirêka me ya sereke û sedema hilbijartina teza me ye ku di vê xebatê de em ê vê pirsgirêkê heta ji destê me bê çareser bikin.

3. ARMANC Û GIRÎNGIYA TEZÊ

Bi guhertina mercan re helbesta Rojen Barnas balê dikişîne û helbesta wî di nav edebiyata Kurdî de deng vedide. Ji ber ku helbesta Barnas di xwe de pirsgirêkên civakî û siyasî dihewîne, helbesteke girîng tê dîtin. Lewre helbestvanekî bi vî rengî di nav edebiyata Kurdî de balê dikişîne û ji ber vê jî girîng e ku vê yekê jî em ber bi xebateke akademîk ve birine.

Di vê xebatê de, me hewl daye ku em jiyan û berhemên Rojen Barnas bidin nasandin û rengvedana neteweperweriyê di nav helbestên wî de derxînin holê. Ev armanca me ya sereke ye ku di vê xebatê de derbarê van mijaran de heta ji destê me hatiye em kûr bûne. Her wisa armanca me ew e ku rengvedana neteweperweriyê di nav helbestên wî de berceste bikin. Armanceke me ya din jî ew e ku xebateke akademîk li ser Rojen Barnas bê kirin da ku bi vê yekê re helbestên wî ji aliyê temayên siyasî ve bînin berçavkirin û helbesta wî di nav edebiyata Kurdî de derkeve ber ronyê. Em hêvî dikin ku tespît û berçavkirinên ku me kirine rê li ber gelek xebatên din veke ku ev jî girîngiya xebata me diyar dike.

4. SÎNORÊ TEZÊ

Bi vê xebatê re me hewl daye ku em pêvajoya helbesta Rojen Barnas ya çil salî ji aliyê naverokê ve berçav bikin. Ji ber vê jî me xebata xwe bi sînor kiriye û me bêhtir berê xwe daye naveroka helbestên wî.

Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de ji ber gelek sedeman me xebata xwe bi sînor kiriye. Beriya ku em dest bi vê xebatê bikin me hêvî dikir ku em xwe bigihînin gelek nivîsên ku derbarê Rojen Barnas de hatine nivîsandin. Lê piştî ku me dest pê kir me dît ku ji bilî çend gotar û nivîsên şexsî tu tişt di destê me de tune ye û li gorî lêgerînên kûr û dirêj ku me kirine jî heta niha, xebateke ku ji aliyê akademiyeke ve

hatiye kirin me bi dest nexistiye. Ji ber vê weke piraniyên xebat û lêkolînan ev xebata me jî rastî hin asteng û pirsgirêkan hatiye, bi piranî jî di warê çavkaniyan de. Ji ber ku helbesta Barnas ji ber mercên ku me li jor diyar kirine dereng hatiye kifşkirin, hê di helbesta Kurdî de mijareke nû ye. Lewre hejmara lêkolîn, gotar û nivîsên ku derbarê wî û helbesta wî de hatine nivîsandin tiliyên destan derbas nakin. Vê yekê hem hişt ku em vê valahî bi hewldaneke mezin tije bikin û hem jî hişt ku em xebata xwe bi sînor bikin.

Lewre di pêvajoya amadekariya vê xebatê de ji aliyê meteryalan ve em bi gelek kêmasiyan re rû bi rû man. Helbet ev kêmasiyên me ne û van kêmasiyan em teşwîqî vê xebatê kirine. Herçiqasî kêmasî hebin jî em di wê baweriyê de ne ku helbestvanekî wek Rojen Barnas berhemdar û xweser, divê ku xebateke akademîk li ser bê kirin. Bi vê berpirsariyê û li gorî van kêmasiyan em xebitîn û heta ji me hat me hewl daye ku em xebateke bê kêmasî ava bikin. Hêviya me ew e ku ev xebat bibe gaveke ewilî û rê li ber xebatên berfirehtir veke, herçiqasî xebateke bi sînor be jî.

5. RÊBAZA TEZÊ

Berî her tiştî divê em diyar bikin ku di xebata xwe de em li gorî zanista edebiyatê tev geriyane û carina gava ku hewce kiriye me serî li zanistên wek derûnnasî, civaknasî û zimannasiyê jî xistine. Ji ber ku xebata me li ser tehlîla helbestan sekiniye, em bêtir di wateya helbestan de hûr bûne. Ev hûrbûn bi nêrîna edebiyata çepgir hatiye kirin û me ev li gorî rê û rêbazên vê edebiyatê kirine.

Di mijara rastnivîsa vê xebatê de, ji bo ku xebata me di vî warî de birêkûpêk be ji aliyê rêbaza rastnivîsê ve me serî li gelek xebatan xistiye û ji wan sûd wergirtiye. Ji van xebatan derket holê ku gelek rê û rêbazên rastnivîsîna Kurmancî hene lewre di teza xwe de me di hin cihan de ji van xebatan sûd wergirtiye. Ji bo rastnivîsa hin peyvên ku derbarê wan de li hev kirineke bi giştî tune ye jî em li gorî xebata “Ji bo Rastnivîsîna Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Tirkî”³⁶ çûne. Ji bilî vê, çî

³⁶ M. Malmîsanîj (Amedekarê Weşanê), **Ji bo Rastnivîsîna Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Tirkî (Doğru Yazım İçin Kürtçe (Kurmanca)-Türkçe Sözlük)**, Weşanxaneya Rûpel, Çapa Yekem, Stenbol, 2012.

nivîsên ku me di xebata xwe de rasterast ji nivîsekê an jî ji pirtûkekê girtine, me bi rastnivîsa wan nelîstiyê. Ango bi çî awayî hatibin nivîsîn me wisa neqil kirine.

Me hemû çapên pirtûkên Rojen Barnas yê helbestan di ber çavan re derbas kirin lê ji ber ku hemû helbestên Barnas di dîwana wî ya bi navê *Kadizê* de çap bûne me hemû helbest ji vê xebatê girtine û li gorî rastnivîsîna vê xebatê dane. Di vî warî de jî, ji bo rê û rêbazeke bi giştî û rêkûpêk çî helbestên ku di beşa duyem de me şîrove kirine û wek mînak dane, me ji vê xebatê girtine û di jêrenotan de me rûpêlên wan diyar kirine.

Li gorî rê û rêbaza xebata xwe, ewilî me hemû pirtûkên Rojen Barnas berhev kirin û me dest bi xebata xwe kiriye. Piştî bi qasî ku Barnas di nava dîroka edebiyata Kurdî de bi cih bûye, me daneyên xwe dane hev. Berî her tiştî ji kovara *Tîrêjê* û heta roja me, em ketin nava kovarên edebî û hunerî. Çî nivîsên ku derbarê helbestvan de hatine nivîsandin me diyar kirin û me ji bo têgihîştina helbestên wî ji van nivîsan sûd wergirtiye. Me hem ji kovar û rojnameyên di serdema wî de û hem ji kovarên ku hê jî derdikevin sûd girtiye. Çî kesên ku derbarê helbesta Barnas de gotar nivîsandine û çap bûne me bi dest xistin û li gorî xebata xwe me ji hin malperên înternetê jî sûd wergirtiye. Ji bilî van ji ber ku Barnas hê dijî me gelek agahî û dane ji wî jî pirsîne. Daneyên ku me dane hev, me li gorî rê û rêbazên xebata xwe senifandine û bi kar anîne.

Derbarê jîyan û helbesta Rojen Barnas, ji bilî sê nivîs û du hevpeyvînan pê ve heta niha tu nivîs di destê me de tunene. Hevpeyvîna Nîhat Çelîk hevpeyvîneke kurt e û ji ber hin prensîbên Barnas, Çelîk gelekî neketiye nav jîyan û helbesta wî. Nivîsa kurt ya Abidin Parîltî jî bi awayekî hestiyarî ji bo rojnemeyekê hatiye nivîsandin ku ev nivîs jî tenê danasîna helbestvan dike. Berken Bereh di nivîsa xwe ya ewilî de hin gotinan derbarê helbesta Barnas de bibêje jî dîsa ji ber ku ev nivîs jî ji bo rojnameyeke rojane hatiye nivîsandin kin maye. Lê Berken Bereh di nivîsa xwe ya duyem de li ser helbesta Barnas hinekî din kûr dibe û hin taybetmendiyên helbesta wî diyar dike. Vê nivîsê di gelek cihan de rê li ber me xistiye. Hevpeyvîna Fahriye Adsay jî di hin cihan de bi kêrî xebata me hatiye. Xebateke ku li ser helbesta Kurmancî ya piştî salên 1970yî rê li ber me bixe jî tunebû. Xebata Îrfan Amîda ya bi navê *Helbesta Tîrêjê* şîroveya hin helbestên Rojen Barnas dike. Lê ji ber ku armanca

xebata me û ya xebata Amîda ji hev cuda ye, me tenê çend agahiyên derbarê kovara *Tîrêjê* de jê girtine. Ji bilî van xebatan, xebata ku herî pir bi kêrî me hatiye, rê li ber xistiye û me gelekî sûd jê girtiye xebata Zülküf Ergün ya bi navê *Nerît û Helbestê* ye. Em dikarin bibêjin ku vê xebatê karê me pir hêsan kir.

Teza me ji pêşgotin, kurte (Kurmancî, Tirkî, Ingîlîzî), naverok, destpêk, beşa yekem, beşa duyem, encam û çavkaniyekê pêk hatiye. Di pêşgotinê de nav û nîşana tezê bi zelalî hatiye berçavkirin. Di destpêkê de jî ewilî me cihê “Rojen Barnas di Edebiyata Kurdî de” bi çî kesên ku derbarê helbesta wî de nivîs nivîsandine re diyar kiriye û piştî me “Sedema Hilbijartina Tezê, Armanç û Girîngiya Tezê, Sînorê Tezê û Rêbaza Tezê” diyar kiriye.

Di beşa ewilî de me cih daye jiyana wî û pê re jî me hin taybetmendiyan berhemên wî dane. Em di wê baweriyê de ne ku hin aliyên jiyana wî ji bo têgihiştin û temayên helbesta wî bi kêrî me hatine. Ji ber vê jî me jiyana Rojen Barnas û helbesta wî ji hev veneqetandiye.

Ji ber meteryalên hindik, me bêhtir jiyana û berhemên Rojen Barnas derxistine pêş. Agahiyên ku me di vê beşê de dane me rasterast ji berhemên wî û ji bîranînên wî girtine. Derbarê jiyana wî de me bêhtir ji berhema wî ya *FARQÎN Sîlvan/Sîlvan* (lêkolîn) sûd wergirtiye. Em di wê baweriyê de ne ku jiyana û berhemên Barnas pir bi hev re girêdayî ne. Ji ber vê yekê derbarê jiyana wî de me xwe gîhandibe çî û me çî dabe hev, bi kêrî têgihiştina şîrovekirina helbestên wî hatine û vê yekê temayên helbesta wî jî zelaltir kirine.

Herçiqasî Berna Moran diyar bike ku: “Ji ber ku pergala ziman wateyê dide peyvê û ji bo mirov berhemekê binirxîne hewecedariya me pir bi nivîskar tune. Divê em berê xwe bidin binyada ku di berhemê de wateyê ava dike û berhemê bi wate dike.”³⁷ Lê me di xebata xwe de, tevî mercên siyasî, civakî, dîrokî û psîkolojiya helbestvan, di heman demê de me giraniya xwe daye berhemên Barnas jî. Ango heta ji me hatiye me bi hemû awayan helbestên Barnas nirxandine û berçav kirine. Di vir de divê em diyar bikin ku hemû şîroveyên ku me kirine li gorî têgihiştina me ya helbestê hatine kirin.

³⁷ Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, 3. Basım, İletişim Yayınları, İstanbul, 2000, s. 214.

Piştî jiyana Rojen Barnas, di heman beşê de me cih daye berhemên wî. Di vir de me danasîna *Li Bandeva Spêde* (helbest), *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* (helbest), *Milkê Evînê* (helbest), *Hingê* (çîrok), *Şi'r -I-* (berhevoka 1 û 2yan ya helbestan), *Bi Kurmanciya Gewr* (bend û gotar), *Kadiz* (dîwana hemû helbestan) û *FARQÎN Silvan/Silvan* (lêkolîn) kiriye. Derbarê pirtûkên wî de, Barnas jî di nav de, kê çî gotiye û çî şîrove li ser pirtûkên wî hatine kirine, me hemû diyar kirine. Bi her pirtûkê re çî guhertinên ku di helbesta wî de çêbûne jî me tespît kirine. Ji bilî vê me taybetmendiya her pirtûka wî li gorî têgihîştina xwe şîrove kiriye. Bi taybetî jî me pirtûkên wî yên helbestan bêhtir şîrove kirine ku bi van şîroveyan re me xwestiye em helbestên wî ji bo xebata xwe ji hev veçîrînin.

Piştî danasîna berhemên di beşa duyem de em li ser temayên siyasî yên helbesta Rojen Barnas sekinîne. Di beşa duyem de me xwe bera nav helbestên wî daye û ji aliyê naverokê ve me temayên siyasî diyar kirine. Tespîtîkirina temayan û şîrovekirina wan bingeha vê beşê ava dikin. Di nava van şîroveyan de me hin caran taybetmendiyan helbestvaniya Barnas û hin caran jî ramanên wî yên derbarê helbest, edebiyat, ziman û çandê de dane. Di helbesta Barnas de herçiqasî şêweyeke nû derkeve hemberî me û helbestvan bide dû vê şêweya nû jî, ji ber armanca xebata xwe, ji bo guhertinên ku di helbesta wî de xuya bibin me berê xwe bêhtir daye dahûrîna naverokê. Ev tercîhek e û di vê çarçoveyê de me helbesta wî berçav kiriye.

Di vê beşê de em li ser temayên siyasî yên ku pir derketine pêş rawestiyane û vegotina van temayan bi helbestên ku me neqandine re me şîrove kirine. Berî ku em van temayan diyar bikin me helbestên wî yek bi yek xwendin û bi vê xwendinê re me temayên ku pir derdikevin pêş diyar kirin û dest bi şîrove û ravekirina wan kiriye. Di encamê de temayên siyasî yê ku Rojen Barnas pir di helbesta xwe de bi cih kirine û serê xwe pir bi wan re êşandiye, neteweperwerî û îdeolojiya çepgir e. Me “Îdeolojiya Çepgir” bi serê xwe û “Netewetî” jî di binbeşên “Bêriya Welat, Bindestiya Welat, Dîmenên Welat, Berxwedana Neteweyî, Nasnameya Neteweyî û Zimanê Neteweyî” de diyar kiriye.

Di encamê de jî, piştî hemû xebata xwe û li gorî lêkolînan me encamên giştî yên lêkolînê di hinek xalan de berçav kirine. Daneyên ku me berhev kirine jî li gorî armanc û beşên vê xebatê ji hev hatine veçîrandin û bi vî awayî hatine dayîn û

şîrovekirin. Di nava bi dehan çavkaniyan de yê ku me di vê xebatê de bi kar anîne di beşa çavkaniyan de me nîşan kirine.

Helbet ev xebata me ne bêkêmasî ye lê em hêvî dikin ku ev hewldan, helbestên helbestvan û berhemên wî ji hin aliyan ve zelal bike û ev xebata me ya bi navê “Rojên Barnas û Temayên Siyasî di Helbestên wî de” rê li ber gelek xebatên din veke û bibe sedema zêdetirîn dewlemendkirina helbest û edebiyata Kurdî.





BEŞA YEKEM

JIYAN Û BERHEMÊN ROJEN BARNAS

1. JIYAN Ê BERHEMÊN ROJEN BARNAS

1.1. JIYANA ROJEN BARNAS

Çavkaniyên di destê me de derbarê jiyana Rojen Barnas de agahiyên bi sînor didin me. Em bi kitekit nikarin jiyana wî li ber çavan raxînin. Li gorî tê dîtîn, ew bi xwe jî naxwaze ku bi jiyana xwe ya taybet derkeve pêş. Ev yek ji ber rewşenbîrî û berpirsiyariya wî pêk tê ku jiyana taybet ne li bala wî ye. Ji ber ku gava em bala xwe didin berhemên wî, em bêhtir dibînin ku pirsgirêkên civakî, siyasî, dîrokî, çandî û aborî yên serdema xwe derdixe pêş. Lewre dema ku di çend hevpeyvînan de pirsên taybet jê tînin pirsîn jî tenê bi çend hevokan bersivê dide û mijarê diguhere. Ji ber vê em mecbûr dimînin ku pirtir li ser tîkiliya Barnas û vê serdema ku tê de jiyaye û kes û bûyerên ku bandor li kesayetiya wî kirine bisekinin. Em di wê baweriyê de ne ku ev agahiyên me dane bûne bingeha helbestên Barnas û mijara xebata me jî zelaltir dikin.

Rojen Barnas li Farqînê hatiye dinyayê. Lê rojbûna wî bi teqezî nayê zanîn. Tê dîtîn ku di gelek antolojî û xebatên zanistî yên curbicur de jî, derheqê rojbûna wî de lihevhatineke teqez tune. Derbarê rojbûna xwe de Barnas bi xwe jî di nava gengeşeyekê de ye û agahiyên ku ew bi xwe jî dide me vê gengeşeyê çareser nake.

“(…) Li gora tescîla nufûsê di 5.1.1945, bi awayê salixdanê jî -ku 12-15 roj berî kuştina yuzbaşî Ferîdon- di roja şemiya 13.11.1943 û li gorî nivîsa li pişt Mewlûda Kurmancî ya malê jî di “Kasım 1944” de hatiye dinyayê. Tarîxa kuştina Ferîdon 1943 be 1943, ne ku 1944 be hingê 1944 rast e.”³⁸

Wek gelek rewşenbîr, nivîskar, romannûs û helbestvanên Kurd, Rojen Barnas jî ne bi navê xwe yê fermî dinivîsîne. Navê fermî yê Rojen Barnas, Mehmet Gemici ye û “Rojen Barnas” nasnavê wî yê hunerî ye.³⁹ Li gorî ku Rojen Barnas bi xwe ji me re radigihîne, nasnavê “Rojen Barnas” ne şexsek e, tenê îmzeyek e û ji 1978an û vê de, bi vî nasnavî heta demeke dirêj tenê helbestan dinivîsîne. Lê piştî ku ev nasnav

³⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 4.

³⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 4.

berbelav dibe û derdikevê pêş bi heman nasnavî berê xwe dide pexşanê jî û xebatên ziman û edebî jî bi nasnavî kirine.⁴⁰

Ji bilî nasnavê Rojen Barnas bi van nasnavan jî nivîsandiye: *Memo Guhderz*, *Şêrgo Ciwanroj*, *Sersax Arda*, *Ferîdûn Salar*, *Mihemed Qasim û Flît Totanî*.⁴¹ Ev her şeş nasnav li gorî mercan û li gorî tercîhên Rojen Barnas hatine guhertin. Li gorî ku Rojen Barnas ji me re radigihîne her nasnavê jî van nasnavan ji bo cureyeke edebiyatê bi kar aniyê.

“(…) Min bi navên Rojen Barnas, Şi’r; Flît Totanî, çîrokên mîzahî; Sersax Arda, gotar û bend; Ferîdûn Salar, çîrokên didaktik ên sergiran; Mihemed Qasim, li ser folklorê dinivisand (…)”⁴²

Li gorî çavkaniyên ku di destê me de ne, helbestên Rojen Barnas yê ewilî, di salên 1968 û 1969an de bi nasnavên *Memo Guhderz* û *Şêrgo Ciwanroj*⁴³ tên weşandin. Dîsa li gorî çavkaniyan; helbesta Rojen Barnas ya ku ewilî çap bûye, ku ev helbest wek belge jî di destê me de heye, helbesta bi navê *Memo* ye. Ev helbest bi nasnavê *Memo Guhderz* çap bûye û bi vî nasnavî heta niha tenê helbestek li ber destê me heye. Ev helbest, di pirtûka Mîr Kamûran Alî-Bedirxan ya bi navê *Fêrbûna Xwendina Kurdî* de li Parîsê, di sala 1968an de çap dibe.⁴⁴

Rojen Barnas, ji bilî nasnavê *Memo Guhderz*, di serdema ewilî de bi nasnavê *Şêrgo Ciwanroj* jî helbestan dinivîsîne. Lê ji ber mercên vê serdemê helbestên ku bi nasnavê *Şêrgo Ciwanroj* nivîsandine li tu cihî nehatine weşandin.⁴⁵ Ango *Şêrgo Ciwanroj* ne tê de bi hemû nasnavên din nivîsên Barnas di pirtûk, kovar û malperan de weşiyane ku ev hemû wek belge jî di destê me de hene. Ji ber ku her du nasnavên pêşî -*Memo Guhderz* û *Şêrgo Ciwanroj*- ji aliyê polîsan ve deşîfre dibin, pêwîstî bi nasnavê jî din dibîne û nasnavê *Rojen Barnas* derdikeve holê.⁴⁶

⁴⁰ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 39.

⁴¹ Rojen Barnas, *Hingê*, Çapa Duyem, Nûbihar, İstanbul, 2014. r. 9.

⁴² Rojen Barnas, *Farqîn (Silvan/Silvan)*, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 186.

⁴³ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 39.

⁴⁴ Rojen Barnas, *Şi’reka Min a Kevin*, Kovara Nûbihar, Hejmar 138, Sal 25, Cild 20, Zivistan 2017, r. 20-21.

⁴⁵ Barnas, *Kadiz*, r. 15.

⁴⁶ Barnas, *Şi’reka Min a Kevin*, r. 20.

Rojen Barnas xwendina xwe ya destpêkê û navîn li Farqînê dike. Di 1952yan de dest bi dibistana seretayî dike. Tê dîtî ku di dema wî de li Farqînê tenê du dibistan hene. Yek dibistana seretayî ye û ya din dibistana navîn e.

Dema ku Barnas dest bi dibistanê dike, rewşa xwendinê di asteke din de ye ku ev rewş, hem asta perwerdeya civakê li ber çavên me radixîne û hem jî tê dîtî ku bandoreke mezin li kesayatiya wî dike ku ev bandor siberojê wê di helbesta wî de jî xwe bide der.

Zarok, bi darê zorê ji aliyê sermamoste û çend mamosteyên din ve li dibistanan bi darê zorê tên qeydkirin. Mamoste mal bi mal li zarokan digerin. Zarokên ku gîhane ber xwendinê û malbatên wan ew neşandibin dibistanê ceza li wan tê birîn. Hin malbat jî ji bo ku ji vî cezayî xelas bibin zarokên xwe ji mamosteyan vedişêrin û wan naşînin dibistanê. Barnas jî di vê serdema zor û zehmet de bi alîkariya nasekî xwe dest dibistanê dike.⁴⁷

Barnas di destpêka dibistana seretayî de wek gelek zarokan bi Tirkî nizane. Tirkiya Barnas ji çend peyvan pêk tê ku di vî warî de ne bi tenê ye. Zarok di nava xwe de bi Kurmancî diaxivin lê ji ber zarokên ku bi Tirkî dizanin û di TKKyê (Türkçe Konuşurma Kolu-Şaxa Axaftina bi Tirkî) de cih digirin, nikarin bi dilrehetî di nava xwe de bi Kurmancî biaxivin. Ev zarokên ku di TKKyê de cih digirin ji aliyê mamosteyan ve tên hilbijartin. Ji van zarokên ku bi Tirkî dizanin tê xwestin ku giliyê zarokên ku bi Kurmancî diaxivin li ber mamosteyan bikin. Mamoste jî ji ber axaftina wan ya bi Kurmancî, li zarokan dixê ku ev rewş di helbestên Barnas de jî wê xwe bide der. Tê dîtî ku Barnas û hevalên xwe yê Kurmancî-axêv ji ber vê rewşê lêxistinê gelekî dixwin. Barnas, van rojan û vê rewşê weha bi bîr tîne:

“Xwendin bêguman bi tirkî bû. Bêjezaniya min a bi tirkî bi tenê ev bû: ‘Gel, git, ekmek, su.’ Di vî warî de ez ne bi tenê bûm, ji sedî heftê û pênc-heştê yê nû destpêkiriyan wek min bûn. Me bi hev re bi Kurmancî xeber dida. Lê di her sinifek de yek-du TKK hebûn. Ev ji xwendevanên tirkîzan dihatin hilbijartin, karê wan di ders û bîhnvedanan de wek sîxur bigerin, yê ne bi

⁴⁷ Barnas, **Farqîn (Silvan/Silvan)**, r. 140.

tirkî xeber din li wan gilî bikin. Kesên wek min, wek Muhterem ji riyê wan bêbavên TKK (Türkçe Konuşurma Kolu) gelek lêdan xwarine.”⁴⁸

Rewşa dibistana ku Barnas lê dixwîne ne di rewşeke normal de ye ji ber ku li vê dibistanê ne av heye û ne jî destav. Herçiqasî şert û mercên dibistanê ne baş bin jî Barnas dibistana seretayî wek cihekî baş dibîne. Tê dîtîn ku Barnas li dibistana seretayî hînî xwendin, nivîsandin, jimartin, arîtmêtîk û ya girîng jî hînî xeyalkirinê dibe. Her ders ji aliyê mamosteyê polê ve tê dayîn. Di vir de diyar dibe ku bandora mamosteyê wî di jiyana wî ya xeyalkirinê de mezin e. Di dibistana seretayî de Barnas tenê ji pedagojiya dersa dîn hez nake. Ev ders ji aliyê sernamoste Aziz Kirişçioğlu tê dayîn. Ji ber ku sernamoste hekarî li zarokan dike û li wan dixê zarok ji vê dersê hez nakin.⁴⁹

Sernamoste bi awayekî neyînî bandorê li jiyana wî dike. Ji ber ku hin gotinên sernamoste di bîra wî de meyanê ku ev gotin înkara wî û civaka wî bi xwe ye. Di vê demê de xwe û dinyayê hêdî bi hêdî nas dike, ev gotin hem li ser kesayetiya wî û hem jî li ser helbesta wî bandorê dikin. Sernamoste bi wan dide zanîn ku ‘Her kes tirk lawê tirkan e’ û hemû mirovên li ser rûyê dinyayê ji Asyaya Navîn derketine û li her çar aliyê dinyayê belav bûne û zimanê wan jî ji tirkiya Ergenekonê zayê û zêde bûye.⁵⁰ Ev fikr û raman dîsa wê xwe di helbesta wî de bide der.

Pênc salan dibistana seretayî dixwîne û piştî di payîza 1957an de derbasî dibistana navîn dibe. Dibistana navîn di jiyana Barnas de xwedî cihekî girîng e. Barnas vê serdemê di perwerdeya xwe de wek dinyayeke bi serê xwe û cuda dibîne. Ew vê serdemê wisa dinirxîne ku bi rastî jî di vê serdema me ya pêşketî de em li xwendineke wisa rast nehatine.

Ev dibistan bi serê xwe dinyayek e. Rêvebirê dibistanê Serwet Beg (Servet Sürmeli) bi kar û barên xwe yê erênî bandoreke mezin li zarokan dike. Li dibistanê 4-5 lîstikgehên woleybolê her dem ji bo lîstinê amade ne. Di atolyeya dibistanê de gelek dezgehên modern hene ku zarok li vir hînî gelek karên zenaatê dibin. Barnas bi xwe jî di vê atolyeyê de salekê ji çemberên sindoqan dergûşeke biçûk ya zarokan çê

⁴⁸ Barnas, **Farqîn (Sîlvân/Silîvân)**, r. 140.

⁴⁹ Barnas, **Farqîn (Sîlvân/Silîvân)**, r. 141.

⁵⁰ Barnas, **Farqîn (Sîlvân/Silîvân)**, r. 141.

dike û sala din jî tembûreke zirav û stûr ku tara wê ji kundirê beravê, milê wê ji daran û têlên wê ji yên elektrîkê ne çê dike.⁵¹

Li gorî ku tê dîtin ji bilî rêvebirê dibistanê hin mamosteyên din jî di dibistana navîn de bi awayeke erênî bandorê li jiyana wî dikin. Mamosteya Tirkî Yildiz Xanim, ku mamosteyeke nazik û narîn e, xwendinê li ber çavên zarokan şîrîn dike û di dersên xwe de ji bilî pirtûkên dersê, çîrokên Arsen Lupen ji wan re dixwîne.⁵²

Gulseren Xanima Tirakyayî ku di her dersa fîzîk û kîmyayê de tiştên ku bi wan dide xwendin piştê di laboratuwarê de bi zarokan dide kirin û çespendin. Hemû ceribandinan li ber çavên zarokan çêdike û rastiya wan nîşanî zarokan dide. Piştê bi zarokan jî van ceribandinan dide kirin.⁵³

Dibistana navîn di perwerdehiya wî de di asta herî bilind de ye. Li vê dibistanê beytar her tiştî li ber çavên wan çêdike ku vê yekê Barnas wek perwerdehiya bi “tedbîq” binav dike. Barnas bi xwe jî vê perwerdeya bi “tetbîq” ya li ber destê Gulseren Xanim û beytar di jiyana xwe ya xwendinê de, di asteke bêhempa de dibîne.⁵⁴

Dibistana navîn li ser kesayetiya Barnas ya welatparêziyê jî bandorê dike. Di vê serdemê de şîretên Serwet Begê Bedlîsî, ku di vê demê de rêvebirê dibistanê ye, bandoreke erênî li Barnas dikin. Tê dîtin ku bandora şîretên Serwet Beg li ser hemû zarokan çê dibe. Barnas şîretên Serwet Beg wek hişmendiyeke welatparêziyê dinirxîne, lê tê dîtin ku di vê serdemê de ev şîret bi awayekî veşartî tîrî formulekirin:

“Mudir Serwet beg (Bedlîsî) li me vê şîretê dikir: ‘Hunê herin bixwînin, belkî herin heta dawiyê bixwînin û xwe xelas kin. Hunê bizewicin; eger hun bi yeka wek xwe xwenda û xwe xelaskirî re bizewicin, we bi tenê xwe xelas kiriye; na ku hun bi yeka ji we ya lê nexwenda û xwenexelaskirî re bizewicin hingê hun du kesan; hem xwe û hem wê kesê xelas dikin. Herin bixwînin, xwe xelas bikin û werin bi yeka ji xwe ya xwe nexelaskirî re

⁵¹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 142.

⁵² Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 142.

⁵³ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 142.

⁵⁴ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 142.

bizewicin û wê jî bi xwe re xelas kin.’ Nizanim gelo gelperwerî an welatparêzî bi awayekî dinê çawa tê formule kirin.’⁵⁵

Di serdema perwerdeya dibistana navîn de têkiliya wî bi edebiyat û hunerê re jî dest pê dike. Li gorî ragihandina Arjen Arî, Barnas di pola dawîn a xwendegeha navîn (1959-1960) de bi Tirkî dest bi nivîsandina helbestê dike ku ev pêvajoyê car car qut bibe jî heta salên 1964-1965an didome.⁵⁶

Di sala 1960î de dema ku dibistana navîn diqedîne li Farqînê lîse tune. Lê ji ber ku di payîza heman salê de malbata Barnas koçî Diyarbekirê dike xwendina xwe ya lîseyê li lîseya Ziya Gokalpê dike. Li gorî ku Barnas van salan dide ber hev perwerdehiya lîseyê li gorî ya dibistana navîn pir qels e. Rojekê jî çavên wan ne bi laboratuwara fizîkê û ne jî bi ya kimyayê dikeve.⁵⁷ Piştî lîseyê Barnas xwendina xwe ya zanîngehê jî li Zanîngeha Dîcleyê di beşa Enstîtuya Hînkariyê de temam dike. Ji ber perwerdehiya lîse û zanîngehê têkiliya Barnas heta şeş salan ji Farqînê qut dibe.⁵⁸

Barnas şeş salan ji Farqîna ku destê wî jê nabe dûr dikeve, lê li gorî ku tê dîtin di bin bandora atmosfera Farqînê de gelekî maye. Berî ku Barnas ji Farqînê here ango heta 1960î, li Farqînê rewşa xwendinê li gorî ku Barnas dibêje, di asteke baş de ye. Ev asta xwendinê hinekî sosyolojiya Farqînê ya van salan zelal dike. Li sîka Farqînê esnaf berêvarî piştî ku karê wan sivik dibe li hev kom dibin, radihêjin rojnameyên xwe û bi dengê bilind an jî xwe re an jî ji civata li dora xwe re van rojnameyan dixwînin. Barnas vê xwendinê wek ‘nexweşiyêke giyanî’ an jî ‘ferzeke dînî’ bi nav dike ku ev xwendin bê navber her dem berêvarî pêk tê.⁵⁹

Tê dîtin ku Barnas van rojname û têkiliya civaka xwe ya bi xwendinê re dişopîne. Em di wê fikrê de ne ku ev rewş bandorê li xwendina Barnas jî dike. Ji ber ku haya Barnas ji hemû rojnameyên vê serdemê heye.

Rojnameyên van esnafan bi taybetî *Ulus* (vê demê piştgiriya CHPê dike) û *Köylü* (vê demê wek rojnameya Partiya Demokratê tê zanîn) ye. Di van salan de

⁵⁵ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 143.

⁵⁶ Arjen Arî, *Antolojiya Helbesta Bakur*, Çapa Yekem, Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd, Duhok, 2007, r. 62.

⁵⁷ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 142.

⁵⁸ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 152.

⁵⁹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 144.

rojname piştî du sê rojan digihêjin Farqînê. Rojnameya *Ulusê* di nav esnafan de li gorî rojnameya *Köylüyê* zêdetir tê xwendin. Ji bilî van her du rojnameyên ku zêdetir tî xwendin, rojnameyên wek *Cumhuriyet*, *Vatan*, *Sabah*, *Akşam*, *Tercüman*, *Hürriyet*, *Akbaba û Hayatê* jî li Farqînê tî xwendin û kiryarên wan hene.⁶⁰

Barnas di nava malbata xwe de bêhtir di bin bandora bavê xwe dimîne. Ji ber ku bavê Barnas mela ye û perwerdeya medresê girtiye, Barnas ‘zewqa lezeta şî’ra klasîk a Kurmancî’⁶¹ jî bavê xwe werdigere. Ji bilî medreseyê bavê Barnas jî pedagojiya qursên “Millet Mektebi”yê (Dibistanên Gel) jî sûd wergirtiye. Barnas xwendin û hişmendiya bavê xwe wisa şîrove dike:

“Bavê min neçûbû xwendegehê, lê di demek navbera 1930-1940 de bi navê ‘Millet Mektebi’ qursên hînkirina xwendin, nivîsandin û w.d. ya bi şevê didan ku ew çûbû wê. Hingê min fehma pirsînê nedikir ka ew qurs çend şev an çend meh ajotibû an mufredata wê çibû? Tiştê ecêb bû ku ez di lîseyê de bûm jî di hin waran de zanîna min a li ser dîrokê bi qasî ya wî tunebû, destnivîsa min wek ya wî xweşik nedihat. Herçend mele bû jî di medresê de dersa dîrokê nemaze ya Tirkan û dersa destnivîsê nedidan.”⁶²

Yek ji wan kesên ku bandora wî li ser kesayetî û têgihiştina Barnas dibe Îsa Şans⁶³ e. Îsa Şans di van salan de li Farqîna biçûk (1962) doza mafê xwendin û nivîsandina Kurdî dike. Berî ku malbata Barnas jî Farqînê bar bike û here Diyarbekirê (1960), Barnas Îsa Şans nas dike. Îsa Şans xwediyê rojnameya *Silvan Sesi* (Dengê Sîlvane) ye. Lê ew hem tîprêz e, hem çapker e, hem nûçegihan e, hem gerîndeyê berpirsyar e û hem jî sernivîskarê rojnameya *Silvan Sesi* ye. *Silvan Sesi*, rojnameya yekem e ku li Farqînê derdikeve û bi xêra wê çapxaneyê Gutenberg xwe digihîne Farqînê jî. Rojname ji du rûpelan pêk tê ku ev her du rûpel jî li ser dîwarê fetwaxanê tî daliqandin û jî aliyê Farqîniyan ve tî xwendin. Farqîn bi saya

⁶⁰ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, r. 145.

⁶¹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, r. 138.

⁶² Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, r. 145.

⁶³ Îsa Şans an jî Îsa Ruhi Silvanî helbet di rojnamegeriya Farqînê de xwedî cihê girîng e û di rojnameya *Dicle-Firatê* de jî cih girtiye û hin nivîsên wî di *Dicle-Firatê* de weşiyane. Rojen Barnas di pirtûka xwe ya *Farqînê* de, di bin sernivîsa xwe ya “Îsa Şans û rojnameya *Silvan Sesi*” de bi dirêjahî behsa Îsa Şans, rojnamegerî û aqûbeta wî dike. Di vê nivîsê de, li gorî têgihiştina me, ji ber bandora wî ya li ser Barnas me hin agahî dane ku me xwestiye bi van agahiyan em mijara xwe zelaltir bikin. Ji bo berfirehî binêre: Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, “*Îsa Şans û rojnameya *Silvan Sesi*”, r. 149.*

rojnameya Îsa Şans dibe xwedî rojname û çapxane. Tê dîtin ku bi derketina vê rojnameyê re, Barnasê ku vê demê panzdeh an şanzdeh salî ye û xwe wek “xortekî romantîk” dibîne, şahiyek di nava wî de dikele.

Îsa Şansê Kurdperwer ku di her nivîsa xwe de çend bêjeyên Kurmancî bi kar tîne, guhê Barnas li Kurdî vedike. Îsa Şansê “Farqînperest”⁶⁴ behsa dîroka Farqînê ji Barnas re dike. Îsa Şans “berhevkarê folklora Kurdî”⁶⁵ ye ku Barnas çîroka “Kurê Pîrê û Heft Dêw”⁶⁶ ji wî dibihîse ku ev çîrok yek ji wan xebatên Barnas ên edebiyata gelêrî ye û ev çîrok derbasî kaxezê kiriye. Ji ber ku Barnas di havîna 1960î de bi qasî du mehan wek şagirdê li ber destê Îsa Şans dixebite, bêguman bandora Îsa Şans û rojnameya wî li ser kesayetîya Barnas û tîkiliya Barnas ya bi nivîsê re dibe.⁶⁷

Heta 1965an li Farqîn û Diyarbekirê hin bûyer û tevgerên din pêk tên ku ev bûyer û tevger li ser Kurdperwerî û şoreşgeriya Barnas dîsa bi awayekî erênî bandorê dikin. Helbet Barnas van bûyer û tevgeran hem bi xwe dibîne û hem jî ji bîranên hin kesên Farqînî hîn dibe. Hukumeta vê serdemê dixwaze bi kampanyaya “Vatandaş Türkçe Konuş” (Welatîno bi Tirkî biaxivin) Kurdan ji çand û zimanê wan dûr bixe û wan asîmîle bike. Barnas bi xwe jî pankartên “Vatandaş Türkçe Konuş” li ser camekanên dermanfiroş, dikan û mexazayên curbicur ên li Diyarbekirê dibîne. Em dikarin bibêjin ku ev dîmen, Barnas hîn bêhtir ber bi kurdî ve dibin.

Di van salan de hin bûyer û gotinên din jî hene ku bandoreke mezin li Barnas dikin. Li Diyarbekirê rêvebirê Sumerbankê nahêle ku karmendên bankê bi mişterîyan re bi Kurdî biaxivin. Cemal Gürsel Paşa jî, ku Barnas wî wek “Kurdnijad” bi nav dike û di vê serdemê de wek “Kürt Cemal Axa” tê nasîn, ji Kurdan re dibêje: “Yê ku ji te re bêje Kurd tif li ser çavên wî bike” Barnas di wê fikrê de ye ku dixwazin bi van kirin û gotinan Kurdbûnê li ber çavên Kurdan reş bikin û wek ku Kurdbûn sûc, guneh û eybek be, bi Kurdan bidin zanîn.

Helbet hin Kurd di bin bandora van gotinan de dimînin, lê hin xortên Kurdan yê vê serdemê jî van kirinan wek hovîtî û asîmîlasyonê dibînin. Lewre li himberî

⁶⁴ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 150.

⁶⁵ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 153.

⁶⁶ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 211.

⁶⁷ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 150.

van gotin û kirinan tevdigerin. Hinek ji wan hîn bêhtir bi Kurdî diaxivin, hinek navên Kurdî li zarokên xwe dikin, hinek hîn bêhtir li radyoyên Kurdî guhdar dikin. Ango li hemberî vê nemirovatiyê derdikevin û kesayetiya xwe ya neteweyî diparêzin û ji Kurdbûna xwe şerm nakin, berevajî vê yekê xwe bi Kurdbûna xwe serbilind dibînin û ev Kurdperwer bi van bertekên xwe ji tevgera siyasî û civakî re dibin rêber.⁶⁸ Di nav van xortên ku li hemberî van kirin û gotinan derdikevin, hin xortên Farqînî jî hene ku Barnas bertekên wan yên van salan wek şoreşekê bi nav dike.

“Li Farqînê jî ji van gencên ber bi çav Mele Evdilkerîm, Mele Mehmûd, Muhterem, Mehdî Zana, Şêxê Zirav, Şêx Mehmûd, Şêx M. Şîrîn, Mele Xelîlê Şêx Birahîm, Şêx Mihemed Şakir û w.d. hebûn. Di mîtîngan de bi kurmancî şî’rên Cegerxwîn xwendin hingê wek şoreşek bû ku wan jî ev dikirin.”⁶⁹

Rojen Barnas di dawiya salên 1950yî de bi Tirkî dest bi nivîsandina helbestan dike. Helbestên wî di kovar û rojnameyên ku li Diyarbekirê çap dibin de diweşin. Rojen Barnas di van kovar û rojnameyan de wek helbestvan û nivîskarekî ciwan tê nasîn. Ji ber wan sedemên ku me li jor diyar kirin, em dikarin bibêjin ku piraniya helbestvan û nivîskarên Kurd yên van salan bi Tirkî dest bi nivîsandinê kirine. Rojen Barnas destpêka xwe ya nivîskariyê wisa radigihîne:

“Min ji sala 1958-59an pêde dest bi nivîsandina şî’ran kir. Ji 1961ê pêde şî’rên min di 5 rojname û 2 kovarên edebî-hunerî yên Diyarbekirê de çap û belav dibûn. Di forma berhemên edebiyata dîwanî û gelêrî ya tirkî de bûn. Biyografiya min ji wan kovaran di yekê de çap bû. Bêguman ev şî’rên min bi tirkî bûn. Herdû rojnameyên wek Gökalp û Şehir ne tê de, wek dinê ji aliyê temamê rojnameger û çapkerên nav Diyarbekirê ve wek şair û nivîskarekî gênc dihatim nasîn. Min hem şî’r û hem jî nivîs dinivîsîn.”⁷⁰

Têkiliya Barnas di salên 1963-65an de li Diyarbekirê bi rojnameyên bi navê *Demokrasiye Güven*, *Dicle*, *Diyarbakır*, *Mücadele* û *Yeni Yurt* re xurt e. Lê danûstandina Barnas bêhtir bi *Demokrasiye Güven* re û kovargerîya wê ya edebî bi

⁶⁸ Barnas, **Farqîn (Silvan/Silîvan)**, r. 161.

⁶⁹ Barnas, **Farqîn (Silvan/Silîvan)**, r. 163.

⁷⁰ Rojen Barnas, **Şî’r-1**, Çapa Yekem, Nûdem, Järfälla (Swêd), 2002, r. 11-12.

Karacadağ Mecmuası re ye ku piştre navê wê dibe *Güven*. Barnas di vê rojnameyê de wek nivîskarekî tê nasîn û bi saya vê nivîskariyê gelek kesan nas dike ku ev kes di van salan de wek rojnameger, helbestvan, nivîskar û entelektuel tînan nasîn.⁷¹

Piştî ku Barnas zanîngehê diqedîne, malbata Barnas jî di havîna 1966an de ji Diyarbekirê vedigere Farqînê.⁷² Ango malbat di navbera salên 1960-1966an de li Diyarbekirê dijî. Şeş salên li Diyarbekirê û xwendina zanîngehê bîr û baweriya Barnas xurttir û kûrtir dike. Di salên zanîngehê de tîkiliyên Barnas bi Kurdperweran re her ku diçe qewîntir dibe û Barnas di vî warî de dikemile ku ev kemilandin berê Barnas dide nivîsandina helbestên bi Kurdî. Barnas vê tîkiliyê xwe ya bi Kurdperweran re wisa vedibêje:

“Di 1964-1965an de bi awakî siyasî-fîkrî rastî rojhilatperwer, çepverûyên rojhilat û Kurdperweran hatim. Di wê demê de li Diyarbekirê buroya Seîd Elçî û dikana pirtûkfroşî ya nivîskarê Îslamiyet Açısından Şeyhlik ve Ağalık muftiyê Qulpê yê berê M.Emin Bozarslan mîna kewara mêşên hingiv ji çûnûhatina kesên navdar dixebitîn. Ez jî yek ji mudawimên her du cihan bûm. Seîd Elçî ji tevgera 49an bû û seydayê Muftî bi pirtûka xwe li tevahiya Tirkiyê wek “aydın din adamı” nav dabû ku ji aliyê çepverû û Kurdperweran ve dihate hez kirin. Li van her du cihan ez rastî gelek kesan hatim ku hin di çapa Kurdistanê û hin di çapa Tirkiyê de navdar bûn. Bi qasî çend deqîqeyan be jî wek guhdar beşdarî sohbetên wan dibûm, ji dîtînan wan ên erênî yan neyînî min li gorî fem kirina xwe ders hiltanî.”⁷³

Di van salan de û bi saya van kesên ku tevî sohbetên wan dibe Barnas digihîje wê biryarê ku dewlet ne tenê li hemberî hebûna Kurdan ya fîzîkî ye û dibîne ku dewlet dixwaze nasnameya Kurdî, zimanê Kurdî û çanda Kurdî hem ya devkî û hem jî ya nivîskî bibire û ji holê rake.⁷⁴

Dîsa di van salan de axaftina bi Kurmancî, nivîsandina bi Kurmancî û guhdarkirina stranên Kurmancî qedexe ye. Lê berhemên çanda Kurdan wek cil û

⁷¹ Adsay, *Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS*, r.76

⁷² Barnas, *Kadiz*, r. 15.

⁷³ Barnas, *Kadiz*, r. 14.

⁷⁴ Barnas, *Kadiz*, r. 14.

berg, govend û dîlan, xwarin û vexwarin û stran û kilamên wan li Tirkî tèn wergerandin û di merasîmên dewletê de serbest tèn xwendin. Kurd ji Cemal Gürsel re dibêjin: “Cemal Axeyê Kurd” lê nikarin bibêjin: “Ez Kurd im.” Ev înkâr, qedexa û asîmîlasyon Barnas diêşînin û dibin sedem ku Barnas bi rêya bikaranîna ziman û kultura devkî û nivîskî helwest werbigere.⁷⁵ Tê dîtîn ku Barnas vê helwesta xwe bi cih tîne ku jixwe biryara herî xurt helbestên wî ne.

Ji bilî van sedemên civakî û siyasî, helbet gelek sedemên şexsî jî hene ku berê Barnas dane û didin helbestê. Lê em dikarin bibêjin ku ev sedemên civakî û siyasî dibin pêlika ewilî ji bo helbesta Barnas û têkiliya wî ya bi huner û edebiyatê re jî ji ber van sedeman dest pê dibe.

Ji ber van sedemên li jor Barnas jî biryar dide li çî cihê ku derfet hebe û xisar negihêje tu kesî bi Kurmancî bipeyive, bi Kurmancî bistre û li Kurmancî guhdar bike û bide guhdarkirin.⁷⁶ Ji bilî vê biryarê Barnas biryareke din ya radîkal dide ku ev biryara radîkal dibe sedema helbestnivîsîna wî. Barnas ji ber van sedeman bi “rik û înad” dev ji nivîsandina xwe ya pêşveçûyî ya Tirkî berdide û dest bi nivîsandina helbestên bi Kurmancî dibe. Arjen Arî jî sedema helbest nivîsandina Barnas ya bi Kurmancî bi têkiliya wî ya aktîf ya ku bi tevgerên Kurdperweran ve girê dide.⁷⁷ Lê herçiqasî Barnas biryara xwe ji ber vê rewşa li jêr bide jî li gorî dîtina me ev sedem hemû bi hev ve girêdayî ne.

“Dewlet bi serê xwe bi tenê me asîmîle nake, ew türkücü/şarkıcı yê kurdnîjad ên stranên me werdigerînin tirkî û li ser navê hemşerîtiyê bi me didin guhdarî kirin, ew şair an nivîskarên kurdnîjad ku erfûedetên me bi tevlêkirina hin bêjeyên kurdî bi tirkî dinivîsînin û li ser navê rojhilatperwerî yan hemşerîtiyê bi me didin hezkirin, me ji dewletê deh car bêhtir dihêlînin. Wisa be ku bi ya min wisa ye: 1. Ez êdî nabim yek ji wan diranên çerxa asîmîlasyonê; ji name yan nivîsên resmî û zarûrî pêve êdî bi tirkî nanivîsînim,

⁷⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 14.

⁷⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 14.

⁷⁷ Arî, **Antolojiya Helbesta Bakur**, r. 62-63.

2. Heta ji min bê ezê hêza xwe bidim ser zimanê xwe, pê bipeyivim, pê binivîsim, pê bistrêm û guhdarî bikim.”⁷⁸

Ango, Barnas ji ber kirinên dewletê ku dewlet dixwaze Kurdan asîmîle bike û têgihîştina xwe ya ku “bi zimanekî din nivîsandin tu caran alîkariya zimanê Kurdî nake û ji dêvla ku xizmeta zimanê serdestan bikim ez ê xizmeta zimanê xwe bikim” dev ji nivîsandina xwe ya pêşveçûyî ya helbestên bi Tirkî berdide û berê pênuşa xwe dide Kurmancî. Barnas helbestên xwe yê ewilî yê bi kurdî ku bi îmzeyê Şêrgo Ciwanroj dinivîsandin, li boruya Said Elçi û li dikana M. Emin Bozarslan ji Kurdperwerên pêbawer re dixwîne.⁷⁹

Di navbera salên 1960 û 1966an de Barnas li Diyarbekirê ye û di heman demê de di navbera van salan de xwendina xwe ya zanîngehê jî dike. Di van salan de têkiliya Barnas bi çepgir û Kurdperweran re zû çêdibe. Ji ber vê zûbûnê nêrîna wî ya li dinyayê û civakê dikeve asteke din. Di salên 1964 û 1965an de bi awayekî siyasî-fîkrî rojhilatperwer, çepverûyên rojhilat û Kurdperweran dinase. Di vê demê de seriyên ji buroya Said Elçi qut nake û dibe endamê dikana pirtûkfiroşiyê ya M. Emin Bozarslan. Barnas li van her du cihan bi gelek kesên navdar re têkiliyê datîne.⁸⁰

Di salên 1964 û 1965an de, bi nasîna van Kurdperweran re Barnas jî ber bi Kurdperweriyê ve diçe. Barnas digihîje wê baweriyê ku bi Kurdî nivîsandina her nivîsareke bedew, her helbestekê, her stranekê xizmeta Kurdî geştir dike û çerxa asîmîlasyonê dişikîne. Ji ber ve fikrê Barnas biryarê dide ku nebe xizmetkarê asîmîlasyonê li ser zimanê Kurdî.⁸¹ Li hemberî vê heta ku jê tê di rêgeha mekanîzmaya ziman û çandê de têdikoşe û em dikarin bibêjin ku Barnas bi helbesta xwe jî vê fikrê û baweriyê xwe diçespîne.

Di salên 1970yî de helbestnivîsîna bi Kurmancî bi serê xwe sekneke mezin e û Kurdperwerên ku pêşeroja gelê xwe di zimanê gelê xwe de dîtine dest avêtine nivîsîna bi Kurmancî. Rojen Barnas jî yek ji van Kurdperweran e. Li gorî nivîsa “*Ka bêje Rojen Barnas kî ye çima ew bi Kurdî şûran dinivîsîne?*” ya Faris Medenî Marsil

⁷⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 14-15.

⁷⁹ Barnas, **Şî'r-1**, r. 14.

⁸⁰ Barnas, **Şî'r-1**, r. 12.

⁸¹ Çelîk, **Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas**, r. 39.

ku behsa destpêka kovara Devrimci Demokrat Gençlikê (DDG) û rewşa Kurdperwerên van salan dike, tê dîtin ku hem haya Barnas ji kirinên dewletê heye û hem jî bîra pêşeroja gelê xwe dibe.

“Tenê di kovarê de hin şîr bi navê Rojen Barnas dihat çapkirin ew jî wexta ji bo kovarê, diçûm emnîyetê, komîser gelek li ser wî navî disekînî digot, ka bêje ev kî ye, çima bi Kurdî dinivîsîne. Herçiqas min ji wan re bi tirkî digot; mahna wê ‘ağır yükü taniyan gün’ e, aciz dibûn; digotin, belkî ez bi wan henekan dikim. Lê min henekan nedikir, mahneya navê wî qasî ku min fêm dikir, wedigerand tirkî. Lê wan navê wî yê rastî dipirsî. Wê gavê min di dilê xwe de digot evqas nivîs hene, çima ew tenê li ser nivîsên Kurdî disekin. Wer xuya bû ji bo dewletê zêde ne muhîm bû ku tu bi tirkî binivîsînî û bi tirkî dewlet û berpirsiyên wê rexne bikî ya jî pesnê sosyalîzmê û li dijî emperyalîzmê bî. Dewlet bi Kurdî nivîsandinê ji bona xwe hin xetertir didît û li pey wan kesan bûn ku ew çî kes in ku bi Kurdî dinivîsîn. Zimanekî qedexekirî wexta derbasê nivîsê bibe êdî ew zimên wenda nabe û bi nivîsandinê pêş dikeve, dewlet vê yekê baş zanibû lê ji bo me Kurdan bi tirkî ajitasyon hesantir bû; me ne qîmeta Kurdî dizanibû û ne jî zêde ji me re girîng bû.”⁸²

Piştî ku Barnas xwendina xwe temam dike di sala 1966an de malbata Barnas jî ji Diyarbekirê vedigere Farqînê. Helbest-nivîsandina Barnas ya bi Kurmancî li Farqînê jî didome lê di van salan de kesî ku van helbestên xwe ji wan re bixwîne û cihekî ku tê de biweşîne tune. Jixwe civak û derdora Barnas jî ji bo helbestên wî ne amade ye ji ber ku ji bilî ahenga helbestên Cegerxwîn guhê tu kesî ji helbesteke din re ne amade ye.⁸³

Barnas di 1966an de zanîngehê diqedîne û wek hînkare koma edebiyatê dest bi kar dike û li hin dibistanên navîn û li Lîseyê Silîvanê dixebite.⁸⁴ Barnas di salên zanîngeh û karmendiya xwe de tevî xwepêşandanên civakî û siyasî dibe. Ji bo pêşketina civaka xwe her dem di nava liv û tevgerê de ye û bi baldarî tevî

⁸² Faris Medenî Marsil, **Ka bêje Rojen Barnas kî ye çima ew bi Kurdî şîran dinivîsîne?**, 2013, neynik@Kurdinfo.com, nêrîna dawî: 17.04.2015.

⁸³ Barnas, **Şîr-1**, r. 14.

⁸⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 4.

gengeşeyên ku ji bo civakê tên kirin dibe ku tu carî çav û guhên xwe ji wan re negirtiye.

Barnas di bihara 1966an (08.05.1966) de bi pêşniyara Mehdî Zana tevli mîtînga Farqînê dibe. Mîtîng ji ber protestoya xeta petrolê ya ku bi rêya boriyan wê bikişînin Ceyhanê, pêk tê ku dixwazin li herêmê jî parzûnxaneyek bê çêkirin û bi hezaran kesên betal û belengaz tê de bixebitin. Barnas ji bo tevlibûna mîtîngê li enstîtuya perwerdehiyê tevdigere û bi xwendekarên enstîtuyê tevli mîtîngê dibe. Barnas di vê mîtîngê de axaftinekê li ser belengaziya Rojhilat dike.⁸⁵

Di 1967an de Barnas li Madenê navçeya Elezîzê mamosteyê dibistana navîn e. Di betlana havîna vê salê de Barnas jî li Farqînê ye. Vê havînê ji ber nivîsên Nihal Atsız yên di derbarê Kurdan de, Kurdperwerên Kurd mîtîngê li dar dixin ji bo ku van nivîsan şermezar bikin. Herçiqasî belavoka vê mîtîngê ji aliyê TÎPa Diyarbekirê hatibe guhertin jî Barnas bi xwe vê belavokê dinivîsîne. Mîtîng li herêmê wek mîtînga Kurdan deng vedide û Kurdperwerên vê serdemê li Farqînê mîtîngeke mezin li dar dixin. Yek ji van Kurdperwerên ku tev li vê mîtîngê dibe Mûsa Anter e ku Barnas wî di vê mîtîngê de dinase.⁸⁶

Ji bilî van her du mîtîngên mezin Barnas di heman salan de beşdarî mîtîngên Diyarbekir, Siwêreg, Hîlwan û Hezoyê dibe ku hin ji van mîtîngan jî ber rewşa siyasî ne û hinek jê jî carina dibe protestokirina qeymeqamekî ku erza merivekî şikandiye û bi ser de jî lê xistiye.⁸⁷

Wek ku li jor jî tê dîtin Barnas piştî ku dest bi mamostetiyê dike, têkiliyên xwe ji civaka xwe û ji Kurdperweran qut nake. Barnas her dem û her kêlî di nava tevgerê de ye. Di van salan de li hemberî pelçiqandina dewletê xwedî tevger e. Di sala 1969an de beşdarî hereketa Dr. Şivan (Sait Kırmızıtoprak) dibe û di rêxistina herêmê de cih digire. Lê li gorî ku Barnas dibêje, di nava van rêxistinan de du carî cih digire ku ev cihgirtin jî pir kurt didomin û piştî kuştina her du Seîdan dev ji siyasetê berdide.⁸⁸

⁸⁵ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 165.

⁸⁶ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 165.

⁸⁷ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 166.

⁸⁸ Çelîk, **Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas**, r. 39.

Barnas di salên karmendiyê de tevî partî û sendîkayên nêzî ramanên Kurdperweran dibe. Ji ber ku ew di nava van partî û sendîkayan de hinekî din bi awayekî legal dikare xwe îfade bike, di nava rêveberiya van partî û sendîkayên van salan de jî cih digire. Di van salan de partiya ku Kurdperwer dikarin xwe tê de herî baş îfade bikin partiya TÎPê (Türkiye İşçi Partisi) ye. Barnas jî wek Kurdperwerekî di partiya TÎPê de cih digire ku ew sedemên tevîbûna xwe wisa radigihîne:

“Li hember partiyên siyasî yên legal wek AP, CHP û YTP ku li herêma me TÎP xwe nesparta Kurdperweran û doza Kurdî, tu şensek wê yê cihê piyê xwe kirinê tunebû. Keysa xebata Kurdperweran a di partiyên din de ku herin propaganda bikin jî tune bû. Loma li cihên mîna Farqînê kesên mîna Mele Ebdulkerîm û Muhterem⁸⁹ tê de cih digirtin. Li nav xelkê û li gundan digerin propagandaya partiyê bi kurmancî dikirin, şî'rên Cegerxwîn dixwendin. Partiya herî dilsoz a nêzîkî Kurdan YTP bû ku tê de îmkana xwendina şî'rên Cegerxwîn an propaganda bi kurmancî ya li dijî sîstema kevneperest a şêxîfî-axatîyê ne gengaz bû. Loma TÎP nêzîktirî me bû.”⁹⁰

Ji ber vê yekê herçiqasî cih û roleke Barnas ya fermî di partiya TÎPê (Partiya Karkerên Tirkîyeyê) de tunebe jî, di ger û çûnên kongre û hîlbijartinan de bi Kurdperweran re di nava TÎPê de cih digire ku Kurdperwer jê re dibêjin: “Bi hatina te xelq bêhtir bi me bawer dikin.” Hem ji ber ku di vê serdemê de ciheke din tune ku Kurdperwer dengê xwe lê derxin û doza Kurdî bikin û hem jî ji bo ku ev bawerî xurttir bibe, Barnas bi Kurdperweran re beşdarî van çalakiyên TÎPê dibe: mîfînga Qulpê ya 1969an, bi Mehdî Zana re kongreya TÎPê ya Hezoyê, ji bo deng xwestinê çûyîna gundên çiyê û gundên deştê.⁹¹

Di 4ê Kanûna 1967an de Barnas ji Madenê tê Farqînê û li dibistana navîn dest bi mamostetiyê dike. Piştî ev dibistana navîn dibe lîse û Barnas jî êdî li lîseya Farqînê dibe mamoste. Di heman salê de şaxa TÖSê (Sendîkaya Mamosteyên Tirkîyeyê) li Farqînê heye û ji ber ku Barnas di van salan de vê sendîkayê wek

⁸⁹ Mele Ebdulkerîm Ceyhan û Muhterem Biçimli di van salan de li Farqînê du Kurdperwer in û di nava gel û mîfîngan de propagandaya Kurdî dikin ku Muhterem Biçimli hevalê Rojen Barnas yê dibistana seretayî ye. Ji bo kurte jiyana wan binêre: Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 168-169.

⁹⁰ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 167.

⁹¹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 167.

navendeke pêşverû dibîne di payîza 1968an de dibe serokê TÖSa Farqînê. Di dema serokatiya Barnas de hin tevgerên erênî çêdibin. Barnas ji ber van tevgeran jî tê darizandin. Yek ji van tevgeran Meşa Mezin a Hîndekariyê (Büyük Eğitim Yürüyüşü) ye ku di 15ê Sibata 1969an de li Ankarayê çê dibe. Ya din jî Boykota Mezin a Mamosteyan (Büyük Öğretmen Boykotu) e ku ev jî di 15-18ê Kanûna 1969an de ji aliyê sendîkayên İLK-SEN û TÖSê ve pêk tê. Telgrafa biryara vê boykotê dereng bikeve destê Barnas jî li navenda Farqînê hejmarek baş tevlî vê boykotê dibin.⁹² Tam di van rojan de rêvebirê dibistanê biryar daye ku Barnas bike alîkarê xwe û pêşniyaza xwe ji Barnas re eşkere dike. Wê Barnas bibe alîkarê rêvebir lê bi şertê ku tevlî boykotê nebe. Barnas pêşniyaza rêvebir dinirxîne û piştî biryara tevlîbûnê dide. Bi biryara tevlîbûna vê boykotê re hem alîkariya rêveberiyê ji destê Barnas diçe û hem jî dibe sedem ku Barnas surgun bibe. Piştî vê boykotê li Barnas û li hin kesan lêpirsîn tê vekirin û berê wan didin dadgehê. Ji dadgehê biryara surgunê derdikeve û di payîza 1970yê de berê Barnas didin Surûcê.

Barnas ji 1968an heta payîza 1970yê ango heta ku sirgunî Surûcê dibe li Farqînê serokatiya TÖSê dike. Berî ku Barnas surgunî Surûcê bibe bûyereke din di 8ê Nîsana 1970yê de li Farqînê diqewime ku bi vê bûyerê re rengê kesayetiya Barnas a Kurdperwer derdikeve holê û ev yek êdî ji aliyê rêvebirên dewletê ve jî bi awayekî eşkere tê zanîn.

Di vê rojê de Farqîn ji aliyê komandoyan ve ji çar aliyan tê dorpêçkirin. Mêrên ji heft salî mezintir bi darê zorê li kampan dicivînin ku doza çekanîne li wan dikin. Ji ber vê bi destûra leşkerî li ser devûrê wan kaş dikin, qûnkaşkî dikin, wan li ser çarlepikan dibezînin û bi qazkî wan dimeşînin. Helîpkoter li ser Farqînê dikin qîjeqîj û leşker li kûçeyan gel kom dikin û berê wan didin kampan.⁹³

Di vê rojê de Barnas jî diçe sûkê û li ber deriyê dikanekê rûdine. Qeymekam û dozgerê ku di sûkê re dimeşin û her kes ji ber wan radibe û dikeve “selamê.” Barnasê ku van kesan wek kesên kolonyalîst bi nav dike, ji ber wan ranabe û li aliyê wan jî nanihêre. Piştî çend rojan qeymeqam tê serdana dibistanê û li odeya mamosteyan bi kêfxweşî behsa dorpêçkirina Farqînê dike û pesnê qomandoyan dide.

⁹² Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 170.

⁹³ Barnas, **Farqîn(Sîlvan/Silîvan)**, r. 173.

Ji bilî Barnas her kes vê dorpeçkirin û pesinandina qomandoyan “baş dibîne” û piştgiriya qeymeqam dike. Qeymeqamê ku dibîne Barnas bala xwe nade wî, ji Barnas re dibêje ma ne wisa ye? Barnas li hemberî qeymeqamê kolonyalîst derdikeve û li hemberî vê pirsê vê bersivê dide ku em vê bersivê wek nepejirandina kolonyalîzmê dibînin: “Na ne wisa ye. Nufûsa Farqînê çil hezar e. Ma ev çil hezar gişt çekdar in? Yên ku bi şev çek berdidin kî ne? Ne ev ji aliyê polîsan û cendirmeyan ve tîn zanîn, hûn çima di wextê de dest danaynin ser wan, wan kesan nagirin? Rewşa îro ne bi awayê tu dibêjî, ya îro bizdandin û zulma li ser xelqekî ye. Tiştê ku îro li Farqînê çêdibe, li kolonyên Afrîkayê jî nehatiye dîtin.”⁹⁴

Piştî vê nîqaşê Barnas û qeymeqam li odeya mamosteyan hinekî din jî dikevin qirika hev û gava ku qeymeqam ji odeyê derdikeve li Barnas dizîvire û dibêje: “Bawer meke ku ev ewê ji te re wisa bi rehetî bimîne, ji xwe li ser çûnê hezira min ev bû ku raporek baş li ser te amade bikim, lê te ev îro heq kir.”⁹⁵ Barnas jê danaqurtîne û lê vedigerîne: “Tiştê ji destê te tê teqsîr meke!” Piştî vê diyalogê hin mamosteyên hevalê Barnas jê dixwazin ku here lêborîna xwe ji qeymeqam bixwaze. Lê ji ber ku Barnas van kirin û gotinan wek zulm û tadeyeke mezin dibîne û hew hedar û debara wî tê lewre meseleyê ne wek meseleyeke şexsî dibîne û lêborîna xwe ji qeymeqam naxwaze.

Ji ber van bûyerên ku di 8ê Nîsana 1970yê de li Farqînê diqewimin, welatperwer û Kurdperwerên vê demê yê Farqînê haya TÎPa Diyarbekirê jê çêdikin û dixwazin ku partî serî li parlametoyê bixe. Bi vê armancê metnekê amade dikin ku Barnas jî vê metnê îmze dike. TÎP vê metnê dibe meclîsê û ji DDKOya Stenbolê, ji DEV-GENÇa Diyarbekirê, ji Ankarayê Oya Baydar û grûba xwe û ji TÖSa Siwêregê çend mamoste tîn li Farqînê digerin û bûyerê ji gel hîn dibin.⁹⁶

Li gorî ku me li jor diyar kir Barnas ji ber boykota TÖSê sirgun dibe. Lê piştî vê bûyera ku li Farqînê diqewime tê dîtin ku Barnas bi xwe jî nema dizane ne ji ber

⁹⁴ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 174.

⁹⁵ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 174.

⁹⁶ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 175.

rapora Fuat Uğur⁹⁷ ku gef li Barnas xwaribû û ne jî ji ber lêkolîna îdarê ya li ser boykotê di payîza 1970ê de surgunî Surûcê dibe.⁹⁸

Ji ber ku her du bûyer nêzî hev diqewimin, em dikarin bibêjin ku her du bûyer jî dibin sedemên surgunkirina Barnas. Piştî ku Barnas surgunî Surûcê dibe jî ranaweste û karê xwe berdewan dike. Li Surûcê şaxa TÖSê jixweber hatiye girtin. Barnas bi Ankarayê re dikeve têkiliyê û piştî çend nivîsên fermî şaxa TÖSê bi rêkûpêk dike û vedike.⁹⁹

Barnas bi biryara “Danişta”yê re di 31.03.1971 de careke din vedigere ser karê xwe yê berê yê li Farqînê. Bi vê biryarê re Barnas ji surgunê vedigere û Kurdperwer dixwazin vê carê jî Barnas bikin endamê DDKOyê (Devrimci Doğu Kültür Ocağı). Barnas herçiqasî ji wan re dibêje: “Ez karmendê dewletê me, di lîseyê de mamoste me, mehzûra wê heye.” jî Kurdperwer israr dikin û dixwazin Barnas bikin endam û dibêjin: “Endamtiya te ew ê prestîja komela me bilind bike û pê endamên me zêdetir bibin.”¹⁰⁰ Li ser israra Kurdperweran Barnas bernameya komeleyê dixwaze, dixwîne û dibîne ku tiştêkî berbiçav û rasterast zerarê bide karmendiya wî tune. Ew jî radibe û daxwaznameya endamtiyê îmze dike û dide wan.¹⁰¹

Piştî herçiqasî Barnas ji ber vê endamtiya komeleyê bê girtin jî, em dibînin ku Barnas tenê bi daxwaznameyekê serî li komeleyê daye ku bibe endam. Lê hîn endamtiya Barnas ji aliyê rêveberiya komeleyê ve nehatiye pejirandin. Jixwe ji serlêdana Barnas û heta girtina komeleyê du hefte derbas dibin û di van her du hefteyan de tu çalakî û tevger ji aliyê komeleyê ve li dar neketine.¹⁰²

Di 1969an de DDKO li Diyarbekirê vedibe. Piştî Diyarbekirê li Farqînê jî şaxeke wê vedibe. Di van salan de herçiqasî DDKO wek ocaxeke Tirkî û di nava Kurdperwerên Farqînê de bi navê “şarge”(rojhilat) bê nasîn jî, Kurdperwer li vir dicivin û “xwerû bi Kurdî” tê de diaxivin û xwe li vir bi rêxistin dikin. Ji ber ku

⁹⁷ Qeymekamê vê demê yê Farqînê ye. Li gorî nivîsên Rojen Barnas “qeymeqamekî cir nexweş e ku gelek zulm û zordarî daye xelkê Farqînê.”

⁹⁸ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 175.

⁹⁹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 172.

¹⁰⁰ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 176.

¹⁰¹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 176.

¹⁰² Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 180.

Barnas nû ji Surûcê vegeyriyaye, tê dîtî ku haya wî ji şargê tune ye. Jixwe li ser pirsê ku Barnas ji Mele Ebdulkerîm dike rewş diyar dibe: “Min meraq kir “şarge” çi ye(...)? Mele Ebdulkerîm got, “wî ezîzê min, şarge yanî ocaxa tirkî ye û xwerû bi Kurdî ye.”¹⁰³

Di şeva 26/27ê Nîsana 1971ê de li tevahiya Tirkiyê rêvebirîya awarte (sıkıyönetim) îlan dibe. Serê sibeha 27ê nîsanê leşker davêjin ser malên Kurdperweran. Helbet Barnas jî di nava wan de ye. Di van salan de bi kesên ku tên girtin re wek delîl dest datînin ser pirtûkên wan jî. Lewre Barnas û pirtûkên wî jî pê re ku di nava pirtûkên wî de çend pirtûkên bi fransîzî jî hene, dibin qereqolê.¹⁰⁴ Di rê de ev diyalog di navbera fermanîdar û Barnas de derbas dibe. Ev diyalog hem xwedî derketina Barnas ya li Kurdî û hem jî redkirina Kurdî ya dewletê diyar dibe:

“Başçawîşê mufreze got: ‘xoce xuyan e fransîziya te baş e, min çend pirtûkên fransîzî di nav pirtûkên te de dîtî.’ Pirtûkên fransîzî yê birayên min bûn. Min got: Na! Çi bigire qet nizanîm. Vêca pirsî: Zimanê te yê biyanî çi ye? Min got: Ji wext dayîna hînbûna tirkî min zeman nedît ku hîna zimanekî dîtir bibim. Pirsî, got: Çima zimanê te yê dayîkî ne tirkî ye? Min got: Na! Zimanê min ê dayîkî Kurdî ye, ez tirkî paşiyê hîn bûm. Got: Wisa be tirkî dibe zimanê te yê biyanî, newisa? Min got: Tirkî zimanê resmî ye.”¹⁰⁵

Barnas û kesên ku hatine girtin tên berdan. Lê Barnas vê berdanê wek xapandinekê dibîne. Ji ber ku hin Kurdperwer reviyane û nehatine girtin. Lê haya Barnas ji vê yekê heye û hevalên xwe şîret dike. Kurdperwerên ku nehatine girtin biryarê didin ku xwe nedin dest û birevin û dixwazin ku Barnas jî bi wan re bê lê Barnas biryara xwe daye: “Ez bêm girtin jî neyê girtin jî bi derekî de naçim.”¹⁰⁶

Barnas hem li ser a xwe dimîne û hem jî wek wî derdikeve. Roja 5ê gulanê du polîs tên li deriyê wî dixin û wî dibin polîsyanê û ji wir jî dibin baregeha leşkerî (tugay). Li vir jê re tê gotin ku li DDKOyê tuzuk û bernameya PDKê û daxwaznameya endamtiya wî hatiye bidestxistin ku Barnas ji ber vê tê sûcdarkirin.

¹⁰³ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 176.

¹⁰⁴ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 176.

¹⁰⁵ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 176-177.

¹⁰⁶ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 177.

Herçiqasî li baregeha leşkerî Barnas vê sûcdarkirinê napejirîne û îtraz dike ku DDKO komeleyeke çandî û demokratîk e û di çarçoveya makeqanûnê de hatiye danîn jî, berê wî didin girtîgeha leşkerî ya rêvebiriya awarte.¹⁰⁷

Barnas di nava koma Farqîniyan¹⁰⁸ de tê darizandin û di 18ê gulanê de derdikeve dadgehê. Piştî ku tên darizandin wan dîsa dişînin girtîgehê. Ji ber ku Barnas bi xwe jî nizane bê ji ber çî tên darizandin, meraq dike û dipirse: “em ji ber çî li vê derê ne, sûcê me çî ye?” jê re dibêjin ku “li gorî îddînameyê ji maddeyên TCK yên 125, 141, 142, 163 û wd. tên sûcdar dîtin.”¹⁰⁹ Koma Farqîniyan piştî dîsa vedigerin girtîgehê ji parêzer Tehsîn Ekinci hîn dibin ku 125 îdam e, 141 jî 8 salan heta 15 salan hebsa giran e û 142 jî 7-8 sal hebs e.¹¹⁰

Dadgeh hê di dadgehkirina ewilî de biryara hevdîtin û serdana bi Barnas re qedexe dike ku tu kes ji malbata Barnas nikara bê hevdîtina wî. Herçiqasî di nava koma Farqîniyan de damezîrêner û rêvebirên fermî yên komeleyê hebin jî ev biryar tenê ji bo Barnas hatiye dayîn. Ji ber vê yekê Barnas her çend caran daxwaznameyê dide ji bo ku ev biryar bê rakirin, lê her carê ev daxwaz nayê pejirandin û rewş bi vî awayî heta teblîxata îddînameyê didome. Ji ber vê rewşê malbat û xalanên wî li ser paşnavên Mustafa Gemici û Yumni Budak, ku di vê demê ev her du kes jî li vir girtîne, tên serdana Barnas.¹¹¹

Wexta dadgehê tê û Barnas ji maddeya 142/5an tê dadgehkirin. Bersivên Barnas nêrîna wî ya li Kurdî û Kurdan derdixîne pêş û xalên ku bi îsrar li ser disekine kesayetiya wî ya Kurdperwer dide nîşandan ku ew ne li gorî xelaskirin û berjewendiyên xwe tev digere. Li dadgehê tê angaştîkirin ku Kurd tunene û bi navê Kurdî zimanek jî tune. Barnas vê angaştê napejirîne û dibêje: “Belê Kurd hene û hebûna Kurdan rastiyeke sosyal e. Herwisa zimanê min ê dayikê jî Kurdî ye.”¹¹²

¹⁰⁷ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 178-179.

¹⁰⁸ Di vê serdemê de, di ragihandinên fermî yên leşkerî de koma Farqînê wek “Bahri Evliyaoğlu ve arkadaşları (Bahri Evliyaoğlu û hevalên wî)” tê ragihandin. Ji bo berfirehî binêre: Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 179.

¹⁰⁹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 179.

¹¹⁰ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 180.

¹¹¹ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 180.

¹¹² Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, r. 181.

Di dadgehê de dozger Barnas ji ber endamtiya wî ya komeleya DDKOyê sûcdar dibîne û dibêje ku ev komele komeleyeke îllegal e û bi armanca nijadperestiyê hatiye avakirin û dozger îddîa dike ku destûr û bernameya PDK-Tyê li komeleyê hatiye bi dest xistin ku ev jî dibe sedema îddîaya nijadperestiya komeleyê. Lê divê em careke din bi bîr bînin ku endamtiya Barnas hîn nehatiye pejirandin. Helbet Barnas van îddîayan red dike û dibêje: “D.D.K.O li gorî rêûrêçîkek qanûnî û bi destûra dewletê hatiye danîn ku ez jî bûme endamê wê.” û “Li gorî zebta lêgerînê ya di lêgerîna serê sibeha 27ê nîsanê li komelê tiştêk wisa nehatiye dîtin û bidestxistin. Ew der vikîvala dibe, emniyet derî mor dike.” Barnas van îddîayên dozger wek “karekî tertîbkirî dibîne ku ji aliyê hêzên asayîşê ve hatiye tertîb kirin.”¹¹³ Ev gotinên Barnas jî vê tertîbê pûç dikin ku ev yek pir li zora dozgerê dadgehê diçe. Ji ber vê yekê dozger îfadeya Barnas ne wek ku dibêje qeyd dike û du salan heps li Barnas dibire.

Barnas û gelek Kurdperwerên ku di van salan de di rêveberiya TIP-DDKOyê de cih digirtin bi hev re girtî ne. Edip Karahan, Mehdi Zana, Kemal Burkay, Tarık Ziya Ekinci, Tahsin Ekinci, Şerafettin Kaya, Niyazi Osta, Mehmet Biçimli, Bahri Evliyaoğlu, Zeki Bozarlan, Vedat Erkaçmaz, Fikri Müjdecî, Akif Işık, Cüneyt Ceyhan, Fethullah Cüneyt, Yumni Budak û Mustafa Gemici¹¹⁴ hin ji van kesan in.

Rojen Barnasê ku hîn di salên zanîngê de bi asîmîlasyona zimên dihese û dev ji nivîsandina bi Tirkî berdaye, li girtîgehê jî xebatên xwe yê li ser ziman didomîne. Di vê demê de Îsmail Beşikçi jî bi Rojen Barnas re girtî ye û di heman qawîşê de ne. Barnas ji Îsmail Beşikçi fransîzî û Îsmail Beşikçi jî ji Rojen Barnas Kurmancî hîn dibe. Li ser pêşniyaza Beşikçi: “Ewê çawa be ku tu vê qursa kurmancî li xwaringehê ji bona hevalan jî bidî?”¹¹⁵ Barnas dest bi mamostetiya Kurmancî dike.

Qursa ku rewşa vê serdemê hinekî din zelal dike bi qasî 35-40 dersan didome bi operasyoneke mezin re ev qurs ji hev belav dibe û dersdayîna Barnas jî bi dawî dibe. Lê bi vê qursê re hem rewşa zimanê Kurdperweran diyar dibe ku zimanê sereke ne Kurmancî ye û hem jî tê dîtin ku nêrîna Kurdperweran ya di derbarê Kurmancî de hêdî hêdî tê guhertin

¹¹³ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, r. 182.

¹¹⁴ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, r. 178-184.

¹¹⁵ Barnas, **Farqîn (Sîlvan/Silvan)**, r. 185.

“Qursek bikêrhatî bû. Ew kesên ji ber kurmanciya xwe ya gelek teng a lokal heta hingê şerm dikirin bipeyivin, bi wê qursê re dest pê kirin êdî bi kurmanciya ji hev fahmkirinê peyivîn. Îsmâil xoce jî bi Xelîl axa û bi Mele Şebab re pratik dikir. Ev li xweşa Kurdperweran dihat, pê dilşad dibûn. Ebdurehmanê radyocî, Egît axa, Mele Şebab ji dûrve dinihêrtin û di bin simbêlan re dibişirîn.”¹¹⁶

Barnas û Kemal Burkay bi hev re tèn texliyekirin. Piştî Barnas ji hebsê derdikeve bi statuya ‘sakıncalı er’ dişînin eskeriyê. Piştî vegera leşkeriyê Barnas hîn dibe ku wezaretê hîndekariyê (MEB) tşkiliya wî bi biryara “hükmen emeklilik”ê ji karûbarê mamostetiyê û ji karê karmendiyê biriye.¹¹⁷

Barnas serî li “Daniştay”ê dixê û li ser îtiraza Barnas daniştay biryara wezaretê pûç dike û biryar dide ku Barnas vegere ser karê xwe. Tam di van rojan de jî lêborîna giştî ya sala 1974an derdikeve. Li gorî vê lêborînê, her tişt ji holê tê rakirin û hemû kesên sûcdar jî tèn buhurandin. Li gorî van biryaran tu sedem tuneke ku Barnas venegere ser karê xwe. Lê wezaretê hînkariyê biryarekê bi encumana rêvebiran distîne. Li gorî vê biryarê Barnas ji mamostetiyê tê dîrxistin û bi şertê ku Barnas li Burdur, Muğla an jî li Uşakê wek katibekî bixebite biryar tê stendin.¹¹⁸ Ev biryar berê Barnas careke din dide surgunê.

Barnas hem ji mecbûrî û hem jî ji ber aboriya xerab neçar dimîne ku şertê wezaretê hîndekariyê bipejirîne. Ji ber vê berê xwe dide Muğlayê. Ji 7ê Tîrmeha 1975an heta 19ê Adara 1979an li wezaretê hîndekariya Muğlayê “wek katibekî sade” dixebite.¹¹⁹ Barnas herçiqasî nêzî çar salan li Muğlayê bixebite jî tê dîtin ku her dem dixwaze vegere welat û li herêma xwe bixebite. Lewre em dikarin bibêjin ku bi hêviya vegeerê û “Bêriya Welat” ku dibêje: “Bêriya welat, di dilê min de/ Bêriya welat, şîşa sor kirî” li vê surgunê çar salan diqedîne.

Bi hêviya vegeerê û li ser daxwaza hin hevalan Barnas bi rêveberiya CHPê ya Muğlayê re dikeve tşkiliyê. Bi pêşniyaza ku Barnas bikin rêvebirê dibistana seretayî

¹¹⁶ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 185.

¹¹⁷ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 183.

¹¹⁸ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 183-184.

¹¹⁹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silîvan)*, r. 184.

rojnamevanê vê serdemê Tufan Doğu û hin kesên din diçin Ankarayê ku bi wezîr Mustafa Üstündağ re bipeyivin. Barnas li ser daxwaza wan û bi hêviya ku rewş bê guhertin û vegere ser karê xwe, rewşa xwe ji wan re dibêje. Lê hêvî û daxwaza ku Barnas vegere welat bi cih nayê.

Bi hêviya ku hin tişt bên guhertin, ev hevalên Barnas du caran diçin Ankarayê. Ev heval meseleya Barnas ji Hikmet Çetin re jî dibêjin û alîkariyê jê dixwazin. Barnas alîkariya wî dixwaze ku wî vegeerîne ser karê wî yê mamostetiyê û tayina wî jî bibe Diyarbekirê. Piştî evqas çûnûhatinan di dawiya dawî de Barnas li karê mamostetiyê vedigere lê hêviya vegera welat pêk nayê, ji ber ku şertê dane ber divê ku Barnas hetabihetayê li navenda Muğlayê wek mamoste bixebite.¹²⁰

Barnas van serpêhatiyên xwe wek delîl dibîne, li hemberî îddîaya dozger Hamdi Seviçê ku Barnas wek ajanê MÎTê bi nav dikir. Barnas piştî van serpêhatiyên xwe vê pirsê dike ku ev li gorî nêrîna me jî di cih de ye û jixwe ev pirs meseleyê zelal dike û gumanê tê de nahêle: “Ku ez bi MÎT, polis an yekîneyeka îstîxbaratî ya dewletê re xebitîbama, li ser heval û hevrayên xwe an kesê dîtir min îfade dabûya, li wan îxbar kiribûya, gelo ewê ev tiştên jorê bihatina serê min?”¹²¹

Barnas di havîna 1979an de tê Farqînê û di çiriya paşî ya 1979an de jî bi temamî dev ji karê karmendiyê berdide û tê li mala xwe ya Farqînê bi cih dibe. Piştî ku dev ji karmendiyê berdide îcar li Farqînê dest bi kar û barê kovara *Tîrêjê* dike.¹²² Li gorî ku Arjen Arî jî ji me re neqil dike, piştî ku ji bo kovareke edebî û xwerû bi Kurdî teklîf lê tê kirin Barnas di payîza 1979an de dev ji dersdayîna bi Tirkî berdide û bi çend hevalên xwe re dest bi derxistina kovara *Tîrêjê* dike.¹²³ Barnas biryara derxistina kovara *Tîrêjê* û destpêka berpirsiyariya xwe ya di *Tîrêjê* de wisa ji me re radigihîne:

“(…) para şerefê ya derxistina kovara TÎRÊJê ya rêveberiya KÎP/DDKD û bi taybetî jî ya Ömer Çetin, M. Elî û Ahmed Beğik e. Ku ew û biryara wan a siyasî nebûya ewê TÎRÊJ derneketa. KÎP/DDKD hingê bi navê

¹²⁰ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silvan)*, r. 184.

¹²¹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silvan)*, r. 184.

¹²² Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silvan)*, r. 186.

¹²³ Arî, *Antolojiya Helbesta Bakûr*, r.63.

Devrimci Demokratik Gençlik bi tirkî û Kurdî kovarek legal derdixistin, lê dixwestin ku kovareke seranser bi Kurdî ya wêjeyî jî derxin. Ji bona zazakî kar û xebata Malmîsanij berdest û amade bû, lê ji wan re ye lazim bû ku barê beşa kurmancî bide ser milê xwe. Ji bo wê jî pêşniyaza xwe li min kirin.”¹²⁴

Barnas ji ber hişmendî û mebesta xwe ya sosyal-siyasî-çandî a Kurdî ku wê ev yek Kurdî geş bike û ji ber ku wê kovar seranser bi Kurdî û edebî-hunerî be xwe dide ber barê xebata *Tîrêjê*.¹²⁵

Di payîza 1979an de hejmara yekemîn ya kovara *Tîrêjê* derdikeve û Barnas berpirsiyarê beşa Kurmancî ye. Ev berpirsiyariya Barnas heta cuntaya leşkerî ya 12ê Îlona 1980yê berdewam dike. Piştî cûntayê Barnas jî wek gelek rewşenbîran neçar dimîne ku terka welat bike. Barnas ji 19/20ê Tîrmeha 1982yan ve diçe Swêdê û hîn jî li vir dijî.¹²⁶

Piştî ku Barnas ji mecbûrî terka welat dike û digihîje Stockholmê tê dîtîn ku li dîasporayê jî xebatên xwe yên Kurdî didomîne û tevlî gelek xebatên Kurdî dibe. Di van salan de Federasyona Komelên Kurdistanê kovarekê bi navê *Berbangê* derdixin. Barnas demeke dirêj bi helbestên xwe tevlî vê kovarê dibe.

Kurdiska Projektet (Projeya Kurdî) ji bo Kurdên ku li Tensta-Rinkebyê rûdinên û baş bi Swêdî nizanin bulteneke agahdariyê ya bi navê “Rênasî” derdixînin. Ev bulten bi Kurmancî û Soranî derdikeve. Armanca vê bultenê ji bo bidestxistina kar, rêliberxistina nexweşxaneyê û hwd. ya Kurdên penaber e. Barnas berpirsiyarê Kurmanciya vê bultenê ye. Tenê çend hejmarên vê bultenê derdikevin û Barnas demeke kin di vê projeyê de cih digire. Ji bilî vê bultenê Kurdiska Projektet kovarekê bi navê *Çarçirayê* li ser ziman û edebiyatê derdixin ku Barnas tevlî vê xebatê jî dibe.

Enstîtuya Kurdî ya Parîsê di sibata 1983yan de vedibe. Xebata Kurmancî ya vê enstîtuyê ji gulana 1983yan û pê de dest pê dike. Barnas ji civîna ewilî ve beşdarî xebatên Kurmancî dibe ku aniha jî yek ji wan kesên koma Xebata Kurmancî ya

¹²⁴ Adsay, **Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS**, r. 81.

¹²⁵ Adsay, **Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS**, r. 82.

¹²⁶ Derbarê jiyana Rojen Barnas ya li Swêdê tu agahî û çavkaniyên berfireh di destê me de tune ne. Tenê em xwe digihînin çend agahiyên bi giştî. Ji ber vê me di derbarê jiyana Rojen Barnas ya li Swêdê de, ji Rojen Barnas bi xwe pirsî. Ango agahiyên ku ji vir û şûnde em ê bidin Rojen Barnas bi xwe dane me. Lê ev agahî jî tenê di derbarê jiyana wî ya edebî de ne.

Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ye û dîsa beşdarî civînên Kurmancî dibe. Enstîtuya Kurdî ya Parîsê kovarekê bi navê *Hêvî*, ku ev kovar bi Kurmancî, Soranî û Zazakî ye, derdixe. Barnas hem bi nivîsên xwe tevlî vê kovarê dibe û hem jî alîkariya redaksiyona vê kovarê dike. Tê dîtin ku Barnas di van salan de dîsa hem bi helbestên xwe û hem jî bi nivîsên xwe beşdarî kovara *Nûdemê* jî dibe.

Ji bilî van xebatên zimanî û çandî helbestnivîsandina Barnas li Swêdê kêr mibe jî her dem domaye. Van salên dawî helbestên Barnas di kovara *Nûbiharê* de diweşin. Ji bilî *Li Bandeva Spêde* hemû berhemên Barnas xebatên wî yê li Swêdê ne.

Barnas ji sala 1982yan vê de li Stockholmê wek penaber û bi malbatî dijî. Xwediyê şeş zarok û pênc neviyan e¹²⁷ û ji serê sala 2010an de teqawîd bûye. Barnas niha xwe wek xwendevanekî normal dibîne û carcar ku besta Barnas lê vedibe helbestan dinivîsîne ango helbestnivîsandina Barnas hê jî berdewam e.¹²⁸

Li gorî jiyana Barnas ya ku me li jor diyar kir, tê dîtin ku em nikarin helbesta wî ji jiyana û îdeolojiya wî veqetînin û wan ji hev cuda binirxînin. Ji ber ku her berhem di bin bandora taybetmendiyên dema xwe de dimîne û serdema xwe temsîl dike. Tê dîtin ku helbestên Barnas jî ji vê serdemê dizên û dengê vê serdemê diqîrin. Herî dawî em dikarin bibêjin ku hemû serpêhatiyên Rojen Barnas û rewşa siyasî ya vê serdemê dibin bingeha helbestên wî û temayên helbesta wî jî ji vê bingehe dizên.

¹²⁷ Arî, *Antolojiya Helbesta Bakûr*, r.63.

¹²⁸ Adsay, *Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS*, r. 83.

1.2. BERHEMÊN ROJEN BARNAS

Rojen Barnas wek helbestvanekî edebiyata Kurdî ji sala 1958-1959an de ewilî bi Tirkî dest bi nivîsandina helbestan dike. Lê ji ber bîr û baweriya xwe ya siyasî terka nivîsandina bi Tirkî dike¹²⁹ û ji 1964-1965an bi vir de jî dest nivîsandina helbestên bi Kurmancî kiriye.

Rojen Barnas herçiqasî bi helbesta xwe di edebiyata Kurdî de li pêş be û wek helbestvanekî binavûdeng bê nasîn jî, ji bilî helbestê çîrok, bendên edebî yên li ser ziman û çandê jî nivîsîne. Di kovara *Tîrêjê* de dest bi helbestê dike û di heman kovarê de çîrok û bendên wî yên edebî jî dertên. Nivîsên Barnas ji bilî *Tîrêjê*, di kovarên wek *Berbang*, *Çarçira*, *Çira*, *Hêvî*, *Nûdem* û *Nûbiharê* de weşiyane.

Barnas, heta niha çar pirtûkên helbestan, yek çîrok, yek bend û gotar û yek jê jî lêkolîn bi giştî heft pirtûk nivîsandine. Helbestên wî wek dîwan hem ji weşanxaneyê Nûdemê û hem ji ya Nûbiharê çap bûne. Hin berhemên wî yên pexşanî jî çapa xwe ya duyem kirine. Berhemên Barnas wek kronolojîk û tabloyeke bi giştî bi vî awayî ne:

1. Li Bandeva Spêde (helbest), *Tîrêj*, Îzmîr, 1979.
2. Heyv Li Esmanê Diyarbekirê (helbest), Invandrarförlaget, Borås, 1983.
3. Milkê Evînê (helbest), *Nûdem*, Stockholm, 1995.
4. Hingê (çîrok), *Nûdem*, Stockholm, 1997.
5. Şi'r -1- (berhevoka 1 û 2yan ya helbestan), *Nûdem*, Stockholm, 2002.
6. Bi Kurmanciya Gewr (bend û gotar), Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs, 2005.
7. Kadiz (dîwana hemû helbestan), *Nûbihar*, Stenbol, 2013.
8. FARQÎN Sîlvan/Silîvan (lêkolîn), *Nûbihar*, Stenbol, 2013.
9. Hingê (çîrok), çapa duyem, *Nûbihar*, Stenbol, 2014.
10. Bi Kurmanciya Gewr (bend û gotar), çapa duyem, *Nûbihar*, Stenbol, 2014.

¹²⁹ Adsay, *Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS*, r.76

1.2.1. HELBEST

Pirtûka yekemîn (*Li Bandeva Spêde*) ya Rojen Barnas ya helbestan di sala 1979an de û ya dawî (*Yelda*) jî di sala 2013an de di nava dîwana *Kadizê* de diweşe. Heta niha çar pirtûkên helbestan yê Rojen Barnas weşiyane. Pirtûkên Barnas yê helbestan ev in: *Li Bandeva Spêde* (1979), *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* (1983), *Milkê Evînê* (1995), *Yelda* (2013), *Şi'r -1-* “dîwana her du pirtûkên ewilî” (2002), *Kadiz* “dîwana hemû helbestan” (2013).

1.2.1.1. LI BANDEVA SPÊDE

Yekemîn pirtûka Rojen Barnas ya helbestan e. Ango Barnas bi vê pirtûkê re derdikeve ser dika helbesta Kurmancî. Heta aniha sê çapên *Li Bandeva Spêdeyê* bûne. Çapa yekemîn bi serê xwe ji nav Weşanên Tîrêjê û her du çapên din jî di nav dîwanên Barnas de çap bûne ku yek jê ji Weşanxaneyê Nûdemê û ya din jî ji Weşanxaneyê Nûbiharê derketiye.

Rojen Barnas ji 1964an de bi Kurmancî helbestan dinivîsîne. Lê helbestên wî yê berî 1975an hem ji ber ku derfeta weşandinê bi dest nakeve hinek ji wan wînda dibin û hem jî hinek ji wan bi pirtûkên wî yê din re ji aliyê lêgerînên polîsan ve tên şewitandin.¹³⁰ Ji ber vê “tirsê” Barnas helbestên xwe yê *Li Bandeva Spêdeyê* bi sê nusxeyan daktîlo dike, du nusxeyan dide hevalên xwe ji bo ku veşêrin û yek jê jî li cem wî dimîne.¹³¹ Li gorî agahiyên Barnas dide me du helbestên wî yê berî 1975an ji van windabûn û şewitandinan difilitin û lê ev her du helbest di çapa ewilî ya vê pirtûkê de cih nagirin.

Ji helbestên Barnas yê vê demê yek di pirtûka xwendinê ya Kamûran Alî Bedirxan de çap dibe, yek jî “Danielê Sor” ji aliyê komeleya piştgiriya Kurd û Fransîz ve tê çap kirin û wek belavokekê di tevgerên 1969an de li Parîsê tê belavkirin.¹³²

¹³⁰ Barnas, *Şi'r-1-*, r. 14-15.

¹³¹ Barnas, *Farqîn (Sîlvan/Silvan)*, r. 186.

¹³² Barnas, *Şi'r-1-*, r. 14.

Ev her du helbest û helbesta “Çûm Diyarbekirê” jî ku Barnas vê helbestê wek helbesta xwe ya pêşî diyar dike¹³³ di vê çapê de cih nagirin. Barnas helbesta “Çûm Diyarbekirê” cara ewilî di çapa Nûdemê de diweşîne. Ji ber ku Barnas ev helbesta xwe ji ber kiriye û di bîra wî de maye, ev helbest winda nebûye.¹³⁴ Helbesta “Memo” ku di pirtûka “Fêrbûna Xwendina Kurdî” ya Mîr Kamûran Alî Bedirxan de çap dibe, heta niha di nava pirtûkên Barnas de cih negirtiye. Ev helbest careke din di kovara *Nûbiharê* (hejmar 138, Zivistan 2017) de çap dibe. Helbesta “Danielê Sor” jî dîsa di tu pirtûkên Barnas de heta niha neweşiyaye. Ango ji helbestên Barnas yê berî 1975an ev her sê helbest di destê me de hene lê di çapa ewilî ya *Li Bandeva Spêdeyê* de cih negirtine.

Li Bandeva Spêde cara ewilî ji Weşanên Tîrêjê derdikeve. Di heman demê de ev pirtûk yekemîn pirtûka Weşanên Tîrêjê ye jî. Ev çap ewilî li Îzmîrê derdikeve lê dîroka çapbûna wê li ser pirtûkê nehatiye nivîsandin.¹³⁵ Ango sala weşana çapa yekemîn nayê zanîn. Ji ber vê yekê em nikarin bi teqezî sala wê bidin. Lê li gorî hin agahiyên ku nivîskar bi xwe dide me, *Li Bandeva Spêdeyê* bi kovara *Tîrêjê* re derdikeve: “Di dawîya 1979 û serê 1980 de hejmara pêşî ya *Tîrêjê* û *Li Bandeva Spêdeyê* derketin.”¹³⁶

Li gorî dîwana ku ji çapxaneyê Nûdemê derketiye jî, nivîskar di pêşgotina vê dîwanê de dîsa heman salan nîşan dika: “*Li Bandeva Spêde* (1979/1980, Weşana Tîrêjê li Tirkîyê).”¹³⁷ Ev agahî mijarê hinekî zelal bikin jî sala wê dîsa jî ne diyar e. Di çapên *Nûbiharê*¹³⁸ de sala çapa yekemîn bi vî awayî hatiye danîn: *Li Bandeva Spêde* (şî’r), Tîrêj, (bê tarîx), İzmir. (1979)¹³⁹ Ev jî diyar dika ku çapxaneyê *Nûbiharê* sala çapa yekemîn “1979” hilbijartiye. Li gorî van agahiyan em digihêjin vê encamê: Dîroka çapa yekem ya *Li Bandeva Spêdeyê* bi teqezî nayê zanîn. Lê li gorî van agahiyan tê dîtin ku dîroka çapa wê sala 1979 tê zanîn an jî ev sal hatiye

¹³³ Barnas, *Şî’r-1*, r. 15.

¹³⁴ Barnas, *Şî’r-1*, r. 15.

¹³⁵ Rojen Barnas, *Li Bandeva Spêde*, Weşanên Tîrêjê, İzmir.

¹³⁶ Barnas, *Farqîn (Silvan/Silvan)*, r. 186.

¹³⁷ Barnas, *Şî’r-1*, r. 11.

¹³⁸ Qesta me ji çapên *Nûbiharê* ev e: Di 2013 û 2014an de hemû pirtûkên Rojen Barnas careke din ji weşanxaneyê *Nûbiharê* derdikevin. Helbestên wî wek dîwan di bin navê “Kadiz”ê de çap bûne û xebatên wî yê din jî bi serê xwe hatine çapkirin. Li gorî van çapan, dîroka çapa yekemîn ya “*Li Bandeva Spêde*” 1979 e.

¹³⁹ Barnas, *Kadiz*, r. 4.

hilibjartin. Ji ber ku di gelek çavkanî û antolojiyan de “1979” belav bûye em ê jî vê salê wek dîroka çapa ewilî hilibjêrin.

Çapa duyemîn ya *Li Bandeva Spêdeyê* di nava dîwana “Şî’r -1-”ê de ji aliyê Weşanxaneyê Nûdemê ve di sala 2002yan de li Swêdê bi *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* re derdikeve. Barnas di pêşgotina vê dîwanê de diyar dîke ku daxwaza ji nû ve ya çapkirina van her du pirtûkan ne ji ber piyasa pirtûkan e, an jî ne ji ber hesret lêpîrsîna xwendevanan e. Barnas ji ber du sedeman *Li Bandeva Spêdeyê* ji nûve diweşîne: Sedema ewilî ji ber ku pirtûka ewilî di destê tu kesî de nema ye. Ya din jî ji ber ku di çapa ewilî de gelek şaşî bûne û Barnas dixwaze bi çapa nû re ev şaşî bîn sererastkirin.¹⁴⁰

Çapa sêyemîn jî di nava dîwana *Kadizê* de ji aliyê Weşanxaneyê Nûbiharê ve di sala 2013an de li Stenbolê derdikeve. Ji ber ku di her du çapên din de hin şaşiyên berbiçav hene em dikarin bibêjin ku ev çap, çapa herî tekûz e.

Ji bilî van agahiyên ku me di derbarê çapa ewilî de dan, herçiqasî Amir Hassanpour diyar bike ku di navbera salên 1967-71 û 1975-80yî de hukumeta Tirkîyeyê ji ber hin polîtîkayên xwe yê liberal destûra hin weşanên bi Kurdî bide jî; heta van sala li Tirkîyeyê, li ser weşangeriya Kurdî tu pirtûkên ku çavkaniyan şanî me bikin tunene.¹⁴¹ Lê Berken Bereh berevajî Hassanpour me bi taybetmendiyeke vê pirtûkê dihisîne: “*Li Bandeva Spêde*, yekemîn pirtûka Kurdî ye ku di dîroka komara Tirkîyê de hatiye çapkirin.”¹⁴² Ji ber van her du angaştan, ku em nikarin ji sedî sed vê taybetmendiya çapa *Li Bandeva Spêdeyê* teqez bikin, em bi guman in. Eger rast be jî taybetmendiyeke balkêş e. Ê Berken Bereh jî diyar ku ev pirtûk di sala 1979an de hatiye çapkirin ku bi derketina vê pirtûkê re Rojen Barnas di helbesta Kurmancî de gaveke mezin diavêje û dibêje, ez jî heme.¹⁴³

Gava ku em li çapa yekemîn ya *Li Bandeva Spêdeyê* dinêrin, wek ku Barnas li jor jî diyar kir, tê dîtin ku gelek şaşiyên çapê hene. Lê em di wê baweriyê de ne ku ev şaşî ji ber mercên vê serdemê ne. Ji ber ku bi rastî jî pirtûk di demeke dijwar de

¹⁴⁰ Barnas, *Şî’r-1-*, r. 11.

¹⁴¹ Amir Hassanpour, *Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik (1918-1985)*, Çeviri: İbrahim Bingöl ve Cemil Gündoğan, Birinci Baskı, Avesta, İstanbul, 2005, r. 334-335.

¹⁴² Bereh, *Ağzımda Kimliğim Benim*.

¹⁴³ Bereh, *Ağzımda Kimliğim Benim*.

hatiye weşandin ku haya Rojen Barnas bi xwe jî ji vê çapê tune. ¹⁴⁴ Ev rewş di serdema modern de ne rewşeke normal e helbet.

Li Bandeva Spêdeyê ji şêst û heşt helbestan pêk tê û wek hemû pirtûkên, *Milkê Evînê* ne tê de, Barnas yên helbestan di dawiya vê pirtûkê de jî ferhengokek heye. Li gorî nêrîna me şêst û heşt helbest ji bo pirtûkeke helbestan zêde ye û em hebûna ferhengokekê jî normal dibînin. Ji ber ku hem pirtûka helbestan û hem jî hebûna ferhengokê bi mercên vê serdemê û bi civakê ve girêdayî ne. Nîhat Çelîk hebûna ferhengokan bi vê sedemê ve girê dide: “Ji ber ku zimanê Kurdî ne zimanekî fermî, lê zimanekî qedexekirî ye û ji ber *jênosîda spî* qels ketiye. Barnas bi xwe jî ev rastî dîtiye ku li dawiya pirtûka xwe ferhengokek daniye.” ¹⁴⁵ Bêguman ev nêrîna li gorî nêrîna me jî di cih de ye.

Helbestên *Li Bandeva Spêdeyê* ji helbestên Barnas yên ji sala 1975an û heta sala 1979an pêk tên. Ji van şêst û heşt helbestên *Li Bandeva Spêdeyê* çar jê cara ewilî di kovara *Tîrêjê* de diweşin. Bi weşandina van helbestan re em dikarin bibêjin ku helbestkariya Barnas jî dest pê dibe. Her çar helbestên ku cara ewilî di *Tîrêjê* de diweşin, ev in: *Ez Mendalekî Çar Salî Me Mamo!*, *Melayê Şîretkir*, *Jîndarî û Bibişire*. ¹⁴⁶

Helbesta “*Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir*”, di vê pirtûkê de cih digire ku em dikarin bibêjin ku gelek kesan Rojen Barnas bi vê helbestê nas kiriye û ev helbest hê jî di nava Kurdan de bi navûdeng e û ji ser zimanan nakeve. Ev helbest wek gelek helbestên Barnas, ji aliyê Ciwan Haco ve tê bestekirin û di nava Kurdan de berbelav dibe. Barnas bi xwe jî dibêje ku bi saya Ciwan Haco gelek kes bi nav û dengê çend helbestên wî dihisin ku ne ji Ciwan Haco bûya wê haya kesî zûbizû ji wî û helbesta wî çênebûya. ¹⁴⁷ Heman helbest, piştî nozdeh salan careke din di kovara *Jiyana Rewşenê* de diweşe. ¹⁴⁸ Helbet ev rewş di vê serdema me ya nû de ne rewşeke normal e. Ango pirtûkek derketibe û piştî helbesteke ku di vê pirtûkê de cih digire

¹⁴⁴ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 40.

¹⁴⁵ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 37.

¹⁴⁶ Rojen Barnas, *Ez Mendalekî Çar Salî Me Mamo!*, *Melayê Şîretkir*, *Jîndarî, Bibişire*, *Tîrêj*, Hejmar 1, İzmir, 1979, r. 15-21.

¹⁴⁷ Adsay, *Hevpeyvîn Ligel Rojen Barnas*, r.74.

¹⁴⁸ Rojen Barnas, *Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir*, *Jiyana Rewşen*, Hejmar 20, Pûşber, 1998, r. 30.

îcar careke din di kovarekê de derkeve, ne rewşeke ji rêzê ye. Lê li gorî nêrîna me dibe ku *Jiyana Rewşenê* xwestibe ku careke din vê helbesta bi navûdeng bi xwendevanên xwe re parve bikin û helbestê careke din bide bibîranîn.

Piştî van agahiyên ku me di derbarê çapkirina wê de dan îcar gava ku mirov li helbestên *Li Bandeva Spêdeyê* dinêre tê dîtîn ku Rojen Barnas bi vê pirtûkê re ne wek helbestvanekî ecemî, wek helbestvanekî gihiştî tevî cihana helbesta Kurmacî dibe. Barnas ji pêşî de biryar daye û dizane wê çi û çawa bibêje. Ji helbestên vê pirtûkê diyar dibe ku dê helbesta Barnas ber bi kîjan alî ve here.

Temayên *Li Bandeva Spêdeyê* bi serdema xwe û bi jiyana helbestvan re têkildar in. Di vê pirtûkê de temayên şexsî û yên civakî tevlihev bin jî Barnas di helbestên herî şexsî de jî carina fikrên civakî û neteweperwerî bi kar tîne. Lê em dikarin bibêjin ku helbestên *Li Bandeva Spêdeyê* bêhtir bi êşa civakê xwe didin der.

Temayên ku di vê pirtûkê de derdikevin pêş ev in: welat, welatparêzî, neteweperwerî, evîn, bêrîkirin, dûrbûn, hezkirin, hêvî, fikra sosyalîzmê, hezkirina xwezayê, êş, koçberî... hwd. Ji van temayan ya herî li pêş “hêvî” ye. Hêviya têkoşîn û berxwedanê di gelek helbestan de xwe dide der. Herçiqasî bûyerên nexweş qewimîbin û Barnas pir di bin bandora van bûyeran de ma be jî hêvî xurt e. Di helbestan de her dem ronahiyek heye û Barnas dixwaze ku hişyariyê belav bike. Helbest bi coş in û bîranîn tunene. Nebûna bîranînan hêvî û coşê xurttir dike. Di hin helbestan de fikra sosyalîzmê û jiyana karkeran jî derdikeve pêş, ev helbest bi rewşa vê serdemê re têkildar in. Ev fikir bi piranî di vê pirtûkê de xuya dibe. Di pirtûkên din de Barnas berê xwe bi temamî dide rewşên ku bi netewetiyê ve girêdayî ne.

Ji aliyê taybetmendiyan şeweyê ve gava ku em li helbestên vê pirtûkê dinêrin, tê dîtîn ku Barnas carina bi şeweya gelêrî û carina bi şeweya serbest helbest nivîsandine. Helbestên ku bi şeweya gelêrî hatine nivîsandin her ji çend helbestan carekê dubare dibin. Ev çûnûhatin di pirtûka ewilî de derdikeve pêş. Lê ev şeweya gelêrî her ku diçe kêr dibe û di pirtûkên din de kêr daran xuya dibin. Ji bilî vê helbestên ku tenê bi çarînekê hatine nivîsandin di hemû pirtûkan de hene. Barnas hem di van çarînan de û hem jî di hemû helbestên ku bi şeweya gelêrî hatine

nivîsandin de serî li hem serwayê dide û hem jî ev helbest bi pîvana kêteyî nivîsandine. Lê ev helbest di pirtûkê de ne serdest in û pir dernakevin pêş.

Şêweya serdest û ya li pêş, rist û pîvana serbest e. Ev şêweya serdest şêweyeke pêlikî (Basamaklı Şiir) ye û ev şêwe pir li pêş e. Li gorî nêrîna me, taybetmendiya herî mezin ya *Li Bandeva Spêdeyê* ev ceribandina şêweyê ye ku ev taybetmendî lêgerîna Barnas ya di helbestê de jî şênber dike. Şêweya pirtûkê bi temayan re li hev dike û hevdu tamam dikin. Ev lihevkerin helwesta Barnas e ku di zimanê pirtûkê de jî xwe dide der. Derbarê zimanê pirtûkê de Nîhat Çelîk diyar dike ku Rojen Barnas di helbestên pirtûka xwe ya ewilî de zimanekî zor, gelek peyvên çêkirî û yên ku zêde nayên naskirin bi kar aniyê.¹⁴⁹ Helbet her helbestvan gelek peyvên ku zêde nayên bi kar anîn, bi kar tîne lê li gorî nêrîna me zimanekî zor ya *Li Bandeva Spêdeyê* tune ye û Barnas “peyvên çêkirî” bi kar nayîne. Em di wê baweriyê de ne ku ev peyv ji bo ahenga helbestan herikbartir bike, hatine hilibijartin ku ev jî dîsa helwesta Barnas e.

1.2.1.2. HEYV LI ESMANÊ DIYARBEKIRÊ

Heyv Li Esmanê Diyarbekirê yekemîn pirtûka Rojen Barnas ya ku li Swêdê derdikeve û duyemîn pirtûka wî ya helbestan e. Heta aniha sê çapên *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* bûne. Çapa yekemîn bi serê xwe ji nav Weşanên Invandrarförlagetê li Swêdê û her du çapên din jî di nav dîwanên Barnas de çap bûne ku yek jê ji Weşanxaneyê Nûdemê û ya din jî ji Weşanxaneyê Nûbiharê derketiye.

Çapa yekemîn ya *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* di sala 1983yan de li Swêdê ji nav Weşanên Invandrarförlagetê derdikeve. Li gorî *Li Bandeva Spêdeyê*, ji ber ku sala çapa wê ne diyar bû û gelek gengeşe di derbarê çapkirina wê de hebûn, *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* ji van aliyan de tekûz e. Ji bilî *Li Bandeva Spêdeyê* hemû pirtûkên Barnas xebatên wî yên ku li Swêdê ne.

Çapa duyemîn ya *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* di nava dîwana *Şi'r -I-ê* de bi *Li Bandeva Spêdeyê* re ji aliyê Weşanxaneyê Nûdemê ve di sala 2002yan de li

¹⁴⁹ Çelîk, *Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas*, r. 37.

Swêdê derdikeve. Ji bo *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* jî Barnas di pêşgotina vê dîwanê de dibêje, ji ber ku ev pirtûk li Swêdê çap bûye û negihîştîye destê tu kesên li derveyî Swêdê ji nû ve çapa vê pirtûkê dike.¹⁵⁰

Çapa sêyemîn ya *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* jî di nava dîwana *Kadizê* de ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve di sala 2013an de li Stenbolê derdikeve. Tu şaşiyên berbiçav ji aliyê rastnivîsê ve di her sê çapan de jî tunene. Ango her sê çap jî ji vî alî de nêzî hev in. Li gorî nêrîna me ev yek dîsa ji ber mercan e. Ji ber ku mercên vê demê bi awayekî erênî hatine guhertin.

Pirtûka *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* ji sih û şeş helbestan pêk tê û helbesta ku ji bo navê pirtûkê hatiye hilbijartin “*Heyv Li Esmanê Diyarbekirê*” jî ji nozdeh beşan pêk tê. Em dikarin bibêjin ku pirtûk du beş e. *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* li gorî *Li Bandeva Spêdeyê* ji aliyê hejmara helbestan ve hindiktir e. Ev yek li gorî dîtina me rewşeke normal e û divê ku bi vî awayî be. Hebûna ferhengokekê dîsa wek gelek pirtûkên wî di vê pirtûkê de jî berdewam e.

Helbestên ku di *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* de cih digirin, helbestên Barnas yên ji sala 1979an û heta 1983yan in. Ango piştî ku tu têkiliya Barnas bi karmendiyê re namîne û terka welat dike, ev helbest nivîsandine. Heşt ji van helbestên ku di vê pirtûkê de cih digirin cara ewilî di kovara *Tîrêjê* de diweşin. Ev her heşt helbest di heman demê de heşt helbestên ewilî yên pirtûka *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* ne jî. Di hejmara duyemîn de sê helbest: *Bi Avê Bi Nan, Bîbik Dirêsin, Nizanim Kengê*.¹⁵¹ Di hejmara sêyemîn de helbestek: *Stranên Me*.¹⁵² Di hejmara çaremîn de jî çar helbest: *Berêz Hoto Hemoto, Asiwayî, Ezimandin, Helbet*¹⁵³ diweşin.

Ji vê pirtûkê xuya dibe ku jiyana û helbesta Barnas bi hev ve girêdayî ne. Devjêberdana karmendiyê û terka welat ya ji mecbûrî, bêguman jiyana Barnas diguherînin û pê re jî tê dîtin ku helbestên Barnas di bin bandora vê guhertinê de mane. Helbest li biyanistanê hatibin nivîsandin jî her dem berê wan li welat e. Di vê

¹⁵⁰ Barnas, *Şî'r-1-*, r. 11.

¹⁵¹ Rojen Barnas, *Bi Avê Bi Nan, Bîbik Dirêsin, Nizanim Kengê*, Tîrêj, Hejmar 2, Swêd, 1980, r. 13-19.

¹⁵² Rojen Barnas, *Stranên Me*, Tîrêj, Hejmar 3, Swêd, 1980, r. 16.

¹⁵³ Rojen Barnas, *Berêz Hoto Hemoto, Asiwayî, Ezimandin, Helbet*, Tîrêj, Hejmar 4, Swêd, 1981, r. 12-18.

pirtûkê de helwesteke xurt ya li hemberî mêtinkariyê derdikeve holê. Di gelek helbestan de tevgera têkoşîna welat li pêş e û gelek ji van helbestan dîmenên têkoşîna welêt li ber çavên me radixînin. Serkeftin nêz e û hêvî di asta herî bilind de ye.

Temayên *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* jî li gorî vê jiyana nû tî guhertin. Êşa takekesî xuya bibe jî, êşa ku derdikeve pêş dîsa ya civakê ye. Di vê pirtûkê de jî temayên derdikevin pêş “hêvî” û “bêrîkirin” e. Ev “hêvî” her dem piştî tîkçûnekê xwe dide der ku carina hêviyeke bi xemgîn e. “Bêrîkirin” jî bêrîkirina welat û axê ye. Barnas êdî dûrî welat e û tê dîtî ku piraniya helbestan li gorî vê dûrbûnê û bi bandora vê dûrbûnê hatine nivîsîn. Ji bilî van her du temayên sereke wek din temayên wek evîn, şoreşgerî, neteweperwerî, ax-welat, dîrok, bîr, têkoşîn, berxwedan, welatparêzî jî derdikevin pêş.

Bi vê pirtûkê re em dibînin ku helbestkariya Barnas hinekî din kemiliye. Ev kemilandin jî her alî ve xwe dide der. Tê dîtî ku lêgerîna Barnas ya di derbarê şeweyê de tekûztir dibe. Me li jor jî diyar kiribû ku ji aliyê şeweyê ve, taybetmendiya helbesta Barnas ew e ku ceribandineke nû ye ji bo helbesta vê serdemê. Îcar gava ku em bala xwe didin vê pirtûkê, em dikarin bibêjin ku ji bilî helbestekê, *Berêz Hoto Hemoto*, tu helbest bi şeweya gelêrî nehatiye nivîsandin. Ango şeweya vê pirtûkê, dîsa şeweyeke pêlikî ye û bi rist û pîvana serbest hatiye xemilandin. Gava ku em pirtûka ewilî û vê pirtûkê didin ber hev, em dibînin ku helbestên bi şeweyên gelêrî hatine nivîsandin li gorî pirtûka ewilî kêmtir in. Ango Barnas di vê pirtûkê de ji aliyê şeweyê ve bêhtir bi rêkûpêk derketiye pêşberî me. Lewre Barnas bi *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* re niyeta xwe ya şeweyê diyartir dike ku em dikarin bibêjin, di vê pirtûkê de êdî dev ji şeweya gelêrî bi temamî berdaye. Ji ber van guhertinan em dikarin ji bo vê pirtûkê bibêjin ku lêgerîna Barnas ya rist û pîvana serbest xurttir û gurtir dibe û ev rist û pîvan ne bi tesadufî hatine hîlbijartin. Ango ji bo şeweya helbesta Rojen Barnas ev pirtûk destpêkeke nû ye.

1.2.1.3. MILKÊ EVÎNÊ

Milkê Evînê, pirtûka Rojen Barnas ya sêyemîn e. Ev pirtûk bi temamî jî jiyana Barnas ya Swêdê pêk tê. Heta aniha du çapên *Milkê Evînê* bûne. Çapa yekem ya

Milkê Evînê di sala 1995an de li Stockholmê ji nav Weşanên Nûdemê derdikeve. Çapa duyem ya *Milkê Evînê* di nava dîwana *Kadizê* de ji Weşanxaneya Nûbiharê di sala 2013an de bi hemû pirtûkên wî yê helbestan re çap dibe. Tu guhertinên ber bi çav di her du çapan de nexuyane ango her du çap jî ji her awayî de nêzî hev in.

Milkê Evînê ji pêncî û du helbestan pêk tê. Helbesta bi navê “Dicle û Firat” jî ji pênc beşan pêk tê. Di dawiya her du pirtûkên din de ferhengokek heye, lê di *Milkê Evînê* de tê dîtîn ku Barnas dev ji ferhengê berdaye.

Rojen Barnas piştî navbereke dirêj (12 sal) bi pêncî û du helbestan derdikeve hemberî me lê ev nayê wê wateyê ku Barnas dev ji helbestê berdaye. Ji ber ku Barnas di nava van salan de ji bilî helbestê tevî gelek xebatên din jî dibe, rêkûpêkiya helbest nivîsandina wî hinekî qels dibe. Lê di ber van xebatan re Barnas têkiliya xwe tu carî ji helbestê qut nake. Ji ber ku tê dîtîn ku Barnas bi helbestên xwe tevî kovarên ku di van salan de derdikevin dibe. Lewre li gorî nêrîn û dîtina me, em dikarin bibêjin ku Barnas ji bo derxistina pirtûkeke helbestan ecele nekiriye û li benda kemilandina wan sekiniye.

Helbestên *Milkê Evînê*, helbestên Barnas yên ji sala 1983yan û heta 1995an in. Ango ev helbest bi temamî li dîasporayê hatine nivîsandin. Piraniya van helbestên ku di *Milkê Evînê* de cih digirin ewilî di kovara Nûdemê de çap dibin. Du helbest jî di kovara *Çirayê* (kovara komeleyên nivîskarên Kurd li Swêdê) de çap dibin.¹⁵⁴

Di vê pirtûkê de jî Barnas ji aliyê şeweyê ve dîsa li ser şopa helbesta pêlikî û rist û pîvana serbest berdewan dike. Lê gava ku em bi giştî lê dinêrin hin helbestên ku bi şeweya gelêrî hatine nivîsandin hene. Ango hin helbest bi pîvana kêteyî û bi serwa hatine nivîsandin. Helbestek (Rasterast) jî bi bi şeweya xezelê hatiye nivîsandin. Di her du pirtûkên ewilî de çend helbestên ku tenê bi çarînekê hatine nivîsandin di vê pirtûkê de zêdetir xuya dikin. Hin helbest bi çend çarînan hatibin nivîsandin jî di wan de rêkûpêkiyek tune ye. Gava ku em vê pirtûkê û her du pirtûkên ewilî didin berhev em dibînin ku Barnas di vê pirtûkê de hinekî din berê xwe daye şeweya gelêrî.

¹⁵⁴ Me ev agahî ji Rojen Barnas girtine.

Di *Milkê Evînê* de Barnas bêhtir çîroka welatekî û axa vî welatî li ber me radixîne. Temayên ku di *Milkê Evînê* de derdikevin pêş hemû bi çîroka vê axê re girêdayî ne. Ev ax welat e. Hebûna Kurdan ya li ser vê axê ji destpêka zemanekî nediyar û heta îro bi awayekî çîrokî û bi alîkariya helbestê ji me re vedibêje. Barnas bêhtir ji aliyê dîrokê ve li vê çîrokê dinêre. Di vê dîrokê de bêhtir li ser mijarên ku Kurdan bi giştî eleqedar dikin û biryarên ku qedera Kurdan guhertine disekine.

Helbesta “Dicle û Firat”ê, çîroka erdnîgariya welat û serpêhatiya vê axê û gelên ku li ser vê axê şîn bûne û piştê têk çûne vedibêje. Ji dîroka kevin ve hebûna Kurdan ya li ser vê axê, berxwedana Kurdan ya li ser vê axê, bêbextî û xapandina ku li Kurdan bûye, qedexeyên ku li Kurdan hatine kirin, newekheviya li hemberî Kurdan di vê pirtûkê de xuya dibin.

Di vê pirtûkê de jî Barnas dûrî welat e, lê hişê wî her dem li welat e û berê xwe bi piranî dide simbolên welat. Bi van sembolan hebûna Kurdan ya li ser vê axê vedikole. Di hin helbestan de carina serî li destanên Kurdan jî dixê û wan ji helbesta xwe re dike referans. Di van helbestan de lehengên ku neteweperweriya Kurdan nîşan didin û gava ku behsa têkoşîna Kurdan dibe ev nav tên bîra Kurdan, di vê pirtûkê de bêhtir xuya dibin. Wek Şêx Seîd, Seyid Rîza û Qazî Mihemed derdikevin pêş. Ev yek girêdana Kurdan ya bi vê axê re diyar dike.

Ji ber ku Barnas dûrî vê axê ye bêfikirina ax, dîrok, xweza û mîmariya vê axê helbestên bi hesret pê dide nivîsandin. Bi giştî em dikarin bibêjin ku di *Milkê Evînê* de Barnas li ser mijar û temayên dîrokî, şoreşgerî, neteweperwerî, berxwedan û têkoşînê disekine. Têkoşîn, xwenasî, xwezanî li hemberî dagirkeran hişktir dibe. Helbestên vê pirtûkê bêhtir li dora van mijar û temayan diçin û tên. Ji bilî van mijar û temayên ku çîrok û dîroka vê axê bi simbolên vê axê re ji me re radigihînin, Barnas wek pirtûkên xwe yên din jî di hin helbestan de hestên xwe yên şexsî jî tîne ziman. Hin helbest ji bo hin kesên navdar nivîsandine û di hin helbestan de jî li ser meseleya ziman, yekîtî û birakujiyê sekiniye ku ev cure helbest jî li gorî nêrîna me dîsa bi dîrok û çîroka vê axê re girêdayî ne.

Hêvî û coşa ku di her du pirtûkên ewilî de xuya dibe di vê pirtûkê de hinekî qels dibe. Li şûna wan helbestên ku ji hêviyê dagirtî ne, helbestên ku rexneyan li orf

û adetên civakê dikin xuya dibin. Barnas van helbestan bi awayekî mîzahî dihûne û tê dîtin ku di van helbestan de pir ciddî ye.

1.2.1.4. YELDA

Yelda di nava dîwana *Kadizê* de ji Weşanxaneya Nûbiharê di sala 2013an de derdikeve. Ji ber ku wek beşeke bi serê xwe di nava dîwana *Kadizê* de derdikeve em ê van helbestan jî wek pirtûkekê binirxînin. Ango ev pirtûk perçeyeke ji dîwana *Kadizê* ye û bi serê xwe nehatiye çapkirin. Lewre ev pirtûka çaremîn ya helbestan e û di heman demê de ev pirtûk, pirtûka Barnas ya herî dawî ya helbestan e jî.

Yelda ji helbestên Barnas yê ji sala 1995 û heta sala 2013an pêk tê. Di *Yeldayê* de pêncî û çar helbest hene. Ji van pêncî û çar helbestan hinek jê di kovara *Nûdemê* de û hinek jî di kovara *Nûbiharê* de derdikevin. Piştî ku ev helbest dibin bi qasî pirtûkekê, Barnas van helbestan di nava dîwana *Kadizê* de çap dibe. Helbesta *Yeldayê* ya dawî (Niyaz û Encam) di hejmara 25an ya kovara *Nûbiharê* de çap dibe.

Ji aliyê şeweyê ve gava ku em li *Yeldayê* dinêrin tê dîtin ku şeweya rist û pîvana serbest li gorî pirtûkên din qelstir dibe. Em dikarin bibêjin ku Barnas di vê pirtûkê de ji aliyê şeweyê ve dev ji rist û pîvana serbest bi piranî berdaye. Lê helbet dîsa jî carcaran serî li vê şeweya serbest dixê. Li gorî her sê pirtûkên din, helbestên ku tenê bi çarînekê hatine nivîsandin pirtir dibin.

Li gorî her sê pirtûkên ewilî di *Yeldayê* de tema û mijareke ku Barnas bi giştî li ser hûr dibe tune. Mijar û temayên *Yeldayê* hinekî belawela ne. Helbestên siyasî yê ku di her sê pirtûkên ewilî de li pêş in, di vê pirtûkê de Barnas pênûsa xwe bi piranî ji wan dikişîne. Lewre em dikarin bibêjin ku helbestên vê pirtûkê bêhtir ber bi mijarên şexsî ve çûne. Bîranîn, xwezî û poşmanî derdikevin pêş. Ew hêviya xurt, ya ku wê hin rewş û kes bi têkoşîn û berxwedanê rast bibin têk diçe û êdî bêhtir berê xwe dide gilî û gazinan. Hêviya serkeftin û têkoşînê nema xuya dibe. Barnas bi xwe jî di gelek helbestan de li xwe mikur tê ku hevî wî berdide. Barnas di vê pirtûkê de bêhtir li “xweziyên windabûyî” digere.

Helbestên mizahî yê ku di *Milkê Evînê* de derdikevin pêş û rexneyan li hin rewşan dikin di *Yeldayê* de jî ev cure helbest xuya dibin. Em dikarin bibêjin ku ev cure helbest di her du pirtûkên dawî de êdî dibin şêweyek ji helbesta Barnas.

Gava ku em li hemû helbestên Barnas dinêrin, ji pirtûka ewilî û heta ya dawî, tê dîtin ku ew hêvî û daxwaza xurt ya di helbestên ewilî de di van helbestên dawî de nîne. Hêvî berê xwe dide bîranînan û Barnas carcaran jî li dû hêviyê digere.

1.2.1.5. ŞI'R -1-

Ev berhem berhevoka pirtûka *Li Bandeva Spêde û Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* ye. *Şi'r -1-* cara ewilî ji aliyê Weşanxaneya Nûdemê ve di sala 2002yan de li Swêdê derdikeve. Ji ber ku bi vê berhemê re her du pirtûkên ewilî ji nû ve hatine çapkirin me li jor wek dîwan bi nav kir.

Li gorî ragihandina Barnas, hin helbestên berî 1975an ji ber ku derfeta weşandinê tune ye wînda dibin û hin jê jî tên şewitandin.¹⁵⁵ Lewre helbestên ku di vê dîwanê de cih digirin yê jî sala 1975an û heta sala 1983yan in. Tenê helbesta ewilî ya vê dîwanê “Çûm Diyarbekir” di sala 1965an de hatiye nivîsandin û Barnas vê helbestê wek helbesta xwe ya pêşî qebûl dike ku cara ewilî di vê dîwanê de diweşe.

Ji ber hin sedeman Barnas ev her du pirtûk ji nû ve çap kirine. Pirtûka ewilî di destê tu kesî de nemaye û ya duduyan jî ji ber ku li Swêdê çap bûye û negihîştîye destê tu kesê li derveyî Swêdê, hewecedarî pê dîtiye ku wan ji nû ve çap bike. Hem ji ber van sedeman û hem jî ji ber rastkirina hin şaşiyên di çapên ewilî de Barnas xwestîye ku wan ji nû ve çap bike.¹⁵⁶

1.2.1.6. KADİZ

Çapa ewilî ya *Kadizê* ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve di sala 2013an de li Stenbolê derdikeve. Taybetmendiya vê dîwanê ew e ku hemû helbestên Barnas

¹⁵⁵ Barnas, *Şi'r-1-*, r. 14.

¹⁵⁶ Barnas, *Şi'r-1-*, r. 11.

dihundirîne. Ango ji 1979an û heta sala 2013an hemû helbestên ku Barnas nivîsandine di vê dîwanê de cih digirin. Di vê dîwanê de ji bilî her sê pirtûkan (*Li Bandeva Spêde, Heyv Li Esmanê Diyarbekirê û Milkê Evînê*), pirtûka bi navê *Yelda* jî cih digire. Yelda ji helbestên Barnas yên dawî pêk tê û cara ewilî di nava vê dîwanê de cih digire.

Heta Kadizê tê dîtin ku her pirtûkeke Barnas ya helbestan ji aliyê weşanxaneyê cuda ve hatiye weşandin. Lewre em dikarin bibêjin ku bi *Kadizê* re ev rewş tekûz dibe û hemû helbestên Barnas bi tevahî di vê dîwanê de cih digirin.

Derbarê *Kadizê* de hata niha tenê Berken Bereh nivîsandiye. Herçiqasî şîroveyên Bereh yên ku ji bo *Kadizê* dike kin bin jî, li gorî dîtina me Bereh tespîtên hêja dike.

“Çima Kadiz? Hê bi vê peyvê em pê dihesin ku em bi dîwaneke ku her helbesteke wê wek stêrkekê ronak, çirisîner û bi hev re dê wek rojê şeva me û aso û pencera jiyana me ronahî bike dihesin. Me amadeyi rêwitiyekê dike. Ev rêwitî di şevê de dest pê dike lê, rêya me ne şevtarî ye, kadiz bi hemû geşedaniya xwe li raserî me diçirise, ji me re dibişire. Em ne di tarîsataneke de ne, ha aha roj hile. Lê nexuyana rojê hêmaya kadizê xurtir û watedartir dike. Li me dide zanîn ku ger em tariyê baş fêm nekin, ne hêçînin dê em nekarin ji bo ronahiyê stranên gerdenawaz bistrên.”¹⁵⁷

Wek dawî ji bo dîwana *Kadizê* em dikarin bibêjin ku hemû serpêhatiya helbesta Barnas û rêwitiya jiyana wî ya helbestê bi yekserî ji me re berçav dike. Ango her çar pirtûkên helbestên Rojen Barnas di vê dîwanê cih digirin.

¹⁵⁷ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 7.

1.2.2. ÇÎROK

Rojen Barnas ji bilî helbestê di kovara *Tîrêjê* de, bi nasnavê Flît Totanî jî çîrokên mîzahî dinivîsîne. Ango wek helbestvaniya Barnas pêvajoya çîroknivîsiya wî jî bi kovara *Tîrêjê* dest pê dike. Bêguman îro roj Barnas ne bi çîrokên xwe lê bi helbestên xwe li pêş disekine. Heta niha tenê pirtûkeke çîrokan ya Barnas derketiye û li gorî ku Barnas ji me re dibêje, êdî li çîroknivîsiyê nafikire.¹⁵⁸

1.2.2.1. HINGÊ

Tekane pirtûka Rojen Barnas ya çîrokan e. Heta niha du çapên wê bûne. Çapa yekem ji nav *Weşanên Nûdemê* li Stockholmê di sala 1997an de derdikeve û çapa duyem jî ji *Weşanxaneyê Nûbiharê* li Stenbolê di sala 2014an de derdikeve. Her du çap ji her awayî de nêzî hev in û di her du çapan de jî heman çîrok cih digirin.

Çîrokên ku di vê pirtûkê de cih digirin ewilî di kovaran de diweşin û tê dîtîn ku di van çîrokan de hin şaşiyên rastnivîsê û tewangê hene. Piştî Barnas bi van şaşiyên xwe dihise û wek têngiştina xwe ya ziman ya wê serdemê qebûl dike.¹⁵⁹ Helbet bi derketina çapa ewilî re van şaşiyên rast dike.

Hingê, berhevoka pênc çîrokên rewşî-mîzahî û ji bîranîneke Rojen Barnas pêk tê. Her çar çîrokên ewilî di kovara *Tîrêjê* de û çîroka dawî jî di kovara *Hêviyê* de bi navê Flît Totanî û bîranîn jî di kovara *Çirayê* de bi navê Rojen Barnas derdikevin.

Her pênc çîrokên ku di vê pirtûkê de cih digirin ev in: *Te Evî Zimanî ji Ku Derê Anî?* (Tîrêj, hejmar 1, 1979), *De Were Binivîsîne...* (Tîrêj, hejmar 2, 1980), *Heft Xwezil Bi Wan Roja* (Tîrêj, hejmar 3, 1980), *Şîfa Bi Xwedê Ye* (Tîrêj, hejmar 4, 1981), *Ka Merivatî Maye?* (Hêvî, hejmar 1, 1983). Bîranîn: *Hecî Mihemed Eliyê Qelşo* (Çira, hejmar 1, 1995). Ango her pênc çîrok bi navê Flît Totanî û bîranîn jî bi navê Rojen Barnas diweşe.

¹⁵⁸ Adsay, *Hevpeyvîn Ligel ROJEN BARNAS*, r. 83.

¹⁵⁹ Rojen Barnas, *Hingê*, Çapa Yekem, Nûdem, Stockholm, 1997, r. 3-4.

Ji bilî van çîrokên mîzahî, çîroka bi navê “Car Zane, Zêr Zane, Zor Zane” jî bi înzeya Ferîdûn Salar di hejmara yekem ya *Tîrêjê* de diweşe. Lê Barnas ji ber ku vê çîrokê ne di nav kategoriya yên bi stîla Flît Totanî de dibîne, ev çîrok tevî çîrokên *Hingê* nekiriye. Lewre ev çîrok di tu pirtûkên Barnas de heta niha nehatiye weşandin.

Me li jor jî diyar kir ku Rojen Barnas di *Tîrêjê* de bi nasnavên Sersax Arda, Ferîdûn Salar, Mihemed Qasim û Flît Totanî jî dest avêtiye edebiyatê û ji bo her celebeke edebiyatê navek bi kar aniye. Rojen Barnas ji van nasnavan, nasnavê Flît Totanî tenê ji bo çîrokên mîzahî bi kar aniye. Piştî *Tîrêjê* tê dîtîn ku Barnas ji bilî nasnavê Flît Totanî dev ji nasnavên din berdide, lê heta çendekî nasnavê Flît Totanî didomîne. Bi derketina çapa ewilî ya *Hingê* re êdî wezîfeya Flît Totanî jî bi temamî diqedê.¹⁶⁰

Her pênc çîrokên *Hingê* yên mîzahî di navbera salên 1979 û 1983yan de hatine nivîsandin. Piştî 1983yan Barnas tenê çîrokekê (*Hecî Mihemed Eliyê Qelso*) dinivîsîne, lê ev çîrok jî wek ku me li jor jî diyar kir ji bîranînekê pêk tê.

Rojen Barnas di pêşgotina çapa ewilî de dibêje: “Çîrokên Flît Totanî wek çîrok çiqas hêja ne, çiqas ne hêja ne ez bi xwe pê nizamim, hûnê li gorî jêhezkirina xwe biryar bidin. Lê ez bi vê dizanim ku qenc-xerab ew mêweyên çandeya me ya nivîskî ya demekê ne.”¹⁶¹ û di çapa duduyan de jî vê tespîtê lê zêde dike: “*Hingê* û çîrokên di wê de neynika şarezayî an lewaziya min a Kurmancî û çîroknivîsiya min a demekê ye.”¹⁶² Helbet ev şîrove yên nivîskar bi xwe ne. Lê em jî di heman baweriyê de ne ku çîrokên *Hingê* hem rewşa serdemekê li ber çavan radixînin û hem jî tê dîtîn ku ev çîrok herçiqasî yên “hingê” bin jî li gorî nêrîna me hin çîrok hê jî guncaw in. Ev yek jî li gorî dîtina me hem şarezaiya Barnas ya di Kurmancî de nîşanî me dide û hem jî van çîrokan bi qedr û qiymet dike.

Pêvajoya çîrok-nivîsîna Barnas herçiqasî kêr û hindik domiya be jî em di wê baweriyê de ne ku bi van çîrokên xwe yên mîzahî jî xwedî cihekî taybet e û çîrokên wî di edebiyata Kurmancî de li cihekî cuda disekinin.

¹⁶⁰ Barnas, *Hingê*, r. 3-4.

¹⁶¹ Barnas, *Hingê*, r. 4.

¹⁶² Barnas, *Hingê*, r. 7.

Ji ber ku naverok û tehlîla van çîrokan li derveyî xebata me dimîne, em ê di derbarê naverok û tehlîla wan de agahiyên berfireh nedin. Barnas di van çîrokan de bi giştî ji bûyerên rojane û bîranînên xwe sûd werdigire lê tê dîtîn ku van bûyer û bîranînan rasterast nade me, wan li bêjînga edebiyatê dixê û bi çavên nivîskarekî ji me re vedibêje.

Ji bo girîngiya çîroka Barnas, hinekî bê fêmkirin û ji ber ku çîroka “Te Evî Zimanî ji Ku Derê Anî?” hê jî gelekî aktuel e, em dixwazin tenê behsa vê çîrokê bikin. Berî her tiştî Barnas di çîrokên xwe de zimanekî rojane û zelal bi kar tîne û bêyî ku meseleyê dirêj bike nakokiyên civakê li ber me radixîne.

Barnas bi çîroka “Te Evî Zimanî ji Ku Derê Anî?” re me bi nakokiyêke civaka Kurdan dihisîne. Hem dihisîne û hem jî dihêle ku em bi halê xwe bikenin. Çîrok behsa mirovên ku têkoşîna zimên dikin, disekine. Ev kesên ku qaşo têkoşer in, bi demê re hem di bin çand û zimanê serdestê xwe de dimînin û hem jî bêyî ku hay ji xwe hebin tê dîtîn ku zimanê serdestê xwe dipejirînin û yê xwe ji bîr dikin. Lê belê ev kesên ku zimanê serdestên xwe bi kar tînin hay ji xwe tune ne bê bi çî awayî dipeyivin. Lewre rewşeke trajîkomîk derdikeve hemberî me. Ziman her ku diçe dejenere dibe, hin kes ji axaftina Kurmancî fedî dikin û peyvên Tirkî di zimanê wan de pir dibin an jî qet bi Kurmancî napeyivin lê di heman demê de mafê axaftina bi Kurmancî dikin ku ev rewş wek nakokiyêke ecêb derdikeve. Barnas di vê çîrokê de vê fikrê an jî vê rewşê bi estetîka edebiyatê û bi alîkariya diyalogan wek pêkenokekê ji me re vedibêje. Divê em ji bîr nekin ku ev çîrok di sala 1979an de hatiye nivîsandin, lê gava ku em îro jî li civaka Kurdan dinêrin tê dîtîn ku heman nakokî hê jî didome.¹⁶³ Ev jî çîrokê aktuel û xurt dike.

Helbet Barnas berê pênûsa xwe heta jê hatiye daye helbestê û hê jî dide helbestê. Vê yekê bi israr dike û li gorî dîtina me îro roj di helbestê de hatiye asteke bilind. Lê ji bilî helbestvaniya Barnas îcar gava ku em li çîrokên wî dinêrin tê dîtîn ku çîrokên Barnas jî di edebiyata Kurmancî de xwedî cihekî taybet in û hêjayî xebateke berfireh in.

¹⁶³ Parilti, **Gizemli Bir Şair**.

1.2.3. BEND Û GOTAR

Helbestkarî û çîroknivîsiya Rojen Barnas bi kovara *Tîrêjê* dest pê dike û di heman demê de em dibînin ku Barnas di heman kovarê de dest avêtiye bend û gotarên cihê cihê. Piştî kovara *Tîrêjê* jî bend û gotar-nivîsandina Barnas didome. Barnas van bend û gotaran di bin navê *Bi Kurmanciya Gewr* de çap dike.

1.2.3.1. BI KURMANCIYA GEWR

Bi Kurmanciya Gewr ji nivîsên Rojen Barnas yê derbarê mijarên cihê cihê pêk tê ku Barnas van nivîsan carina bi awayekî rexneyî û carina jî bi awayekî ceribandinan dide. Ev pirtûk ji bend û gotarên Barnas yê ji sala 1979 û heta 2014an pêk tê.

Heta niha du çapên *Bi Kurmanciya Gewr* bûne. Çapa yekem ya vê pirtûkê ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ve di sala 2005an de li Parîsê derdikeve. Ev çap bend û gotarên Barnas yê ji sala 1979an û heta sala 2001ê di hundurîne. Çapa duyem jî ji aliyê weşanxaneyê Nûbiharê ve di sala 2014an de li Stenbolê derdikeve. Ev çap jî tevî bend û gotarên çapa yekem, bend û gotarên piştî sala 2001ê û heta 2014an di hundurîne. Çapa ewilî ji 25 nivîsan û ya duyem jî, 9 nivîsên din li çapa ewilî hatine zêdekirin, ji 34 nivîsan pêk tên ku ev bend û gotar bi awayekî kronolojîk hatine dayîn.

Heft nivîsên ewilî yê *Bi Kurmanciya Gewr* di navbera salên 1979-1981ê de di kovara *Tîrêjê* de bi nasnavên Sersax Arda û Mihemed Qasim diweşin. Ji bilî van heft nivîsan bend û gotarên din bi nasnavê Rojen Barnas, di kovar û malperên cihê cihê de derdikevin. Nivîsa dawî jî di sala 2014an de di kovara *Nûbiharê* de bi nasnavê Rojen Barnas derdikeve.

Gava ku em li vê xebatê dinêrin tê dît ku Barnas her dem û her kêlî bi helbestê re rabûye û rûniştîye. Barnas bi van bend û gotaran hemû nêrînên xwe yê derbarê helbestê de ji me re diyar dike. Lewre girîngiya van bend û gotaran ew e ku serpêhatiya ramanên Barnas yê 35 salan berçav dike. Bi alîkariya van bend û gotaran em xwe digihînin gelek fikrên Barnas yê di derbarê helbest û helbestvan,

edebiyat, siyaset, ziman, rêziman, rastnivîs, kovar, mîtoloî, dîrok, jiyana rojane, muzîk, şexsiyetên navdar, mijarên derbarê neteweperweriyê û hwd.

Ji van bend û gotaran tê dîtîn ku haya Barnas ji serpêhatiya ziman, edebiyat, ferheng, kovar, mîtolojî û folklorê Kurdî baş heye û wan baş dişopîne. Barnas derbarê van mijaran de ne gotinên ji ber kirî ji me re dibêje, ew tespîtên balkêş û resen dike. Çawa ku Barnas bi helbesta xwe bi awayekî din li dinyayê dinêre tê dîtîn ku bi van bend û gotaran jî vê nêrînê didomîne.

Hin bend û gotarên *Bi Kurmanciya Gewr*, herçiqasî wext û sal di ser wan re derbas bibin û şert û merc hatibin guhertin jî, li gorî dîtina me ev bend û gotar hê jî aktuel in. Ji bilî van tê dîtîn ku di derbarê heman mijarê de ramanên Barnas hatine guhertin. Ev tablo potansiyeleke têgihîştina Barnas berçav dike.

Rojên Barnas di vê pirtûkê de li ser gelek mijaran rexneyên xwe anîne ziman. Piraniya van mijaran derbarê huner û wêjeyê de ne. Helbet her rexne heja ye, lê di van nivîsan de ya ku pir bala mirov dikişîne nivîsa bi navê “*Şairê Ronahî û Hişyariyê Cegerxwîn*” e. Em dikarin bibêjin ku ev nivîs yek ji wan nivîsa herî berfireh e derbarê helbesta Cegerxwîn de. Rojên Barnas di vê nivîsê de li gorî jiyana û serpêhatiya Cegerxwîn, fikra wî ya edebî û nêrîna wî ya li dinyayê ku çawa xwe di helbesta wî de dide der, ji helbestên ewilî û heta yên dawî li ber çavên me radixîne. Helbet vê pêvajoyê li gorî referansên wêjeya klasîk û cudahiya Cegerxwîn dide. Barnas vê yekê li gorî pîvanên rexneyê dike û di bin bandora rexneyên şexsî de namîne.

Bi van bend û gotarên lêkolînî û ramanî em hem xwe digihînin fikrên Barnas yên di derbarê gelek mijaran de û hem jî ev nivîs têgihîştina Barnas ya di derbarê gelek mijaran de nîşanî me dide.

1.2.4. LÊKOLÎN

Ji bilî helbest, çîrok, bend û gotaran Rojen Barnas bi pirtûkeke lêkolînê jî derdikeve pêşberî me ku ev pirtûk bi temamî li ser danasîna Farqînê ye.

1.2.4.1. FARQÎN (SÎLVAN-SÎLÎVAN)

Heta niha çapeke *Farqîn (Silvan-Silîvan)* hatiye kirin ev çap jî di sala 2013an de ji Weşanxaneya Nûbiharê li Stenbolê weşiyaye.

Ev pirtûk ji nivîsên Barnas yê derbarê Farqînê de pêk tên. Li gorî ku Barnas di pêşgotina vê pirtûkê de ji me re radigihîne, ev pirtûk ji serî de nehatiye plankirin ango tu mebesta Barnas tune ye ku pirtûkekê di darbarê Farqînê de bi vî awayî binivîsîne.¹⁶⁴

Nivîsên vê pirtûkê li ser alîkarî xwestina şaredarê Farqînê yê berê birêz Fikret Kaya tên nivîsandin. Li ser vê dixwazê Barnas ji bo alîkariyê ji şaredar Fikret Kaya re dibêje: “Ez bi tenê dikarim binivîsim.”¹⁶⁵ Bi vê yekê şaredar dilxweş dibe û piştî hin amadekariyên teknîkî Barnas dest bi nivîsandina van nivîsên ku di vê pirtûkê de cih digirin, dike. Ev nivîs ewilî di malpera “Silîvan (www.silivan.com)” de diweşin.

Farqîn (Silvan-Silîvan) ji 12 beşan pêk tê. 11 beş nivîs in û beşa dawî jî beşa fotografan e. Di 11 beşan de bi giştî 57 nivîs hene. Ji van 57 nivîsan 5 nivîs jê ne yê Barnas in, dudu jê bi Kurmancî ne û her sêyên din Barnas ji Farisî, Ingilîzî û Tirkî wergerandine.

Li gorî lêkolînên ku me kirine heta niha xebateke bi vî awayî berfireh li ser Farqînê bi rêkûpêk nehatiye kirin. Çend xebatên ku hene jî Barnas ew wek çavkanî nîşan dane. Lewre em dikarin bibêjin ku ev xebat, derbarê Farqînê de xebata herî berfireh e.

Di vê pirtûkê de Barnas bi awayekî berfiref Farqînê ji her awayî ve berçav dike. Barnas di her du beşên ewilî de li ser wateya navên wê û di derbarê dîroka wê

¹⁶⁴ Barnas, *Farqîn (Silvan/Silîvan)*, r. 9.


¹⁶⁵ Barnas, *Farqîn (Silvan/Silîvan)*, r. 9.

ya kevin de agahiyên balkêş bi referansên nivîskî dide me. Di beşên din de jî, di derbarê Farqîna ku Barnas bi xwe dîtiye me agahdar dike û li ser mîmarî, aborî, jiyana civakî, cejn û şahî, rewşenbîrî, tevgerên siyasî, dîn û bawerî, xwendin û edebiyata Farqînê tabloyeke hêja li ber me radixîne ku ev nivîs dibin çavkaniyên bingehîn yê derbarê Farqînê de.

Tiştên ku di van nivîsan de bala me dikişîne ew e ku Barnas herçiqasî bi salan dûrî Farqînê mabe jî em dibînin ku her tişt di bîra wî de wek xwe maye û tê dîtin ku Barnas tu tişt ji bîr nekiriye. Jixwe Barnas bi xwe jî di pêşgotina vê pirtûkê de dibêje: “Di nivîsên xwe de ez giliyê Farqîna xwe, yanî Farqîna ku min dîtiye dikim. Çi hemkûfên min, çi kesên ji min mezintir an piçûktir, dibe ku Farqînê bi çavek dîtir dîtibin. Tiştê ku wan dîtibe min nedîtibe, berevajî tiştê min dîtibe dibe ku çavên wan pê neketibe”¹⁶⁶

Girîngiya vê pirtûkê ew e ku em bi alîkariya gelek nivîsan xwe digihînin bûyer, tevger û kesên ku Barnas di bin bandora wan de maye. Barnas di beşa 7 (Xwendin), 8 (Rewşenbîrî) û 9an (Tevgerên Nerazîbûn û Pêşverûtiyê li Farqînê) de rewşa Farqînê ji salên 1960î û heta 1980yî bi bîranîn û carcaran jî bi serpêhatiyên xwe ji me re radigihîne. Bi alîkariya van bîranîn û serpêhatiyên em hem xwe digihînin atmosfera van salan û hem jî xwe digihînin potansiyela Farqînê: Rojnamegerî, çapxane, weşangerî, mitîngên van salan, daxwaza perwerdeya bi Kurdî, serpêhatiya kovara Tîrêjê, tevgerên siyasî û Kurdperwerên vê serdemê potansiyeleke mezin ya Farqînê nîşanî me didin. Tê dîtin ku vê potansiyel û atmosferê bandoreke mezin li helbesta Barnas kiriye.

¹⁶⁶ Barnas, **Farqîn (Sîlván/Silvân)**, r. 9.



BEŞA DUYEM
TEMAYÊN SIYASÎ DI HELBESTÊN
ROJEN BARNAS DE

1. TEMAYÊN SIYASÎ DI HELBESTÊN ROJEN BARNAS DE

Bêguman her helbestvan ji ber gelek sedeman berê xwe dide helbestê. Lewre gava ku em li jiyana Rojen Barnas jî dinêrin em dikarin bibêjin ku sedemên ku berê Barnas dane helbestê pir in.

Wek ku me berê jî diyar kir, Barnas di sala 1945an de li Farqînê tê dinyayê, di sala 1952an de dest bi dibistanê dike û di sala 1982yan de berê xwe dide Swêdê. Bûyerên ku di navbera van salan de diqewimin bandoreke mezin li Barnas dikin û tê dîtîn ku ev bûyer dibin sedemên helbesta Barnas.

Destpêka dibistana sereteyî û nezaniya bi Tirkî, bandora sermamosteyê ku wî û civaka wî înkâr dike, aliyên erênî yê dibistana navîn, bandora mamosteyên dibistana navîn, şîretên Serwet Begê Bedlîsî ku wî ber bi welatparêziyê ve dibe, atmosfera xwendina li Farqînê, şagirdiya Îsa Şans, koçkirina ji Farqînê, atmosfera Diyarbekirê, daxwazên hukumeta van salan ku dibêje: “Vatandaş Türkçe Konuş (Welatîno bi Tirkî biaxivin),” pankartên “Vatandaş Türkçe Konuş” ku li ser camekanên dermanfiroşan, dikan û maxazayên curbicûr ên li Diyarbekirê daliqandî, gotina Cemal Gürsel ku dibêje: “Yê ku ji te re bêje Kurd tif li ser çavên wî bike”, têkiliya bi rojname û rojnamegeran re, nasîna rojhilatperwer û Kurdperweran, qedexeyên li ser Kurdî û fikra asîmilasyonê, tevlîbûna pêşandanên civakî û siyasî yên li Farqînê û li derveyî wê, nivîsên Nihal Atsız yên di derbarê Kurdan de, beşdariya hereketa Dr. Şivan, endamtiya DDKOyê û partiya TÎP û sendîqaya TÖSê, sirguniya Surûcê, dorpêçkirina Farqînê, diyalogên ku di navbera wî û qeymeqamê Farqînê de diqewimin, rêvebirîya awarte ya sala 1971ê, biryara mayîna li welat, darizandina ji madeya 125an, li dadgehên înkarkirina Kurdan, bersivên wî yên ku hebûna Kurdan weke rastiyeke civakî dibîne û diyarkirina ku zimanê wî yê dayikê jî Kurdî ye, salên girtîgehê, li girtîgehê xebatên li ser ziman û dersdayina zimanê Kurdî, têkiliya bi İsmail Beşikçi re, piştî girtîgehê rasterast şandina leşkeriyê, biryara ku têkiliya wî ji karmendiyê hatiye birîn, piştî biryara lêborîna giştî ku berê wî didin Muğlayê, bi hêviya vegeerê danûstandinên bi CHPê re û çûnûhatinên Ankarayê, îddîaya dozger Hamdi Seviçê ku Barnas wek ajanê MÎTê bi nav dike, dev ji berdana karmendiyê, vegeera li Farqînê, xebata kovara *Tîrêjê*, piştî çûntaya leşkerî ya Îlona 1980yê terka

welat, jiyana li Swêdê û şer û pevçûnên ku di van salên dawî de li welat diqewimin dibin çavkaniyên helbesta Rojen Barnas.

Helbet çavkaniyên her helbestvanî mijareke girîng e û ev çavkanî hêza helbestvan şanî me dike. Di heman demê çavkaniyên helbestvan zanîn û şiyana helbestvan jî nîşanî me dide. Helbestvan herçiqasî bihêz û xwedî hestan be jî eger zanyariya wî derbarê çavkaniyên ku dê bi kar bîne kêr be nikare ji nav mijarê derkeve. Lewre di mijara çavkaniyan de pêdiviya helbestvan bi zanyariya mijarê jî heye. Ya ku helbestvan ji helbestvanên berî xwe cuda dike jî ev zanyariya derbarê çavkaniyan de ye.

Li gorî ku Eliot tîne ziman, karê helbestvanekî ne ewe e ku hestên nû peyda bike, divê ew hestên ku her kesî serî li wan daye bi kar bîne û van hestan di helbesta xwe de bîne ziman û divê lê miqatebe ku ev hest ne yên wî tenê ne.¹⁶⁷ Di vê çarçoveyê de gava ku em bala xwe didin helbesta Barnas, tê dîtîn ku mijar û çavkaniyên ku ji wan sûd werdigire beriya wî jî gelek helbestvanên Kurd, di helbestên xwe de serî li wan dane. Lê Barnas bi awayekî din ango bi nêrîneke din nêzî van çavkaniyan bûye û bi awayekî din di helbestên xwe de bi kar anîne. Ev yek jî, Barnas ji helbestvanên bêriya xwe vediqetîne. Ji ber vê jî em dikarin bibêjin ku Barnas li çavkaniyên ku hene “kirasekî îro li wan kiriye” ku vê jî hiştiye ku helbesteke nû derkeve holê.

Îrfan Amîda, çavkaniyên helbesta Kurdî di bin bandora dîroka siyasî de dinirxîne û diyar dike ku hin helbestvanan bi serê xwe çavkaniyên vê helbestê veguherandine renekî din. Amîda di vê veguherandinê de rola Cegerxwîn, kovara *Hawar* û *Tîrêjê* girîng dibîne. Di nav Nîfşê *Tîrêjê* de helbestvanên ku ji heman çavkaniyan sûd wergirtine û renekî nû dane helbesta Kurmancî Rojen Barnas, Berken Bereh û Arjen Arî ye. Herçiqasî van helbestvanan ji heman çavkaniyan sûd wergirtibin jî em dikarin bibêjin ku helbesta Rojen Barnas ji hemû derfetên helbesta Kurdî sûd wergirtiye û ber bi helbesta dinyayê ya modern ve bilind bûye.

¹⁶⁷ Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, r. 9-10.

Gava ku mirov bala xwe dide helbestên Barnas tê dîtin ku ji çavkaniyên herî bingehîn yê helbesta Kurdî sûd girtiye.¹⁶⁸

Lewre bi kovara *Tîrêjê* re helbesta Kurmacî dikeve asteke din. Helbestvanên vê nîfşê berê xwe didin çavkaniyên heyî û bi van çavkaniyan re ber bi nûbûnekê ve diçin. Hin xortên Kurdan destên xwe diavêjin pênûsa xwe û pêşkeşiya vê nûbûnê dikin. Armanç ew e ku derd û kulên civaka xwe bi nivîsê ragihînin. Li gorî ku Îrfan Amîda destnîşan dike armanca *Tîrêjê* îspatkirina hebûnê ye.

“Wêje û nivîs ji bo Tîrêj û nîfşê Tîrêjê pirsgirêkeke bûnewerî ye. Zimanê Kurdî qedexe ye, hebûna Kurdan tê redkirin. Ji ber vê yekê jî Kurd tune ne, Kurdî tune ye. Lewre Kurd bixwe jî ji ber nebûna wêjeya Kurdî hebûna zimên jî nîqaş dikin û bawer nakin ku bi Kurdî wêje dikare bê kirin. Ji ber vê yekê jî divê bi Kurdî wêje bê nivîsîn ku hebûna Kurdî bê îspatkirin û bi wê îspatê jî hebûna Kurdan ango hebûna neteweyî. Derdê sereke ne estetîk an jî çawabûna wêje/helbestê ye, derdê sereke yê helbestkarên nîfşê Kovara Tîrêjê îspat e ku ew jî helbesteke refleksîf derdixê holê.”¹⁶⁹

Heman rewş di helbesta Rojen Barnas de jî xwe dide der, lê di *Tîrêjê* de helbesta Barnas li cihekî xweser e. Ji ber ku helbesta Barnas, ji bilî derdê bûneweriyê bi naverok û şeweyeke modern/nû û bi pêşketin û çavkaniyên siyasî, çandî û civakî re girêdayî ye ku ev jî helbesteke nû, asofireh û resen derdixîne meydana Kurmancî. Ango Barnas jî di bin bandora heman çavkanî û pirsgirêkan de maye lê wî ev rewş ji bo helbesteke nû û xweser nekiriye asteng ku di encamê de helbesteke nû derxistiye holê.

Barnas ji pirtûka ewilî (*Li Bandeva Spêde*) û heta ya dawî (*Yeldayê*) bi şêwe û şewazeke nû, li derdora heman çavkanî û temayan diçe û tê. Gava ku em bala xwe didin van temayan, tê dîtin ku Barnas bi piranî li ser temayên wek netewetî, îdeolojiya çepgir, şoreşgerî, bêrîkirina welat, berxwedan, têkoşîn, welatparêzî, ax-welat, dîrok, evîn, biyanistan, êş, koçberî û hêviyê disekine. Helbet helbestên şexsî jî

¹⁶⁸ Îrfan Amîda, “Çağdaş Kürt Şiirinin Kaynakları”, **İnatçı Bir Bahar**, (r.526-536), Birinci Basım, Ayrıntı, İstanbul, 2012, r. 528.

¹⁶⁹ Îrfan Amîda, **Qonaxeke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, Çapa Yekem, Lîs, Diyarbekir, 2016, r. 39.

bi van helbestan re nivîsandîne, lê divê em diyar bikin ku ev cure helbest qet dernakevin pêş. Barnas bêhtir li ser temayên civakî û siyasî disekine û lewre gava ku mirov bala xwe dide helbesta wî, tê dîtin ku her dem bi helbesteke siyasî derketiye pêş. Ji nav van temayan jî yên ku bêhtir derdikevin pêş netewetî û îdeolojiya çepgir e. Barnas di helbestên xwe yên ewilî de serê xwe bêhtir bi îdeolojiya çepgir re diêşîne. Ev jî ji ber bandora vê serdemê ye. Lê bi pirtûka duyem re ev rewş vediguhere helbesteke neteweperwer.

Berken Bereh jî diyar dike ku yek ji taybetmendiya helbesta Barnas pîrbûna mijaran e. Rojen Barnas di warê temayê de pîrreng dibîne. Ev mijar curbicur in. Li gorî Bereh, Barnas bi piranî li ser van mijaran radiweste: “evîn, dûrbûn, mirin, tenêti, bêrîkirin, evîn û hesreta welat, berxwedan, xizani, felsefe, neheqî, zanist, enternasyonalizm, zilm, dîrok, îdeolojî û hwd.” Barnas, gava ku van mijaran li helbestê bar dike carcar ji derfetên bizav û vegotinên wek futurîzm, mîzah, rexne, çîrok, romantizm û ji rastiya civakê sûd werdigire.¹⁷⁰

Bingeh û çavkaniya veguherîna mijarên helbesta Barnas, jiyana wî bi xwe ye û bûyerên ku di nav vê jiyane de diqewimin bandorê li psîkolojiya wî û pê re jî li psîkolojiya helbestên wî dikin. Gava ku jiyana Barnas tê guhertin, tê dîtin ku helbesta wî jî di bin bandora vê guhertinê de dimîne. Lewre her pirtûkeke Barnas xwedî hin taybetmendiyan e û di her pirtûkê de ziman, şêwe, şewaz û tema/mijar jî li gorî vê jiyane xwe diguherînin.

Di nav vê guherînê de Barnas ne helbesteke ku di nava herêmekê an welatekî de xitimiye dinivîsîne, ew cih dide temayên gerdûnî ku van temayan di nava hîs û fikrên xwe re derbas dike û helbesta xwe ber bi cîhanê ve bilind dike. Ev temayên ku di gelek dem û dewranên dîrokê de ji aliyê gelek helbestvanan ve hatine bikaranîn, Barnas ji nû ve wan difesilîne û helbesteke xweser ava dike.

Weke ku me got, em ê bêhtir li ser du temayan hûr bibin: Netewetî û Îdeolojiya Çepgir. Sedemê vê jî ew e ku Barnas di helbesta xwe de bêhtir li derdora van temayan diçe û tê. Herçiqasî me li jor behsa hin temayên din kiribe jî, di

¹⁷⁰ Bereh, **Ağzımda Kimliğim Benim.**

helbestan de tê dîtin ku têkiliyeke wan bi van her du temayan re bêhtir heye. Ji ber vê têkiliyê em ê wan jî di nav van her du mijaran de binirxînin.

1.1. NETEWETÎ

Piştî Şoreşa Fransayê, netewetî wek fikreke siyasî belav dibe û piştî şerê cihanê yê yekem û duyem jî dîsa bandoreke mezin li hemû cihanê dike. Lewre netewetî li cihanê mijareke sereke ye ku gelek bandor li rewşenbîr, nivîskar û helbestvanan kiriye û dîsa gelek rewşenbîran serê xwe pê re êşandiye. Heman rewş di nav rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên Kurd de jî xuya dike ku gelek jê di berhemên xwe de cih dane vê mijarê. Di nav van helbestvanan de Rojen Barnas jî heye. Rojen Barnas di helbestên xwe de pir cih daye vê mijarê û gelek rewşên ku bi vê mijarê re têkildar in di helbestên xwe de bi kar aniye. Ev yek ji ber rewşa siyasî û civakî ya serdema Rojen Barnas pêk hatiye. Heta serdema ku Rojen Barnas helbestên xwe dinivîsîne gelek bûyer li cihanê diqewimin û helbestvanên Kurd ev tema di helbestên xwe de bi kar anîne.

Zülküf Ergün, netewetiyê wek çemkeke siyasî û civakî nîşan dike ku bi amrazên moderniyê tê darijtin û bi êrîşkarî û kolonyalîzmê tê belavkirin ji aliyê gelên bindest ve bi başî bê pêşwazîkirin jî, ji bo desthilatdarên monarşik ên rojhilatî wek metirsiyeke siyasî diyar dike.¹⁷¹ Amîda jî netewetiyê berî her tiştî wek têgeheke siyasî û çandî dibîne ku têkêlî hevbin. Li gorî wî siyasîbûna neteweperweriyê rê li ber çandê vedike ji ber ku pêdiviya wê bi zimên, çand, huner û edebiyatê re heye ku bi vî awayî pêdiviya wê bi hesteke hevpar û nixrên hevpar re heye ku dibe têgeheke çandî jî.¹⁷²

“Netewetî wek îdeolojiyeke siyasî tenê bi siyasetê re sînardar nemaye û rengvedanên wê yên civakî, hizrî, hunerî û edebî jî çê bûne. Ji ber vê mirov dikare bibêje ku netewetî di nav war û dîsîplînên ciyawaz de bûye pireke peywendiyê û çavkaniyeke hevbeş a dahênanê. Di mînakê netewetiyê Kurdî

¹⁷¹ Zülküf Ergün, **Netewetiyê Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de**, Nûbihar Akademî, Jimar 4, Sal 2, İstanbul, 2015, r. 13.

¹⁷² Amîda, **Qonaxê Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, r. 47-48.

de jî di navbera netewetî û edebiyatê de û bi taybetî jî di navbera netewetî û helbestê de tîkiliyeke înteraktîf çê dibe. Ji aliyekî ve netewetî bergeheke nû li ber helbesta Kurdî vedike û wê bi naverokeke nû dadigire, ji aliyê din ve jî helbest dibe hilgirê herî çalak ê îdeolojiya neteweyî û wek amrazêke populer ji bo avakirin û belavkirina wê roleke girîng digêre. Ji ber vê tîkiliya du alî jî ji destpêka netewetiya Kurdî heta roja îro hemû reng û taybetiyên netewetiya Kurdî di helbestê de reng vedide û helbest dibe cihê bercestebûna hizrên netewetiya Kurdî.”¹⁷³

Amir Hassanpour dibêje ku netewetiya Kurdan di nav cîhana musulmanan de belkî jî yek ji wan îdeolojiya herî kevnar e û naşibe yeka din ku em dikarin bikişînin heta sedsalên şazdeh û hivdehan.¹⁷⁴ Îbrahîm Seydo Aydogan jî diyar dike ku civakeke wek Kurdan ku hem bê dewlet e û hem jî ji aliyê dewletên gelên din ve bi sînoran hatibe perçekirin û bindestkirin û ji hev hatibe feşkilandin, bi ser de jî nasname û zimanê wî lê hatibe qedexekirin; divê ku pêvajoya netewebûyîna wan jî li ser hin bingeheên din ava bibe. Lewre di avakirina netewebûyîna civakê de dewlet ne şertê bigehîn e lê hebûna dewletê gelekî girîng e ji bo xurtkirina netewetiyê. Ji ber vê jî di rewşa gelekî weke Kurdan de ku bi her awayî hatiye parçekirin, netewebûyîna wan jî li ser bawerî an jî îdeolojiyeke hevpar ava dibe. Lê divê em diyar bikin ku ev netewebûyîna bi vî awayî pirsgerêkeke mezin e, ji ber ku Kurd di nava axeke çar perçeyî de dijîn û bandora welat, çand, ol, ziman û siyasetên cuda li ser wan dibe.¹⁷⁵ Lewre em dikarin bibêjin û jixwe bi awayekî diyar jî xuya dibe ku ev bandor xwe di helbesta Kurdî ya neteweperwer de eşkere dike. Ev yek li welatên cihê bi awayên cihê xuya dibin ku bi taybetî jî di helbestê de xwe bêhtir berçav dike.

Bi fikra netewetiyê re, gelek tevgerên Kurdan yên neteweperwer jî ava dibin û li hemberî dagirkeran derdikevin. Bi van tevgeran re fikr û hesta netewetiyê di nav rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên Kurd de berbelav dibe. Zülküf Ergün diyar dike ku netewetiya Kurdî di çarçoveya rêxistinên civakî û siyasî de tê temsîlkirin û heta destpêka salên 1940î jî komeleyên Kurdî dibin cihê dahênana gotar û çanda neteweyî, lewre di bin baskên van komeleyan de bi piranî wek organên wan ên resmî

¹⁷³ Ergün, *Netewetiya Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de*, r. 12

¹⁷⁴ Hassanour, *Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik*, r. 28.

¹⁷⁵ Îbrahîm Seydo Aydogan, *Guman-1*, Çapa Yekemîn, Lîs, Diyarbekir, 2013, r. 307-308.

yan rojnameyek yan jî kovarek tê derxistin û ev jî dibin cihê geşbûna edebiyata Kurdî ya neteweyî.¹⁷⁶

Bi van rêxistinên civakî û siyasî re, di nav edîp û ronakbîrên Kurdan de romantîzmeke neteweyî serî hilda û di berhemên van rewşenbîran de ev fikir derket holê. Li gorî nêrîna Zülküf Ergün Hacî Qadirê Koyî, Ebdurehîm Rehmî Hekarî, Pîremêrd û Cegerxwîn wek helbestvanên ewilî yê neteweperwer tên qebûl kirin. Ji van helbestvanan jî, li gorî ku Ergün tîne ziman di helbesta Kurdî de helbestvanê ku yekem car netewetî û mijarên ku bi neteweperweriyê ve girêdayîne, di helbestên Hacî Qadirê Koyî de xuya dibin. Ango em dikarin bibêjin ku netewetîya modern a Kurdî di helbestên Hacî Qadirê Koyî de derdikevin holê.¹⁷⁷ Ji ber vê çendê wek yekemîn helbestvanê romantîk ê Kurd Hacî Qadirê Koyî bû alahilgirê romantîzma neteweyî ya Kurdî.¹⁷⁸

Di vê çarçoveyê de em jî dikarin li van helbestavanan Rojen Barnas zêde bikin. Helbet ev zêdekirin ji ber naveroka helbestên wî yê ku zêde serê xwe bi neteweperweriyê êşandiye, tê. Fikra netewetiyê, di helbestên Rojen Barnas de û di helbestên helbestvanên ku me li jor diyarkirine ne bi heman awayî xuya dibe. Ji ber ku heta dema Rojen Barnas fikr û hesta netewetiyê gelekî tê guhertin, şêkilvedana netewetiyê jî bi awayekî din xuya dibe. Lewre di serdema Barnas de, pîrsgîrêka Kurdan li hemû dinyayê belav dibe û dibe xwedî ramanên cudatir. Ji ber vê jî naveroka helbestên Rojen Barnas li gorî vê guhertinê û demê, behsa hestên Kurdewarî û neteweperweriyê dike.

Rojen Barnas simbol û metaforên netewetiyê di helbesta xwe de bi cih dike û helbesta xwe li ser zemîna simbol û metaforên neteweyî ava dike. Ji ber vê jî em dikarin bibêjin ku di helbesta Barnas de ramanên herî li pêş an jî beriya her tiştî neteweperwerî ye. Lê divê em bizanibin ku Barnas bi helbesta xwe propagandaya netewetiyê nake. Terry Eagleton dibêje ku em dikarin bifikirin ku helbest ji motîfeke wateyê avabûye ku di heman demê de armanca wê ew e ku tiştêkî bide kirin. Helbest

¹⁷⁶ Ergün, *Netewetîya Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de*, r. 17.

¹⁷⁷ Ergün, *Netewetîya Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de*, r. 14.

¹⁷⁸ Zülküf Ergün, *Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn*, Nûbihar Akademî (Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî), Cild 1, Jimar 1, Sal 1, Îstanbul, 2014, r. 15.

rasterast mudexeleyî tşkiliyên mirovan nakin lê dihêlin ku hestên heqîqet û xweşîkbûnê di wan de ava bibin ku bi vê yekê re mirovan ber bi kirinekê diajon. “Helbest weke ku tiştekî ji me re dibêjin, tiştekî bi me jî dîkin; ew bi qasî ku berhemên mirovekî bin, bûyerên civakî ne jî.”¹⁷⁹

Herçiqasî helbestên wî yên dawî ji aliyê naverokê ve guherîbin jî, tê dîtin ku Barnas dîsa ji hest û ramanên Kurdperweriyê dîr neketiye. Barnas di van helbestan de bi rastiya xwe, bi kûrahî û xweşiya xwe coşeke mezin û hestên dewlemend ên Kurdperwerî di dil û hinavên mirov de diafirîne.¹⁸⁰ Lewre netewe û mijarên ku bi neteweperweriyê ve girêdayîne di helbesta Rojen Barnas de bêhtir beloq in. Sedemên vê jî hem ji ber serdema helbestên wî û hem jî ji ber bûyerên ku di van salan de diqewimin berê pênuşa Barnas didin vê temayê.

Divê em ji bîr nekin ku Barnas di serdema ku helbest nivîsandine de endamê Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TİP) ye. Ji ber ku gelek Kurdperwerên van salan (1970-1980) dikarin li vir xwe îfade bikin, dibin endamên vê partiyê. Barnas jî yek ji van Kurdperweran e. Lewre em dikarin bibêjin ku fikra Kurdperwerî/neteweperweriyê ji van salan de xwe di helbestên wî de bi cih kirine ku ev fikir di hemû pirtûkên wî de xwe dide der.

Berî her tiştî di meseleya neteweperweriyê de peywira helbesta Barnas; tiştên ku nebûye dike, yên ku nexuyane dide xuyakirin, yên ku nehatine bihîstin dide qîrandin. Gava ku van dike jî ji nirx, ked, fikir û hestên mirovahî û neteweperweriyê dîr nakeve. Barnas di helbesta xwe de rastiya xwe û civaka xwe, rasterast nade. Ew xwe teslîmî rastiya hişk nake. Ew xeyal, hêvî û rastiye tevî hev dike û dide.

Di encama xwendina helbestên Rojen Barnas de, li gorî nirxandinên ku me kirine, me netewetî di binbeşên “Bêriya Welat, Bîndestîya Welat, Dîmenên Welat, Berxwedana Netweyî, Nasnameya Netweyî û Zîmanê Netweyî” de tespît kirine û tşkiliya van binbeşan bi mînakên ku me ji helbestan giritine şîrove û berçav kirine. Ji bilî van binbeşan wek beşeke sereke me “Îdeolojiya Çepgir” jî dîsa bi mînakên helbestan tşkiliya wê ya bi netewetiyê re diyar kiriye.

¹⁷⁹ Terry Eagleton, **Şiir Nasî Okunur**, Çeviri: Kaya Genç, Agora Kitaplığı, Birinci Basım, İstanbul, 2011, r. 140-143.

¹⁸⁰ Çelîk, **Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas**, r. 37.

1.1.1. BÊRIYA WELAT

Rengvedana welat di nav helbestên Rojen Barnas de bi awayekî siyasî derdikeve hemberî me. Welat wek cih û warê netewe û niştecihbûnê xuya dibe. Ev cih an jî welat bi ruh û teybetiyên simbolik ên neteweyê re tên xemilandin. Di helbestên Rojen Barnas de welat bi sê awayan tê bercestekirin. Yek jê ji ber ku Rojen Barnas ji welat dûrdikeve, ku ev dûrbûn ji ber rewşên siyasî pêk tê, bi awayekî bêrîkirinê rû dide. Ya din ji ber zilm û zorderiya li ser welat derdikeve holê ku ev jî ji ber bîndestîya welat rû dide. Ya din jî rengvedana dîmena welat e.

Gava em bala xwe didin dîroka têkoşîna neteweya Kurd, tê dîtîn ku gelek rewşênbîr, nivîskar û helbestvan ji ber gelek sedeman ji welat surgun û li xeribiyê bi cih bûne. Sedema herî mezin ya ku ji welat dûrketine, ew sedem e ku di nav tevger û şoreşan de cih girtine. Piştî têkçûna tevger û şoreşan hin rewşênbîr, nivîskar û helbestvan ji ber ku jiyana wan dikeve xetereyê, mecbûr mane ku terka welat bikin. Ev dûrketin, ne tenê dûrketina ji cihekî bo cihekî din e. Dûrketina ji çand, civak, ziman û hemû simbolên neteweyî ye. Vê yêkê jî berê wan daye jiyaneke nû. Herçiqasî di vê jiyana nû de tu sedemeke ku jiyana wan têxe xetereyê nîn be jî, tê dîtîn ku dîsa li gorî derfetan dixwazîn tevî jiyana li welat bibin. Ji ber vê jî tê dîtîn ku dîsa hiş û dilên wan her li welat e. Lewre di nav vê dûrbûnê de hesteke bêrîkirina welat ava dibe ku ji bo ev bêrîkirin jî biceribe pêdiviya wan bi azadiya neteweyî heye.

Gelek helbestvanên Kurd ji ber rewşa hebûna tevlihev û rewşa welat a nebaş di gelek serdeman de koçber û derbeder bûnê. Hinek ji van helbestvanan bi dilê xwe koç kirine û hinek ji wan jî ji ber kar û barê xwe yê siyasî mecbûr mane ku koç bikin. Ev dûrketina ji welat, bûye sedemê ku helbestvanên Kurd zêdetir hogirî welat bibin û welat û niştîman li ber dilê wan şîrîntir bibe. Bi vê yekê re jî helbestvanan zêdetir xema welat û niştîmanê xwe xwarine ku di helbestên wan de ev xem bi hesta bêrîkirinê re berçav dibe.

Yek ji van helbestvanên ku ev xem xwe di helbestên wî de berçav dike Rojen Barnas e. Rojen Barnas ji ber kar û barê xwe yê siyasî mecbûr dimîne ku ji welat koç bike. Piştî vê koçê em dibînin ku rengên helbestên wî jî tên guhertin. Xem û kula

welat xwe di hesta bêrîkirinê de didin der. Di helbestên Rojen Barnas de, armanca me ya ji bêrîkirinê ew e ku ev hest ji ber dûrketina ji cih û niştecihê xwe dûrketin an jî surgun e. Ev dûrketin an jî surgun ji ber sedemên siyasî derdikeve holê.

Edwar Said surugunê wek rewşeke pir xetere dibîne û dibêje ku surgun ew tişt e ku di hişê mirovekî ku ji cih û warê xwe yê ku lê ji dayik bûye dûrketiye, quleke mezin vekiriye ku tu kes nikare ji bin vî barî bi rehetî derkeve. Li gorî wî kesên surgun ji kok, ax û rabirdûya xwe hatine birîn. Bi pîranî artêş an jî devleteke wan tuneye lê her dem li dû avakirina van tiştan in. Ji ber vê jî kesên surgun bi gelemperî piştî xwe didin îdeolojîyekê, da ku xwe bikin perçeyek ji têkoşîna gelê xwe. Ev rewş derûniya kesên surgun berçav dike ku Said ji bo kesên surgun tu cih û warî ewle nabîne. Lê vegera mal an jî cih û warê xwe jî ne pêkan e. Ango kesên surgun mecbûr in ku tehemul bikin, ji ber ku tu kesê surgun ne li cih û warê xwe ye. Lewra surgun ne bijartinek e. Surgun ew tişt e ku hatiye serê te û tu têkiliya wê bi jiyana te re tuneye ku tu mecbûr mayî ku hînî vê jiyânê bibî. Lewre tu koçber û bê navend î.¹⁸¹

Di vê çarçoveyê de gava ku em bala xwe didin jiyana Barnas, ku nîviyê emrê wî li surgun û biyanistanê derbas bûye, rengvedana welat di hin helbestan de xwe di nav hesta bêrîkirinê re dide der û gelek rengvedanên surgunê di wan de xuya dibin. Ji ber vê yekê ev rengvedana welat di helbestên wî de bi awayekî hisret xuya dibe. Lewre em dikarin vê rengvedana welat bi dûrbûnê ve girê bidin û li gorî vê dûrbûnê berê xwe bidin van helbestan. Rojen Barnas di helbestên xwe de, bandora vê dûrbûnê û encamên ku ji ber vê dûrbûnê derdikevin holê nîşanî me dike. Lê divê bê zanîn ku ev bêrîkirin ya li hemberî welat e. Hê di pirtûka ewilî de û di helbesta ewilî ya bi navê “Bêriya Welat” ya vê pirtûkê de ev rengvedan xuya dibe. Barnas bi şev û roj, di xewn û xeyalê de, bêriya welat dike û bi tirs e ku ev xwezî û keser pê re bimîne heta mirinê.

Bêriya welat, di dilê min de
Bêriya welat, şîşa sor kirî
Dil hilûvk e
Dil kezaxî
Dilê ciwan

¹⁸¹ Edward Said, **Kış Ruhü**, Çeviri: Tuncay Birkan, İkinci Baskı, Metis, İstanbul, 2006, r. 28-42.

Pê dax kirî.¹⁸²

Barnas piştî ku ji zindanê derdikeve û surgunî Muğlayê dibe cara ewilî ji welat dûr dikeve û ev dûrbûn bi xwe re bêrîkirinê ava dike di helbestên wî de. Em dikarin bibêjin ku gelek helbestên ewilî ku di wan de hesta bêrîkirinê heye, ji ber vê dûrbûnê ava bûye. Helbesta “Destpêka Biharê ye Niha li Welatê Min” jî di bin bandora heman hestê de hatiye nivîsandin. Helbest bi awayê xeyalkirinê destpêka rengvedana bihara welat pêşkeşî me dike. Barnas rengvedana welat bi bişkifîna nêrgizan, bişîrîna beybûnan, çem û robarên zirav, ava ku di lêvên newalên şirav re diherike, guliyên darên rengareng û çivîkên ku stranên evîne distrên berçav dike.

Destpêka biharê ye, niha li welatê min
Nêrgiz bişkifîne li avgîran
Û beybûn dibişirin
Li welatê min niha destpêka biharê ye
Dixulxulin çem û ro li berwara
Ji lêvên newalan, şirav
Zirav... zirav
Dişîrşirin.
Gulyên dara xemilîne rengareng
Şar û temezî girêdane li dora kofîyan
Çivîk distrên stranên evîniyê
Çivîk bi tolazî niha difirin.¹⁸³

Risteya “li welatê min niha destpêka biharê ye” di xwe de hem dûrbûnekê hem jî berîkirinekê dihêwirîne. Dûrbûn, xerîbî û koçberî bandoreke wisa li ser helbestvan dike ku êdî wî bêzar û bêtaqet dihêle. Di pasaja çarem de Barnas li xwe mikur tê ku biyanî û li biyanistanê ye.

Ez biyanî me li van deveran
Li kujekî guhê biyanistanê
Destpêka biharê ye niha li welatê min
Darê beîvan,
Bi xemlûxêz û bi xişir in.¹⁸⁴

Gava ku mirov bi temamî li vê helbestê dinêre tê dîtî ku Barnas ji biyanistanê li welatê xwe difikire û çî bûyerên xwezayî ku li welat diqewimin bi texmînî tabloyeke bihara welat ji me re vedibêje. “Çem û rûbar dixulxulin ji lêvên

¹⁸² Barnas, **Kadiz**, r. 23.

¹⁸³ Barnas, **Kadiz**, r. 24.

¹⁸⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 24.

newalan.” Ev tabloya ku bi biharê ve hatiye girêdan bêhtir bi rewşeke erênî ve tê şayesandin. Ev jî hem bêrîkirinê û hem jî hêviyê xurt dike. Di pasaja dawî de jî em dibînin ku ji ber vê bêrîkirinê êdî hedana wî nemaye.

Lê!..
Hun sosin û benefşên vê deverê
Reş-rihan medin ber tûncikan
Gulyan vemeweşînin bi bayê spêdê re
Hedana min nema, min aram nîn e
Dil û cergê min mepincêrin.¹⁸⁵

Bêriya Barnas her dem berê xwe dide welat. Kêm caran ev bêrî ji bo evîn û hezkiriyê ye. Di helbesta “Dûr Ketin”ê de ev her du bêrîkirin bi hev re xuya dibin. Dil ji hesreta welat kûr e, bêbinî ye û yar jî dûredest e. Dûrketina ji welat û yarê bêriyê ava dikin û Barnas vê dûrketinê wek dûrketineke jehrîn bi nav dike.

Dil kûre, yar dûredest
Dûr ketin para min e
Kesî nola min neçêst
Zirav-çêj e, jehrîn e.¹⁸⁶

Di pirtûka ewilî de hin helbestên evînî hebin jî ev evîn, ne tenê evîneke ku li hember yekê ye. Ev evîn gelek caran wek “evîna welat” dixuye. Helbesta “Tekya Evînê” vê evîna welat tîne ziman. Di rista ewilî de navê “me” -ne navê “min”- di nava lêvê dîlberekê de ye ku li gorî nêrîna me ev “dîlber” welat e. Di helbestê de em têdigihîjin ku bêhtir behsa welatekî û evîndarên vî welatî tê kirin. Vekirina “nûjen ya tekya evînê” û “murîdê welat” nêrîneke din e. Peyvên tekya, tekke, tarîqat û murîd berê me didin kevneşopiyekê, lê gava ku ev peyv ji bo evîna welatekî tije bibin û ev cih ji bo welat bixebitin, ev dibe nêrîneke nûjen. Lewre em dikarin bibêjin ku Barnas bi argumanên kevin rengvedaneke nû ya welat ava dike.

Di lêvê dilberê de navê me
Bêşikbirin wird û selewat in
Me tekya evîna nûjen vekir
Ku tê de gişt murîdê welat in.¹⁸⁷

¹⁸⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 24.

¹⁸⁶ Barnas, **Kadiz**, r.33.

¹⁸⁷ Barnas, **Kadiz**, r.50.

Helbesta “Rojbaş Roza!”yê di her pasajekê de berê me dide mijareke xweser û gelek îmaj û dîmenan bi hev ve girê dide ku li gorî nêrîna me ev girêdan di heman demê bi kompozîsyoneke serkeftî hatiye avakirin. Ji ber vê jî helbest bi gelek şîrovevên curbicur dikare bê şîrovekirin. Evîn, welat, dagirkerî, azadî û bêrîkirin tevlihev û bi hev re xuya dibin. Di helbestê de diyar dibe ku Barnas ji dinyayê, berpirsariyên xwe, siyasetê û ji rabirdûyê tu carî qut nebûye. Lê herçiqasî helbest bi gelek rengvedanan bê xûyakirin jî, di helbestê de bêhtir bêrîkirin derdikeve pêş ku Barnas di her pasajekê vê helbestê de vê bêrîkirinê bi regekî din diyar dike. “Roza” herçiqasî wek jinekê bê xûyakirin jî em di wê baweriyê de ne ku weke metafora welat hatiye bikaranîn û di her pasajê de ev metafor bi gelek awayan xwe diyar dike.

Destpêka helbestê berê me dide sibehekê ango helbestvan bi “Rojbaş”ê dest pê dike. Lewre di sibehekê de em derbasî helbestê dibin. Jixwe di pasaja duyem de em dibînin ku di “berdestî sibê û di xewka şîrîn” de, dengê helbestvan nagihîjê Rozayê. Ewîlî mirov dibêje qey li cem hev in lê piştê ji nûşkê ve em dibînin ku “bi çivîk-firê” “sê hezar kîlometre ji hevdû dûr” in. Ji vir diyar dibe ku helbest li dûriyê hatiye nivîsîn. Lê li hemberî vê dûrbûnê girêdaneke giyanî di navbera wan de heye.

Rojbaş
 Beyanî be xêr
 Ez û tu
 Bi çivîk-firê
 Sê hezar kilometre ji hevdû dûr
 Lê, bi giyanî
 Ji canê hev ji hev re nêzîktir in.

Dengê min nagihîje te, dizanim
 Di vê berdestî sibê
 Di xewka şîrîn
 Pêjnê
 Hilîne
 Ku bibêjime:
 Di xewnê de rojbaş
 Di xeyalê de beyanî be xêr.¹⁸⁸

Di pasaja sêyem de helbestvan ji ber dûrbûna ku di giyanê wî de hesta bêrîkirinê avakiriye bi gilî û gazin e. Lê ev hesta ku ji hinavê wî wek axîneke sotî

¹⁸⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 190.

derdikeve, ne weke “no-nûçeyekê” bi nav dike. Ango ya dilê xwe tîne ziman ku ev dil ji ber bêrîkirinê bûye kaniya agir û kevanê evîna ku bi hesreta welat mişt e.

Bi nermî çavê xwe veke
Tevzî li ser tevziyê bi şîranî
Belav ke li canê xwe
Û bi giranî
Bi bîr bîne ku
Ev herikîna pêlên pêjnîn
Di ser bêj û derya de
Bi milmilîn
Ji hinavê min î sotî
Bi axîn
Derketiye.

Ev ne no-nûçe ye, metirse
Ev ragihîn
Ev dazanîn e, ji dilê min ve
Dilê min
Kaniya agir
Dilê min
Kevanê evîn.¹⁸⁹

Weke ku em dizanin Barnas piştî darbeya leşkerî diçe Swêdê û li vir bi cih dibe. Di vê pasajê de Barnas şayesandina erdnîgariya Skandînavyayê dike. Li gor nerîna me ev şayesandin bi şibandike pir balkêş hatiye kirin. Helbet armanca helbestvan ne ew e ku pesnê vê erdnîgariyê bide. Bi vê şayesandinê re armanc ew e ku dûrbûna xwe ji aliyê erdnîgariyê ve bîne ziman. Ev erdnîgarî, erdnîgariyeke sar û seqemî ye û dilê vê erdnîgariyê bi hêviya germbûnê diperpîte. Di vir de helbestvan di navbera xwe û vê erdnîgariyê de şibandineke ava dike. Vê erdnîgariyê wek hêlîneke sar ya tenêtiya dilê wî xwe berçav dike. Lê ev dil bi hêviya “Roj”ê dixewire. Di vir de “roj” dîsa wek semboleke welat derdikeve pêş ku xewirandin jî wek hesta bêrîkirina welat diyar dibe.

Xarîta dinyayê veke li ber xwe
Li hêla bakurîn binihêre
Tê bibînî
Bejekî
Ku mîna nikulekî kêrr
Serejêrî Atlantîkê biye
Serî,

¹⁸⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 190-191.

Ji derya qeşemê gewr
Û dilê wê
Ji bêriya Rojê dixewire
A...
 ha!
Li wir e,
Hêlîna tenêyiya dilê min.¹⁹⁰

Di vê helbestê de diyar dibe ku biyografiya Barnas û helbesta wî ji hev nayên qutkirin. Lewre em mecbûr in ku ji vir berê xwe bidin helbestê. Helbest piştî çûna Swêdê, di 1983yan de hatiye nivîsandin. Bi vê yekê re bandora biyanistanê di helbestên Rojen Barnas de pir berçav dibe. Bi taybetî jî di pirtûka *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* de bêrikirina ku li vê biyanistanê ava dibe bêhtir xuya dibe. Hiş û aqlê Barnas her kêlî li welat e û di dilê wî de her dem hêviya veşerê heye. Di pasaja şeşem de biyanistanê wek dûrketineke ji “çanda-civakî” bi nav dike û vê yekê bi şibandina masiyekî ku bê av bimîne berçav dike. Û dizane gîhayekî ku ji axa xwe dûr bikeve dê tu carî li ser axeke din şîn nebe.

Gul li şaxê
Kulîlk di guliyê xwe de geştir e
Ku ji avê derkeve
Masî dimire
Rast e,
Meriv meriv gotiye
Masî jî masî
Em
Ne masî ne, ne gul in, ne kulîlk
-Bi çavek xwas
 gava lê bê nihêrtin-
Lê em jî
Ji hêlîna xwe ya çande-civakî
Ku derkevin
Ji wan gelek
Ne têveltir in.

Ez
Ne şaxa hewrê
Ne şiva mêwê me
Ku bê reh hêşîn bibim ji nû ve
Ji nû ve reh berdim di axê de.¹⁹¹

¹⁹⁰ Barnas, **Kadiz**, r. 191.

¹⁹¹ Barnas, **Kadiz**, r. 193-194.

Li xwe mukur tê ku dê tu carî nîkaribe xwe û biyanîstanê bi hev ve girê bibe. Lewre xwe tenê hîs dike, di okyanusa mezin de weke dilopekê, ku ne winda dibe û ne difetise. Di vê “windabûn” û “fetisîn”ê de dîsa bêrîkirina welat xwe dide der.

Biyânî dijwar e, Roza
Biyânîfî
Kabûsek har e, di ser sînga meriv de
Û tenêyî
Mîna dilopeke xwas
Li Okyanûsa Mezin
Bi serê xwe
Bê windabûn
Bê fetisîn
Jiyîn...¹⁹²

Barnas “bo welatê xwe ji welat dûr” e. Di helbestê de pasajek jê rengvedaneke ji texayulkirina welat berçav dike. Wext ji nişkê ve tê guhertin. Dîcle, Firat, Amed û Deryaya Wanê me dibin welat. Helbest di sibeheke sar ya Swêdê de hatibe nivîsandin jî niha li welat êvar e. Em di wê baweriyê de ne ku ev ferqiyet dide xuyakirin ku hişê Barnas bi her awayî li welat e. Jixwe ew bi xwe jî di helbestê de tîne ziman ku dil û hişê wî her dem bi welat ve ye.

Ey olana heyvê
Ku niha
Leylana wê li Dîclê
Li Firatê diîse
An mîna keçperiyek dileyize
Li ser deryaça Wanê
Û ey kevirê reş ê Amedê
Ku niha
Li ber tava wê dibirise
Hun nizanin ku dilê min
Çawa bi we ve ye,
Bi bêriya we çawa davêje
Çawa dimerise
Ji weşê carek.¹⁹³

Piştî ku Barnas li biyanîstanê bi cih dibe û şûnde helbestên wî jî li gorî vê biyanîstanê rûdidin. Barnas tu carî li vê biyanîstanê germ nabe, ji ber ku dil, hiş û berê wî her dem li welat e. Dîtina welat ya careke din her di bîr û fikra wî de ye ku

¹⁹² Barnas, **Kadiz**, r. 192-193.

¹⁹³ Barnas, **Kadiz**, r. 193-194.

helbestvan xwe bi vê hestê re her dem dixapîne. Ev rewş di helbesta “Resamê Kurd” de bi awayekî eşkere xwe dide der. Ji vê biyanîstana ku li para wî ketiye ne razî ye. Barnas ji resam daxwaz dike ku jê re resmekî xêz bike ku di vî resmî de xalek ji welat hebe. Lê xaleke tijê hêvî ku bi mefer biçirise li raserê hemû tûwalê.

Asiwayên Kurdistan
-Ji zeriqîngehê ta zerketavê-
Ne bê mefer in, bê şik
Lê, li vê perrê biyanistanê
Cêlîbûn para me ketî
Zivistan helişî bi dilê me de.¹⁹⁴

Bi van helbestan jî diyar dibe ku dûrbûn û biyanistanê bandoreke mezin li hest û fikrên Rojen Barnas yê neteweperwer kiriye. Ji ber jiyana Rojen Barnas ya ku li dûrî welat derbas kiriye, weke ku di van mînakên de jî diyar dibe tê dîtîn ku ji ber dûrbûn û koçberiyê bêtaqet û bêzar e. Ev rewş di helbestên wî de bi hesta bêrîkirinê re hatiye honandin. Wek helbestvanekî neteweperwer Rojen Barnas, ji ber ku ji mecbûrî terka welat kiriye û li derveyî welat jîyan kiriye xem û kulên dûrbûna jî welat û niştîman gelekî xwariye û vê xemê jî rengvedaneke bi vî awayî di helbestên wî de avakiriye.

1.1.2. BINDESTIYA WELAT

Di helbestên Rojen Barnas de mijareke din jî bindestiya welat e. Welatê ku di van cure helbestan de xuya dibe û tê behskirin, welatekî dagirkirî û perçekirî ye. Ev helbestên Barnas ji ber zilm û zordariya li ser welat û bindestiya ku welat ji ber vê zilm û zordariyê dijî, derketine holê. Ev cure helbest nîşanî me dîkin ku Rojen Barnas dîsa wek helbestvanekî neteweperwer bi helbesta xwe tev digere ku bi van helbestan bindestiya welat berçav bike. Divê em careke din diyar bikin ku fikr û baweriyaya neteweperwer ya Rojen Barnas, berê pênuşa wî dide van helbestan. Di van helbestan de diyar dibe ku têkoşîn û şoreşgeriya Rojen Barnas ya li hember dagirker, zilimkar û zordaran her berdewam e.

¹⁹⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 207.

Di van cure helbestan de Barnas li pey azadî, xelasî û rizgariya welat ya ji bindestiyê ye. Ew li pey xerakirina sînorên çêkirî yên li ser axa welat hatine kişandin û dijminê kesên ku welat perçe perçe kirine. Ji ber vê jî di van helbestan de bi zimanekî tund li hember hemû rengvadanên neyînî yên li ser axa welat derdikeve û bindestiya welat bi tu awayî napejirîne.

Rojen Barnas di hin helbestan de carcaran ji neteweya xwe bi gilî gazin be jî, ev ji ber ku ji bindestiyê neraziye derdikeve holê. Barnas di helbesta xwe ya yekem “Çûm Diyarbekir”ê de tabloyeke neyînî ya Diyarbekirê vedibêje ku di vê helbestê de Diyarbekir wek semboleke ji welat berçav dike. Helbet ev tabloya neyînî ji ber bindestiya welat e. Herçiqasî tabloyeke neyînî di helbestê de xuya bike jî, helbest hêviya Barnas ya ji welat nîşanî me dide. Lewre ew di serî de ne li benda vê tabloyê ye. Herçiqasî “bi kêf û bi eşq” be jî rewşa ku çav lê dikeve ne li gorî hêviya wî ye. Barnas ji vê tabloyê ne razî ye. Ew li benda rewşeke erênî ye an jî dixwaze ku rewşeke erênî bibîne loma di serê helbestê de bi heyecan e. Hê di helbesta ewilî de hêvî û daxwazeke wî ji neteweya wî xuya dike. Ji ber ku Barnas di vê helbestê de wek neteweperwerekî tev digere û naxwaze ku gelê wî ne di nava tabloyeke neyînî de be. Lê di çarîna duyem de ev hêviya wî di dile wî de dimîne. Xortên Diyarbekirê li qehwexaneyan rûniştine û ketine nava lîstikan. Bê hêvî û armanc in û Barnas jî tu hêviyê di wan de nabîne.

Çûm qehwan gişt xortên bîst û yek salî
Bi berçavk, qerewat nasin dileyzin
Karê wan tewle bû, ji fikrê xalî
Bê omîd, bê armanc, tevek bê feyz¹⁹⁵

Barnas ji dem û rewşa ku neteweya wî tê de ye ne memnûn e. Daxwaza wî ew e ku ev rewşa bindestiyê bêguhertin. Lê di çarîna sêyem de dibîne ku rihspî jî li hember vê rewşa neyînî dernakevin û tu îfîrazeke wan nexuyaye. Xema Barnas ew e ku neteweya wî hinekî li xwe biwerqile û li hember rewşa bindestiyê tevbigere.

Rûsipî sekinîbûn li ber mizgeftê
Tesbîhan dikşandin ji bona îrem
Ji wan re jî wê der koşkê sedef tê
Nedigotin ta kengê dom bike ev dem¹⁹⁶

¹⁹⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 19.

¹⁹⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 19.

Heta çarîna dawî Barnas rewşa ku ne li bendê ye rave dike. Di çarîna dawî de Barnas li xwe mukur tê ku ji ber vê rewşa bîndestiyê dikeve nava rewşeke xerab. Ji ber ku li gorî fikra wî eger Kurd xwe nedin hev û her dem di rewşa heyî de bimînin dê negihêjin armancên xwe yê neteweyî. Lewre ji Diyarbekirê bi gilî û gazin e.

Ez reş û tarî bûm, sar bûm di cî da
Ev çî hal, ev çî xew, ev çî rexawet?
Me digot ji bo te canê me fîda
Zeriya enîreş, bajarê Amed!¹⁹⁷

Barnas bi helbesta “Ez Mendalekî Çar Salî Me, Mamo!” re careke din berê me dide welat. Mehabad dîsa wek perçeyekî sembolîk a dîmena welat berçav dike. Berî vê helbestê cara ewilî di helbesta “Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir”ê de Barnas berê me dabû bajarekî welat û helbesteke ku gelek sembol û metaforên neteweperweriyê tê de xuya dikirin li dar xistibû. Di vê helbestê de li kolaneke Mehabadê zarokê çar salî piştî ku Îmam Xumeynî Mehabadê wêran dike, ev zarok li kolanan dimîne. Divê em diyar bikin ku di vir de Mehabad wek sembolekê welatê bîndest temsil dike. Helbestvan bi devê zarokê ku nizane ji ber çî bajarê wî xerabûye, diaxive. Zarok di nava trawmayekê de derbas bûye. Malbat miriye û ew filitiye. Û welat kavi bûye.

Ez mendalekî çar salî me, mamo!
Ez mendalekî çar salî
Li kolaneke Mehabada xopan mame
Li kolaneke Mehabadê
Kolanên Mehabadê xir û xalî¹⁹⁸

Zarok li kolaneke Mehabada “xir û xalî” bang dike û serpêhatiya xwe vedibêje. Berî ku Mehabad xir û xalî bibe zarok li bajarê xwe bextewar e û roj wek bişirandinên dayika wî jê re dibişirin. Lê ji ber ku zarok e nizane bê çî dibe û çawa çêdibe agir bi ser serê wan de dibare. Ev rewş bi çavê zarokê vegotina dagirkeriyê ye ku tu maneyê nade vê yeke. Armanc ji vê helbestê ew e ku balê bikişîne ser rewşa bîndestiya welat.

Roj,

¹⁹⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 20.

¹⁹⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 158.

Mîna kiloreke rûnî, ji genimê sorgul
 Ku di tendûrê de sorgizirî
 Di şebaka me de,
 li rojhilat
 li esman
 ji min re
 Wek bişirandinên dayika min
 dibişirî
 Ê
 Ez nizanim çawa bû, mamo!
 Çarşevê ket navbera me
 Mîna cubê Îmam Xumeynî tarî
 çarşerek reşvegerî¹⁹⁹

Di dawiya helbestê de ev mendalê çar salî bi avakirina Mehabadeke nû re mijûl e. Ev avakirin temsîla li-berxwedan û ji nû ve vejandinê ye. Zarok ji bo avakirina Mehabadê bi çêkirina malokan re daketiye. Em di wê baweriyê de ne ku ev zarok vîna neteweyekî temsîl dike li hember têkçûnan ku Kurd piştî gelek kavihbûnan bi ser xwe ve hatine û xwe ji nû ve ava kirine. Lewre helbestvan di wê baweriyê de ye ku dê ev bindestiya welat di dawiya dawî de têk biçe û rizgar bibe. Ev jinûveavakirin û baweriyê li hemberî bindestiyê xwe di vê helbestê de rasterast dide der.

Li ser kavihê
 wê
 mendalekî çar salî
 Niha
 Bi avakirina Mehabadeke nû,
 bilî...
 Ez mendalekî çar salî me, mamo!
 Ez mendalekî çar salî
 Ez niha malokan çêdikim ji xwe re
 Ezê ji malokan ava kim Mehabadê
 Mehabadeke ku
 Ji avahiyên xweydana min xemilî²⁰⁰

Barnas carcaran bi mînakên bajarên welêt re hêvî û daxwaza xwe ya ji welat tîne ziman. Welat dîsa bindest e lê helbestvan ji siberojê bawer e ku dê ev bindestî têk biçe. Helbesta “Ameda Min” yek ji wan helbesta ye ku hêviya ji welat û temsîla neteweya Kurdan dike. Barnas di vê helbestê de ji Amedê bi hêvî ye ku wê bibe

¹⁹⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 158.

²⁰⁰ Barnas, **Kadiz**, r. 159.

“nimaya serxwebûna niştimanî” û Amedê di tevgera şoreşê de wek “serseda” xwe û mefera xwe ya dahatûyê bi nav dike. Barnas di çarçoveya hevgirtina welat û neteweyê de Amedê wek semboleke şoreşê bi berçav dike. Amed di hevgirtina welat û neteweyê de dîmeneke “adanî, jîndarî û serxwure” dijmin e ku wek çavkaniya hêviya xwe destnîşan dike.

Ameda min
Mefera min a dahatû
Di tevgera şoreşê de
Serseda min.
Zîl de
Hêşîn ke mefera min²⁰¹

Di helbesta “Rojbaş Roza!”yê de jî pasajek jê berê me dide dîmeneke ji welat. Helbestvan ji welat dûr e. Lê ev dûrbûn ji bo siberoya welatê bîndest e. Herçiqasî “sê hezar kîlometre” li dûrî welat be jî di navbera wan de girêdaneke giyanî xuya dibe. Helbet ev girêdan ji ber bandora biyanîstanê xwe dide der ku vê yekê bi gelek metaforan vedibêje: “masî, gul û kulîlk.” Dûrketina ji çanda-civakî bandoreke mezin li helbestvan dike û tîne ziman ku wê li vê biyanîstanê tu carî şîn nebe. Piştî berê me ji biyanîstanê dide welat û kokên neteweya xwe “di hêtûna nêtewebûyîne” de yê herî kevintir dibîne. Hebûna wî ya li biyanîstanê ne ji ber xwesteka wî pêk hatiye. Ew di ber welat û neteweya xwe ya bîndest de ku ji ber ev bîndestî nepejirandiye, surgun e.

Bo welatê xwe, ji welat dûr im
Bo welatê xwe cêlî û tenya
Bo welatê xwe
Li van deveran tengezar im.²⁰²

Bi helbesta “Kuştin, Sotin, Talan”ê re Barnas balê dikişîne ser dagirkeriya ku li welat pêk hatiye. Ji ber van kirinan welat vediguhere rengê dojhê. Welatê ku bi kuştin, sotin û talankirinê rû bi rû maye helbestvan diyar dike di newalên wê re av bi zelalî naherike, ezman mor û tixan e û kevir li ser kevir nemaye. Bi vê tabloyê rewşa welatê ku ji ber bîndestiyê kavil bûyî ji me re vedibêje. Lê herçiqasî welat ji ber van kirinan di rewşeke dojhê de be jî, Barnas bi hêvî ye û ji xwe bawer e ku wê ev rewşê dî dom neke. Roja ku welat rizgar bibe dê birînen ku bi “kuştin, sotin û talankirin”ê

²⁰¹ Barnas, **Kadiz**, r. 185.

²⁰² Barnas, **Kadiz**, r. 193.

di welat de avabûne dê di nava tariyê de bimînin û sibeheke nû dê dest pê bike. Ev dîsa hêviya helbestvan e.

Kuştin
Sotin
Talan
Roja ku Kurdistan
Ji binî bifilite
Şunwarê we yek bi yek
Biçikînin li sergoya tûgehê
Bi tûkirina li we, li xwe bînin êvaran
Bi tûkirina li we, selav bidin sibehe.²⁰³

Di helbesta “Tarî”yê de jî Barnas welatê bindest wek dîmenekê ji tariyê berçav dike. Helbestvan di pasaja ewilî ya helbestê de bi me dide zanîn ku welat di nav tariyê de hatiye pêçandin û di wê baweriyê de ye ku dê vê tariyê bi rizgariya welat bifetisîne û dê rewş li welat bê guhertin. Û helbestvan bawer dike ku dê tarûmarkirina tariyê li rojhilatanavîn bi azadkirina welat têk biçê.

Tarî!
Roja ku Kurdistan bifilite
Tu tarûmar î
Li rohilatanavîn.²⁰⁴

Helbesta “Gul û Bilbil û Evîn”ê, rewşa welatê bindest di nav tabloyeke xerab de tîne ziman. Di helbestê de tê dîtin ku dewletên dagirker welat talan kirine û xwezaya welat şewitandine. Helbestvan tîne ziman ku ev rewş ji salê carek li welat dubare dibe. Ji ber vê bindestiyê jî helbestvan angaşt dike ku mirina bilbilekî ne bi awayekî xwezayî pêk tê. Ev “bi fermana dewletên talankerî” ye. Helbestvan di pasaja duyem ya vê helbestê de ji ber vê rewşê “Şîngirtina xwe” mafdar dibîne. Gul û bilbil temsîla xwezaya welat in ku helbestvan ji ber talankirina vê xwezayê şîngirê dide. Xwezaya welat tê talankirin û zindiyên vê xwezayê ji ber vê talanê ne dikarin bêhnê bistînin û ne jî bistrên. Di pasaja sêyem de jî helbestvan balê dikişîne ser mirinan, ku ev mirin “ne ji pîrî” û “ne ji tayê” ne. Mirin bi destê hineke din pêk tên ku haya hemû dinyayê jî ji van mirinan heye. Di vir de helbestvan dixwaze bindestiya welat berçav bike û haya hemû dinyayê ji bindestiyê çêbike. Di encama van mirinan de rewşa ku li welat ava dibe diyar dike.

²⁰³ Barnas, **Kadiz**, r. 197.

²⁰⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 198.

Ka bêjin min çawa
 Çawa ji evînê nestrêm?
 Ji yarê re nebêjim: “Ka piçek bibişire!”
 Jîna min
 Keleka li ber pêlên derya
 An keleperra ber bayê
 Mirina me
 Neji pîrî, ne ji tayê
 Stêrkên li esman jî dîzanin
 Roj tuneke ku
 Bûkên serbixêlî
 -Bi jinebîfî-
 Ser mala bavê de nezivirin
 Li Kurdistanê.²⁰⁵

Di pasaja dawî ya vê helbestê de têkoşîna li hember bindestiya welat berbiçav e. Ev têkoşîn ji bo azadiya welat e. Barnas ji ber rewşa welat ku welat hatiye talankirin û qetlîam û qîlên wampîran di qirika neteweya wî de ye, çareseriyê di têkoşînê de dibîne. Helbestvan diyar dike ku, madem rewş ev be divê ku em jî li ber xwe bidin û bibin “Kelemên nav çavên dijmin.” Bi vê têkoşînê re dê welat bê xemilandin, stranên azadiyê bînin gotin û bi alîkariya dengê milyonan li welat tovên serxwebûnê şînin bibin. Di vê çarçoveyê de helbestvan bi vê dîmenê rewşa welat û neteweyê bi hev re girê dide.

Madem qîlên Drakula di qirika me
 Ê tovê qelînokê bi me de tê reşandin
 Ê himin
 Em kelemên nav çavên dijmin in
 Gula min,
 Bilbilê min
 Emê
 Bi bîhn
 Bi evîn
 Eniya têkoşîna welatê xwe
 Bixemilînin
 Stranên azadiyê
 Bi awazê bilbilîn
 Ji devê milyonan bistirên
 Bi xweydana milyonan
 Di Kurdistanê
 Gulekê hêşîn bikin
 Tovê serxwebûnê de.²⁰⁶

²⁰⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 199.

²⁰⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 200.

Barnas ji welat “cêlf” be jî hiş û aqilê wî li welat e û rewşa ku welat tê de ye bi her awayî bandorê lê dike. Di beşa heftem ya “Heyv Li Esmanê Diyarbekirê” de dagirkeriya li ser welat rave dike. Di vê beşê de dagirkeriyê bi sembola “pandarekî romî” ku li ser bircên Diyarbekirê piyase dike, tîne ziman. Ji ber kirinên vî pandarê dagirker û tevgerên wî, li welat “pîrekên qozax” û “qesrên koledariyê” avabûne. Li hemberî vî pandarî serfîhildaneke têkçûyî xuya bike jî, helbestvan bi çavê spartakûsan li van kesên ku li hemberî vê dagirkeriyê serî hildane û berxwedan li dar xistine, dinêre. Ango welat hatibe dagirkirin jî hêvî heye ku dê bi têkoşînê re dagirker têk biçin û welat ji bin destê van dagirkeran rizgar bibe.

Heyv li ezman zîz...
 Pandarekî romî
 Bi mertal û rim
 Ji xwe bawer
 Piyase dike berûber kele
 Lê
 Li ser birce
 Li ser sûrê.²⁰⁷

Bandora heman dagirkeriyê di beşa heştem de jî didome. “Pandarê Romî” ji aliyê helbestvan ve li ser kela Amedê wek sembola zordestî û dagirkeriyê tê dîtin. Helbestvan vî pandarî wek “gladyatorê romî” û “Augustos” dibîne û tevgerên wî jî dişibîne yê Sezar. Di vê şibandînê de armanc û hêviya helbestvan ew e ku ev kes di dîrokê de têk çûne ku dê ev kela Amedê ji “pandarê romî” re jî nemîne û welat ji bindestiyê rizgar bibe.

Pandar
 Gladyatorê romî
 Li ser sûra Amedê
 Şêla Augustos dide xwe
 Drûvê Sezar bi xwe dixîne
 Û ji wî tirê ku
 Kela Amedê
 Rojhilatanavîn
 Her û her
 Dê ji romê re bimîne
 Ta Ku
 Dinya hebe.²⁰⁸

²⁰⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 217.

²⁰⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 219.

Barnas di wê baweriyê de ye ku ji ber dagirkeriyê gelek trawmayên mezin li welat avabûne ku ev rewş her “ji serê dehan salan carek”ê dûbare dibe. Ji ber vê yekê bang li neteweya xwe dike ku li hemberî van kirinên ku dagirker li welatê wan avakirine, têk bibin û li hemberî vê yekê derkevin. Lewre helbestvan hin mînakên ku ji ber bîndestiyê li welat ava bûne, dide û ji neteweyê xwe sedemên van dipirse. Bi van pirsan re armanca helbestvan ew e ku neteweya xwe li hember van kirinên dagirkeran hişyar bike û wan ber bi hin bertakan ve bibe.

Zindanên li Kurdistanê, bo çi
Bo kêrhatîyên kê ne ev sêdarên rastkirî
Ev cendekên gulebarankirî goriyên kê
Ev gundên bi garankî têne lêdan her sal
Jinemêr tazîkirî di darê îşkencê de²⁰⁹

Rojên Barnas bi van helbestan hem li hember stemkarî, zulm û zordariya ku li welatê wî dibe derdikeve û hem jî neteweya xwe li hember van kirinên dagirkeran diparêze û hişyar dike. Ev jî tê wê wateyê ku Barnas bi helbesta xwe di nav armanceke neteweyî de ye ku li hemberî kirinên dagirker, zilimkar û zordaran bê deng nemaye û her dem bi hêz û qeweteke neteweyî tevgeriyaye. Barnas li hemberî perçekirina welat bi helbesta xwe nîşan dide ku gelê Kurd ji ber vê yekê ne razî ye. Lewre helbesta wî hertim di nav bizav, xebat û têkoşîneke neteweyî de ye da ku zulm û zordariya li ser welat bişikîne. Armanca jî vê yekê jî azadî û serbestiya welat e.

1.1.3. DÎMENÊN WELAT

Welat ji bo gel û neteweyan ji bilî wateya perçeyê ax, tê wateya gelek sembolên din. Di serê ewilî de welat wek cihêkî ku mirov lê hatiye dinyayê; bê nêrîn jî, ev nêrîn bi pêvajoya dîrokê re hatiye guherîn ku em îro roj dikarin bibêjin ku welat di van serdemên modern de êdî ne tenê di wateya axê de tê şîrovekirin. Wateya welat, li gorî têkoşîna gel û neteweyan û guherînên wan yê bi demê re hatiye guherîn. Ji ber vê jî gel û neteweyên ku aniha hê li ser rûyê axekê dijîn bi fikreke din li wateya welat dinêrin û li gorî vê welat şîrove dikin.

²⁰⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 231.

Welat bi gelemperî tê wateya heman mirovên ku di bin bandora tiştên maddî û manewî de, di heman erdnîgariyê de mane. Çawa ku fikr û wateya welat bi demê re hatibe guhertin; hesta welat jî, her çiqas bi qasî dîroka mirovahiyê kevin be jî, guheriye. Gel an jî neteweyek kengî gava ku “hebûna xwe, şerefa xwe, parastina xwe ya li hemberî hinekên din hest kiribe, li wir hesta welat jî avabûye.”²¹⁰ Helbet ev hest di serdema me de gelek wateyên din li xwe vedihewîne.

Em îro roj dizanin ku avabûna hesta welat di jiyana gelan de piştî bûyerên ku bandoreke mezin li jiyana wî dîroka wî gelî kiribe, pêk hatiye û vê yekê xwe di edebiyata wî gelî de jî berçav kiriye. Ji ber vê jî vê hestê xwe di helbesta heman gelî de jî diyar kiriye ku welat di vê helbestê de xwe bi dîmenên cihê cihê aniye ziman. Heman rewş di edebiyata Kurdî de ango di helbesta Kurdî de jî xuya dibe. Welat di helbesta Kurdî de xwe digihîne dîrokeke kevnar û rengvedana dîmenên welat di helbesta Kurdî de li gorî serdeman wateya ku lê hatiye barkirin, tê guhertin.

Zülküf Ergün jî di heman nêrînê de ye. Li gorî wî “di nav dahênana nerîtên neteweyî de cihekî diyar ê dîmena sembolîk a welat heye. Ji ber vê jî welat di gotara neteweyî de wek cihekî helbestî tê şayesandin ku di çarçoveyên cuda cuda de reng û rûyê neteweyê diyar dike. Li gorî Smith dema bîranînên etnik bi axê ve tîr girêdan û rengê dîrokî bi şiruştê tê bexşîn, dîmenên helbestî yê etnik tîr afirandin ku pêwendiya wan bi rûdan û kesayetên girîng ên dîroka civaka etnik re heye. Ji ber vê welat wek cihekî coxrafi bi taybentmendiyên xwe yê fîzîkî reng dide awayê jiyana endamên neteweyê û dibe nasname, karakter û çarenûsa wê. Bi vî awayî netewe û welat dibin yek û weha lê tê ku êdî gol, çiya, rûbar û geliyên welat bi tevahî dibin taybentmendiyên otantik ên neteweyê û sembolên jiyana neteweyî. Ev diyardeya neteweyîkirina siruştê bi xwe re tîr ku welat êdî ji taybentmendiyên xwe yê fîzîkî zêdetir bi wateya xwe ya siyasî di gotara neteweyî de cihê xwe digire.”²¹¹

²¹⁰ Hilmi Ziya Ülken, “**Millî Vatan**”, **Vatan ve Kahramanlık Şiirleri Antolojisi**, Hazırlayan: H. Fethi Gözler, İnkılâp ve Aka Kitabevleri, İstanbul, 1965, s. 13.

²¹¹ Zülküf Ergün, **Nerît û Helbest (Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de 1880-1970)**, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul, 2017. r. 133.

Di vê çarçoveyê de gava ku em bala xwe didin helbesta Kurdî û rengvedana welat ku xwe di helbesta Kurdî de diyar kiriye, tê dîtin ku dîmenên welat di serdema modern de bi fikreke siyasî derketiye pêş û wek cihekî çavkaniya netewetiyê hatiye dîtin. Ergün jî vê yekê diyar dike ku wêneyê welat di helbesta Kurdî de wek pêşengê helbesta neteweyî dîsa bi helbestên Hacî Qadirê Koyî derdikeve hemberî me. Hacî tovê vê dîmenê diavêje û piştî wî di helbestên Ebdurehîm Rehmî Hekarî de ev dîmen xuya dibin. Piştî Ebdurehîm Rehmî Hekarî jî Siyahpoş û Pîremerd helbestvanên Kurd dawetî dahênana dîmena welat dikin.²¹² Dîmenên welat di helbesta Rojen Barnas de jî xwe didin der ku em dikarin Rojen Barnas jî tevlî van helbestvanan bikin. Barnas bi awayekî siyasî û neteweyî berê xwe dide dîmenên welat û ji bo ravekirina welat û neteweyê di helbesta xwe de zemîneke mezin ava dike. Ango di helbestên Rojen Barnas de dîmenên welat bi wateyên xwe yê siyasî derdikevin pêş.

Di helbestên Rojen Barnas de rengvedana dîmenên welat bala Berken Bereh jî dikişîne. Bereh diyar dike ku dema mirov helbestên wî dixwîne, di rih û giyanê mirov de pêlên Kurdperweriyê û çemên mîrxasî û xweragiriyê radibin pêdarê. Deng û reng û awaza erdnîgariya welat wek filmekî diherike û wek straneke bengiyê xwe li dilê mirovî dipêçe.²¹³

Bi pirtûka *Milkê Evînê* re Barnas berê me ji kavilkirina welat dide dîrok û axa welat û di vê pirtûkê de welat bêhtir bi rengê xwe yê erênî xuya dibe. Bi helbesta ewilî ya vê pirtûkê re avabûna welat bi şêwazeke lîrik û mîstîk hatiye vegotin û helbestvan erdnîgariya vî welatî bi me de dide nasîn. Wêneyê welatekî ku bi berî û deşt, kortik û pehnav, çiyayên bilind û ji geliyên kûr pêk tê, bi me dide temaşekirin. Ev cihê ku di navbera “Dicle û Firat”ê de cih digire, bêguman ev cih û axa ku tê behskirin welat bi xwe ye. Barnas bi vê helbestê re vê axê bi her awayî nîşan dide. Di helbesta “Mezopotamya” de, ku ji axa di navbera Dicle û Firat re tê gotin, Barnas vê axê wek axeke “hêşîn û seraser” dibîne. Ev erda ku di hembêza Firat û Dicle de cih digire xwedî xwezayeye şîrîn û bi xêrûber e ji bo şaristanî û neteweyan.

Xweza bi şîranî li vê der
Dergûşa pîtika şarsaniyetê
Hejand bi evînî, bi nazdarî

²¹² Ergün, *Nerî û Helbest*, r. 151.

²¹³ Bereh, *Rojen Barnas*, r. 8.

Gel tê da afirîn, gel tê de rabûn
Gel ku mora xwe li sînga
Zanîn û şarsaniyeta mirovî xistin
Lê hê jî kes nizane ka gelo
Bi ku ve çûn
An ji ku hatin.²¹⁴

Barnas axa welat wek evîneke germ bi nav dike û hezkirina welat jî “kûr û zirav û dirêj” dibîne di helbesta “Ev Milk”ê de. Ev milkê ku “di hembêza Firat û di paşila Dîclê de” cih digire ji aliyê helbestvan ve wek axeke bi ber û bereket tê dîtîn ku esmanê vî welatî ji vê axê re dayînên “bibext û zengîn” didêrîne. Ji ber van dayînan jî erda vî welatî wek dêyeke biber û dilovan tê dîtîn. Barnas li ser vê axa biber û bereket Kurdan wek hêşînbûneke dibîne ku kes nizane Kurd çawa û çilo ev cih û war ji xwe re kirine milk. Hebûna Kurdan ya li ser vî milkî “ji destpêka zemanekî nebinavkirî” ve gire dide. Bi vî awayî girêdaneke xwezayî di navbera welat û neteweyê de ava dike ku armanca helbestvan di vê helbestê de hebûna Kurdan ya li ser vê axê qewîntir bike.

Ji esman hatin em,
-Wek Kurd-
An
Ji erdê hêşîn bûn bi awakî?
Kengê... çawa... çilo...
Peyda bûn li vî xakî?...
Kes nîne bersîva vê pirsê bide
Û bîra tarîxê jî ji heq dernayê.
Tiştê tê zanîn
Ji destpêka zemanekî nebinavkirî
Em li vê deverê ne.
Me gêra, vî xakî kire war
Û vî warî kire milk
Me xwe jê re feda kir
Ji silqê safî.²¹⁵

Barnas di helbesta “Pêrgîn”ê de dîsa balê dikişîne ser axa di navbera Dîclê û Firatê de û vê axê wek laşe welat û ava Dîclê û Firatê jî wek xwîna vê axê dibîne. Barnas tîne ziman ku ev ax ji Kurdan re jiyan, bihişt û delala ber dila ye û eger ev welat bê windakirin dinya dê ji Kurdan re bibe zindan. Ji ber vê parastin û

²¹⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 238.

²¹⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 239.

xwedîderketina vê axê girîng e û divê ku Kurd di ber vê axê de canê xwe bidin ku ev ax ji Kurdan re pişt û stargeh e.

Dicle-Firat xwîn û can,
Laş bi xwe Kurdistan e.
Bê laş ma xwîn çi tişt e?
Xwîn û laş pêkve can e.
Ger Kurdistan behîşt e,
Bê Kurd behîşt xopan e.
Gava behîşt ji dest çû
Cîhan êdî zindan e.²¹⁶

“Di Hembêza Firat û Di Paşila Dicle De” axa welat bi her awayî tê xemilandin. Çiyayên bilind, hêlînên eyloyên serbilind, gelî, rêl, kaş, lat, deşt, çiya û hwd. xwezaya vê axê bi dîmeneke xweş bi nav dike. Helbestvan ji bo diyarkirina xweşiya welat, xwezaya vê axê bi her awayî tîne ziman û vê xwezayê wek xemilandina vî welatî di paşila vî milkî de diçirisîne.

Di hembêza Firat û di paşila Dîdê de
Milkek heyê li raser esmanekî bêdawî
Li Kadiza wî stêrkin hene
Navên wan ji beriya b’ hezarên salan
Me danî
Û ew
Bi delalî
Diçirisin.²¹⁷

Di nav helbestên Rojen Barnas de, bi taybetî helbestên ku di pirtûka *Milkê Evînê* de cih digirin, miheqeq têkiliyeke wan rasterast an jî ne rasterast bi welat re heyê. Her helbestek, bi awayekî têkiliya xwe bi vî milkî re datînin. Hin jê bi erdnîgarî û axa vî welatî, hin jê bi dîroka wî re û hin jê bi zimanê wî re têkildar in. Barnas di helbesta xwe ya “Milkê Evînê” de dîmena hemû erdnîgariya welat tîne ber çavan û dîmena vê axê di çarçoveya nexşeya welat de berçav dike. Ji ber vê jî helbestvan di navbera neteweya xwe û vê erdnîgariyê de têkiliyeke bihêz ava dike. Bi dîtina Barnas ev milk cihê evîn û jiyana Kurdan e ku Kurd hê ji “Qalûbela”yê de li vî milkî dijîn. Di pasaja sêyem ya vê helbestê de jî balê dikişîne ser sînorên welat. Bi dîtina Barnas ev welat ji erdnîgariyeke fireh pêk tê.

²¹⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 240.

²¹⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 241.

Milkekî ji navserên li Mûnzir û Agirî
Serejêrî Xaniqînê dibe.
Gava Roj dibişire li Mahabadê
Kerresî digermijin ji kêfa
Li dolik û mesilên di Efrînê,
Li wan berwarên Çiyayê Kurda.²¹⁸

Di helbesta Barnas de perçebûna welat jî xwe di gelek helbestan de dide der ku helbestvan ji ber vê perçebûnê ne razî ye û li benda azadî û xelasiya vî welatî ye. Di helbesta “Dilekî”yê de Barnas cihê welat di erdnîgariya dinyayê de diyar dike û welat wek dilekî dibîne û tîne ziman ku ev dil bûye çar perçe û xwînê winda dike. Diyarkirina erdnîgariya welat wek cihekî stratejîk tê xuyakirin ku ji çar aliyan ve “pîrhevokan tevan xwe lê rapêçane”. Ji ber vê jî welat li benda azadiyê ye û kesên ku di ber azadî û ronahiya vî welatî de xwe feda dikin di asta herî mezin de tîne dîtîna û helbestvan wan serbilind dibîne.

Ew dil e, dilekî mîna dilan e
Li rexkî Elîşêr, li rexkî Rêber
Alîkî Beko ye, strî di gulê
Alîkî Memo ye; dilsoj, bêxeber.²¹⁹

Di dahênana dîmena welat û neteweyê de, Zülküf Ergün diyar dike ku tovên dîmena welat Hacî Qadirê Koyî diavêje û di helbestên Ebdurehîm Rehmî Hekarî, Ehmed Muxtar Caf, Pîremêrd, Faîq Bêkes, Zêwer, Esîrî, Şêx Nûrî, Qani’, Goran, Dildar, Kamiran Bedirxan û Cegerxwîn de jî şûna vî tovî xuya dibe. Li gorî mînakên ku Ergün dide di helbestên van helbestvanên navborî de dîmena welat her dem bi dîmeneke xweş û erênî xuya dibe ku armanc ew e ku welat li ber dilê Kurdan bê şîrînkirin. Îcar li gorî mînakên ku me ji helbestên Rojen Barnas hîlbijartine, tê dîtîna ku dîmena welat ne tenê bi aliyê xwe yê xweş û şîrînî derdikeve pêşberî me. Barnas di helbestên xwe de welat bi hemû dîmenan nîşanî me dike. Welat carina cih û warê evînê ye, carina cihê ezebê ye. Ango dîmenên welat bi her awayên xwe di helbestên Barnas de cih digirin ku li gorî dîtîna me Barnas vê yekê bi awayekî serkeftî dike. Barnas van dîmenan di nava wateyê siyasî re bi hemû sembolen netewetiyê re şanî me dike. Ango Barnas dîmena welat di her rewşê de pêşkêşî me dike û welat dike çavkaniya hebûna neteweya xwe.

²¹⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 265.

²¹⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 274.

1.1.4. BERXWEDANA NETEWYÎ

Di helbesta Rojen Barnas de yek ji wan temayên sereke jî berxwedan û têkoşîn e ku ev berxwedan û têkoşîn ji bo azadî û serbestiya neteweyî ye. Ji destpêka helbesta wî ve ev fikir xuya dibe û ev cure helbest her dem bi hêviyeke tije coş re derdikevin holê. Lê di helbestên dawî de hêviya bi coş û fikra berxwedanê her diçe qels dibe. Berxwedana ku di helbestên ewilî de xuya dibe, bi taybetî jî di pirtûka ewilî de, berxwedaneke çînî ye û ev berxwedan bi nêrîneke çeprew hatiye dayîn. Lê piştî pirtûka ewilî ev berxwedana çînî vediguhere berxwedaneke neteweyî. Ango di helbesta Barnas de berxwedan her heye lê armanca vê berxwedanê bi demê re tê guhertin ku di vê binbeşê de em ê helbestên ku berxwedana neteweyî di wan de diyar dibin bi mînakên ku me hilbijartine berçav bikin.

Rojen Barnas di serdemeke pir polîtîk de helbestan dinivîsîne û jixwe me li jor jî diyar kir ku ji ber fikra xwe ya siyasî berê xwe dide Kurmancî. Di serdema ku helbestan lê dinivîsîne de gelek rêxistinên siyasî hatinen avakirin û gelek ramanên siyasî di vê serdemê de bandorê li hemû hunermendan dikin. Ji ber vê jî gelek rewşenbîr berê xwe didin hin rêyan ku karibin xwe di van rêyan de bînin ziman. Weke rewşenbîrekî vê serdemê Rojen Barnas jî berê xwe dide helbestê û di vê rêyê de dimeşe. Ji ber atmosfera siyasî tu bike û neke dê Rojen Barnas jî helbesteke ku bi hemû awayî bi vê atmosfera siyasî ve girêdayîye binivîsîne. Lewre Barnas hem wek şexsê xwe û hem jî bi helbesta xwe di nav vê atmosfera siyasî de cih digire û bi coş û heyecaneke mezin gel hişyar dike û dixwaze berxwedanekê ava bike ku hemû gel û netewe di nav vê berxwedanê de cih bigirin.

Di vê çarçoveyê de îcar gava ku em berê xwe didin helbestên Rojen Barnas, tê dîtîn ku berxwedana neteweyî bi gelek awayan xwe di helbestên wî de diyar dike. Barnas bi helbesta xwe ji vê berxwedana neteweyî re dibe semboleke hestî. Bi alîkariya van helbestan re hêviyeke mezin di nav gel de ava dike. Helbestên Rojen Barnas hêviyeke mezin di xwe de dihevinin ji bo berxwedana neteweyî. Di avakirina vê berxwedanê de Rojen Barnas serî li gelek metafor û sembolan dixwe ku yek ji van jî bilindkirina qehremanên dîrokî yên neteweperwer e.

Ergün, dahênana qehremanan wek diyardeyeke dîrokî ya sekna nabîne û diyar dike ku “ev tiştêkî berdewam û livîner e, bi taybetî di rewşên neasayî yên mîna ceng û serîhildanan de yan jî di bizavên rizgarîxwaz ên neteweyî de li gorî sirûştê van diyardeyên civakî pêwistî bi qehremanan çêdibe û ev kes bi armanca bilindkirina moral û motîvasiyona cemawerê di gotara neteweyî de tîne îdealîzekirin.” Û tîne ziman ku ev qehremanan wek figurên hestî derdikevin holê ku qehreman bi vê wateya xwe ya derûnî zûtir û baştir bandorê li mirovan dikin û berê wan didin armancên neteweyî. Di helbesta Kurdî de jî di encama serîhildanên neteweyî yên Kurdan de serok û pêşengên van tevgerana wek qehremanên neteweyî tîne berçavkirin ku bi alîkariya van hêza berxwedan û têkoşînê tîne afirandin.²²⁰

Li gorî diyarkirina Ergün, di helbesta Kurdî ya nû de yekem car Hacî Qadirê Koyî di çarçoveya fikra neteweyî de behsa qehremanên dîrokî dike û yê ku di nav qehremanên dîrokî yên Kurdî de ji destpêka hişyariya neteweyî û vir ve pir navê wî te bibîranîn jî Selahedînê Eyûbî ye. Ji bilî Selahedîn, di helbesta Kurdî de behsa gelek kesayetiyên neteweyî tîne kirin ku di nav van kesan de yên ku herî zêde navê wan derbas dibe Şêx Mehmûd, Şêx Seîd, Qazî Mihemed û Mela Mistefa Barzanî ye. Ev kesayet wek qehremanên neteweyî ji aliyê gelek helbestvanên Kurd ve di berxwedana neteweyî de hatine bibîranîn. Wek ku Ergün jî tîne ziman ji bilî van di gotara neteweyî ya Kurdî de, bi taybetî di helbestê de gelek qehremanên din jî hene ku di ser wan re peyamên neteweyî hatine dayîn.²²¹ Rojen Barnas jî wek helbestvanekî neteweperwer van şexsiyetên navborî di helbesta xwe de ji bo berxwedana neteweyî bi cih dike û di gelek helbestên xwe de li wan xwedî derdikeve û aliyê wan yê neteweperwer derdixîne pêş. Barnas ji bilî van qehremanên neteweyî hin kesên ku di nav herêmekê de ji aliyê gel ve wek kesekî neteweperwer û qehremanê berxwedana neteweyî navê wî derketiye pêş jî bi bîr tîne.

Berken Bereh jî diyar dike ku di gelek helbestên Barnas de lehengên dîrokî û mîtolojîk derdikevin pêş. Ev lehengên dîrokî tenê ne yên dîroka kevin in ku ev leheng dîsa ji bo berxwedana neteweyî wek simbolên herî zindî derketine holê. Di

²²⁰ Ergün, *Nerît û Helbest*, r. 106-111.

²²¹ Ergün, *Nerît û Helbest*, r. 111.

heman demê de bi lehengên dîroka kevin re, lehengên dîroka nû jî xuya dibin: “Şêx Seîd, Bijîşk Fûad, Bavê Tûjo, Barzan, Rizgo û Simko...”²²²

Di helbesta Rojen Barnas de wek qehremanên berxwedana neteweyî, herî pir navê Şêx Seîd, Seyîd Riza û Qazî Mihemed tê pesinandin û bilidkirin. Helbesta ku cara ewilî hem hest û kodên neteweperweriyê û hem jî qehremanên berxwedana neteweyî ku rasterast tê de xuya dibin helbesta “Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir”ê ye. Em dikarin bibêjin ku ev helbest berê helbesta Barnas hê di serî de dide berxwedaneke neteweyî. Ji ber ku bi vê helbestê re Barnas hem berê me hêdî bi hêdî dide şêweyeke nû û hem jî mijara neteweperweriyê piştî vê helbestê xuya dibe. Ango piştî vê helbestê Barnas simbol û metaforên neteweperweriyê bêhtir di helbesta xwe de dihewîne.

Barnas di helbesta “Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir”ê de Şêx Seîdê Kal, Bijîşk Fûad û Bavê Tûjo bi bîr tîne ku ev kes wek qehremanên neteweyî ji bo berxwedaneke neteweyî tîne îdealîzekirin. Barnas van şexsiyetên neteweyî; mirovperwer, welatparêz û şoreşger dibîne ku her yekî ji wan li ser Birca Diyarbekir navê xwe kolaye û bûye simbol û rengeke berxwedanê li ser bircên “Diyarbekira rengîn.” ji bo berxwedana neteweya xwe. Di vir de xwedîderketineke li şexsiyetên neteweyî diyar dibe ku van her sê “simbol”an ji bo gelê xwe berxwedaneke neteweyî li dar xistine. Ev kesên navborî di vê helbestê de wek sê figurên hestî ji bo berxwedana neteweyî derdikevin pêş.

Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
Ez welatparêz im,
Ez mirovperwer im,
Ez li ber bircên Diyarbekra rengîn
Şêx Seîdê kal,
Bijîşk Fuad im
Ez Bavê Tûjo me lo!..
Şoreşger im²²³

Berken Bereh diyar dike ku Rojen Barnas di helbesta Kurdî de yek ji wan helbestvanên herî bi nav û deng e. Helbesta Barnas, vegotina Kurdan û aliyê mirovî yê erdnîgariya wan e. Bi pirtûka xwe ya ewilî re dengêkî mezin vedaye. Helbestên wî

²²² Bereh, **Rojen Barnas**, r. 8.

²²³ Barnas, **Kadiz**, r. 28.

bi çoş û hezkirineke mezin hatin pêşwazîkirin. Di gelek mitîngan de helbestên wî ji bo ku gel germ bikin, dihatine xwendin û helbestên wî ji ser zimanan nediket, bi taybetî jî helbesta “Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir”ê çoşeke mezin dida gel û hê jî ev helbest ji ser zimanan neketiye.²²⁴ Bi dîtina me sedema helbesta navborî ku ji ser zimanan nakeve û çoşeke mezin dide gel, xwedîderketina li simbolên neteweyî ye ku ev simbol wek qehremanên berxwedana neteweyî derketine pêş û hêviyeke gelekî xurt li hemberî siberojê heye. Lewre di vê helbestê de hêviya ji berxwedanê li pêş e.

Di destpêka helbestê de rewşeke neyînî dikumişe ser welat. Stêrk stûxwar in, “ney û bilûr û tembûr û dehol û zirne” sar in. Cobar naxuşin, “beybûn û sosin” nabişkivin. Tariyên giran û kûr xwe berdidin ser serê welat lê dîsa jî “kolandin” didome “bi giyanek pola.” Têkoşîn heye ku hem şer dike û hem jî berberiyê dike bi dijminê xwînxwar re. Yên ku vê pêk tînin Şêx Seîd, Bijîşk Fûad û Bavê Tûjo ne.

Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
 Gava ku stêrk
 Li esmana stûxwar,
 Gava ku
 ney û bilûr û tembûr
 û dehol û zirne
 sar
 bûn
 Ê cobar
 Nedixuşîn di nivînên xwe de seraser
 Sosin û beybûn û rihan
 Ne d’ bişkifîn di bûtikê de.
 Tariyên giran
 Tûj û kûr
 Bi zûrezûr û bi orîneke jakaw
 Bê fikare,
 bê paxav
 dihelişî
 dikumişî
 li ser welatê min²²⁵

Nîhat Çelîk jî vê helbestê wek bîrveanîna dîrok, çand û xwedîderketina li Diyarbekirê²²⁶ binirxîne jî di heman demê de ev helbest xwedîtiyê li simbol û

²²⁴ Bereh, **Ağzımda Kimliğim Benim.**

²²⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 27.

²²⁶ Çelîk, **Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas**, r. 40.

metaforên berxwedana neteweyî jî dike. Şêx Seîd, Bijîşk Fûad û Bavê Tûjo van sembolan temsîl dikin ku van lehengan di rojên herî zor û zehmet de “navê xwe kolane li bircên Diyarbekir.” “Navkolandin” di vê helbestê de sembola hebûn û berxwedanê ye. Di pasaja duyem de helbestvan bi giyanekî pola wek “bablîsok, moraz û bagereke gur” li ber xwe dide û ji berxwedanê bi bîr û bawerî ye.

Bi giyanek pola
Min navê xwe kola
Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
Wek babelîsk
Wek moraz
Wek bagerek gurr
Min eniya têkoşînê vekir
Min di eniyek de şer kir
 li hember xwînxwara
Bi dilawerî
Bi bîrûbawerî
Min têkoşîn û berberî
 kir²²⁷

Wek ku tê zanîn çar deriyên Birca Diyarbekirê hene. Di helbestê de jî “çar derî” xuya dibin ku her yek ji van deriyan wek sembolekê hatiye bikaranîn: Deriyê Niştîmanî, Deriyê Neteweyî, Deriyê Serxwebûnê û Deriyê Felatê. Her deriyek ji bo avakirina neteweyekî wek sembolekê xuya dibin. Deriyê Niştîmanî; xwedîderketina li axê û xwecihî ye, Deriyê Neteweyî; berxwedan û şoreşa ku bûye û dibe ji bo gelekî tê kirin, Deriyê Serxwebûnê; armanca şoreş û berxwedanê diyar dike ku ev şoreş ji bo serbestiyê ye ango berê me dide Deriyê Felatê.

Ez,
Di Deriyê Niştîmanî de ketim hundir
Min
Deriyê Neteweyî bi zerzenga xemiland
Û li ber Deriyê Serxwebûnê
 şer kir
Bêweç mabû baxçeyê Deriyê Felatê
Min tê de
Şaxên serbestiyê çikand
Tovê xawêndariyê werkir.²²⁸

²²⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 28.

²²⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 29.

Ergün, Şêx Seîd wek pêşeng û şehîdê serîhildana 1925an bi bîr tîne û dibêje ku di helbesta Kurdî de wek qehremanekî neteweyî tê diyarkirin. Şêx Seîd ne bi serkeftinên xwe, bi helwest û şhadeta xwe dibe çavkaniya hişmendiya neteweyî û di helbesta Kurdî de bi vî aliyê xwe derdikeve pêş.²²⁹ Di vê helbestê de û bi taybetî jî di pasaja dawî de, “Şêx Seîdê Kal” bi vî aliyê xwe xuya dibe. Şêx Seîd wek qehremanekî dîrokî sembola berxwedan û têkoşînê ye. Bijîşk Fûad, Bavê Tûjo û “pêşmergekî bê navûnîşan” jî temsîlên xwedîderketina li vê berxwedanê ne û wek şopînerên wî yên nû tîne xuyakirin ku peyama ku dê berxwedana Şêx Seîd her bidome, didin neteweya xwe. Ango her navek “qewdek ji pincara” şoreşa welat e. Herçiqasî têkçûbûn jî bi helwesta xwe navê xwe kolane li bircên Diyarbekirê. Her du ristên dawî “Ez duh şehîd bûm/ Îro, nû hatim.” jî xwedîderketinek li van nava xuya dibe ku Barnas wan wek şehîdan û xwe jî wek şoreşgerekî ku “nûhatiye” dibîne. Ango hêza berxwedana neteweyî bandorê li nîfşên piştî xwe jî dike û ev qehreman dibin “modelên şênber” û “peyameke neteweyî didin nîfşên îro û dahatûyê.”

Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
 Ez Şêx Seîdê kal,
 bijîşk Fuad im
 Pêşmergekî bê navûnîşan
 Û qevdeki ji pincara welat im.
 Ez duh şehîd bûm
 Îro, nûhat im.²³⁰

Di helbesta “Jîna Bûrî”yê de helbestvan weke şoreşgerekî ji xwe bawer ji bo berxwedanê tev digere. Di her mercên jiyane de berxwedan heye û tîne ziman ku ev rewş dê her dem bidome. Di rista duyem de ji ber ku li ber xwe daye û ser netewandiyê “di jiyana borî de”, hinekî bi gazin be jî, di helbestê de tê dîtin ku dîsa li ser a xwe ma ye. Her çiqas aniha ev berxwedan tunebe jî helbest tîne ziman ku li dema borî di her mercên zor -“sirra spêdê,” “tariya şevê” û “qêleqija tîrmehê”- de ser nehatiye tewandin. Di heman demê de hêviyeke veşartî jî xwe dide hîskirin ku dê ev berxwedan her dem bidome. Di helbestê de berxwedana ku tê behskirin berxwedaneke gelemperî ye ku kirde ne “ez” lê “em” e.

Me ser ne tewand, li ber kesî di jîna bûrî
 Lê, ku ji vê jînê re jî, jîn bête gotin

²²⁹ Ergün, *Nerî û Helbest*, r. 114.

²³⁰ Barnas, *Kadiz*, r. 29.

Me ser netewand, ne li ber sirra spêdê,
Ne li ber tanya ku çavê şevê dirihotin
Û ne li ber qêleqija Tirmehê ku
Ew qêleqija laş û hinav tev de disotin.²³¹

Helbesta “Berevanî”yê jî berê me dide jiyana kesekî neteweperwer ku ji bo doz û neteweya xwe têkoşiyaye. Ev kes Bavê Tûjo²³² ye ku di nava gel de wek şoreşger û qehremanekî neteweperwer bi bizav û sekna xwe derketiye pêş. Di serê helbestê tevgera Bavê Tûjo ya li hember îdamê û axaftina wî ya li hember sêdarê tê ravekirin. Ji tevgerên Bavê Tûjo diyar dibe ku di vê kêliya jiyana xwe de jî bêtirs e û li hemberî celadê xwe bi axaftina xwe ya dawî jî li ber xwe dide. Ev axaftin, daxwaza kesekî welatparêz e ku li ber mirinê “bi pêşdarazî” biryar lê hatiye birîn.

Gote wan:
We
 bi pêşdarazî
 biryar daye
 ji xwe
Lê,
Dîsa baş pê bizanin
Em natirsin, ji taristaniya mirinê
Em natirsin
 ji brûskên har
 ên di ewrên reş
Û ji bene donekî
 yê sêdarê²³³

Helbestvan, Bavê Tûjo wek “dendika gerûya roja welat” derdixîne pêş û li hemberî keftar û xwînxwaran tariyê belav dike û bê tirs tev digere. Bavê Tûjo ji bo hişyarkirina gel û vîna neteweyê wek simbol û figureke ji nava gel tê xuyakirin. Lewre di ser axaftina Bavê Tûjo re peyamek tê dayîn. Ev peyamek hêviyekê li gel belav dike û li hember xwînxwaran gel di nava hestên neçariyê de nahêle.

Em
Dendika
 di gerûya
 Roja welat in
Em natirsin

²³¹ Barnas, **Kadiz**, r.37.

²³² Li gorî agahiyên ku Rojen Barnas dane me, Bavê Tûjo şoreşgerê serdema xwe ye û di nava gel de wek lehengekî derketiye pêş.

²³³ Barnas, **Kadiz**, r.113.

Em
 ji mirinê
 naçilmisin
 Dîsa bizanin
 Ji gidranên berazên kûvî
 û ji keftar
 Dijwar,
 xwînxwar
 û jakawtir
 tu nîn in.
 Tu nîn in teba li reşayiyê
 Lê,
 Hêz û jakawiya wan
 Li ber tîrêjên ramanên mirovan
 natiwan
 Ê li ber bizava bawermendan
 naçar
 dimînin.²³⁴

Di dawiya helbestê de Bavê Tûjo wek temsîlekî şoreşgeran û sembolekî neteweyî li ser navê gelek kesan tê peyivandin û bersiva wî doza li hemberî kedxwiran tîne ziman. Herçiqasî Bavê Tûjo di vê berxwedanê de bi ser neketibe jî, bi helwest û bersiva xwe, baweriyekê diyar dike ku bêguman ev bawerî hişmendiya neteweperweran e.

Bersiva min ev e,
 Berevaniya min ev
 Me baweriyek, pêşbîrek heye
 Em, ronahiya dilê xwe
 Bi qelewbûna kedxwiriye
 Bi tariya patoxwira, nadin guhartin
 Ronahiya dozan mîna rîman e
 Rim di şîlfan de nayê veşartin.²³⁵

Barnas bi pirtûka *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* re berê helbesta xwe bêhtir dide netewetiyê û mijarên ku bi netewetiyê re girêdayîne. Ji ber vê jî berxwedana ku di van helbestan de xuya dibe berxwedaneke neteweyî ye. Ev berxwedana neteweyî bi helbesta “Rom”ê re xuya dibe. Serhildana Dêrsim, Zîlan û bi darvekirina Şêx Seîd bi bîr tîne û diyar dike ku Kurd di van serhildanan de “bêhejmar hatibin kuştin” jî xwe gihandine îro. Berçavkirina Dêrsim, Zîlan û bi darvekirina Şêx Seîd, wek

²³⁴ Barnas, **Kadiz**, r.114.

²³⁵ Barnas, **Kadiz**, r.114.

vejandina berxwedana Kurdan derdikeve pêş. Kurd dê tu carî xelas nebin û Şêx Seîd jî her hebin. Lewre rêya Şêx Seîd bûye rêya hemû Kurdperweran û wek Kurdekî neteweperwer Ezîz Yûsif jî li vê mîrateyê xwedî derdikeve ku ev xwedîderketin berxwedaneke neteweyî ye.

Rom!
Em li Dêrsimê not hezar,
Li Zîlan
Bêhejmar hatin kuştin
Lê dîsa jî
Gihîştin îro.
Şêx Seîd gelek in ji bona darê
Li zîndanê tev Ezîz Yûsifî
Bi saya xwe
Emê zîl bidin
Bifitiqin
Li Kurdistanê her roj.²³⁶

Di avakirina berxwedana neteweyî de Rojen Barnas bêhtir berê xwe dide dîroka neteweyî û di nav vê dîrokê de jî qehremanên dîrokî berçav dike. Bi nîşandana van qehremanan re Rojen Barnas hem hişê neteweya xwe zindî dihêle û hem jî peyamên serkeftinê di ser van qehremanan re dide neteweya xwe. Derbarê vê mijarê de Ergün diyar dike ku dahênana qehremanan di heman demê de dahênana dîrok û reçelega neteweyî ye. Dîrok û reçelega neteweyî ji bo avakirina îro û dahatûya neteweyê wek pêwîstiyekê dibîne. Kişf û afirandina qehremanên neteweyî ji bo bercesterkirina taybendmendiyan neteweyî, rizgariya ji bindestiyê û gihîştina serdemeke zêrîn wek sembolen neteweyî dipejirîne. Ji ber vê jî bi dîtina Ergün, netewe li ser hizra dîrokeke tijî qehreman tê avakirin û qehremanên neteweyî jî wek nûnerê mîrateke bi şan û jan ji bo sazkirina bernameya hevbeş a paşeroja neteweyê wek regezên kara tên vejandin û ger nebin jî tên afirandin.²³⁷

Li gorî diyarkirina Ergün; Qazî Mihemed, di 1946an de bi ragihandina Komara Mehabadê re dibe mijara helbesta Kurdî û diyar dike ku di nav helbestvanên Kurd de wek helbestvanê wê serdemê û şahide vê rûdana girîng herî zêde Hêmin vê mijarê di helbesta xwe de bi cih dike.

²³⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 186.

²³⁷ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 106.

Di vê çarçoveyê de, Barnas jî bi helbesta “Kirîv”ê re qehremanên dîrokî xwedî derdikeve û wan wek sembolên serdema neteweyekî ya ji bo berxwedana neteweyî tîne ziman. Barnas bi vê helbestê re dide dû şopa Hêmin, ku “Hêmin roja ku Komara Mehabadê ava dibe wek cejna serxwebûna welat û roja şadiyê pênase dike. Helbestvan di wê baweriyê de ye ku Pêşewa ne tenê Mehabadê, dê hemû axa welat ji bin destê dijmin rizgar bike û Kurdan azad bike.”²³⁸ Li vê fikrê xwedî derdikeve û Qazî Mihemed wek qehremanekî neteweyî ji bo berxwedana neteweyî di helbesta xwe de bilind dike. Di heman helbestê de helbestvan, Seyîd Riza jî wek qehremanekî neteweyî berçav dike. Bi vê yekê re Barnas qehremanên neteweyî bi bîr tîne û careke din hiş û berxwedana neteweyî zindî dihêle. Di heman demê de ev helbest me bi perçebûna axekê re jî rû bi rû dihêle ku ev jî xwedîderketina li hemû perçeyên neteweya xwe ye. Ji ber ku her qehremanek ji perçeyekî hatiye bi bîranîn ku Barnas bi vê yekê re jî peyamekê dide neteweya xwe.

Ji te tirê ez çî me, kirîv?..

Ez dara

çar

reh

Kulîlka çar serî

Û şemala

çar-çira

Ez Rîzoyê Dêrsimî me

Qazî Mihemedê Mehabadî

Li Rewandizê şax davêjim

Dibişirim

Li Çiyayê Kurda

Bi zeraqa Rojê ra.²³⁹

Li gorî diyarkirina Aydogan, qewm û millet û netewe ji bo berxwedaneke neteweyî her dem ji xwe re di dîrokê de şexsên ku di dîroka wan de derketine pêş wek mîtan nîşan dane. Ev yek ji bo ku ji dîroka xwe hez bikin tîne avakirin. Ev, ji bo neteweyan hezkirin û serbilindahiyek e ku ev yek ji bo siberaja neteweyên herî mezin jî girîng e. Di vê dîrokê de her tim kesayetiyên hene ku xwestine mirov ji wan

²³⁸ Ergün, *Nerî û Helbest*, r. 115.

²³⁹ Barnas, *Kadiz*, r. 184.

hez bikin û xwe bikin weke wan. Lewre her dem teybetmendiyên van kesan yên baş derdixînin pêş²⁴⁰ ku ev yek bi dîtina me ji bo berxwedana neteweyî jî tê bikaranîn.

Di vê çarçoveyê de gava ku em lê dinêrin tê dîtina ku Şêx Seîd, Seîd Riza û Qazî Mihemed wek sê figûrên neteweya Kurd di helbestên helbestvanên berî Barnas de jî wek sê qehremanên neteweyî ji bo berxwedana neteweyî hatine bilindkirin û di berxwedana Kurdan de her dem li pêş sekinîne. Rojen Barnas jî van şexsan di helbesta xwe de derdixîne pêş û li mîrata wan ya neteweperwer wek helbestvanekî neteweperwer xwedî derdikeve. Ev her sê figûrên neteweyî cara ewilî di helbesta “Ragihandina Azad” de bi hev re xuya dibin ku di vê helbestê de wek temsîla berxwedanê disekinin.

Me hinarê bi serbilindî xwar, di zîndanê
Bi evîn û sergermiya Mem û Zîn
Şêx Seîd, Seyd Rîza, Qazî Miheme
Xwençeyê dîlanê şandine bo me
Li Kadiza Serbilinda emê bicivin.²⁴¹

Di dawîya helbestê de Barnas xwe weke yekî ku li vê mîrateya berxwedanê xwedî derketiye berçav dike û diyar dike ku alaya berxwedanê ji dest nexistiye û bi têkoşînê, ji bo siberoja netewetiyê xwe vê alayê dispêre yên piştî xwe.

Me ew ji dest nexist heta mirinê
Me serê we serbejêr nekîr
Bi rûreşiya jihevketinê
Ev alaya ha
Sparî hewe
Nekeve ha!²⁴²

Di helbesta “Sê Tîrêj”ê de Barnas careke din Şêx Seîd, Seyid Riza û Qazî Mihemed bi bîr tîne û van şexsan di têkoşîna neteweya Kurdan de wek sê sembolên herî pak û hêja dibîne. Di vê helbestê de Barnas, her sê qehremanên neteweyî wek “sê tîrêj”ên ku ji esmanê welat hatine xwar berçav dike ku ev rewş wateyeke efsûnî li wan bar dike. Hatina wan ya ji esman dişibîne “sê kevokên çîk spî” û “sê şêrên berxwedanê”. Bi hatina wan re hişmendiyê nû li zarokên welat belav dibe. Bi vî awayî helbestvan diyar dike ku careke din van her sê qehremanên neteweyî bîne bîra

²⁴⁰ Aydogan, **Guman-1**, r. 310-311.

²⁴¹ Barnas, **Kadiz**, r. 256.

²⁴² Barnas, **Kadiz**, r. 257.

neviyan wan û vê mîrata berxwedana neteweyî her zindî bihêle. Ji ber vê jî di helbestê de her yekî bi aliyekî derdixîne pêş ku ev aliyê wan bandoreke mezin li berxwedana neteweya Kurd kiriye. Helbestvan, Şêx Sêid bi awayekî pak û xweşik dişayesîne û hin taybetiyên wî yên ku kesayetiya wî diyar dikin derdixîne pêş û wî wek wijdanê neteweyê bi nav dike.

Gul di hinarîkan de sorexazî
Roj di bîbikan de dilopa hingiv
Di neynika riyê wî yê hirî
Wijdanê netewayek:
Ji kefa avê paqijtir
Çîkspî diçilwilî.
Siwarê hespekî belekberfîn
Şêx Sêid bi zarûkan şa dibû
Ji devê milyonan radmîsa eniya wan
Xweziya xwe
Bi zarûtiya wan dianî
Û misêwa
Mîna qerenfîla di gulana
Sor dibû
Geş dibû
Dibişirî.²⁴³

Seyîd Rîza jî bi helwesta xwe ya di têkoşîna neteweyî de wek şoreşgerekî ku ji aliye bizavên xwe xurt e derdixîne pêş.

Ji eylo dûrbêna difesiland
Ji piling leygîrtir
Ji kewê sivik
Seyd Rîza dersên bizavê dida
Bi destên xwe yên pîroz û nazik.²⁴⁴

Helbestvan, Qazî Muhemed wek zanyar û neteweperwerekî ku ji bo pêşketina berxwedana neteweya xwe jiyaye dibîne û diyar dike ku hişmendiya ziman pir di bîra Qazî Muhemed de ye. Ji ber vê jî wî wek neteweperwerekî ku li ziman xwedî derketiye berçav dike. Di helbestê de jî diyar dibe ku Qazî Muhemed zanîna ziman ji bo pêşeroja neteweyê wek qoda herî girîng dibîne.

Çetik di mil de derî bi derî
Şêrekî alfabe dida zarûkan

²⁴³ Barnas, **Kadiz**, r. 279.

²⁴⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 279.

Diyariya Rojê; ronahî, raman
Pêşewayê min Qazî Muhemed
Zanînê belav dikir.²⁴⁵

Derbarê berxwedana neteweyî ya ku Rojen Barnas berçav dike em dikarin bibêjin ku di helbestên xwe de ji bo azadî û xelasiya ji bindestiyê berxwedaneke tûj derdixîne pêş. Barnas dizane û tîne ziman ku azadî ne bi berxwedanê be dê pêk neyê. Ji ber vê jî neteweya xwe di gelek helbestan de hişyar dike ku li ber xwe bidin û xwe bigihînin xelasiyê. Di vê çarçoveyê de, Rojen Barnas di berxwedaneke neteweyî de herî pir Şêx Seîd, Seyîd Riza û Qazî Muhemed di dahênana qehremanên neteweyî de wek sê simbolên neteweperwer di helbestên xwe de derdixîne pêş. Ev her sê qehremanên neteweyî ku li hemû welat û di nav hemû helbestvanên Kurd de tên zanîn, di helbesta Barnas de jî derdikevin pêş ku ev yek xwedîderketineke neteweyî diyar dikin. Ji bilî van, Barnas hin kesên ku tenê di nav heremekê de wek kesên neteweperwer hatine pejirandin jî di helbesta xwe de cih daye wan û ew dîsa di nav berxwedana neteweyî de bilind kirine. Ev qehremanên neteweyî di helbestên Rojen Barnas de dibin sembola Kurdayetiyê û di vê çarçoveyê de tîne îdealîzekirin. Barnas di ser van şexsiyetên neteweyî re dixwaze hişmendîya Kurdan her zindî bihêle û wan ji berxwedana neteweyî re bike modelên şênber.

1.1.5. NASNAMEYA NETEWYÎ

Avakirina nasnameya neteweyî ji gelek aliyan ve di helbestên Rojen Barnas de xwe diyar dike. Barnas di destpêkê de li dû avakirina wekhevîyekê ye ya bi neteweyê din re. Lewra ewilî zilm û zordariya ku neteweya Kurd dijî tîne ziman û dixwaze ku bi vê yekê re wekhevîyekê ava bike. Ji ber vê jî tîne ziman ku divê Kurd jî wek neteweyên din xwedî mafên xwe û nasnameya xwe ya neteweyî bin. Li hemberî nexweşî û bêpariya gelê xwe derdikeve û bi hemû hêza xwe di helbestên xwe de dixwaze bi vê yekê re li dijî bêdadiyê raweste. Lê piştî demekê, ji ber ku ev xwesteka Barnas pêk nayê, em dibînin ku Barnas li hemberî neheqîya ku li Kurdan dibe bi zimanekî tûjtir tevdigere û Kurdan di ser gelên ku zilm û zordariyê li Kurdan dike re dibîne. Her ku diçe fikra neteweperwerî û rizgarîxwaziya Kurdan di helbestên

²⁴⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 279.

Rojen Barnas de germ dibe. Ev jî di helbestên wî de dibe destpêka vejandina nasnameyeke neteweyî ku li ser dijberiya gelên din ava dibe. Bi vî awayî mirov dibîne ku nasnameya neteweyî di helbestên Rojen Barnas de bi rengvedaneke din derdikeve holê ku ev jî ji ber înkarkirina Kurdan ava dibe.

Ergün dibêje ku “netewetî hizreke weha ye ku di çarçoveya dijberiyên de peyda dibe û bê dijmin nikare bijî. Ji ber vê, her netewe xwe bi neteweyeke dijber pênase dike û di vê çarçoveyê de tevdigere.”²⁴⁶ Di vê çarçoveyê de Amir Hassanpour jî tîne ziman ku yek ji wan taybetmendiya netewetiya Kurdan ew e ku li hember her sê (Tirk, Ereb û Fars) neteweyên din serhildanek heye.²⁴⁷ Pascale Casanova jî diyar dike ku neteweyî, tîkiliyeke wisa ye ku avakirina dijminekî tiştêkî pir xwezayî tê dîtin û li dijberî wî dijminî hatiye avakirin.²⁴⁸ Di vê çarçoveyê de gava ku em li helbestên Barnas dinêrin tê dîtin ku di van cure helbestan de Barnas jî dijminekî ava dike ku armaca wî jî ji vê yekê ew e ku nasnameyeke neteweyî li ser dijberiyên ava bike.

Zülküf Ergün jî heman rewşê berçav dike û li gorî wî jî, “Kurd jî her wek neteweyên dîtir ji ber ku demeke dirêj di bin rêvebirîya desthilatên Tirk û Fars de mane, di gotara neteweyî ya Kurdan û helbestvanên neteweperwer de neteweyên navborî wek dijberên Kurdan hatine destnîşankirin. Ev nerît bi Xanî dest pê dike û ji aliyê helbestvanên piştî wî ve jî tê dubarekirin. Neteweyên navborî carina bi navê xwe, carina bi simbolên xwe û carina jî bi herêm û dewletên xwe tên nasandin û ev nerît wek mînaekeke navdeqîtiyê ji helbestvanekî derbasî helbestvanekî din dibe.”²⁴⁹

Ev nêrîn di helbestên Barnas de jî xuya dibin û li hemberî vê, nasnameyeke neteweyî ava dibe. Barnas rasterast navê helbesteke xwe dike “Rom” ku li gorî dîtina me fikra Xanî, xwe di vê helbesta Barnas de dubare dike. Di vê helbestê Barnas gihîştina neteweya xwe ya îro bi kirinên serdestên xwe “Rom”ê ve girê dide. Di vir de dijberiyek peyda dibe ku nasnameya neteweyî li dijî dijminê xwe derketî re ava dike. Têkçûnan ji bo avakirina hebûn û nasnameya neteweyê bi kar tîne ku ev, bi

²⁴⁶ Ergün, *Nerît û Helbest*, r. 223.

²⁴⁷ Hassanour, *Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik*, r. 29.

²⁴⁸ Pascale Casanova, *Dünya Edebiyat Cumhuriyeti*, Türkçesi: Saadet Özen-Filiz Deniztekin, 1. Basım, Varlık Yayınları, İstanbul, 2010, r. 51.

²⁴⁹ Ergün, *Nerît û Helbest*, r. 223.

bîranîna hin serhildanên têkçûyî re xwedî derketina li neteweyê xwe derdixîne meydanê.

Rom!
Em li Dêrsimê not hezar,
Li Zîlan
Bê hejmar hatin kuştin
Lê dîsa jî
Gihîştin îro.²⁵⁰

Bi pirtûka *Heyv li Esmanê Diyarbekirê* re tê dîtina ku Barnas hê bêhtir mijarên ku bi neteweperweriyê ve girêdayî ne li pênuşa xwe dixê. Em dikarin bibêjin ku bi vê pirtûkê re helbesta Barnas ji serdemekê an jî ji pêvajoyekê derbasî serdem/pêvajoyekê din dibe. Di helbesta ewilî de ya ku Barnas dîsa berê me dide neteweperweriyê helbesta “Em” e. Hê di serê helbestê de rasterast îtrazeke li ser navê biryardayîna îradeye neteweyekî heye.

Kê em çandin ku
Biçînin
Çi îro
çi sibê...²⁵¹

Derdê wî tenê ew e ku divê “dost û dijmin pê zanibin” ku “em” ji bo rizgariyê li ber xwe didin. Di pasaja din de ev derd bi vîn û hêza rizgariya neteweyekî xwe dide der. Serhildana li hemberî desthilatdarê xwe derdikeve pêş. Tekane çareseriyê vî neteweyî rizgarî ye.

Em:
Ne di berîka dayika kesî de nok,
Ne jî
Di tesbîha bavê kesî de movik in
Heta rizgariyê
Em, kansêra di dilê romê
Û
Li serê rohilatanavîn
tomik in.²⁵²

Helbesta “Şeyê Felekê” windabûna gelek neteweyên ku di nava çerxa felekê de hatine hêrandin tîne ziman. Barnas di serê helbestê de balê dikişîne ser gelek ji

²⁵⁰ Barnas, **Kadiz**, r. 186.

²⁵¹ Barnas, **Kadiz**, r. 182.

²⁵² Barnas, **Kadiz**, r. 182.

van neteweyên ku di nava diranên vê çerxê de windabûnê. Lê hinek jê jî hîn di teşîya berxwedanê de ne. Yek ji van neteweyên ku di nava van çerxan de hê li ber xwe didin Kurd in.

Bihone felek bihone
Kurd
zexm e,
nûjen e,
kon e.²⁵³

Di beşa XVIan de ya helbesta “Heyv Li Esmanê Diyarbekirê”, Barnas berê me dide hebûn û nebûna neteweya Kurd. Di vê beşê de neheqîya ku li Kurdan dibe û newekheviya wan ya bi cîranên wan re tîne ziman. Herçiqasî zanayên van netewan li ser azadiya neteweyan “bi qasî barê heft kera” pirtûk xwendibin jî guhê wan ji azadiya Kurdan re girtiye û bi înkâr û ricimandina Kurdan xwe mezin dibînin.

Her yek
Bi qasî barê heft kera
Pirtuk-xwenda
yê
li ser azadî
Û li enternasyonalan
Nimînendê rohilatanavîn
Çi Kurd, çi tirk, çi ereb, çi faris²⁵⁴

Lê Barnas di wê baweriyê de ye û bi hêvî ye ku înkara Kurdan tu carî rêyek ronî li ber dijminên Kurdan venake. Di vê înkârê de rola rewşenbîrên tirk, ereb û farisan jî mezin e ku ev rewşenbîr înkara Kurdan hê mezintir dikan. Bi vê helbestê Barnas zilma serdestên Kurdan berçav dike.

Ji we tirê
Bi înkara me
Hunê
Pandarê pergalê
Lejkerên romê
Bi hêsanî bixapînin
Bi dizî
Vegirin textê selteneî
Bi hêsanî riya ronî bibînin²⁵⁵

²⁵³ Barnas, **Kadiz**, r. 183.

²⁵⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 227.

²⁵⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 228.

Li hemberî vê înkare di beşa XVIIIan de Barnas neteweya Kurd li hember dijminên wan hişyar dike. Ji Kurdan dixwaze ku bizanibin ku armanca serdestên wan ya li welatê wan ji bo asîmîlasyona neteweya Kurdan e.

Ey neteweyê min
Kewgirê dijmin
Kûsîgirê xwe
Fermo ka bêje
Lejkerê romê
Bo kê
Li serê kela Amedê ye
Karê wî çi ye,
Li wê derê li çi digere?²⁵⁶

Di pirtûka *Milkê Evînê* de jî mijara neteweyê derdikeve pêşberî me. Barnas dîsa neheqî û newekheviya ku li hemberî neteweya Kurd dibe, di helbestên vê pirtûkê de jî tîne ziman. Barnas di helbesta “Cîrano”yê de bang li cîranên xwe dike ku qesta wî ji cîranan serdestên Kurdan in. Barnas ji serdestan daxwaz dike ku di navbera wan de wekheviyek hebe. Lê di heman demê de dizane ku dê serdestên wî tu carî wekheviyê qebûl nekin. Ev tenê xweziya Barnas e.

Were em bi çemberkî rûnen di civata mirovan:
Ne tu li seriya min bi çavsorî
Ne ez li jora te bi dek û fen...
Ez, ez
Tu, tu
Lê em...
Em bistrên bi hev re stranên mirovhezî
Em şabaş bikişînin ji şahiya hevdû re
Em nebin qatîlê hev,
Li pey hev bi muxennet.
Em ji hev razî
Em ji hev xweş
Û em li hev bi hesret.
Ax!
Ax!
Ka li ku
Xwezî?!...²⁵⁷

Barnas carcar ji ber zor û zehmetiyan pesnê xwe jî bi neteweyê xwe dide. Kurdbûnê di dogehê de wek serfiraziyekê, jixwerazîbûnekê û xwedîderketina li

²⁵⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 230-231.

²⁵⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 247.

niştîman dibîne. Ji ber vê zorbûnê serbilind e. Lê di heman demê de zor û zehmetiya Kurdbûnê jî tîne ziman.

Ez Kurd im.
Kurd bûn:
Bê nav û nîşan
bê niştîman
bûyîn e.
Bê huwiyet, bê paseport
Jiyana bi dizî ye li welatê xwe.²⁵⁸

Di helbesta “Gotara Azad”ê de Barnas hem van zor û zehmetiyên Kurdbûnê tîne ziman hem bi wan pesnê xwe dide ku bi milyon salan e xwe gihandiya roja me. Em dikarin vê rewşê bi nasnameya dîrokî bînin ziman ku ev yek xwedîderketineke dîrokî jî tîne ziman û bi vê helbestê re rewş berçav dibe. Ango di vê helbestê de dîsa xwedîderketina li Herîrî û Cizîrî, ku bi “zarê şîrîn” nivîsandine, di heman demê de xwedîderketina li ziman û dîroka neteweya xwe ye ku ev jî nasnameyeke neteweyî ava dike.

Ez im ew mêrxasê ku
Bi Ksenofon da nivisandin
“Vegeza Dehhezaran”
Ez im, HERÎRÎ û CIZÎRÎ
Ku
li hember
“Qale û Yeqûlû”
Bi zarê şîrîn ê kurmancî
Hespê têkoşîna niştîmanî
Rakirin pêdarê.
Ez im,
Ez Kurd im.²⁵⁹

Xwedîderketin û pesindayîna wî jî ne bêbingeh e:

Ez Kurd im,
Belgeya Kurdbûna min:
xwenasî
xwezanî
xwedîna min e.²⁶⁰

²⁵⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 260-261.

²⁵⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 263.

²⁶⁰ Barnas, **Kadiz**, r. 263.

Di avakirina nasnameya neteweyî de, ji bilî fikra dijberiya li hember gelên din, dîrok û referansên ku ji dîrokê tên girtin jî di avakirina nasnameya neteweyî de pir girîng in. Ji ber ku dîrok çavkanî û xezîneyeke bêdawî ya hemû gelan e. Hemû gel û netewe xwedî dîrokeke taybet in ku di vê dîrokê de xweşî û nexweşî, serkeftin û binketinên hemû gelan tê de bi cih dibin. Mirov dikare hemû kar û barên neteweyan yê taybet di vê çavkaniyê bi dest bixe. Ji ber vê jî eger helbestvan, helbestvanekî neteweperwer be mecbûr e ku bi çavekî hûrbînî li vê dîrokê binêre û ji vê çavkaniyê sûd bigire. Helbestvan di nav vê dîrokê de wek rêwiyekî dikeve gerekê ku di vê rêwîtiyê de çî tiştên ku bi kêrî wî tên tomar dike û di avakirina nasnameyê neteweyî de bi kar tîne. Lewre referans û çavkaniyên dîrokî ji bo helbestvanekî neteweperwer di avakirina helbesta wî de yek ji wan keresteyên herî girîng in.

Hobsbawm, dîrok û rabirdûyê girîng dibîne û di mijara netewetiyê de û têkiliya wê ya bi dîrokê re wek têkiliyê xwezayî berçav dike û diyar dike ku “em sedema wê zanibin jî û nizanibin jî hewcedariya me bi dîrokê heye û em ji dîrokê sûd werdigirin.”²⁶¹ Îrfan Amîda jî diyar dike ku pêdiviya her neteweyî bi dîrokê heye ji ber ku dîrok hinekî be jî bîr û hişê neteweyekî diafirîne.²⁶² Li gorî vê nêrînê jî tê dîtin ku gelek helbestvanên neteweperwer bi awayekî zanyarî serî li dîrokê didin û heta ji wan tê xwe digihînin dîrokeke serkeftî. Di nav van helbestvanên neteweperwer de Rojen Barnas jî cih digire ku ew jî bi awayekî zaneyî nêzî dîrokê dibe û heta jê hatiye dîrok di avakirina nasnameyê neteweyî de bi kar aniyê.

Ergün dîrokê di gotara netewetiyê Kurdî de li cihekî taybet dibîne û diyar dike ku “dîrok di nav nerîtên çêkirî de regeza herî girîng e ku di pêvajoya netewesaziyê de derdikeve pêş û wek qada vedîtin û keşîfkirina taybet û nasnameya neteweyê di navbera raborî, îro û dahatûyê de peywendiyê bîhêz çêdike. Ronakbîrên Kurdan yên ku di kovar û rojnameyên pêşî yên Kurdî de nivîsandine ji bo xurtkirina nasnameya neteweyî û nîşandana hebûna Kurdan li hember netewetiyê serdest a resmî gelek caran berê xwe dane dîrokê û bi hêza wê hewl dane.”²⁶³ Gava ku em berê xwe didin helbestên Rojen Barnas tê dîtin ku di vê çarçoveyê de Barnas jî daye dû şopa van ronakbîran û bi vî awayî berê xwe daye dîrokê.

²⁶¹ E. J.Hobsbawm, **On History**, New York: New Press, 1997, r. 23–25

²⁶² Amîda, **Qonaxêke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, r. 39.

²⁶³ Ergün, **Nerît û Helbest**, r. 95-96.

Di vê çarçoveyê de Barnas di gelek helbestên xwe de serî li bûyer û peymanên dîrokî yên nivîskî dixê û tesîra van bûyer û peymanan ji bo neteweya xwe diyar dike. Di vê çarçoveyê de Eliot jî diyar dike ku hişmendiya dîrokê ne ew e ku mirov tenê rabirdûyê bizanibe. Helbestvanekî ku hişmendiya wî ya dîrokê hebe, tenê wextê ku tê de dijî nayine ziman û bi vî awayî tev nagere.²⁶⁴ Armanca serlêdana Barnas ew e ku çî bûyerên ku tesîr li neteweya Kurd kiriye bîne ziman û neteweya xwe li hember dahatûyê hişyar bike û pê re jî nasnameyeke neteweyî li ser vê dîrokê avabike.

Barnas bi helbestên “Du Perî, Mezopotamya û Ev Milk”ê re berê helbesta xwe dide dîrok û axa Kurdan. Di van helbestan de Barnas hebûna Kurdan ya li ser vê axê digihîne dîrokeke kevin û Kurdan bi vê ax û dîrokê ve girê dide. Hebûna Kurdan ya li ser vê axê bi “destpêka zemanekî” kevin ve tîne ziman. Di berde wama van helbestan de çîroka Kurdan bi mîtolojiyê ve girê dide ku ev rewş jî dîsa me dibe dîrokeke kevin. Barnas, çemê Dicle û Firat wek du periyên sembolîze dike û axa di navbera van her du çeman de jî ji dîrokeke pir kevin de wek cihê Kurdan bi nav dike ku ev ax di dîrokê de bi navê Mezopotamya hatiye bi nav kirin. Helbestvan diyar dike ku di nav axa Mezopotamyayê de, bi dîrokê re gelek gel winda dibin lê Kurdan wek qewmê herî kevn ku xwe li ser vê axê girtine û welatê wan jî wek cihê şaristaniyê dibîne. Ango Kurd yek ji wan gelan in ku xwe “ji destpêka bêdestpêk” li vî warî wek niştecîh in û ev ax di dîrokê de wek axa Kurdan tê zanîn. Lewre Barnas xwefedakirina Kurdan ya di ber vê ax û dîrokê de mafdar dibîne. Bi van helbestan Barnas nîşandana mezinahî û bihêzkirina Kurdan berçav dike ku ji vê jî armanca Barnas ew e ku bi van referansên dîrokê re nasnameyeke neteweyî avabike û vê nasnameyê li ser ax, dîrok û erdnîgariyê berçav bike.

Ji esman hatin em,
-Wek Kurd-
An
Ji erdê hêşîn bûn bi awakî?
Kengê... çawa... çilo...
Peyda bûn li vî xakî?...
Kes nîne bersîva vê pirsê bide
Û bîra tarîxê jî ji heq dernayê.
Tiştê tê zanîn

²⁶⁴ Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, r. 2-3.

Ji destpêka zemanekî nebinavkiri
Em li vê deverê ne.
Me gêra, vî xakî kire war
Û vî warî kire milk
Me xwe jê re feda kir
Ji silqê safî.²⁶⁵

Barnas piştî ku Kurdan li ser axeke kevin û bi dîrokeke kevin bi cih dike, îcar çî bûyerên ku li ser vê axê û di nava vê dîrokê de hatine serê Kurdan tîne ziman. Lewre ji ber zordestiya ku li ser vê axê li neteweya Kurd hatiye kirin ji dîrokê bi gilî û gazin e û bûyerên ku di nav dîrokê de diqewimin wek “nivîsîna li eniya” neteweya xwe dibîne. Ev yek ji bo avakirina nasnameyê neteweyî ye ku ev nasname ji ber destê zordestiyê “pişt xûz”, “şerpeze û şapûl” e, aniha.

Ey tarîxa stû xûl
Pişt xûz
Şerpeze û şapûle
ji destê zordestiyê
Ey nivîsana li eniya me²⁶⁶

Barnas di helbesta “Heyv Li Esmanê Diyarbekirê” beşa XVIIan de berê me dide peymanê dîrokî ku ji vê peymanê û şûnde hem înkara Kurdan dest pê dike û hem jî welatê wan perçe dibe. Bi bîranîna vê peymanê re Barnas dixwaze neteweya xwe li hember peymanên dîrokî yên ku nasnameya neteweya wî înkâr dikin, hişyar bike û nasnameya neteweyî li ser vê înkârê vejîne.

Înkara me
Ji peymanê talanker
Qesrîşîrîn vê de
Her tim li dara
Her tim
Mêlîde ye
Li esman
Bi şewitandin û xopan kirin
Ji deh sala carek
Çî bigre
Hêle ye li ser serê me.²⁶⁷

²⁶⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 239.

²⁶⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 230.

²⁶⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 229.

Bi helbesta “Bi Sultanê Osmanî re Me Peyman Danî” re Barnas balê dikişîne ser peymaneke dîrokî. Navê vê peymanê di helbestê de nehatiye diyarkirin û ev peyman di dîroka fermî de jî qet nayê behskirin. Ev peyman di navbera “Mîr Ewdal Xan û Siltanekî Osmanî” de “bi bext, bi qewl û bi qerar” tê dayîn. Her du li ser şertê ku dê “wek ometa Mihemed/ li hewara hev herin/ bi cîranî” bi hev re bin û tu kes li hev xayîntiyê neke, li hev dikin. Kurd bi vê peymanê re digihêjin hin mafên xwe û di navbera wan û cîranê wan de wekhevîyek ava dibe. Lê piştî em dibînin ku mercên ku bi hev re danîne pêk nayên û “Siltanê Osmanî” ji ya xwe vedigere. Barnas vê peymanê wek dûpişkekê ku bi Kurdan vedaye dibîne. Di vê helbestê de Barnas wek vebijêr li ser navê Kurdan dipeyive û tîne ziman ku Kurd ji ber dilsafiya xwe zû tîn xapandin. Di vir de armanca Barnas hişyarkirina neteweya xwe ye ku li hember fen û fûtên dîrokê careke din neyên xapandin. Em di wê baweriyê de ne ku Barnas careke din nasnameya neteweyî li ser vê înkare derdixîne pêş.

Kî nanê me dixwe, bitir dibe
 Kî j' ava me vedixwe, çavsor...
 Hingî ew bitir bû, em lewaz
 Hingî ew bi hêz bû, em bê taqet man.
 Ê wî
 Bext û qewl û qerar
 Ji bîra xwe ya şahane hilanî.
 Bi sultanê osmanî re me peyman danî.
 Peymana me bû dûpişk
 Bi me veda.²⁶⁸

Helbesta “Paşayekî Ferman Deranî” jî dîsa di dîrokê de li ser xapandin û înkara nasnameya Kurdan radiweste. Barnas di vê helbestê de jî berê me careke din dide dîrokê û bi fermana vî “paşa”yî balê dikişîne ser qedexeyên ku hatine lidarxistin. Armanca van qedexeyan tunekirina nasnameyeke neteweyî ye. Bi fermana vî paşayî hemû peymanên ku berê hatine îmzekirin li ber avê diçin. Dîrok û rabirdûyê înkare dike û peymana ku Kurdan berê bi Osmanîyan re daniye “li ber lehiya wî” diçe. Bi ser vê de jî “navê me, mafê me, yê welatê me” qedexe dike. Bi vê helbestê re Barnas careke din neteweya xwe li hember bûyerên ku dîrok û pê re jî nasnameya wan înkare dike, hişyar dike.

Paşayekî osmanî ferman deranî

²⁶⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 243.

Paşayekî ku ji xwe pê ve kes-nenas
 Ji pêşiya xwe sil
 Ji bûrî nexweş
 Bi firçeyeke fereh û stûr
 Boyaxa reş
 Kêşa ser tarîxê û rabirdû.
 Pirtika ji peymanê di navbera me
 Ku mabû
 Ew jî li ber lehiya wî çû.
 “Qapîqûlû” û “dewşirme”
 Zû
 Talûkê eyîşandin
 Maliştin tarîxa heyî
 Tarîxê ji “Wî” û jê pêve dan meşandin.²⁶⁹

Ji van mînanan diyar dibe ku Barnas wek helbestvanekî neteweperwer li hember tevgerên serdestên Kurdan derdikeve û Kurdan li hemberî talan û tunekirinên serdestan diparêze. Ji van helbestan diyar dibe ku helbesta wî xwedî roleke girîng e ku ev rol dîsa di xizmeta gelê wî de ye. Barnas bi hemû hêza helbesta xwe li hemberî serdestan neteweya xwe diparêze û di heman demê de serdestan wek dijminên Kurdan jî dibîne. Bi vê yekê armanca Barnas ew e ku dijminekî ava bike û bi vê re jî li hember van dijminan hevgirtinekê di nav neteweya Kurd de ava bike û pê re jî nasnameyeke neteweyî derxîne holê.

Di heman demê de Barnas bi van helbestan, avakirina nasnameyeke neteweyî û bihêzkirina hebûna Kurdan ya li ser axa wan bi referansên ku ji dîrokê hatine girtin re jî, destnîşan kiriye. Barnas carcaran ji ber bûyerên ku di nav demê re tînin serê neteweya Kurd ji dîrokê bi gazine e. Di nav van helbestan de fikra ku herî derdikeve pêş înkara nasnameya neteweyî ya Kurdan e. Barnas ji ber vê înkare jî dîrokê ne razî ye ku Kurd her dem hatine xapandin. Ji ber qedexeyên ku li ser nasnameya Kurdan hatine ferzkirin, helbesta Barnas van bi bîra neteweya xwe tîne. Di van helbestan de helwesta Barnas ew e ku li hember van biryaran neteweya xwe hişyar bike. Barnas bi van mînanan bindestiya Kurdan û êrîşên neteweyên cîranên wan ji me re berçav dike ku mebest ji vê jî ew e ku neteweya Kurd li hember van êrîşan hişyar bike û bîra neteweya Kurd her zindî bihêle. Lewre em dikarin bibêjin ku bi van helbestan Barnas ji çavkaniyên dîroka neteweyî sîd wergirtiye. Ev jî tê wê wateyê ku dîrok di helbestên Barnas de bi awayekî zanayî hatiye bi kar anîn û bi vê yekê re Barnas şanî

²⁶⁹ Barnas, **Kadiz**, r. 245.

me dike ku dîrok ne ji bûyerên ku qediyane û li rabirdûyê mane, pêk tê. Bi van helbestên ku me weke mînak dane ev aliyê dîrokê xwe di helbestên Barnas de diyar dike.

1.1.6. ZIMANÊ NETEWYÎ

Ziman, hem ji bo takekes û hem jî ji bo gelekî referanseke sereke ye. Ji ber ku ziman, hem nasnameya şexsî û hem jî ya neteweyî diyar dike, wek semboleke sereke tê dîtin. Keresteyeke sereke ya netewebûnê ye ku piraniyên neteweyan li gorî zimanên xwe ji neteweyên din cuda dibin. Di heman demê de ziman rêgezêke sereke ya nasnameya netewebûnê ye jî. Helbet nêrîna ku mirov bi “nasnameya neteweyî” li ziman dinêrin piştî belavbûna fikra netewetiyê ye. Ji ber vê jî em dikarin bibêjin ku di serdemên modern de ziman bi nêrîneke siyasî derketiye pêş. Li gor van nêrînan gava ku em li meseleya ziman dinêrin tê dîtin ku Rojen Barnas jî bi heman hişmendiye li ziman dinêre û dîsa li gorî vê baweriyê nêzî helbestê dibe. Ji ber ku Barnas diyar ku “herî çêtir zimanê helbestê bi kêrî bîr, raman, xwezî û daxwazên mirov yên neteweyî tê.”²⁷⁰

Zülküf Ergün diyar dike ku ziman ji aliyê neteweperweran ve di pêvajoya netewetiyê de hem wek amrazêke girîng a neteweyîkirinê hatiye bikaranîn û hem jî ji aliyê dewletên neteweyî ve ji bo civakeke hevregez armanc pê hatiyekirin. Ji ber vê jî ziman wek erkeke siyasî hatiye dîtin ku di nav hemû neteweyan de wek rêgezêke damezrîner û ew wek ruhê neteweyê hatiye pejirandin. Lewre ji aliyê neteweperweran ve parastina zimanê neteweyî li hember zimanên biyanî wek parastina ruhê neteweyî derdikeve pêş û peyv û karîgeriya zimanên biyanî wek xirabkirina ruhê neteweyî hatiye şîrovekirin û ziman wek tekane pîvana hebûna neteweyê tê destnîşankirin. Ev girîngiya ziman berçav dike ku sînorên neteweyî gelek caran ne bi çiya û rûbaran, bi ziman û nerîtên neteweyî hatiye destnîşankirin û ziman wek semboleke neteweyî hatiye pejirandin.²⁷¹

²⁷⁰ Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr**, r. 62.

²⁷¹ Ergün, **Nerît û Helbest**, r. 175.

Barnas nivîskarekî wek mîmar û xizmetkarê wî zimanî dibîne ku bi hunermendiya xwe afirandineke jîndar dikare çêbike. Lewre nivîskar bi alîkariya edebiyatê xwendevanên xwe dikarin ber bi ramanan ve biajon, çêja bedewiya pejin, xeyal û afirandinên ramanî pê bidin tahmandin. Nivîskarek dikare miletekî ji nû ve ava jî bike û wî ber bi hevkarîyê ve bibe. Ji ber vê yekê gelekî wek me Kurdan hewce ye ku bêhtir li nivîskarên xwe xwedî derkevin. Barnas girîngiya nivîskarekî di edebiyat û hişmendiya wî gelî ya neteweyî de bi vî awayî ji me re diyar dike:

“Di pêşveçûna edebiyatekê de barê giran li ser milê nivîskarên edebî yên wî miletî ne, lêbelê ev nayê wê maneyê ku tevahiya bar li ser milên wan e. Heta ku gengaz be divê pisporên ilmî yên wî miletî jî bi wî zimanî binivîsînin. Mêjûzanên me divê ku bi kurmancî binivîsînin da hem zimanê me ji aliyê termînolojîk hem ji aliyê bêjezanî de ferehtir û dewlementir bibe û hem jî nivîskarên me yên edebî wê fersendê bi dest xî ku ji wê kaniya mêjûya me avê vexwin.”²⁷²

Barnas di wê baweriyê de ye ku bîra neteweyekî ji dîroka wî ya nivîskî pêk tê. Lewre bi Kurdî nivîsandin ji bo Barnas ne minetek e, ku vê minetê li gelê xwe û zimanê gelê xwe dike. Barnas bikaranîn û nivîsandina Kurdî wek peywireke “vatiniya mêjûyî” dibîne. Nivîsandin, vejandina edebiyatê û firehkirina ziman pêwîst e ku ev peywira karker, xwendekar û rewşenbîran e.²⁷³ Pascale Casanova jî di heman fikrê de ye ku ew jî edebiyat û bi taybetî jî ziman ji bo berjewendiyên neteweyî wek mîrateyekê dibîne: “Ziman û edebiyat bingehên siyasî yên neteweyî ava dikin û di vê pêvajoyê de esaletê li hev zêde dikin.”²⁷⁴

Bi Kurdî nivîsandin, ji bo Barnas zimanê nivîskî û yê axaftinê ber bi hev birin e. Ev yek yekîtiya zimanê Kurdî xurttir û bileztir dike. Li hember mêtinkariyê, nivîsandina bi zimanê Kurdî wek têkoşinekê dibîne. Bi zimanê neteweyî nivîsandin, berhem afirandin welatparêzî ye. Ji ziman û edebiyata gelê xwe re xizmet e. Hînkirin û belavkirina zimên jî wek mazmazka têkoşîna mezin a siyasî dibîne. Lewre bang li têkoşer, rewşenbîr û xwendeyan dike ku divê her kes di vî warî de cihê xwe zanibe û

²⁷² Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr**, r. 86-87.

²⁷³ Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr**, r. 12, 62.

²⁷⁴ Casanova, **Dünya Edebiyat Cumhuriyeti**, r. 49.

li gorî vê têkoşînê tev bigere. Ji ber ku herî çêtir zimanê helbestê bi kêrî bîr, raman, xwezî û daxwazên mirov yê neteweyî tê.²⁷⁵

Gava ku em li van ramanên Barnas dinêrin tê dîtîn ku Barnas herî pir di ziman de israrê dike. Helbet ev israr wek ku me li jor jî diyar kir piştî hin bûyeran pêk tê. Lewre şexsiyeta Barnas li ser ziman ava dibe. Piştî têgihîştina asîmîlasyonê, li hember vê berê xwe dide fêrbûn û rizgarkirina zimanê xwe. Helbet ev ne karekî ji rêzê ye ji ber ku zimanê wî qedexe ye û bi vî zimanî jî perwerde nebûye. Li gorî Jan Assmann “dibe ku zimanê neteweyekî jê bê girtin, axaftina wî qedexe bibe û zimanekî din li ser wî bê ferzkirin ku pê biaxive. Lê gava ku ev netewe bi zimanekî din hînî hîskirinê neyê kirin ev nayê wê wateyê ku zimanê kevin ji kokê de hatiye birîn. Zimanê kevin dê dîsa di helbesta wî zimanî de bibe navgîna derbirînê”²⁷⁶ ku Rojen Barnas jî bi helbesta xwe ev navgîn avakiriyê.

Gelek nivîskar û rewşenbîr ziman tenê wek alavekî ragihandinê nabînin. “Bêşik û bêguman; ziman ne qetegoşteke di şikefta devê mirovî de; nasnameya mirov ya mirovî, nijadî û wêjeyî ye jî.”²⁷⁷ Li zimanê xwe veger û bi vî zimanî nivîsandina helbestan û avakirina edebiyatekê diyar dike ku Barnas nasnameya xwe ya edebî li ser ziman ava dike. Lewre Barnas di ziman de li hebûna xwe digere û dîsa di ziman de hebûna xwe dibîne. “Di wêjeyê de ziman, ne tenê alavek e: avahî, avakarî, şêwe û şêwaz, kewn û kemilandin û bi watekirina berhemê bi xwe ye.”²⁷⁸ Di helbesta Barnas de ziman, ji bilî hemû ûnsûrên ku di helbestê de pêk tîne, hebûn bi xwe ye. Ango di helbesta wî de ziman ne tenê alavek e. Zimanê helbesta Barnas, di bin gelek berpirsyarên neteweyî de ye.

Berken Bereh, ziman nîşaneyê herî resen û xweser û tekane stûna neteweyê dibîne û sedema helbest-nivîsandina Barnas ya bi Kurmancî bi hişmendiyê wî ya ziman û neteweperweriya wî ve girê dide.²⁷⁹

Barnas bi heman hişmendiyê li ziman dinêre û ew jî ziman wek nasnameya neteweyî dibîne ku serê xwe pir bi vê nasnameyê re êşandiyê. Li gorî wî, neteweyek

²⁷⁵ Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr**, r. 22, 31, 62.

²⁷⁶ Jan Assmann, **Kültürel Bellek**, Çeviri: Ayşe Tekin, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2001, r. 140.

²⁷⁷ Arjen Arî, **Xasenezer**, Çapa Yekem, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013, r. 53.

²⁷⁸ Arî, **Xasenezer**, r. 105.

²⁷⁹ Bereh, **Rojen Barnas**, r.5.

bi saya ziman li ser piyan dimîne û dibe xwedî nasnameyekê. Ev fikr û raman di helbesta “Nasname”yê de bi awayekî eşkere xwe didin der.

Nasnameya min di devê min de
Derya min a fikr û tesewirê
Hişê min jê hêzê distîne
Bilindî û kûrî pê
Teşe didin pêlên fikrê.²⁸⁰

Li gorî ragihandina Ergün, “ziman neteweyan ji hev vediqetîne û di heman demê de di nav civakê de hestên hevbeş jî çêdike ku rehendên hişmendiya navxweyî ava dike. Ji ber vê di nav piraniya neteweyan de ziman wek nîşaneyê yekem a netewetiyê derdikeve pêş û asta hişyarî û hêzbûna nasnameya neteweyî bilind dike.” Ji ber vê jî Ergün dibêje ku “neteweperweran, ji mêj ve ziman wek amraza hişmendiya neteweyî bi kar anîne û li hember neteweyên din ziman bi kodên neteweyî dagirtine.”²⁸¹ Di heman helbestê de Barnas vê nasnameyê perçeyek ji hişmendiya “zimanê bav û kalan” dibîne û di wê baweriyê de ye ku tu kes nikare vê nasnameyê jê bistîne.

Nasnameya min di devê min de
Dayina dê û bavê min
Ne pasaport e ku bêçirandin
Ne kaxiz e ku tu bavêjî
Nasnameya min di devê min de
Kes nikare bistîne ji min²⁸²

Ergün tîne ziman ku bi peydabûna bizava netewetiyê re girîngiya ziman bêhtir berçav dibe²⁸³ ku hişmendiya ziman neteweyî û hezkirina zimanê zikmakî di helbestên Rojen Barnas de xwedî cihekî girîng in ku vê hişmendiya di helbestên xwe de bi şêwazeke nû tîne ziman. Lewre hişmendiya ziman li gorî Barnas ew e ku Kurdî di her hewcedarî û pêwistiyên edebî, siyasî, aborî û felsefî de têrker e, fireh e û hetanî ku Kurd bi awayekî zanînî li çand û zimanê xwe xwedî dernekevin, ziman û çanda xwe dernexînin pêşiya her tiştî gihîştina azadiya neteweyî ne gengaz e. Lewre Barnas di helbesta xwe de jî li gorî vê fikra xwe tevdigere û bi vê fikrê li helbestê dinêre ku enerjîya xwe bêhtir daye ziman. Ji ber vê jî, Barnas ziman hewcedarê xwedîbûn û

²⁸⁰ Barnas, **Kadiz**, r. 300.

²⁸¹ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 175-176.

²⁸² Barnas, **Kadiz**, r. 300.

²⁸³ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 176.

xwedîkirinê dibîne. Bi xwedîbûn û xwedîkirinê pêşve diçe, digihîje û dikemile. Lê ev zimanê ku nasnameya neteweyê ye aniha perçe perçe ye.

Ey zmanê ku,
Di devê mi de kerî bi kerî
Her kerî
Zûl bi zûl...²⁸⁴

Li gorî Barnas gava nifşek an du nifş li zimanê xwe xwedî dernekevin û pê nepeyivin ew ziman hêdî bi hêdî dimire. Ew di wê baweriyê de ye ku Kurmancî jî bi vê êşê ketiye û ber bi rojên xwe yên dawî ve diçe. Ji ber vê endîşeyê Barnas bi helbestê re hê bêhtir xwe li ziman sor dike. Carina ev endîşe vediguhere gazinan jî ku Barnas dibêje; Kurd naxwazin bi Kurmancî, bi wî “zimanê bav û kalên” xwe bi zarokên xwe re bipeyivin. Sedemên vê jî bi vê yekê ve girê dide: “Bavûkal gundî bûn, koçer bûn, lê zarûkên wan ewê ‘bajarî’ bin, ‘rojavayî’ bin û ewê bi ‘zimanê bajarvaniyê’ bipeyivin.”²⁸⁵ Li gorî nêrîna me di vê fikrê de, li hember zimanên biyanî armanca belavkirina hişmendiya zimanê neteweyî heye ku Barnas ji Kurdan dixwaze ku li zimanê xwe xwedî derkevin û vî zimanî li hemû mekanên jiyane bi kar bînin.

Barnas ziman wek alaveke jîndar dibîne û diyar dike ku ziman bi xwarin, vexwarin û xwedîkirinê dijî. Mirov dikare avakirina helbesta wî xwedîbûn û xwedîderketina li vê fikrê bibîne. Xwedîderketina li ziman bi vî awayî şîrove dike: “Vejandina zimanekî digel zimanê axaftinê bi pêşvebirina zimanê nivîsandinê ye ku ev zimanê weşandinê û wêjeyê ye. Dirûvandî bivê, ku ziman wek sindanê hesinker be zimanê nivîskî jî nola çakûç û geran e. Sindanekî ku demeke dûr û dirêj ji mizdana çakûç û geran dûr keve çawa ku biçilmise; zenga kevnariyê û perpûta mirinê bavêje ser çavê wî, wisa jî zimanekî ku ji axaftinê rojane û bikaranîna nivîskî dûr bimîne herwisa dimerise, dikurise, diçilmise.”²⁸⁶

Di vê çarçoveyê de û di çarçoveya xwedîderketina li ziman de, Barnas fikrên xwe di helbesta “Zarokên Me” de bi cih dike. Ji ber ku Barnas dahatûya neteweya xwe di ziman de dibîne, ew ji zarokên ku bi vî zimanî diaxivin hêvîdar e. Herçiqasî ev ziman li van zarokan hatibe qedexekirin jî, Barnas di wê baweriyê de ye ku dê

²⁸⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 230.

²⁸⁵ Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr (Bend û Gotar)**, r. 139.

²⁸⁶ Barnas, **Bi Kurmanciya Gewr (Bend û Gotar)**, r. 11-12.

ziman bi saya van zarokan li ser piyan bimîne. Lewre zarokan wek pêşeroja ziman dibîne û wan dawetî hezkirina Kurdî dike.

Zmanê wan qedexekirî
Lê,
Zarok bi zmanê xwe dileyîzin
Malokan
Bi zmanê xwe çêdikin
Awir didin
Çindik davêjin
 bi zmanê xwe
Bi zmanê xwe
 digirîn
 dikesirin
Veneşêrin berberiyê zarokno!
Veneşêrin!
Li asiwayê mefera me
Bi zmanê xwe
Bibişirin.²⁸⁷

Barnas li hişmendiya ziman ya Herîrî û Cizîrî ku li hember erebî pesnê Kurmancî dane û Kurmancî ji zimanên din şîrîntir dibînin û ji ber vê jî bi Kurmancî nivîsandine, xwedî derdikeve û vê yekê wek têkoşîna niştimanî bi nav dike. Ev nêrîn hişmendiya zimanê zikmakî li cem Barnas xurt dike ku ew jî xwe wek şopînerê Herîrî û Cizîrî dibîne û dide dû rêya wan. Barnas bi vê tevgera xwe li hember zimanê serdestan Kurdî derdixîne pêş û ji vê helbestê diyar dibe ku Barnas hişmendiya zimanê zikmakî ji helbestvanên beriya xwe hilgirtiye.

Ez im, HERÎRÎ û CIZÎRÎ
Ku
 li hember
 “Qale û Yeqûlû”
Bi zarê şîrîn ê kurmancî
Hespê têkoşîna niştimanî
Rakirin pêdarê.²⁸⁸

Hişmendiya zimanê zikmakî ya Rojen Barnas, wek ku me di beşa ewilî de jî diyar kir, hişmendiyeke siyasî ye li hember înkâr, qedexe û asîmîlasyona li ser Kurdî. Li hemberî vê zexta li ser Kurdî Barnas digihîje wê biryarê ku dev ji “nivîsandina xwe ya pêşveçûyî ya Tirkî” berde û dest bi nivîsandina helbestên bi Kurmancî bike.

²⁸⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 187.

²⁸⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 263.

Tê dîtin ku Barnas vê helwesta xwe bi cih tîne ku jixwe biryara herî xurt helbestên wî ne. Lewre ziman ji bo Rojen Barnas nasnameya neteweyî ye û ziman wek kodeke neteweyî ji bo hişmendiya neteweyî bi kar aniye. Barnas wek helbestvanekî neteweperwer dixwaze ku hemû Kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û hezkirina “zimanê bav û kalan” li ber dilê hemû Kurdan şîrîn bibe. Ji ber ku ew dizane ku bi vê xwedîderketinê re dê hişmendiyeke neteweyî jî derkeve holê.



2.2. ÎDEOLOJIYA ÇEPGIR

Mirov nikare nivîskar û metna wî li derveyî dem û serdema ku metna xwe lê nivîsandiye bifikire. Hişmendî, û nêzîkbûna nivîskar bi dem û sedema wî re girêdayî ye. Bi vî awayî gava ku em bifikirin, her metin di demekê de tê nivîsandin û têkiliyeke organik bi serdema xwe re datîne. Ango mirov nikare tu metnê ji dema ku lê hatiye nivîsandin qut bike û bêyî mercên wê demê lê bifikire. Ji ber vê her metin li gorî dema ku hatiye nivîsandin tê fikirîn û pêwîst e ku mirov jî bi vî awayî nêzî metnê bibe. Eger em her metnê li gorî dema ku lê hatiye nivîsandin nenirxînin û bi vî awayî nêzî metnê nebin, em ê metnê şaş binirxînin ku ev jî nêzîkahiyeke şaş derdixîne holê. Lewre em dikarin bibêjin ku her berhem girêdayî dema xwe ye û ji mercên dema xwe derdikeve meydana edebiyatê. Edward Hallett Carr jî tîne ziman ku; mirov nikare nivîskar ji demê, taybetiyên demê û civakê, her wiha nikare metnê jî ji demê û taybetiyên wê xalî bike.²⁸⁹

Bi vê nêrînê gava ku em bala xwe didin dem û serdema ku Rojen Barnas daxilî helbesta Kurmancî dibe, tê dîtin ku ev serdem serdemeke bi siyasî hê hatiye dadan. Di vê serdemê de gelek fikir û baweriyên siyasî di nava şerekî mezin de ne. Di nav Kurdên çepgir de jî ev fikir û raman tîne nîqaşkirin û pirsgirêka Kurdan her ku diçe dibe pirsgirêkeke mezin. Di vê serdemê de edebiyat jî dikeve bin bandora van ramanên siyasî û li gorî vê serdemê bi şikil dibe. Ji ber vê, helbesta vê serdemê jî bi nasnameyeke siyasî derdikeve hemberî me û helbesta Rojen Barnas jî di vê siyasî hê de tê nivîsandin. Lewre tu bikî û nekî di bin bandora vê atmosfera siyasî de dimînî û jixwe Rojen Barnas jî wê helbesteke siyasî binivîsîne.

Îrfan Amîda jî serdema ku Rojen Barnas dest bi helbestê dike weke serdemeke polîtîk dibîne û diyar dike ku dema Tîrêj dest bi weşanê dike li nav Kurdan dîsa siyasî dest pê kiriye. Piştî 12ê Adara 1971ê ku DDKO hate hilweşandin û tevgera rewşenbîrî û legal tê çewisandin û siyaseta Kurd û tevgerên Kurdewar jî ji holê radibin. Piştî ku bi awayekî dîtbarî rewşa siyasî hinekî dinermije li Tirkiyeyê û welat jî siyasî vedije. Piranî siyasî hê li gorî mercê wê demê û konjukturê di nava Kurdan de jî cîh digire. Siyasî hê ku berê wê li sosyalîzmê ye. Ev yek li cîhanê jî

²⁸⁹ Edward Hallett Carr, **Tarih Nedir?**, Çeviri: Misket Gizem Gürtürk, 2. Baskı, İletişim Yayınları, İstanbul, 2002. r. 44.

belavbûyî ye. Têkoşîn piranî di navbera Kapîtalîzm û Sosyalîzmê de ye. Lê ji hêla rêxistinî û neteweperweriyê ve ne siyaseteke homojen e û ne jî siyaseteke yekgirtî ye. Li gel ku piraniya komele û partiyên Kurdan xwe dispartin fikra sosyalîzmê jî, gelek kitekitên veqetîner hene di navbera wan de û ev jî dibin sedema veqetîne. Ji ber vê yekê jî gelek partî û komele hatine avakirin di wê demê de.²⁹⁰

Zülküf Ergün jî diyar dike ku rêxistin û partiyên Kurdan di serê sedsala 20an de berê xwe dane fikra sosyalîzmê û ev fikir li hemû dinyayê berbelav e. “Şoreşa Bolşevîk ne tenê li Rûsyayê, karîgerî li tevahiya cîhanê çêdike û bi avakirina Sovyetê di navbera her du cemserên komunîst û kapîtalîst de rikeberiyêke tund rû dide. Ji ber vê jî Sovyet dixwaze şoreşa proleteriyê li hemû cîhanê belav bike û bi rêya îdeolojiya xwe ya çînî karîgerî li ser welatên din jî çêbibe. Bi vê armancê, bi rêya rêxistinên nihênî û partiyên komunîst hewl dide pêgeha xwe di nav sînorên siyasî yên dewletên serdest ên Kurdistanê de jî xurt bike da ku sîstema xwe di nav van welatan de bi ser bixe. Ji ber ku dewletên serdest ên li Kurdistanê bi tevahî di bereya kapîtalîst de ne, Kurd bi awayekî siruştî dikevin bin karîgeriya propagandaya siyaseta Sovyetê û di nav çîna xwendewar a Kurdî de îdeolojiya marksîst bihêz dibe. Loma jî di dawiya salên sihî de çendîn rêxistin û partiyên Kurdî yên marksîst tîne damezrandin û di jiyana siyasî û ronakbîriya Kurdî de serdemeke nû dest pê dike.”²⁹¹

Li gorî ku Ergün tîne ziman, “rêxistin û partiyên siyasî yên Kurdî ji aliyekî ve neteweyî ne û mafên rewa yên Kurdan ji xwe re dikin armanc, ji aliye din ve jî di bin karîgeriya îdeolojiya çeprew de li dijî emperyalîst û hevkarên wê serî hildidin. Ji ber vê jî diyar dike ku tevgerên siyasî yên Kurdî bi awayekî siruştî xwe di bereya komînîst de dibînin û di navbera netewetiya Kurdî û îdeolojiya marksîst de pevgerêdanekê çêdikin. Di vê gotara nû ya neteweyî de jî helbestvan wek endam û alîgirên van rêxistinên siyasî roleke çalak digêrin û netewetiya Kurdî di çarçoveya îdeolojiya nû de jinûve pêname dikin.”²⁹²

²⁹⁰ Amîda, **Qonaxeke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, r. 111.

²⁹¹ Ergün, **Nerît û Helbest**, r. 68.

²⁹² Ergün, **Nerît û Helbest**, r. 69-70.

Li gorî tespîtên Ergün “ev netewetîya çeprew ji salên çilî heta salên şêstî berdewan dike ku piraniyê helbestvanên vê serdemê bi awayekî çalak di nav vê fikrê de cih girtine û li gorî fikr û ramanên vê, helbest nivîsandine. Ergün ji bo vê yekê nîşan bide; Goran, Cegerxwîn, Qanî’, Dildar, Hejar û Qedrî Can wek pêşengên vê gotara nû di helbesta Kurdî de diyar dike.”²⁹³ Bi bawerîya me, em dikarin Rojen Barnas jî wek helbestvanekî ku li dû şopa wan çûye, li van helbestavanan zêde bikin.

Dîsa li gorî ku Amîda destnîşan dike, Nîfşê Tîrêjê xwedî nêrînên sosyalîst û Marksîst in. Ev nîfş neteweperweriyê homojen nabînin û ji ber vê yekê jî xwedî nêrîneke îdeolojîk in. Çanda çînen serdestan paşverû dibînin û li çanda çînî ya proleteryan xwedî derdikevin û xwe dispêrin Marksîzmê. Ev yek ji ber dema weşana kovarê pêk tê ku siyaseta li nav Kurdan jî di bin bandora vê serdemê de maye.²⁹⁴ Ji ber vê nêrîn û nêzîkariyê di helbestên Barnas yê ewilî de jî ev fikir xwe dide der.

Di vê çarçoveyê de gava ku em li jiyana Barnas dinêrin tê dîtîn ku Barnas jî di nav van rêxistinên siyasî de cih girtiye û di bin ramanên wan de maye. Lewre ev bandor xwe di helbestên wî yê ewilî de dide der. Ango Barnas di navbera gotara çepgir û netewetîyê de gelek helbestan dinivîsîne û li hember kedxwir, xwîn xwar, mêtînger û emperyalîstan li doza hemû proleter, sosyalîst û komunîstên cihanê xwedî derdikeve û pê re neteweya xwe jî di nav hemû dinyayê de bi awayê wekhevîyê bi cih dike. Li gorî van helbestan tê dîtîn ku Barnas bi vê nêrînê li dinyayê dinêre û ev nêrîn di helbestên wî de rasterast xuya dibin. Ji bo nîşandana vê yekê em li ser hin helbestên Barnas yê ku ev her du nêrîn xwe di wan de didin der, bisekinin.

Berevajî helbestên ewilî, fikra sosyalîzmê di helbestên wî yê dawî de her ku diçe qels dibe. An jî em dikarin bibêjin ku bi qasî yê ewilî ne berçav in. Li şûna vê fikrê, fikra Kurdperweriyê û parastina çand û zimên derdikeve pêş.²⁹⁵

Berken Bereh jî di heman fikrê de ye ku di helbestên wî yê ewilî de fikra sosyalîzmê li pêş e û li hemberî emperyalîzmê têkoşîn heye. Bi vê re jî Bereh, Barnas bi îdeolojiya marksîst ve girê dide. Ji bo vê fikrê jî berê me dide van helbestên wî ku

²⁹³ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 70.

²⁹⁴ Amîda, **Qonaxeke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, r. 16-17.

²⁹⁵ Çelîk, **Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas**, r. 37, 38.

di van helbestan de fikrên marksîst li pêş in: “Ez Karker im, Hevalên Me, Silava Bibe Ji Me, Karîna Me, Bênav.” Lê her ku diçe ev fikr û raman cihê xwe bi helbestên takekesî re diguhere û bêhtir meseleyên şexsî derdikevin pêş. Di vê serdemê de ev her du hêz li seranserê dinyayê li hemberî hev di nava şer û pevçûneke îdeolojîk de ne. Helbesta Barnas di bin bandora van fikran de mabe jî li gorî Bereh ev bandor herçiqasî bi îdeolojiya sosyalîst ve girêdayî be jî “hevîr û xwêya wê neteweyî ye, armraz û armanca wî serxwebûna welatê wî ye û Rojen Barnas, îdeolojiyê ji xwe re nake qiblegeh, ew wê ji bo neteweya xwe û rizgarbûna wê wek alavekê bi kar tîne.”²⁹⁶

Tê dîtîn ku hê di pirtûka ewilî de Barnas bi vê nêrîn û fikrê helbestan dinivîsîne ku ev helbest bi dema xwe re têkildar in. Bi helbesta “Ez Karker im” re rasterast jiyana karkeran û têkoşîna wan ya li hember zordestan û armanca xebata wan ya li hember vê zilm û zordestiyê ji me re vedibêje. Helbest bi dengê karkerekî ji xwe bawer û pesnê xwe bi xebat û hilberîna xwe ku dike hatiye nivîsandin. Ev karker, di doza xwe de mafdar û şidiyayî ye.

Ez karker im
 Mil hesin û awir brûsk im
 Ê ez çirûsk im.
 Ez çirûska bizota derya evînê
 Xwerû
 Evîn im
 Miz didim gerdena geran
 Ê destê xwe li ser pêşîrên sindan
 Digerînim²⁹⁷

Ev karker li ser navê hemû karkerên dinyayê diaxive. Ev karker xwe hem afirîner dibîne û hem jî xwedî fikra sosyalîstekî ye ku ji hevkarîyê bawer dike. Armanc ew e ku proleter, cotkar, rencber û rewşenbîr bi hev re bibin yek û dest biavêjin xebatê da ku li hemû dinyayê wekhevîyek ava bibe.

Em bi hev re
 Dibin yek laş û yek hiş û yek giyan
 Ka werin
 Ka werin ji xwe re binhêrin lo!
 Binhêrin ku

²⁹⁶ Bereh, **Rojen Barnas**, r. 6-7.

²⁹⁷ Barnas, **Kadiz**, r.45.

Ez çî diafirînim.²⁹⁸

Di berdewamiya helbestê de karker, xwemehrûmkirina ji roj û şîneya ezman ji bo hilberîn û pêşketina mirovahiyê dike û dîsa ji ber vê xwe serbilind dibîne. Ji bo دنیا bibe bihiştêk hilberînê dike; da ku gul bibişkivin, qîz û xort stranên bistrên, heval û hogir bi hev re bin û geştir bin qerenfil di serê gulanan de.

Di dawîya helbestê de armanca karkeran bi awayekî eşkere tîne ziman ku hemû xebat, berxwedan û hilberîna ku dikin li hemberî “kedxwiran” e ji bo yara xwe ya demokrasiyê ye ku dixwaze dinyayeke azad damezirîne.

Ez karker im
Serapê pêtiya derya evîn im
Pergala kedxwirî werdigerînim li dinê
Û bo yara xwe ya demokrasî
Dinyayek gerdenaza dadmezirînim.²⁹⁹

Barnas bi helbesta “Ragihandin”ê jî rasterast berê me dide fikra îdeolojiya çepgir û hê di pasaja ewilê de gelek kodên ku vê fikrê temsîl dikin xuya dibin. Raveka “Stranên Lenîni” vê fikrê rasterast diçespîne.

Devê me de çiçikên zanyariya gelêri
Guhê me de stranên Lenîni, olan olan...
Ey çûkên li serê keman
Û kewên li terazinên bandeva
Yên çiyayên bilind
Hun nêziktirin ji me re
Hun nêziktirin ji me şivan,
Şevdorî
û cotkaran
re.³⁰⁰

Li gorî Ergün, “marksîzîm îdeolojiyê çînî ye û li dijî îdeolojiya neteweyî derdikeve.”³⁰¹ Li gorî vê nêrînê tê dîtin ku di heman helbestê de Barnas bêhtir li îdeolojiya çînî xwedî derdikeve û ji pasaja sêyem şûnde helbest wek vexwendnameyekê hatiye nivîsandin ku di vê pasajê de bangêk ji bo hemû kesên ku

²⁹⁸ Barnas, **Kadiz**, r.45.

²⁹⁹ Barnas, **Kadiz**, r.46.

³⁰⁰ Barnas, **Kadiz**, r.115.

³⁰¹ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 69.

Werin!
Dilê me de hêtûna bizaviya gelêrî
Li raser me, bi pêldan, direfşa proletar.³⁰⁴

Helbesta “Silava Bibe, ji Me” bilindkirina têkoşîna karker, gundî û ronakbîran tîne ziman. Helbest bi awayê diyalogekê hatiye nivîsandin ku helbestvan ji hevaleyê xwe re rewşa heval û hogirên xwe radigihîne û diyar dike ku têkoşîn û berxwedana çîna proleter li hember hemû astengiyên didome û hêviya ji siberojê mezin e. Herçiqasî hinek ji wan di vî şerê têkoşînê de ketibin, westiyabin, vekîşiyabin, serî hatibin hilqetandin jî nehatine tewandin tu carî li hemberî dijmin di vê berxwedanê de. Helbestvan di wê baweriyê de ye ku dê tu carî dev ji ya xwe bernede heta serfiraziyê.

Bêje wa.
Me qada şer berneda
Em venekîşîn ji pêstûrî.
Em
-Karker, gundî, ronakbîr-
Wek berbûrî
Ku çawa bi stran diçin dîlanê
Wisa çûnê
Û hêjî diçin.
Hin bi hin
diçirise şemal... şemal³⁰⁵

Ergün diyar dike ku helbestvanên neteweperwer yê çepgir, di nav pêkhatêya neteweyî de cih nadin sermayedar, beg, axa, şêx û melayan. Helbestvanên ku bi vê nêrînê li dinyayê dinêrin van kesan wek hevkarên emperyalîzmê li wan dinêrin û di nav hêviyên xwe yê siberojê de cih nadin wan. Li gorî dîtina Ergün, helbestvanên Kurd jî ji ber ku axa, beg û şêxan wek nokerên dewletên serdest ên li Kurdistanê û dewletên serdest jî wek hevkarê emperyalîzmê bi nav dikin, van kesan wek dijminê neteweya Kurd dibînin. Ji ber vê jî helbestvanên neteweperwer ên çepgir van çînan û kesayetên ji têkoşîn û berxwedana xwe derdixînin û bi çavên dijminan li wan dinêrin. Ji ber vê jî di gotara helbestvanên neteweperwer ên çepgir de Kurd tenê ji çîna karker, hejar û dijminên emperyalîzmê pêk tên.³⁰⁶

³⁰⁴ Barnas, **Kadiz**, r. 116.

³⁰⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 96.

³⁰⁶ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 74.

Di vê çarçoveyê de û li gorî van tespîtan tê dîtin ku Barnas jî wek helbestvanekî neteweperwer ê çepgir, bi heman hewldanê helbest nivîsandine. Li hemberî sermayedarê emperyalîzmê bilindkirina jiyana proleteran derdikeve pêş. Çînên serdest ku piraniya wan ji sermiyandar, axa, beg, şêx û mela tê dîtin, bi çavekî paşverû li wan tê nêrîn. Helbesta Barnas li hember vê çînê têdikoşe. Di helbesta “Cenanên Titûnê” de jiyana karkerên titûnê tê ravekirin. Helbest bi çîrokeke ku her sibeh dubare dibe, dest pê dike ku helbestvan me bi çîroka wan ya zor û zehmet ya li hember sermiyandaran dihisîne. Di helbestê de sermiyandar vediguhere “patron”. Ev peyva “patron” têkiliyeke raste rast ya bi kapîtalîzmê re berçav dike.

Her sibe bi dev re mişt, qamyona cenana
 Her êvar bi dev re ye, qamyon ji cenana
 (...)
 Pardar gelek in, tê de
 Pardar gelek in bê hejmar
 Ji sedî pêncî yê patron e her
 Qapankêş û nivîsvan bê bazar
 Eksper û mudir û embarvan
 Ji malê ne. Ma ew biyan in?
 Di diravdayinê de bêşik, bêguman
 Cihê wî her diyar û xuyan e:
 Raziqê rizqa; hejmarvan³⁰⁷

Karker di nava gelek zor û zehmetiyan de dixebitin. Ev, hinekî ji mecbûrî be jî keda herî mezin ya di vî karî de ya karkeran e, lê gava ku titûn tê firotin para herî kêr dibe para karkeran. Helbest dixwaze neheqîya ku li karkeran tê kirin bîne ziman û balê bikişîne ser jiyana wan ya di nav hejarî û zordariyê de.

Di qêleqija Tirmehê de ax dikele
 Helekela axê, leylan... leylan
 Siyeke hênîk bi zêrê zer
 Aveke sar, li ku der e?
 Danîn e, eşêf e, avdan e
 Quraftin e, çîlgirêdan e
 Xwedîkirin divê, sal salewext
 Jînek tê de dirize,
 Tê de jînek...³⁰⁸

³⁰⁷ Barnas, **Kadiz**, r.70-71.

³⁰⁸ Barnas, **Kadiz**, r.70.

Bêguman helbest neheqiya ku di nav pergala emperyalîzmê de li karkeran dibe tîne ziman. Di nav van şert û mercan de em dibînin ku para herî mezin jî digihîje “patron”. Di helbestê de “patron” wek hevkar û sermayedarê pergala emperyalîzmê tê nîşankirin û di heman demê de tê reşkirin jî.

Heman rewş di helbesta “Êzingvanên Diyarbekirê” de jî xuya dibe. Barnas bi vê helbestê jî berê me dide jiyana karkeran ku di vê helbestê de jî hemû zor û zehmetiyên ku êzingvanên Diyarbekirê anga proleter dikişînin xuya dibin. Li hember evqas zor û zehmetiyan dîsa para mezin dibe ya “patron” anga ya sermayedar.

Giş
Bo çend kilo xwê,
şekir,
don
An jî
Çend metro caw...
Patron heke ku pê re
Dirav
ên romiziyên wan
bi wan de.³⁰⁹

Di vê çarçoveyê de helbesta Barnas ya ku “beg, axa, şêx û meleyan” wek sermayedarê emperyalîzmê tîne ziman û berxwedana çînî bilind dike, helbesta “Melayê Şîretkir” e. Di vê helbestê de mela wek alîgîrekî emperyalîzmê derdikeve hemberî me. Helbestvan bang li melayê ku li ser “lamekân” e dike û jê daxwaz dike ku êdî bes galegal, şîret û gazinan bike. Banga helbestvan ji bo şîretên pûç e ku ew jî bi hemû çîrokên ku mela tîne ziman dizane û jê daxwaz dike ku ji lamekan dakeve were di nav wan de cih bigire. Bi cihkirina mela ya li ser “lamekân” di xwe de pozbilindiyekê vedihewîne ku mela wan piçûk dibîne û bi çavekî mezin li xwe dinêre.

Bes e qurban!
Dakişe ji Lamekan
û were xwarê
Were dinê,
Qasek li însan,
li mirovan
mêze ke
fermo!³¹⁰

³⁰⁹ Barnas, **Kadiz**, r.75.

Di helbestê de mela temsîla kedxwirî, zordestî û sitemkariyê ye. “Ew” an jî em dikarin bibêjin “helbestvan” jî temsîla têkoşînê ye ku li hemberî vê zordestiyê derdikeve. Helbestvan jî dîrokê çîrokên ku li hemberî zordestan pêk hatine wek mînak dide û bangî mela dike ku haya wan êdî ji her tiştî heye, xwedî hiş û mêjî ne û êdî ew nikare wan bixapîne. Lewre jî ji mela daxwaza ku tevlî wan bibe dike ku êdî bes piştevanî û hevkarîya emperyalîzmê bike. Helbestvan jî mela re tîne ziman ku dê karker, gel û neteweyên bindest bi serbikevin û bifilitin ji bin koledariya “Dehaq, Qarûn, Fir’ewn û Azer”. Li hemberî vê helbest têkoşîna cotkar, rencber, şivan û ronakbîran bi hev re dike yek û di heman demê de xwedî li rizgariya neteweyê jî derdikeve. Ango xelasiya neteweyî û çînî bi hev re girê dide.

Seydayê delal!
 Bi serê te î tacdar
 Wê ev pergal
 hilweşe
 Wer dibêje
 enînivîsina şarsaniyetê
 Û wer dinivîse li rûpela deftere
 Deftera biryardana karkêran.
 Wê bi geran
 Bê şikandin rêzila dîlîtiyê
 Vî dîwarê
 ku ji niha ve terk lê ketiye
 Wê bê herifandin
 ji binî
 Bindest wê bifilitin ji nîrê koletiyê.
 Wa
 Li dinê serapa
 Gihiştin hev
 û yekbûn
 Karkêrên hemû peleyan
 gel û netewên bindest
 Li hember
 Dehak,
 Qarûn,
 fir’ewn
 û Azer³¹¹

³¹⁰ Barnas, **Kadiz**, r.83.

³¹¹ Barnas, **Kadiz**, r. 85-86.

Barnas di helbesta “Karîna Me” de jî berê me dide fikreke çepgir ku ev fikir jî dîsa xwedîderketina li jiyana karkeran e. Herçiqasî karker nikaribin gera gerdûnê bi rê ve bibin û dem, şev û rojê bigerînin jî di hilberînê de girîngiyeke wan ya bêhempa heye.

Lê,
Bi me ye
hilkişîna şîrik
 li laşê zîyanê
Seridîna simbil, bi zer-vegerîn
Ji hêtûnên tîhnebilind herikîna hesin
Ronbûyîna karaka kevirîn
-Mîna rûnê helandî
 di sîtilê de-
Bi me ye, hilberîn
Dûkêşîya bixêriyên kargeha
Rabûna balafiran bi me ye
Frîna wan li ser ewrên di esman
Û
Li derya
 avjeniya
 keşîya³¹²

Ev karker di vê hilberînê de herçiqasî “birçî”, “nanoziko”, “destên wan qusandi”, “lingên wan çiriyabin” jî di her dem û dewranan de hatine talankirin ku Barnas vê rewşê tîne ziman. Ev jî fikreke çepgir e û xwedîderketina li vê fikrê ye. Di pasaja dawî ya vê helbestê de, bi hin taybetmendiyan gerdûnê re dilê xwe xweş dîke û bi vê xweşbûnê re jî nê li mêtinkaran reş dîke.

Ne bi me ye îsîna stêrkan
Lê,
Em dikarin stêrka bextê xwe geş kin
Gera Rojê
 ne bi me ye, lê
Em dikarin şemala rojên xwe xweş kin
Û reş kin,
 jî nê
 li mêtinkaran.³¹³

Helbesta “Me Destê Xwe bi Kar Anî, Pêşiyê” jî dîsa berê me dide jiyana karkeran. Helbestvan di helbestê de li ser navê hemû karkeran diaxive. Di karkeriyê

³¹² Barnas, **Kadiz**, r.146.

³¹³ Barnas, **Kadiz**, r.147.

de tiştê herî girîng xebata bi dest û piyan e. Di vê helbestê de jî ev girîngî derdikeve pêş. Karker berî her tiştî destên xwe bi kar tînin ku berî destê xwe bi kar binin dest û lepên wan zexel û weribî ne. Lê bikaranîna destan re ev zexelbûn hêdî bi hêdî têk diçe û bi xebatê re destên wan dilivin, vedizelin û dilîzin. Di vir de helbet behsa rola karkeran tê kirin ku dîsa di hilberînê de rola wan derdikeve pêş.

Me destê xwe bi kar anî, pêşiyê
Jê
Mêjî xebitî bi kûrayî
Bênahî fere bû, balûpal...
Raman
Ji karêza hilberînê nola lehiyê
Za.
Lîstik û govend cur bi cur
Awaz rengîn
Avahî
 gewre,
 zirav,
 narîn³¹⁴

Piştî vê dîsa ji ber bikaranîna destên karkeran hilberînên ku li dinyayê zêde dibin ango girîngiya wan bi mînakên dide ku ev yek bandora karkeran li dinyayê derdixîne holê. Di vê helbestê de em dikarin bi kurtasî bibêjin ku li ser girîngiya rola karkeran ya di pêşveçûna hilberînê de sekiniye.

Helbesta “Li Bandeva Spêde”, ku pirtûka ewilî navê xwe ji vê helbestê girtiye, berê me rasterast dide dijmêtinkariyê. Ji ber naveroka vê helbestê Barnas xwestiye bi pirtûka xwe ya ewilî re helbesteke li dijmêtinkariyê derxe pêş. Ev derketina li dijmêtinkariyê bi netewetiyê û îdeolojiya çepgir ve girêdayî ye. Ango Barnas bi çavekî neteweperwer û çepgir li mêtinkariyê dinêre ku ev helbest jî temsîla vê fikrê dike.

Di serê helbestê de rewşeke razber û mîstîk heye. Roj bi merbend û rêzîlan di nava taristanê de hatiye dîlkin. Lê bi qerenfilan xemilandî difilite û bilind dibe û av mizgîniyê dide xwezayê. Roj ji merbend û rêzîlan difilite û azad dibe. Roj di vir de temsîla ronahiyê ye, ku ev ronahî xelasiya ji taristanê ye. Bi merbend û rêzîlên ku roj pê hatibûn girêdan, tariya mêtinkariyê tê girêdan û mêtinkarî diricife.

³¹⁴ Barnas, **Kadiz**, r.150.

Bizav hat dilê kîroşkê
Qidûm li çokê kûsî
Û tîrsa hoviyan
Di dilê xezalan de nema
Kuriyên mêtinkar ricifin
Li hev deliyan
Revin.
Lê,
Zanga jî li wan sitarî ne kir
Qeliyan,
brîn.³¹⁵

Piştî em dibînin ku ev hilberîn dîsa li ser “perrê karkeran” pêk tê. Û hilberîn li dinyayê belav dibe. Bi destê karkeran roj ji mêtinkariyê difilite û hilberîn pêk tê.

Bi destê wa
Ji okyanûsa dîlistanî
Roj
Ji merbend û rêzila
mêtinkarî
filitî.
Lebitî
devê
hilberînê³¹⁶

Barnas di helbestên xwe de li dijî emperyalîstan derdikeve û li hemû berxwedanên ku li hemberî wan bûne tev digere û piştgiriya wan dike. Di helbesta “Bi Avê, Bi Nan” de ev piştgirî xwe diyar dike. Helbest bi tevahî di bin atmosfereke erênî de hatiye nivîsandin û bi hêvî ye. Helbest ji “serê çiyayê sîpan”ê, ku ev lûtke sembolek ji welat e û wek serîhildana Çiyayê Agiriyê tê zanîn, ber bi hemû dinyayê ve fireh dibe. Helbestvan ji bo armanca xwe nîşan bide sembolekê ji welatê xwe diyar dike û piştî berxwedanên dinyayê bi nav dike ku bi vî awayî di navbera her duyan de têkiliyekê datîne.

Me,
Çiyayê Pentagonê
Mîna arvan
Bi hêran
Çawa hêra li Vîetnamê,
li Îran
Û me

³¹⁵ Barnas, **Kadiz**, r. 155.

³¹⁶ Barnas, **Kadiz**, r. 157.

Çeka di destê Hîtler çawa kir dijminê serê wî
Û me çawa hejand Mûsolînî
-Mîna dewkula li sêpiyê-
Li daran...³¹⁷

Barnas di helbestên xwe de li hember zordestiya ku li hemû dinyayê heye derdikeve. Tê dîtîna ku vê zordestiyê bi sînora nake ji aliyê erdnîgariyê ve. Vê zordestiyê li dinyayê wek “Tarîza” bi nav dîke û her ku diçe vê erdnîgariyê bêhtir fireh dîke. Têkoşîna ku li hember vê zordestiyê dibe di nava vê erdnîgariya fireh de xuya dibe. Ev erdnîgarî ji “Hindistanê ta bi Romê”, ji “zangê Afrîkayê ta bi Aleman” fireh e. Ev têkoşîn wek rêyeke pêwîst tê dîtîna ku dê li dinyayê bi vî awayî wekhevîyek bê avakirin. Dema ku ev têkoşîn bidome dê li hemû dinyayê wekhevî geş bibe ku dê di nav vê geşbûnê de welat jî cihê xwe bigire. Bi vî awayî di navbera îdeolojiya çepgir û fikra neteweperweriyê de pîrekê datîne.

Û
Hê jî
Tarîza
Bi hêza xwe ya tund
Mîrinê diguvguvîne li cîhanê
Li Latîn-Amerîka
Li Afrîka
Li rohilatanavîn
Li kul û kesera dilê min
Li Kurdîstanê.³¹⁸

Wek ku ji van mînakên ku me li jor dan diyar dibe ku Rojen Barnas di navbera îdeolojiya çepgir û netewetiyê de, bi helbestên xwe pîrekê ava dîke. Avakirina vê pîrê ji bo xelasiya neteweya Kurd e ku eger li hemû dinyayê zilimkar, xwînxwar, zordest, emperyalîst û kapîtalîst têk biçin dê Kurd jî li ser axa xwe bigihîjin mafên xwe. Li gorî ku Ergün tîne ziman, “di gotara helbestvanên neteweperwer ên çepgir de Kurd tenê ji çîna karker, hejar û ji dijminên emperyalîzmê pêk tên.”³¹⁹ Di vê çarçoveyê de em dibînin ku Barnas jî di van helbestan de bêhtir li ser rewşa karkerên Kurdan disekine. Berxwedan û têkoşîn bi destê karkeran tê kirin û xelasiya hemû neteweyan bi xelasiya karkeran ve girê daye. Lewre Barnas xelasiya Kurdan ya ji serdestên wan bi hemû têkoşîna dinyayê ya

³¹⁷ Barnas, **Kadiz**, r. 165.

³¹⁸ Barnas, **Kadiz**, r. 223.

³¹⁹ Ergün, **Nerî û Helbest**, r. 74.

karkeran ve girê dide. Di heman demê de bi van helbestan nîşan dike ku neteweyek hem dikare ji bo azadî û nasnameya xwe têbikoşe û hem jî dikare sosyalîst be. Ji ber vê yekê em dikarin Rojen Barnas di nav helbestvanên neteweperwer ên çepgir de bi cih bikin.



ENCAM

Me di vê xebatê de xwest ku em jiyana Rojen Barnas ji her awayî de zelal bikin û helbestên wî ji aliyê temayên siyasî ve berçav bikin û helbesta wî di nav edebiyata Kurmancî de derxînin ber roniyê. Di vê çarçoveyê de, di dawiya vê xebatê de em gihîştin van encamên ku me li jêr diyar kirine.

1. Rojen Barnas li Farqînê hatiye dinyayê û xwendina xwe ya destpêkê û navîn li Farqînê, xwendina lîseyê li Lîseyaya Ziya Gokalpê û xwendina xwe ya zanîngehê jî li Zanîngeha Dîcleyê di beşa Enstîtuya Hînkariyê de temam kiriye. Barnas di xwendegeha navîn (1959-1960) de bi Tirkî dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

2. Navê wî yê fermî Mehmet Gemici ye û “Rojen Barnas” wek nasnavê xwe yê hunerê bi kar aniyê. Ji bilî “Rojen Barnas” bi van nasnavan jî nivîsandiye: Memo Guhderz, Şêrgo Ciwanroj, Sersax Arda, Ferîdûn Salar, Mihemed Qasim û Flît Totanî.

3. Rojen Barnas di 1963-65an de li Diyarbekirê di rojnameyên “Demokrasiye Güven, Dicle, Diyarbakır, Mücadele û Yeni Yurt”ê de bi Tirkî dinivîsîne. Lê di van salan de; înkâr, qedexe û asîmîlasyona li ser Kurdî dibe sedem ku Rojen Barnas dev ji Tirkî berde û dest bi nivîsandina helbestên bi Kurmancî bike.

4. Rojen Barnas her dem di nav tevgerên siyasî de cih girtiye û li hemberî pelçiqandina dewletê derketiye. Di nav hereketa Dr. Şivan (Sait Kırmızıtoprak), partiya TÎPê de cih girtiye û li Farqînê serokatiya TÖSê (1968-1970) kiriye.

5. Piştî darbeya 1971ê; Rojen Barnas, İsmail Beşikçi û gelek Kurdperwerên ku di van salan de di rêveberiya TÎP-DDKOyê de cih girtine bi hev re girtine. Têkiliya wî ya bi İsmail Beşikçi û Kurdperweran re, hişmendiya wî ya ziman kemilandiye.

6. Rojen Barnas di 1979an de tevlî xebata *Tîrêjê* dibe û heta cuntaya leşkerî ya 12ê Îlona 1980yê berdewam dike. Lewre di nav “Nifşê Tîrêjê” de tê nirxandin. Piştî cûntayê terka welat dike û ji 1982yan ve li Swêdê dijî. Li Awrûpayê jî tevlî kovarên *Berbang*, *Çarçira*, *Çira*, *Hêvî û Nûdemê* dibe.

7. Helbestnîvîsandina Rojen Barnas, bi *Tîrêjê* re dikeve pêvajoyeke din û bêhtir bi rêkûpêk didome. Helbestên Barnas yê Kurmancî yê berî *Tîrêjê*, di salên 1968 û 1969an de bi nasnavên “Memo Guhderz û Şêrgo Ciwanroj” hatine weşandin.

8. Rojen Barnas bi helbesta xwe gelek guhertinên nû li helbesta Kurmancî bar kirine. Ji bilî helbestê, çîrok jî nivîsandine û serê xwe bi ceribandînan derbarê helbest, edebiyat, nivîskar, ziman, gramer, rastnivîs, kovar û siyasetê re jî eşandiye.

9. Her pirtûkeke wî ya helbestan serdemekê temsîl dike. *Li Bandeva Spêde*, ji helbestên berî salên 1980yî pêk tên. Di van helbestan de hêviya ji şoreş û berxwedanê bi coşeke mezin derdikeve pêş. Di vê pirtûkê de temayên şexsî û yê civakî tevlihev bin jî Barnas di helbestên herî şexsî de jî fikrên civakî û neteweperwerî bi kar anîne. Temayên ku di vê pirtûkê de derdikevin pêş ev in: welat, welatparêzî, neteweperwerî, evîn, bêrîkirin, dûrbûn, hezkirin, hêvî, fikra sosyalîzmê û îdeolojiya çepgir, hezkirina xwezayê, êş, koçberî... hwd. Di vê pirtûkê de ji aliyê şeweyê ve şeweya gelêrî û serbest tevlihev e. Şeweya serdest û ya li pêş, rist û pîvana serbest e. Ev şeweya serdest şeweyeke pêlikî ye û ev şewe pir li pêş e. Taybetmendiya herî mezin ya vê pirtûkê ev ceribandina şeweyê ye ku ev taybetmendî lêgerîna Barnas ya di helbestê de jî şênber kiriye.

10. *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê*, ji helbestên 1979an û heta 1983yan pêk tên. Helbest li biyanistanê hatibin nivîsandin jî her dem berê wan li welat e. Di vê pirtûkê de helwesteke xurt ya li hemberî mêtinkariyê derdikeve holê û tevgera têkoşîna welat li pêş e. Temayên *Heyv Li Esmanê Diyarbekirê* jî li gorî vê jiyana nû hatine guhertin. Di vê pirtûkê de jî “hêvî” her heye û “bêrîkirin” xwe nîşan dide. Ev bêrîkirin, bêrîkirina welat û axê ye. Temayên sereke şoreşgerî, neteweperwerî, ax-welat, dîrok, bîr, têkoşîn, berxwedan, welatparêzî û evîn e. Bi vê pirtûkê re helbestvaniya Barnas hinekî din kemiliye. Tê dîtin ku lêgerîna Barnas ya şeweyê di vê pirtûkê de tekûztir bûye.

11. Helbestên *Milkê Evîné*, helbestên Barnas yê ji sala 1983yan û heta 1995an in. Helbestên vê pirtûkê bi temamî li dîasporayê hatine nivîsandin lê hişê wî her dem li welat e û berê xwe dide simbolên welat. Bi van sembolan hebûna Kurdistan ya li ser vê axê vedikole û bêhtir çîroka welat û axa vî welatî berçav kiriye. Barnas di

Milkê Evînê de li ser temayên dîrokî, şoreşgerî, neteweperwerî, berxwedan û têkoşînê sekiniye. Di vê pirtûkê de jî Barnas ji aliyê şêweyê ve dîsa li ser şopa helbesta pêlikî û rist û pîvana serbest berdewan kiriye.

12. *Yelda* jî ji helbestên Barnas yên ji sala 1995 û heta sala 2013an pêk tê. Li gorî her sê pirtûkên ewilî di *Yeldayê* de tema û mijareke ku Barnas bi giştî li ser hûr bûye dernakeve pêş. Helbestên siyasî yên ku di her sê pirtûkên ewilî de li pêş in, di vê pirtûkê de Barnas pênuşa xwe bi piranî ji wan kişandiye.

13. Hat dîtin ku bingeh û çavkaniya veguherîna temayên helbesta Rojen Barnas, jiyana wî bi xwe ye û bûyerên ku di nav vê jiyânê de qewimîne bandor li helbestên wî kirine. Lewre her pirtûkeke Barnas xwedî hin taybetmendiyên e û di her pirtûkê de ziman, şêwe, şêwaz û tema jî li gorî vê jiyânê xwe guhertine. Barnas ne helbesteke ku di nava herêmekê an welatekî de xitimiye nivîsandiye, wî ev tema di nava hîs û fikrên xwe re derbas kirine û helbesta xwe ber bi dinyayê ve bilind kiriye.

14. Rojen Barnas bêhtir simbol û metaforên netewetiyê di helbesta xwe de bi cih kirine û helbesta xwe li ser zemîna simbol û metaforên neteweyî avakiriye. Barnas di van helbestan de bi rastiya xwe, bi kûrahî û xweşiya xwe coşeke mezin û hestên dewlemend ên Kurdperwerî di dil û hinavên mirovan de diafirîne. Barnas ji pirtûka ewilî ve bi şêwe û şêwazeke nû, li derdora heman temayan diçe û tê. Bi piranî li ser temayên siyasî disekine û ji van temayan jî yên ku derdikevin pêş netewetî û îdeolojiya çepgir e. Lewre diyar bû ku Barnas helbesteke siyasî nivîsandiye.

15. Di çarçoveya temayên netewetiyê de Rojen Barnas di helbestên xwe de bêhtir li ser “bêriya welat, bîndestîya welat, dîmenên welat, berxwedana neteweyî, nasnameya neteweyî û zimanê neteweyî” sekiniye û tîkiliya îdeolojiya çepgir jî dîsa bi netewetiyê re berçav kiriye. Welat wek cih û warê netewe û niştecihbûnê xuya dibe û welat bi ruh û taybetiyên simbolîk ên netewetiyê re hatiye xemilandin.

16. Rengvedana berxwedan û têkoşînê ji destpêka helbesta wî ve xuya dibe. Berxwedana ku di helbestên ewilî de xuya dibe, bi taybetî jî di pirtûka ewilî de, berxwedaneke çînî ye û ev berxwedan bi nêrîneke çeprew berçav dibe. Lê piştî pirtûka ewilî ev berxwedana çînî veguheriye berxwedaneke neteweyî. Di çarçoveya

berxwedanê de Barnas; Şêx Seîd, Seyîd Riza û Qazî Muhemed wek sê simbolên qehremanên neteweyî, ji bo berxwedaneke neteweyî îdealîze kirine.

17. Barnas wek helbestvanekî neteweperwer li hember tevgerên serdestên Kurdan derketiye û Kurd li hemberî talan û tunekirinên serdestan, bi hemû hêza helbesta xwe, parastine û di heman demê de serdest wek dijminên Kurdan nîşankirine. Bi vê re xwestiye ku li hember van dijminan hevgerîneke siyasî di nav neteweya Kurd de ava bike û pê re jî nasnameyê neteweyî derdixîne holê.

18. Hişmendiya zimanê zikmakî, wek hişmendiyeke siyasî ye li hember înkâr, qedexe û asîmîlasyona li ser Kurdî. Lewre ziman ji bo Barnas nasnameya neteweyî ye û ziman wek kodeke neteweyî ji bo hişmendiya neteweyî bi kar aniye.

19. Barnas di navbera îdeolojiya çepgir û neteweyî de, bi helbestên xwe pirek avakiriye. Avakirina vê pirê ji bo xelasiya Kurdan e. Eger li hemû dinyayê zilimkar, xwînxwar, zordest, emperyalîst û kapîtalîst tîk biçin dê Kurd jî li ser axa xwe bigihêjin mafên xwe. Lewre Barnas xelasiya Kurdan ya ji serdestên wan bi hemû têkoşîna dinyayê ya karkeran ve girê daye. Bi van helbestan berçav dike ku neteweyek hem dikare ji bo azadî û nasnameya xwe tîbikoşe û hem jî dikare sosyalîst be.

ÇAVKANÎ

ADAK, Abdurehman, “**Silvan ve Çevresinde Yetişmiş Şairlere Genel Bir Bakış**”, Uluslararası Silvan Sempozyum, 25-27 Nisan 2008, Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin, 2012.

ADSAY, Fexriya, “**Hevpeyvîn Ligel Rojen Barnas**”, Kovara Zarema, Hejmar 7, Diyarbakır, 2016.

AMÎDA, Îrfan, “Çağdaş Kürt Şiirinin Kaynakları”, **İnatçı Bir Bahar**, Ayrıntı, Birinci Basım, İstanbul, 2012.

AMÎDA, Îrfan, **Qonaxeke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, Çapa Yekem, Lîs, Diyarbakır, 2016.

Arî, Arjen, **Antolojiya Helbesta Bakur**, Çapa Yekem, Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd, Duhok, 2007.

ARÎ, Arjen, **Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr**, Evrensel Basım Yayın, Çapa Yekem, İstanbul, 2011.

Arî, Arjen, **Xasenezer**, Çapa Yekem, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013.

ARİF, Ahmet, **Hasretinden Prangalar Eskittim**, 41. Basım, Cem Yayınevi, İstanbul, 1999.

ASSMANN, Jan, **Kültürel Bellek**, Çeviri: Ayşe Tekin, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2001.

AYDOĞAN, İbrahim Seydo, **Guman-1**, Çapa Yekemîn, Lîs, Diyarbakır, 2013.

BARNAS, Rojen, “**Memo**”, Kovara Nûbihar, Jimar 138, Cild 20, Sal 25, İstanbul, 2017.

BARNAS, Rojen, **Berêz Hoto Hemoto, Asıwayî, Ezimandin, Helbet**, Tîrêj, Hejmar 4, Swêd, 1981.

BARNAS, Rojen, **Bi Avê Bi Nan, Bîbik Dirêsin, Nizanim Kengê**, Tîrêj, Hejmar 2, Swêd, 1980.

BARNAS, Rojen, **Bi Kurmanciya Gewr (Bend û Nivîs/1979-2001)**, Çapa Yekem, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs, 2005.

BARNAS, Rojen, **Bi Kurmanciya Gewr**, Çapa Duyem, Nûbihar, İstanbul, 2014.

BARNAS, Rojen, **Ez Mendalekî Çar Salî Me Mamo!, Melayê Şîretkir, Jîndarî, Bibişire**, Tîrêj, Hejmar 1, İzmir, 1979.

BARNAS, Rojen, **Farqîn (Sîlvan/Silîvan)**, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul, 2013.

BARNAS, Rojen, **Heyv Li Esmanê Diyarbekirê**, Invandrarförlaget, Sweden, 1983.

BARNAS, Rojen, **Hingê**, Çapa Duyem, Nûbihar, İstanbul, 2014.

BARNAS, Rojen, **Hingê**, Çapa Yekem, Nûdem, Stocholm, 1997.

BARNAS, Rojen, **Kadiz**, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul, 2013.

BARNAS, Rojen, **Li Bandeva Spêde**, Weşanên Tîrêj, İzmir, 1979(?).

BARNAS, Rojen, **Milkê Evînê**, Çapa Yekem, Nûdem, Stocholm, 1995.

BARNAS, Rojen, **Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir**, Jiyana Rewşen, Hejmar 20, Pûşber, 1998.

BARNAS, Rojen, **Stranên Me**, Tîrêj, Hejmar 3, Swêd, 1980.

BARNAS, Rojen, **Şi'r-1-**, Çapa Yekem, Nûdem, Järfälla, 2002.

BARNAS, Rojen, **Şi'reka Min a Kevin**, Kovara Nûbihar, Hejmar 138, Sal 25, Cild 20, Zivistan 2017.

BEREH, Berken, **“Rojen Barnas”**, Kovara Nûbihar, Jimar 133, Cild 19, Sal 23, İstanbul, 2015.

BEREH, Berken, **Ağzımda Kimliğim Benim**, 2013, <https://www.evrensel.net/yazi/61963/agzimda-kimligim-benim>, nêrîna dawî: 10.02.2017.

CARR, Edward Hallett, **Tarih Nedir?**, Çeviri: Misket Gizem Gürtürk, 2. Baskı, İletişim Yayınları, İstanbul, 2002.

CASANOVA, Pascale, **Dünya Edebiyat Cumhuriyeti**, Çeviri: Saadet Özen-Filiz Deniztekin, 1. Basım, Varlık Yayınları, İstanbul, 2010.

ÇELİK, Nihat, **“Hevpeyvînek Li Gel Rojen Barnas”**, Kovara Jiyana Rewşen, Hejmar 43, İstanbul, 2000.

EAGLETON, Terry, **Şiir Nasıl Okunur**, Çeviri: Kaya Genç, Agora Kitaplığı, Birinci Basım, İstanbul, 2011.

ELIOT, T.S, **Edebiyat Üzerine Düşünceler**, Çeviri: Sevim Kantarcıoğlu, Birinci Baskı, Paradigma Yayıncılık, İstanbul, 2007.

ERGÜN, Zülküf, **“Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn”**, Nûbihar Akademî, Cild 1, Jimar 1, Sal 1, İstanbul, 2014.

ERGÜN, Zülküf, **Nerît û Helbest (Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de 1880-1970)**, Çapa yekem, Nûbihar, İstanbul, 2017.

ERGÜN, Zülküf, **Netewetiya Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de**, Nûbihar Akademî, Jimar 4, Sal 2, İstanbul, 2015.

HASSANPOUR, Amir, **Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik (1918-1985)**, Çeviri: İbrahim Bingöl ve Cemil Gündoğan, Birinci Baskı, Avesta, İstanbul, 2005.

HOBSBAWM, E. J., **On history**, New York: New Press, 1997.

MALMÎSANIJ, M. (Amedekarê Weşanê), **Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmançî)-Tirkî (Doğru Yazım İçin Kürtçe (Kurmanca)-Türkçe Sözlük)**, Weşanxaneyê Rûpel, Çapa Yekem, Stenbol, 2012.

MARSIL, Faris Medenî, **Ka bêje Rojen Barnas kî ye çima ew bi Kurdî şîran dinivîsîne?**, 20.02.2013, neynik@kurdinfo.com, nêrîna dawî: 17.04.2015.

MORAN, Berna, **Edebiyat Kuramları ve Eleřtiri**, 3. Basım, İletiřim Yayınları, İstanbul, 2000.

PARILTI, Abidin, 16.01.2009, <http://www.radikal.com.tr/kitap/gizemli-bir-sair-917158/>, nêrîna dawî: 12.03.2016.

SAİD, Edward, **Kıř Ruhu**, Çeviri: Tuncay Birkan, Metis, İkinci Baskı, İstanbul, 2006.

TEMO, Selim, **Kürt Şiiri Antolojisi**, II. Cilt, Birinci Basım, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2007.

ÜLKEN, Hilmi Ziya, **“Millî Vatan”, Vatan ve Kahramanlık Şiirleri Antolojisi**, Hazırlayan: H. Fethi Güzler, İnkılâp ve Aka Kitabevleri, İstanbul, 1965.

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: **ROJEN BARNAS Ê TEMAYÊN SIYASÎ DI HELBESTÊN WÎ DE**

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 155 sayfalık kısmına ilişkin 11.06.2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 5'tir.

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dahil

5 Kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar.....
.....

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Kenan ÖRMEK

Öğrenci No: 13711010

Tarih ve İmza

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı
Öğr. Gör. Zülküf ERGÜN

A.B.D. Başkanı Onayı



T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

ROJEN BARNAS VE ŞİİRLERİNDEKİ SİYASİ TEMALAR

KENAN ÖRMEK

13711010

Mardin

2019